



Rêzепirtûk / 3

**Edîtor**

Yaşar Eroğlu

**Sererastkirina Nivîsaran**

Zana Farqînî

**Çapxane**

Îmaj Matbaacılık

**ISBN**

975-6282-15-3

Wêneyê li ser berga pêşîn:  
“Nîgarek ji Dêra Axtirmanê”  
www.roxanepphoto.com

Wêneyê li ser berga paşîn:  
“Kela Xoşabê”  
Arkeo Atlas

**ZEND Bilim Kùltür Eđitim  
Basın Yayın Ltd. Şti.**

Çınar Mah. İstanbul Cad. İlhanlar  
İşhanı No: 57/7 Bağcılar/İstanbul

**Tel:** (0212) 634 18 83

**Fax:** (0212) 634 58 25

**web:** www.enstituyakurdi.org

**mail:** info@enstituyakurdi.org

Ji Zendê .....	2
<b>Di mercên îroyîn de derfetên kurdiya yekgirtî hene?</b> SAMÎ TAN .....	3
<b>Dîroka zimanê kurdî ya nivîskî û perwerdeyî ya di konseptê medreseyê de</b> MAMOSTE QEDRÎ .....	8
<b>Rewşa redaksiyona weşanên kurdî</b> Hevpeyvîn: YAŞAR EROĞLU .....	21
<b>Dîroka pêşveçûyîna hîndekariya zanistî</b> CÎHAN POLA .....	28
<b>Çavdêriyên min ên li ser Aspeşinê</b> YAŞAR EROĞLU .....	31
<b>Zimanzanîn</b> ADAR JIYAN .....	39
<b>Bidestxistina rayeka lêkeran</b> ZANA FARQÎNÎ .....	42
<b>Wêjeya devkî</b> NEZÎR SILO .....	64
<b>Çend gotin li ser Destana Memê Alan</b> YAŞAR EROĞLU .....	72
<b>Li ser dem û jiyana Melayê Cizîrî</b> CELALETTİN YÖYLER .....	82
<b>Melayê Cizîrî û Feqiyê Teyran</b> D. N. MACKENZIE .....	88
<b>Teoriya muzîkê ya giştî</b> VEYSÎ VARLI .....	90
<b>Komara Mehabadê</b> M. REŞÎD IRGAT .....	100
<b>Helbesteke windabûyî ya Feqiyê Teyran; “Sînem”</b> MIRAZ RONÎ .....	103
<b>Bernameya Beşa Ziman</b> .....	105

# JI ZENDÊ

Em bi dilgermî û coşî bi hejmara xwe ya 9'an ji we xwendevanên hêja re dibêjin merhaba. Çendî dereng jî be, em bawer in ku me bi vê hejmerê çavên we zêde li rê nehişt.

Zend bi vê hejmarê jî dîsan wek rêzepirtûk derdikeve. Êdî ev mecbûriyeta me ya qanûnî ye. Di hejmara nehan de, em dîsan bi nivîsên cur bi cur ên balkêş derdikevin pêşberî we. Li ser redaksiyona weşanên kurdî me dosyayek amade kir. Me pirs arasteyî rojname, kovar û weşanxaneyên ku yekser bi vî karî re eleqe ne, kirin. Me di dosyayê de serê pêşîn cih da yên ku bi kurdî karê weşanê dikin û me ji tevan re pirs şandî û me xwest ku beşdarî li vê dosyayê bikin. Minxabin hin weşanxane û kovarên ku me ji wan re pirs şandibûn, bersiv nedan me. Me jî qîma xwe bi yên ku bersiv dabûn me tenê anî.

Rojname, kovar û weşanxaneyan pirsgirêk û çareseriyên wan gelşan li gorî fikirên xwe destnîşan kirin. Li gorî me, ev ji bo destnîşankirina pirsgirêkên zimên hevpariyê erênî ye. Divê xebatên bi vî rengî bi navgîna çapemeniya kurd jî bînin kirin û hîn zêdetir bînin domandin.

Me bi Mehmet Kuşman ê ku bi zimanê Ûrartûyan dikare bixwîne û binivîse re, hevpeyvînek pêk anî. Ji bo vî karî Yaşar Eroğlu çû Wanê û di cihê cih de hevpeyvîn çêkir.

Em yeqîn dikin ku bi vê hevpeyvînê hûn ê der barê Ûrartûyan û zimanê wan de hin agahiyên nû hîn bibin. Her wiha em diramin ku bi wêneyên ji herêmê jî, mijara hevpeyvînê dewlemendir dibe.

Di vê hejmarê de mijarên me cur bi cur in, lê dîsan jî giranî li ser ziman û wêjeyê ye. Me cih da gotara Samî Tan a ku li ser navê Enstîtûya Kurdî ya Stenbolê, li Konferansa Zimanê Kurdî ya ku li Amedê sala çûyî hatibû lidarxistin, hat pêşkêşkirin û der barê mijara standardkirina zimanê kurdî de bû. Gotara Samî Tan bal dikişîne ser pirsgirêkên standardkirina ziman û di vê mijarê de rê nîşan dide.

Mamosteyê Zanîngeha Dicleyê mamoste Qedîrî teblîxek pêşkêşî heman konferansa navborî kiribû. Teblîx li ser zimanê kurdî ye nivîskî û perwerdeyî ye, ku di dîrokê de li ku derê, di kîjan şaristaniyan de hatiye pê û zimanê nivîskî û perwerdehiya di medreseyan de çawan pêk hatiye. Gotar lêkolînî ye, pir balkêş û dewlemend e. Em wê nivîsara balkêş a lêkolînî jî diweşînin ku em bawer dikin hûn dê jê kêfxweş bimînin.

Zana Farqînî di vê nivîsara xwe ya lêkolînî ya bi navê "Bidestxistina Rayeka Lêkeran" de, bi awayekî dorfirehî li ser rayeka lêkeran rawestiyaye. Zana Farqînî bi hûrnêrinî der barê rayeka lêkeran, guherîn û ketina deng û tewanga ku di lêkeran de diqewime radixe ber çavan. Her wiha awayê bidestxistina rayeka lêkerên kurdî ku du rayekên wan hene, disekine û azinawê formûle dîke û mînakên xurt mijara xwe dewlemend dîke.

Adar Jîyan jî di vê xebata xwe de li ser zimannasiyê sekiniye. Mijar li ser zimannasî û cureyên wê ne.

Me di hejmarên pêşî de bernamêya beşa dîrokê dabû. Di vê hejmarê de jî em cih didin bernamêya beşa ziman. Her wiha di vê hejmarê de mijarên wêjeyê jî bi giranî cih girtine. Nezirê Silo, di gotara xwe de cih daye girîngiya wêjeya devkî. Der barê wêjeya devkî de me digihîne agahiyên baş.

Yaşar Eroğlu li ser destana Memê Alan çend nirxandin kirine. Ji gelek aliyan ve li ser vê destana me ya kevnare nirxandinên balkêş dîke.

Me li ser jîyan, felsefe û jidayikbûna Melayê Cizîrî cih daye da du gotaran; yek a Celalettîn Yoyler e, ya din jî ya D.N MacKenzie ye.

Nivîsa Veysî Varli ya li ser muzîkê, ku me beşa pêşî di hejmara berî vê hejmarê de weşandibû, em beşa wê ya dawî diweşînin. Veysî Varil bi vê lêkolîna xwe me der barê meqamên muzîka kurdî de agahdar dîke û pêzanînen me yên heyî yên di vî warî de zêdetir dîke. Gotara Cihan Pola, bi navê "Dîroka pêşveçûyîna hîndekariya zanîstî" dîroka perwerdehiyê diyarî xwendekaran dîke.

Di vê hejmarê de kêmasiyeke Zendê çêbû. Ji ber ku heta niha me nekarî ku em nivîsarên bi zaravayê kirmanckî (zazakî) peyde bikin an jî bi nivîskar û lêkolîneran bidin nivîsandin, me di di nav rûpelên vê hejmarê de, em bi xemgînî dibêjin ku me cih neda nivîsarên bi vî zaravayî. Ji bo vê yekê em ji xwendekarên Zendê lêborîna xwe dixwazin. Em bawer in ku em dê vê kêmasiya xwe di hejmarên pêş de temam bikin.

Em bang û daxwaza xwe ya her tim dîsan dubare dikin ku eger hûn bixwazin Zendeke xurt, tîr û tijî bigihîje ber destê we nivîsan ji me re bişînin. Çawan ku hûn bi xwendina xwe xwedî li Zendê derdikevin, em bawer in ku hûn ê bi heman helwestê xwedî li vê hejmarê jî derkevin.

Heta hejmarake din bimînin di xêr û xweşiyê de.

# Di mercên îroyîn de derfetên kurdiya yekgirtî hene?

Samî Tan

Ez serê pêşî li ser navê Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê silav û rêz xwe pêşkêşî hemû beşdarên konferansê dikim. Her wiha jî spasiyên xwe pêşkêşî Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê û amadekarên vê konferansê dikim.

Li aliyê din divê ez bidim xuyakirin ku bîr û ramanên di vê gotarê de yên min bi xwe ne, ev gotar li ser navê Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê nayê pêşkêşkirin, ez wekî rêveberekî Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê li ser mijarê bîr û baweriyên xwe pêşkêş dikim.

Mijara ku ji bo min hatiye destnîşankirin, “*Di mercên îroyîn de derfetên zimanê yekgirtî yê kurdî hene?*” ye. A rast ev mijar bi min xwe wisa xwest û amadekarên birêz ên konferansê jî ev yek pejirand. Min bo çî mijareke wiha xwest, ew jî têkildarî naveroka konferansê bi xwe ye. Li gorî baweriyaya min mijara zimanê yekgirtî mijareke gelekî sext û dijwar e, nemaze ji bo kurdên Bakur ez wekî tişteki pir pêwîst nabînim. Li Bakur zimanê kurdî ji dest diçe, piraniya nîşên nû hînî zimanê kurdî nabî. Lewre jî divê em serê pêşîn li ser vê yekê xebatên berfireh û birêkûpêk bikin. Piştî ku axiverên wî zimanî nebûn, êdî çiqas zimanekî tekûz û yekgirtî jî

hebe, zêde ne girîng e. Belkî em karibin di konferanseke din de vê yekê jî nîqaş bikin. Lê niha naveroka konferansê wiha hatiye destnîşankirin û em ê jî li ser vê yekê bîr û baweriyên xwe bibêjin.

**Plansaziya li ser zimên di du waran de pêk tê; pêkanîna statûyeke nû ji bo zimên û xebatên têkûzkirina zimên. Xebatên pêkanîna zimanê fermî, zimanê neteweyî û zimanê yekgirtî dikevin nava çarçoveya plansaziya bilindkirina statûya zimanekî. Mercên ku bingeha zimanekî yekgirtî pêk tînin, ne mercên lîngûîstîk in, ji wê zêdetir mercên dîrokî û civakî ne.**

Berî ku ez qala derfetên pêkhatina zimanê yekgirtî yê kurdî bikim, min divê çend tiştan li ser zimanê yekgirtî û mercên wê bibêjim. Di berhemên cur bi cur de li ser mijara zimanê yekgirtî pir hindik heman tişt hatine gotin. Karê pêkanîna zimanekî yekgirtî wekî karê plansaziya li ser zimên hatiye pênasekirin. Plansaziya zimanî jî bi awayekî hewldanên rêxistinî û kesane yên ji bo pêkanîna hin armancên di-

yarkirî li ser zimên in. Ev hewldan dibe ku bi destê kesan bêne kirin, an jî bi destê rêxistin û dewletekê bêne meşandin.

Hinek zanyaran jî bo pêkanîna armanceke diyarkirî li ser zimên bal kişandiye ser hebûna hêzeke navendî, bo nimûne hikûmetê. Hatiye gotin ku hewldanên kes û saziyên ku hikûmet ne li pişt wane, pirî caran bi ser neketine. Plansaziya li ser zimên di du waran de pêk tê; pêkanîna statûyeke nû ji bo zimên û xebatên têkûzkirina zimên. Xebatên pêkanîna zimanê fermî, zimanê neteweyî û zimanê yekgirtî dikevin nava çarçoveya plansaziya bilindkirina statûya zimanekî. Mercên ku bingeha zimanekî yekgirtî pêk tînin, ne mercên lîngûîstîk in, ji wê zêdetir mercên dîrokî û civakî ne.

Piraniya zanyaran diyar dikin ku zimanê yekgirtî bi lihevhatina mercên siyasî, aborî, bazirganî, rewşenbîrî û ayîni pêk tên. Di pêkanîna zimanê yekgirtî de çend rêbaz hene, ev rêbaz ev in:

1) Ji ber sedemên siyasî (desthilatî), aborî, olî û rewşenbîrî zaravayan ji nav zaravayên din derdikeve pêş û dibe zimanê fermî. Pirî caran ev yek bi destkariya hêzeke rêxistî pêk tê. Hêza baladest zaravayê herê-

mekê li ser teveka neteweyê ferz dike. Mercên siruştî alîkariyê wê hêzê dikin û ew bi vê armanca xwe de bi ser dikeve.

2) Jixweber pêkhatina zimanekî yekgirtî.

Ji ber mercên aborî, siyasî, civakî, ayînî devok û zaravayan ber bi hev tîne û jixweber zimanê herêmekê dibe zimanê yekgirtî.

3) Bi xebateke zanistî zimanekî yekgirtî tê pêkanîn.

Di vê rêbazê de zanyar li hev kom dibin û hemû devok û zaravayên zimanekî dinirxînin û di encamê zimanekî yekgirtî pêk tînin.

Di vê gotarê de armanca min lêkolîn û lêhûrbûna merc û derfetên pêkhatina zimanê yekgirtî yê kurdî ye. Di vî warî yek ji kesên ku serê pêşîn li ser meseleyê serê xwe êşandiye, Cemal Nebez e. Wî hê di sala 1976'an de li ser vê mijarê pirtûkek bi navê "Zimanî Yekgirtûyê Kurdî" weşandiye. Mamoste Cemal Nebez gihîştîye wê encamê ku zimanê yekgirtî yê kurdî ku ew jê re zimanê yekgirtî yê edebî jî dibêje, dê bi rêbaza sêyemîn ango bi lêhûrbûneke zanistî ji tevlihevkirina her du zaravayên sereke; kurmanciya jorîn û kurmanciya naverast pêk were.

Hin kesên din wisa bawer dikin ku divê zimanê yekgirtî li ser bingeha zaravayê kurmanciya naverast (Silêmanî) pêk were. Ew kes wisa bawer dikin ku zaravayê kurmanciya naverast yekgirtina xwe pêk aniye û bûye zimanê nivîskî, rewşenbîrî, akademîk. Her wiha mercên siyasî jî dest didin ku ew zarava

bibe bingeha zimanê yekgirtî yê kurdî. Bo nimûne mamosteyê Zanîngeha Selahaddîn Dr. Refîq Şiwanî di gotareke xwe ya ku pêşkêşî Konferansa Zimanê Kurdî ya li Tehranê kiribû de daye zanîn ku divê zaravayê kurmanciya naverast bibe zimanê yekgirtî yê kurdî. Di vê gotara ku di hejmarê duyemîn a kovara "Zimanewan" de hatiye weşandin, wiha gotiye: "Zimanî nûsînê êstayê kurdî Standard, wate kirmancî naverast bikrêt binçîney zimanî neteweyî. Çunke xizmetêkî zor û berdewamî be xoyewe binîwe." (Sabîr, Zimanewan, hejmar: 2, r. 29-39)

**Hin kesên din wisa bawer dikin ku divê zimanê yekgirtî li ser bingeha zaravayê kurmanciya naverast (Silêmanî) pêk were. Ew kes wisa bawer dikin ku zaravayê kurmanciya naverast yekgirtina xwe pêk aniye û bûye zimanê nivîskî, rewşenbîrî, akademîk. Her wiha mercên siyasî jî dest didin ku ew zarava bibe bingeha zimanê yekgirtî yê kurdî.**

Kesên ku mîna birêz Şiwanî difikirin di nava kurdên Başûr de gelek in. Heta hindê kes hê tiştên tûjtir jî dibêjin. Bo nimûne Ferhat Şakelî ku li Zanîngeha Upsala mamosteya zimanê kurdî dike, di malpera bi navê "www.dimane.com" de roja 27'ê kewçêra 2005'an di hevpeyvîneke xwe de bi zimanekî tund êrîşî kesên ku alfabe ya latînî bi kar anîne dike û di serî de malbata Bedirxaniyan, kesên ku alfabe ya latînî bi kar tînin

wekî casûsên emperyalîzmê bi nav dike. Ew dixwaze ku hemû kurd dev ji zaravayên xwe berdin û hînî kurmanciya naverast bibin.

Dîroka biryarên li ser zimanê yekgirtî kevntir e, lewre li gorî agahiyên ku Cemal Nebez dide berê biryar li ser zimanê yekgirtî hatine girtin, lê ji ber nebûna desthilatiyeke giştî ya kurd, ew daxwaz bi ser neketine. Mamoste Cemal Nebez li ser vê mijarê wiha gotiye:

*"Rêy sepandinî şeweyek be ser gelêk da: Em be taybetî bo ew gelane ye ke hêsta zimanekî yekgirtûyan niye, belam qewareyekî serbexoy yekgirtûyan heye. Ew hele bo çareserkirdinî eme; ya be corêkî dêmokratîyane, bîr û ray giştîyê xelkeke werdegîrê, ta bizanrê çî şeweyekî be dil e, ya ewete karbestan xoyan şeweyek le şewekanî zimanekê dekene zimanî resmî û bew renga deysepênin be ser geleke da û berebere dibête zimanî edebîyan.*

*Em rêyeyan bo kurdî dest nada. Çunke ew deng wergirtine giştîye ya ew be zor sepandinê bo cê be cê nabê, be hoy nebûnî qewareyekî siyasî î yekgirtûwewe. Le ber ewe ew rayane lem babetewe ta este bûn û hen; wek ewey le salî 1934 da kongrey kurdnasekanî yekêti Sovyêt biryarî da ke şewey kirmancîyê jûrû bikate şeweyekî resmî bo hemû kurd (4) la ewey le eylûlî salî 1959 da kongrey momastayanî kurdî Êraq biryar da, bo ewey şewey kirmancîyê nêwerast (sorani) bikate şewey resmî (5) le xeyal bew lawe hîçî di nî ye. Çunke naçête ser, be hoy nebûnî desthelatêkî siyasî î*

*nêwendiyewe ke le hemû parçekanî Kurdistan da kar bika.*" (Nebez, 1976:8)

Wate, ji ber ku li seranserî Kurdistanê desthilatiyeke ku zaravayekî li seranserî Kurdistanê nîn e da ku çî bi darê zorê, çî jî bi rapirsînên demokratîk pêk bîne, ev rêbaz ji bo Kurdistanê ligel hin biryaran neçûye sêrî û naçe sêrî.

Li aliyê din, her wekî mercên sepandina zaravayekî, ji bo ku zimanekî yekgirtî xwe bi xwe pêk were jî hinek merc pêwîst in. Di dema pêkhatina zimanê yekgirtî de jî dîsa zimanê herêmekê dikare bingeha zimanê yekgirtî pêk bîne. Nemaze di demên berê de sedemên olî cihêkî taybet digirin. Li ser vê yekê jî mamoste Cemal Nebez wiha gotiye: "1- Ewey kitêbêkî ayîni pîroz bew şêweye binûsrê-tewe. Bo wêne: Şêwey hozî Qur-reys bû be şêwey edebî î erebkan; tenya le ber ewey Qur'an bew şêweyê hate xwarewe. Martîn Luther (1546-1483) î elmanîş ke dahênerî ayîna (6) y protestanî û pêşeway bizûtnewey çakkirdinî ayîni diyanêti "Wata katolîki" ye; paş ewey Încîlî le latîniyewe wergêraye ser şêwey elmanîy saksî, ke ta ew hele tenya le dîwanxanekanî emîrekanî saks da be kar dehênra, tiwanî serincî xelkêkî zor bo ew încîle rabikêşê û her bew hoyewe şêwey saksî bû be zimanî edebî hemû ewaney emro be elmanî dedîwin; her le Elmaniya xoyewe bigire, ta degate Swîsra û Nemsra û gişt layekî dî.

Be me da boman derdekewê ke ayîn dewrêkî mezin degêrê le dirustkirdinî zimanêkî edebî da.

Pêçewaney emeş her rast e.

*Wata; ayîn dîsanewe dewrêkî mezin degêrê le dûletkirdinî zimanêkî edebî da. Bo wêne: Siryanekan heta sedey pêncî zayî-nî; zimanêkî edebîy yekgirtûyan hebû. A lem sedeye da ajawe kewte klîsey diyanekanî rojhelatewe û bewe xelkeke bûn be dû beşewe û her le weşewe ayînzay Yaqûbî û ayînzay Nestûrî peyda bûn. Emca wurde wurde her laye şêwey taybetî xoy parast û pêy nûsî û rîq û kîne û dûberekîş dewrêkî agirxoşkeraney niwand bo dûrxistinewey her dû şêweke le yektir; corê siryanekan êste du şêwey edebîyan heye.*

Aryayîye konekanîş "wata Hind û Êraniye konekan" le seretawe be yek ziman deduwan û yek ayînsiyay hemû. Belam paş ewey ewaney Hindistan ayî-nî xoyan ciyakirdewe û dewr û berî 3000 î P.Z da kitêbî pîrozî "Vîda"yan be şêwey Sanskrît bo nûsrayewe, emca ke duway ewanîş aryayekanî Êran ayîni Zerdestîyan pesend kird û kitê-bekeyan be zimanî "Avêsta" bilaw kirdewe; ew deme zimanî aryayî berebere bû be dû ziman: Hindî û Êranî, ke her yekeşiyay le serxo bû be çend zimanêkî serbexo." (Nebez, 1976: 8-9)

Her wiha hin caran berhemmeke wêjeyî jî dikare bibe, sedem ku zimanê wê berhemê bibe bingeha zimanê yekgirtî..

"Jiyandinewey edebiyat be taqe şêweyekî zimanêk û le sinorêkî yekcar firawan da; debê-te hoy dirustkirdinî zimanêkî edebî. Bo wêne: Zimanî farisîy taze lew katewe durist buwe ke **Rûdekî û Fîrdewsî (1020-932)** destîyan be honrawe honînewe kirduwe be **şêwey derî** (wata şêwey jûrûy rojhelatî Êran). Be

taybetî **Şanamey Fîrdewsî** dewrêkî karîgêr alem rûwewe û tiwanî hemû şêwe û zarawakanî dî ramal bika û cêy xoy bika-tewe." (Nebez, 1976: 9)

Heke li welatekî xebatên akademîk û zanistî bi tenê bi zaravayekî hatibin kirin, bi zaravayên din nehatibin kirin, ew civakê han dide ku zaravayê navborî wekî bingeha zimanê yekgirtî bipejirîne.

Li aliyê din sedemên aborî û bazirganî jî dikarin bihêlin ku zimanê herêmekê bibe bingeha zimanê yekgirtî.

Dema ku em baş bala xwe bidinê em ê bibînin ku ev merc yek jî ji bo kurdî bi cih nayê. Tevî ku pirtûka Zerdestîyan Avesta bi zimanê Avestayî hatiye nivîsandin, piştî kurd bi darê zorê be jî bûne misilman, olên Kurdistanê ên mîna Êzdayî û Ehlî-Heq bûn olên komeke biçûk a kurdan. Tevî ku pirtûkên pîroz ên êzdahiyê Cilwe û Mîstefa Reş bi kurdî jî, ew nikarin peywireke wiha di nav kurdan de bi cih bînin. Vê yekê hiştiye ku kurdên êzdî yên li Sovyetistanê çand û zimanê xwe bipolarîzin, ji ber ku li gorî baweriya wan kesên ku dev ji zimanê kurdî berdidin dev ji ola xwe berdidin. Lê nekariye bingeha zimanê yekgirtî yê kurdan pêk bîne.

Heke em bala xwe bidin wêjeya kurdî, nêzî hezar salan e ku bi zimanê kurdî berhem hatine dayîn. Dema ku em bala xwe didin dîroka wêjeya kurdî em dibînin ku berhemên pêşî bi zaravayên lorî, hewramî hatine nivîsandin. Bo nimûne Baba Tahîrê Hemedanî (938-1010) bi zaravayê lorî nivîsandiye. Mele

Perîşan (1398-9) bi hewramî nivîsandiye. Piştî wî helbestvanên mîna Elî Herîrî (1425-1490), Melayê Cizîrî (1570-1640), Feqiyê Teyran (1590-1660) û Ehmedê Xanî (1640-1706) tên. Wan jî bi zaravayê kurmançiya jorîn nivîsandiye. Yekemîn helbestkarê ku bi zaravayê soranî nivîsandiye Mîstefa Kurdî ye di salên 1809-1849'an de jiyaye.

Di mercên asayî berhemeka mîna Mem û Zîn diviya rola Şahnameya Fîrdewsî pêk bianiya, lê ev merc tu caran bi dest neketine. Ji ber ku berhemên wêjeya kurdî ya klasîk li medreseyan di nav sînoren mîrnîşînên cuda de derketine holê. Wekî mînak di pêşketina wêjeya bi zaravayê kurmançî de mîrnîşîna Botan û Behdînan xwediyê cihekî taybet e. Her wiha di wêjeya klasîk a soranî de jî cihekî taybet ê mîrnîşîna Baban heye, ji ber vê yekê di dema Osmaniya de ew zaravayê kurdî wekî babanî hatiye binavkirin. Wekî mînak di namilkeye hînkirina zimanê kurdî "Hînkêrê Zimanê Kurdî" de ku ji hêla Hêvî Civata Telebên Kurdan ve di sala 1921'ê de hatiye weşandin, wiha hatiye gotin: Rêberê her du kurdî: Kurmançî-Babanî. Her wiha zaravayê hewramî jî zimanê mîrnîşîna Erdalan e. Jixwe bi lawazbûna vê mîrnîşînê re bandora hewramî jî kêmtir dibe. Ji ber ku Kurdistan di demên kevn de her tim bûye warê şerên hêzên mezin ên cihanê, mercên desthilatiyeke yekgirtî bi dest neketine, lewre jî mercên pêkhatina zimanekî yekgirtî durist nebûne.

Tê zanîn ku dema em qala

zimanê yekgirtî dikin, mebesta me ne zimanê axaftinê ye, mebesta me zimanê nivîskî ye. Lê ev nêzî sed salî ye ku bi du zaravayên kurdî berhem tene dayîn. Yekemîn rojnameya kurdî Kurdistan (1898) bi zaravayê kurmançiya jorîn hate weşandin. Di gelek weşanên destpêka sedsala 20'an de du zaravayên kurdî (kurmançî û babanî) bi hev re hatin bikaranîn. Em dizanin ku di rojnameyan mîna Rojî Kurd û Hetawî Kurd de kurmançî û babanî bi hev cih digirt. Piştî ku başûrê Kurdistanê ji bin destê Osmaniyan derket her du zarava ji berê zêdetir ji hev dûr ketin. Ji dawiya salên 1970'yî vir de zaravayê kirmanckî jî bûye zimanê nivîskî. Niha bi sê zaravayên kurdî wêjeyek bi pêş ketiye. Wisa xuya dike ku dê ev rewş bi vî awayî bidome, lewre mercên yekgirtina van zaravayan nîn in.

Mijara zimanê yekgirtî her tim di rojeva kurdan de bi awayekî cihê xwe girtiye. Heta em dikarin bibêjin, wekî xewneke piraniya welatperwerên kurd bûye. Lê digel vê yekê jî ji bo pêkhatinê ve xewnê derfetê bi dest kurdan neketine. Niha digel ku merc ji berê baştir in jî derfeta pêkanîna zimanekî yekgirtî li seranserî Kurdistanê nîn in. Bi qasî ku em dibînin, ev pirs-girêk li başûrê Kurdistanê bi awayekî çareser bûye. Zaravayê soranî wekî zaravayê fermî hatiye pejirandin. Di piraniya karên dewletî de ew tê bikaranîn, ligelê ve yekê nemaze li herêma Behdînan kurmançiya jorîn jî tê bikaranîn. Zaravayê soranî di vê sedsala dawîn de derfetên pêşbetinê bi dest xistin. Niha

wekî zimanê perwerdehî û wêjeyî gelekî bi pêş ketiye, lê mixabin bandora vê pêşketinê li ser parçeyên din ên Kurdistanê çênebûye. Her çiqas bandora wan xebatan hinekî li ser kurdên Rojhilat çêbûbû jî, li ser parçeyên din bandora wan xebatan pir kêmtir e.

**Mijara zimanê yekgirtî her tim di rojeva kurdan de bi awayekî cihê xwe girtiye. Heta em dikarin bibêjin, wekî xewneke piraniya welatperwerên kurd bûye. Lê digel vê yekê jî ji bo pêkhatinê ve xewnê derfetê bi dest kurdan neketine. Niha digel ku merc ji berê baştir in jî derfeta pêkanîna zimanekî yekgirtî li seranserî Kurdistanê nîn in.**

Her wiha di weşan û perwerdehiyê de jî her du zarava bi hev re tene bikaranîn. Nemaze televîzyon û radyo cih didin her du zaravayan jî. Li Rojhilat jî heman rewş heye, her du zarava; kurmançiya naverast û kurmançiya jorîn bi hev re tene bikaranîn. Li başûrê rojavayê Kurdistanê û li nav kurdên Sovyetistanê bi tenê kurmançiya jorîn tê bikaranîn.

Li Bakur niha du zarava; kurmançî û kirmanckî bi hev re tene bikaranîn.

Di nav piraniya rewşên bîr û siyasatmedarên Bakur de li ser vê mijarê dîtineke serdest heye, ew jî dîtina yekgirtina her zaravayî bi awayekî cuda ye. Li ser vê bingehê piraniya weşanên ku bi kurdî derketine cih daye du za-

ravayan (kurmançî-kirmanckî). Ligel vê yekê jî berhemên bi kurdî bi giranî bi zaravayê kurmançî bûne. Ev yek ji Kovara Hawarê vir de bi vî rengî ye. Her çiqas danerê Hawarê Mîr Celadet Bedirxan cih dabe hinek nivîsên bi kurmançiya başûr û hinek xebat li ser kirmanckî kiribin jî, weşanên ku li Şam û Bêrûdê derketine bi giranî zaravayê kurmançî derketine. Piştî salên 90'î ku geşedaneke di warê pirtûk, kovar û heftenameyên kurdî de pêk hatiye, di piraniya kovaran de ligel nivîsên bi kurmançî, kêm be jî nivîsên bi kirmanckî jî cih ji xwe re ditiye.

Di rewşa heyî de em dikarin çi bikin? Karên ku em dikarin cuda cuda bikin hene, karên ku divê em bi hev re pêk bînin hene. Bo nimûne wekî kurdên bakurê Kurdistanê divê serê pêşîn em ji bo ku rê li ber asîmîlasyon û oto-asîmîlasyonê bigirin. Di vî warî de divê kurdên parçeyên din, nemaze jî kurdên başûrê Kurdistanê piştevaniya me bikin. Wekî ew dikarin deriyê zanîngehên li herêma Kurdistanê ji ciwanên kurd re veikin; di pêkanîna projeyên parastin û pêşvekirina zimanê kurdî de alîkariya kurdên Bakur bikin. Ji bilî wê, em dikarin van tiştan bi hev re bikin:

1-Divê armanca me ne pêkanîna zimanê yekgirtî, lê belê çareserkirina arîşeya ji hev têgihîştinê be. Mercên civakî rê didin ku kurd bêyî dijwarî karibin ji zaravayên hev fêm bikin. Ji bo vê yekê jî divê serê pêşîn zarava di nava xwe de yekgirtinê pêk bînin, dema ku vê yekê dikin jî xwe nêzî zarava-

yên din bikin. Zarava aliyên hevpar derxin pêş, bêjeyên hevpar bikin zimanê standart û ji hev bêjeyan wergirin.

2-Ji bo vê yekê jî divê kurd karibin ji berhemên hev sûdê wergirin. Astenga sereke li ber vê yekê cudatiya alfabeyê ye. Divê ev cudatî ji holê rabe. Cihê bextewariyê ye ku alfabe-ya kîrîlî xwe bi xwe ji navê rabû. Êdî kurdên Yekitiya Sovyetê ya berê jî tîpên latînî bi kar tînin. Lê divê berhemên ku bi alfabe-ya kîrîlî hatine nivîsandin, li tîpên latînî û erebî bêne wergerandin. Her wiha her çiqas, hinek rewşenbîrên mîna Ferhad Şakelî pê zivêr bibin jî, li Başûr alfabe-ya latînî belav dibe. Ev jî cihê bextewariyê ye. Divê berhemên ku bi soranî derketine bêne latînîzekirin û berhemên kurmançî ji bo tîpên erebî bêne raguhastin da ku em karibin ji berhemên hev sûdê wergirin.

3- Ji bo zaravayên kurdî nêzî hev bibin divê danûstandinê me xurt bibin. Ji bo vê yekê jî pêdivî bi pêkanîna saziyên hevpar heye. Pêwîst e saziyên rewşenbîrî, civakî û ragihandinê gavan ber bi xebatên hevpar ve bavêjin, bi hev re projeyan pêk bînin. Bo nimûne, em dikarin lijneyeke bilind a zimên bi beşdariya saziyên akademîk û zimanzanên ji her çar parçeyên Kurdistanê pêk bînin. Her wiha nivîskarên kurd dikarin yekîtiya xwe pêk bînin û berhemên wan li her çar parçeyên Kurdistanê bêne belavkirin. Navgînên ragihandinê dikarin xebatên hevpar pêk bînin.

Bi vî awayî belkî em nikarin zimanekî yekgirtî pêk bînin, lê em dikarin zimanê xwe li seranserê Kurdistanê biparêzin, geş bikin û asta cihanî de pê berhemên heja hilberînin. Ev yek jî hem dê rûmeta zimanê me, hem jî rûmeta gelê me di nava mirovahiyê berz û bilind bike.

Dubare rêz û silav!

### Çavkanî:

1- Nebez, Cemal. Zimanî Yekgirtûy Kurdî, Bilawkirawey Yekêti Neteweyî Xwêndkaranî Kurd Le Ewrûpa, Amberg, Almanya, 1976.

2- Şiwanî, Dr. Refîq, "Çûneyetî Awêtekirdinî Zarekanî Zimanî Kurdî le Zimanî Standerd da", Kovara Zimanewan, jimare 2, Taran 1381 (hetawî).

3- Hînkere Zimanê Kurdî, Ji Neşriyata Hêvî Civata Telebên Kurdî, 1921, Stenbol.

4- Hasanpour, Emîr. National And Language In Kurdistan (1918-1985), Mellen Research University Press, San Francisco, 1992.

5- Miller, Carolyn P. "Language standardization: Problems and Possibilities." In Kindell, Gloria E., ed. 1991. Proceedings of the Summer Institute of Linguistics International Language Assessment Conference, Horsleys Green, 23-31 May 1989. Dallas: Summer Institute of Linguistics. From LinguaLinks Library 5.0, CD-Rom, SIL International, 2002.

**Têbinî:** Ev gotar wek teblîxa Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê ji aliyê Samî Tan ve li Konferansa Standartkirina Ziman a çarçoveya "Rojên Wejêyê" ya ku Şarederiya Mezin a Amedê li dar xistibû hatiye pêşkêşkirin.

# Dîroka zimanê kurdî ya nivîskî û perwerdeyî ya di konseptê medreseyê de

Mamoste Qedrî (Zanîngeha Dicleyê)

Çawa ku çend rûpel paşê em ê bi berfirehî li ser bisekinin, medrese wekî perwerdegeha zimanê kurdî û jêdera wêjeya kurdî tê qebûlkirin. Lê ev nayê wê wateyê ku kurdan beriya îslamê û medreseyê, zimanê xwe di warê nivîs û perwerdehiyê de nexebitandine. Belkî wan jî ji Nivîsa Mixî heya Alfabeya Pehlewî bi gelek tîp û alfabeyan berhemên nivîskî û perwerdehî derxistine holê. Qismek ji van berhemên keval in ango tablet in, qismek peyman in, qismek jî pirtûk in. Çawa ku em ê li ser bisekinin qismek ji van berhemên îro di hinek muzeyên dinê de tên mihafezekirin û li ber çavan in. Ji aliyê zanyarên ewrûpî ve li ser wan vekolîn û lêkolînan zanistî hatine kirin û encamên van vekolîn û lêkolînan di kovar û rojnameyên cur bi cur de hatine weşandin. Divê heya niha nivîskar û lêkolînerên kurd li pey wan berhem û belgeyan biketana û biçûna muzexaneyên ku ev belge û berhem di wan de ne, wêne û fotokopiyên wan bikişandana, di kovar û rojnameyên kurdî de bidana weşandin û bi gelê xwe bidana naskirin. Lê mixabin heya îro me xebatên bi vî rengî, der barê van keval û belge û pirtûkan de, di kovar û rojnameyên xwe yên kurdî de

neditine. Ji ber vî qasî, beriya ku em derbasî mijara medreseyê bibin em dixwazin bala nivîskar û lêkolînerên xwe bikişînin ser van berhemên ku hem ji aliyê dîroki û hem jî ji aliyê kurdolojîyê ve gelek girîng in.

## 1. BERIYA ÎSLAMÊ Û MEDRESEYÊ, BIKARANÎNA ZIMANÊ KURDÎ YÊ NIVÎSKÎ

### 1. 1. Kevalên Tofana Nûh bi nivîsa mixî

Nivîsa mixî ya sumeran ji 3000 sal beriya zayînê heya 600 sal beriya zayînê, ji aliyê gelek milletên dinyayê ve hatiye bikaranîn. Kurdistaniyên berê yê mîna Hûrî, Mîtanî, Kaşî û qewmê Med ev nivîs bi kar anîne û li gorî fonetîka zimanên xwe hejmara tîp û dengên wê kêr kirine yan jî zêde kirine.<sup>(1)</sup> Ji bo nimûne Medan gava dest bi bikaranîna wê nivîsê kirine, tîpên wê 36 bûne. Wan li gorî fonetîka xwe 6 tîp lê zêde kirine, bi wê zêdekirinê hejmara tîpan gihîştîye 42'yan.<sup>(2)</sup> Nivîsa mixî hema hema ji tevî dengên kurdî re bi kêr hatiye. Ango pêşiyê kurdan ev sîstem li gorî hemû dengên xwe bi kar anîne.<sup>(3)</sup>

Li gorî ku Hazim Hacıî di kitêba xwe ya erebî de ya bi

navê *Sefehatun Min Tarîxi'l-Kurd we Kurdistan* (Çend Pel ji Dîroka Kurd û Kurdistanê) neqil dike, qismek ji belgeyên herî kevn ku bi nivîsa mixî, bi zimanê kurdî hatine nivîsandin û gihastîne roja me hinek keval (tablet, lewhe) in ku behsa Tofana Nûh dikin. Ev kevalên hanê niha di Muzeya Londonê de tên mihafezekirin û di vî warî de, di rojnameya *Sewtu'r-Rafîdeyn* (Dengê Mezopotamya) de, di hejmara 53'yan a sala 1984'an de meqaleyek jî hatiye weşandin.<sup>(4)</sup>

### 1. 2. Nivîstekên hewramî, bi alfabeya aramî û yewnanî

Li gorî Cemal Reşîd Ehmed, kurdan piştî ketina Împaratoriya Ixmîni, di dawiyê sedsala 4'an a beriya zayînê de dev ji nivîsa mixî berdaye û dest bi xebitandina alfabeya girekî (yewnanî) û aramî kirine.<sup>(5)</sup> Tekstên kurdî yê ku bi van alfabeyan hatine nivîsandin û gihastîne roja me *Nivîstekên Hewramî* ne. Ango hinek nivîstekên ku bi zaravayê hewramî hatine nivîsandin in. Di lêkolînan der barê van nivîstekên ku hem zanyarên ewrûpî hem jî dîroknasên kurd gelek bi girîngî li ser wan sekinîne, ev tespît hatine kirin.<sup>(6)</sup>



Di sala 1909'an a zayînê de li Hewramanê, di hundirê şikeftê de hinek nivîstekên bi zaravayê hewramî, bi xetên girekî û aramî hatine dîtin. Dr. Seîd el-Kurdistanî 3 heb ji van nivîstekan birine Bîrîtanyayê û teslîmî arkeolog Prof. Minns kirine. Ev her sê nivîstek, beriya zayînê di sedsala 88, 22 û 11'an de, di dema aşkaniyan de hatine nivîsandin. Yek ji wan bi alfabe-ya aramî, du heb jî bi alfabe-ya yewnanî bûne. Prof. Minns der barê her duyên yewnanî de lêkolîn kiriye û encamên lêkolîna xwe di sala 1915'an de, di kovara *Lêkolînên Helenîstîk* de daye weşandin. Minns, a bi aramî jî ji A. Cowley re şandiye ku ev zanyar li ser zimanên samî pîsporekî dema xwe bûye. Cowley wergera vê nivîstekê di sala 1919'an de di kovara *JRASê* de weşandiye. Nivîstek ji 8 rêzan pêk tê. Cemal Reşîd Ehmed hem orjînalê vê nivîstekê hem jî bilêvkirina wê ya li gorî alfabe-ya erebî di kitêba xwe ya bi navê *Zuhûru'l-kurd Fi't-Tarîx* de qeyd kiriye. Ji 22 tîpên alfabe-ya aramî ya wê çaxê hew 14 tîp tenê di vê nivîstekê de hatine bikaranîn. Loma di xwendina wê de hinek astengî derketine holê. Ji aliyê kurdolojîyê ve ev nivîstekên han gelek girîng in. Nivîstek ji peymanê bazirganî pêk tê. Tê de behsa kirîn û kirêkirina rez û baxçeyan tê kirin. Navên kesên ku bûne şahidê vê peymanê jî yek bi yek tê de cih digirin. Em dixwazin di tabloya jêrê de hem bilêvkirina vê nivîstekê ya nêzîke hem jî wergera wê ya kurmançî li vê derê qeyd bikin.

Bilêvkirina orjînalê nivîstekê ya nêzîke	Bi kurmançiya îro
1) Şenet /// Qi Yerexa Erwetet Meybenû Pitispik berî Turîn.	1) Sal 3000, meh Erwetet, havîn. Xwediyê şerabê Pitispik kurê Turîn
2) /// 1.. û ? yekî kerma esmek men Ebikuşkun Piliz yat.	2) 201 wekî bihayê yek rezê tîrî da ku nivê malî wî bê zivirandin.
3) Rezbenû Erîl berî Bişnîn dad ehî kula zewzen 10, 20, 20, 5.	3) Xwediyê rez Erîlê kurê Bişnîn e. Temamî pere ku 55 zewzîn e da wî
4) Me men Bûmxûti E...X hemî edlû qedemte	4) Da xwediyê erdê. Vî kesî ev tişt qebûl kiriye di hizûra şahidan de.
5) Şehdîn: Tîrik berî Epînî berî Reşno berî Eriştet	5) Şahid ev in: Tîrik kurê Epînî, kurê Reşno, kurê Eriştet
6) Berî Ebnû Gerîpnehî berî Mitrapedî Sînik berî Matbeng	6) Kurê Ebnû û Gerîpnehî kurê Mitrapedî, Sînik kurê Matbeng
7) ....Kerma esmetin kerma zînet? Erîl men	7) Peryê rezê tîrî yê Esmetin. Ewê rez ji Erîl re bê dayîn ji aliyê
8) Pitispik kula zewzen 10, 20, 20, 5	8) Pitispik ve. Hemû li ser hev 55 zewzîn e.

Cemal Reşîd Ehmed der barê vê nivîstekê de wiha dibêje:

- Xwendina nivîstekê tiştê dijwar e û hinek simbol ne diyar in.

- Ev çend nav aramî ne, yê din kurdî ne:

*Şenet* (sal), *Qi* (havîn), *Yerexa* (meh), *Biliz* (nîvî), *Kula* (hemû, tev, tamam), *Men* (ji...), *Qedemte* (pêşkêşkirin), *Kerma* (rezê tîrî)

- Di rêza yekem de "*Sal 3000*" derbas dibe. Ev sal li gor teqwîma selçûqîyan e. Beramberî bi 11 sal beriya zayînê dike. Di heman rêzê de meha "Erwetet" derbas dibe. Ev nav ji navê xwedawendê Hindû-Arî "*Hewrfetat*" hatiye girtin ku di Quranê de wekî "*Harû*" derbas dibe.

- Wateya bêjeya "*rezbenû*" ya ku di rêza sêyemîn de derbas dibe "*xwediyê rez*" e.

- Di rêza çaremîn de lêkera "*dad*" derbas dibe. Ev lêker niha wekî "*da*" jî tê bikaranîn.

- Bêjeya "şehdîn" ku di rêza pêncemîn de derbas dibe, pirjimara "*şahid*" e.

- Navê şahidên ku di rêzên navbera 5-8'an de derbas dibin, hinek nav û rengdêrên kurdî yê nêzîkî û bawerî ne. Ji bo nimûne:

**Reşno û Eriştet:** Du nav ji navên cinan in.

**Mitrapedî:** Xwedawendê hakim "Mîhra".

**Pitispik:** Fermandarê artêşê

**Reşno:** Ferîştayê ku rihan distîne.

### 1. 3. Sî kitêbên bi alfabe-ya Bînû Şad û Masîsûratî

Ji bilî kurdan tu miletekî "Alfabe-ya Bînû Şad û Masîsûratî" bi kar neanîne. Bînû Şad û Masîsûratî du 'eşîrên kurdan in. Kitêba herî kevn ku behsa vê alfabe-ya kurdan a taybet dike, kitêba erebî ya bi navê "*Şewqu'l-Musteham Fî Ma'rifeti Rumûzi'l-Eqlam*" e. Nivîskarê vê kitêbê Ehmed kurê Ebûbekir kurê Wehşîye ye. Di lîteratûrê de bi kurtasî wekî Îbnu Wehşîye tê naskirin. Bi

xwe Keldanî bûye û bi zimanê kurdî jî zanibûye. Wî ev kitêba xwe li ser daxwaza hukimdarê Endelûsê Ebdulmelîkê kurê Ebdurehman nivîsandiye. Ebdulmelîk xwestiye ku bizanibe ka ji destpêkê heya dema wî çend cure nivîs û alfabe hatine bikaranîn. Îbnu Wehşîye li ser vê daxwazê ev kitêba xwe di sala 241'ê koçî /856'ê zayînî de nivîsandiye. Nivîskar di bin sernavê "*Sifetu qelemin axere mine 'l-eqlami 'l-qedîmeti*" (Şeklê qelemêke din ji qelemên kevn) de wiha dibêje: "Kurdên Bînu Şad û Masîsûratî temamî berhemên xwe yê zanistî û hunerî bi vê alfabayê nivîsandine. Tîp û şeklên ku di vê alfabayê de ne, pir xerîb û kevnar in û di alfabayên din de nayên dîtin. Min li Bexdayê di nav meqberên îsewîyan de 30 pirtûkên ku bi vê alfabayê hatine nivîsandin, dîtin û 2 heb ji wan niha li Şamê li ba min in. Yek jê der barê '*edilandina rezê tirî û xurman*, yek jî der barê *derxistina avê ji bin erdê* ye. Ji bo ku însan jê îstifade bikin min ev ji zimanê kurdî wergerandin zimanê erebî. Çawa ku tu dibînî şeklê vê elfabayê ev e...". Belê Îbnu Wehşîye wiha gotiye û orjînal alfabayê di kitêba xwe ya navderborî de qeyd kiriye.<sup>(7)</sup>

1) Ji gotinên Îbnu Wehşîye ku dibêje "kurdên Bînu Şad û Masîsûratî temamî berhemên xwe yê zanistî û hunerî bi vê alfabayê nivîsandine" tê fêmkirin ku kurdan ev alfabe di warê perwerdehiyê de jî bi kar aniyê.

2) Divê der barê kurdên Bînu Şad û Masîsûratî de vekolîn û lêkolîn bîn kirin.

3) Eger bi salan û mehan jî dewam bike, divê kurd herin

Endelûs, Bexda û Şamê li wan 30 pirtûkên kurdî yê ku bi vê alfabayê hatine nivîsandin bigerin.

#### 1. 4. Çend berhemên bi zaravayê feylî yê kurdî bi alfabe Pehlewî

Zaravayê feylî yê kurdî, di dema Dewleta Sasaniyan de zaravayê fermî bûye. Di navbera sedsalên sêyemîn û heftemîn ên zayînî de gelek kitêb û arşiv ên mîna *Zend Avesta*, *Dînkêrd*, *Bondhîşin*, *Pendnamegî Zaradûst* û *Mînokî Xîred* bi vî zaravayî hatine nivîsandin. Li gor Cemal Reşîd Ehmed ev kitêbên han jî di dema ebasîyan de ji zaravayê feylî hatine wergerandin bal erebî ve, lê eslê wan bi şaşîti wekî farişî hatine qebûl kirin: *Sîndbadê Behrî*, *Hezar û Şevk*, *Xudayname*, *Karname*, *Ayiname*, *Kereteke û Demeneke* (ango Kelîle û Dîmne).<sup>(8)</sup>

#### 2. PIŞTÎ ÎSLAMÊ, DI PERWERDEHIYA MEDRESEYÊ DE BIKARANÎNA ZIMANÊ KURDÎ

Wateya *medreseyê* "*cihê dersê*" ye. Mehna "*ders*"ê jî, rakirina tişteki ji holê ye. Nexwe medrese cihê rakirina tişteki ji holê ye ku ew tişt jî nezani ye. Ji kesên ku di medreseyê de ders digirin re "feqî", ji alimên ku darsa feqîyan didin re jî "seyda" tê gotin. Bajar û gundê kurdan qet bêyî medrese nema ne. Ji bo nimûne, di dema hinek mîrekîyên kurdan de li Nisêbînê 2, li Sîncarê 3, li Heskîfê 3, li Hewlêrê 4, li Cizîrê 4, li Bedlîsê 5, li Mûsilê, 6, li Mêrdînê 10 medrese hebûne.<sup>(9)</sup>

Ji bilî medreseyên mezin ên bajaran, hema hema li her gun-

dekî kurdan bi kêleka mizgeftê ve medreseyeke biçûk dihat çêkirin ku ji wê medreseya biçûk re "hucre" dihat gotin.

Di medreseyê de 12 ilm dihatin xwendin. Kesê ku ev 12 ilm xelas dikirin re "mucaz" ango "xwediyê îcazetê" dihat gotin. Lewra piştî xelaskirina van ilman ji wan re destûrnameyeke mîna dîplomayê dihat dayîn, ku navê wê destûrnameyê "îcazet" e. Mehna îcazetê "destûr" e. Ango ji xwediyê wê re destûr dihat dayîn ku ew jî êdî karibe seydatî û melatîyê bike û dersan bide. Ev 12 ilm ev in ku min bi xwe jî di medreseyên welêt de ew xwendine û xelas kirine: 1) Serf 2) Nehw (ji van her duyan re bi gelemperî rêziman tê gotin) 3) Beyan 4) Bedî' 5) Me'anî (ji van her sêyan re îro belaxet/rewanbêjî tê gotin) 6) Helbest û Edebiyat 7) Mantîq 8) Eqîde=Kelam 9) Hey'et 10) Usûlu'l-Fiqih (Bingehên Hiqûqa Îslamê) 11) Tefsîr (Şîroveya Quranê) 12) Hedîs (Gotinên Pêxember). Ji bilî van ilmên rêzê, ilmê "Siyer"ê (Jîneweriya Pêxember), tarîx û hinek ilmên din jî dihatin xwendin.

Heya sala 1591'ê zayînî kitêbên ku di medreseyên welat de dihatin xwendin û seyda û melayê kurdan darsa wan bi zimanê kurdî didan, erebî bûn. Ji berhemên kurdî yê nivîskî hew tenê destnivîsarê dîwanên helbestan di dest wan de hebûn. Lê ji sala 1591'ê û pê ve kitêbên kurdî yê din jî hatine nivîsandin û di medreseyan de wekî kitêbên dersê cih girtine. Bi saya van berhemên û nivîskarên wan zimanê kurdî ji qonaxa perwerdehiya devkî derketiye, derbasî qonaxa perwerdehiya nivîskî bûye. Li gorî

ilmên medereseyê kitêbên ku bi zimanê kurdî hatine nivîsandin û bi dersîti hatine xwendin bêhtir ev in:

1) Helbest û Edebiyat: *Dîwana Melayê Cizîrî* û hinek dîwan û helbestên din

2) Rêziman: Rêzimana Elî Teremaxî û pirtûkên Mele Yûnisê Erqetînî yên bi navê "*Zurûf*" (Hoker), "*Terkîb*" (Tehlîla hevokan) û "*Tesrîfa Kurmancî*".

3) Ferheng: "*Nûbara Biçûkan*" ya Ehmedê Xanî, *Ferhenga Nodeyî* û *Gulzara Ismaîlê Bayezîdî*

4) Sîyer *Mewlûda* Melayê Bateyî, *Mewlûda Şêx Husên Qazî*, *Rewdetu'n-Neîma Şêx Ebdurehmanê Axtepî*.

5) Eqîde=Kelam: *Eqîda Îmanê* ya Ehmedê Xanî, *Nehcul Enama* Mele Xelîlê Sêrtî

6) Fiqih: *Irşadu'l-Îbada* Xelîfe Yûsîfê Bayezîdî

## 2. 1. Di warê helbest û edebiyatê de

Mirov dikare bibêje ku piştî îslamê, dîroka medreseya kurdî û helbest û edebiyata kurdî girêdayî hev bûne. Lewra li gorî agahiyên ku di *Ansiklopediya Îslamê* de derbas dibin, Baba Tahirê Uryan (938-1010?) li Hemedanê seydayê medreseyê bûye. Di zivistanê sar de xwe tazî kiriye û ketiye nav hewza avê û heya sibehê di nav avê de maye. Loma leqeba *Uryan* (Tazî) lê hatiye kirin. Li gorî menqîbeyaya ku Jukovsky neqil dike, Baba Tahirê Uryan di wê şevê de gihastiye dereceya weitiyê û gava bûye sibeh, bi erebî wiha gotiye:<sup>(10)</sup>

أمسيت كريدوا وأصبحت عربيا = Emseytu kurdiyên ve esbehtu 'erebiyên

(*Ez êvarê kurd bûm, serê sibehê bûm ereb*).

### 2. 1. 1. Nirxandînek li ser cihê dîwanên helbestan di nav kitêbên medreseyê de

Di medreseyên kurdan de zimanê kurdî beriya temamî ilman di warê helbestê de bûye zimanê nivîskî û perwerdehiyê. Axaftin li kîjan parçeyê welêt bi kîjan zaravayê kurdî hatiye kirin, helbestvanên wî parçeyê bêhtir bi wî zaravayî helbestên xwe gotine û nivîsandine. Feqî û seydayan, helbestên wan ji ber kirine, bi şeklê dîwanan civandine, tiştên ku jê fêm nekirine ji hev pirsîne û şîrove kirine. Gelek caran ev şîroveyan han wekî "derkenar" di kenarê wan dîwanan de nivîsandine, çûne ku derê destnivîsarên dîwanan bi xwe re birine, li cem xwe mihafeze kirine û bi vî awayî ji windabûnê xelas kirine.

Bûyerên ku nîşan didin, di medreseyên welat de Dîwana Melayê Cizîrî bi dersîti hatiye xwendin gelek in. Lêkolîner Mahmût Aksu di kitêba xwe ya bi tirkî ya bi navê "*Jiyana Bedûzaman Seîd Nûrsî ya Wanê û Zanîngeha ku di Xeyala Wî de Bû*" de bi kurtasî wiha dibêje: "Seîdê Nûrsî her tim Dîwana Melayê Cizîrî bi xwe re digerrand û dersa feqiyên xwe dida. Rojekê di dersê de ev malik derbas bû:

*Tu ji Melê Bohtî bipirs esrêre îşqê ew hel dikit,*

*Vê muemmayê çi zanin sed mela û Musteîd!*

Feqiyên wî, jê vê pirsê dikin: "Ma seyda qey tu jî vê malikê nizanî û nikarî hel bikî?" Seîdê Nûrsî zaravayê Melayê Cizîrî û terza wî teqlîd dike û wiha bersîva feqiyên xwe dide:

*"Vê muemmayê dizanî sed melayê wek Seîd"*.

Seîdê Nûrsî bersîva wan bi vî hawayî dide û dibêje ku "Ez ê sirên vê malikê ji we re sibehê şîrove bikim." Lê bi şev di xewa xwe de Melayê Cizîrî dibîne, Mela jê re dibêje ku "Sirên vê malikê aşkera meke." Seîdê Nûrsî li ser vê xewnê ji feqiyên xwe re vê malikê şîrove nake.<sup>(11)</sup>

Heman nivîskar di heman kitêba xwe de der barê xebardana ku di navbera Huseyn Paşa û Seîdê Nûrsî de derbas bûye jî wiha dibêje: Dîwana Melayê Cizîrî çend sed sal in ku di medreseyan de tê xwendin. Seîdê Nûrsî ev dîwana han her tim bi xwe re digerrand û di berîka xwe de mihafeze dikir. Gava ew bi feqiyên xwe ve çend mehan beriya serhildana Şêx Seîd li Wanê li ser Çiyayê Ereke bûne, Huseyn Paşa çûye cem wî û xwestiye ku ew jî tê bikeve nav wan kesên ku xwestine serî hildin. Seîdê Nûrsî jê re wiha dibêje: "Were di vê meseleyê de em Dîwana Melayê Cizîrî ji xwe re bikin hakem. Em dîwanê vekin û binêrin ka ew ê kîjan rûpel vebe û em karibin ji kîjan malikê çi mesajê derxin." Di pey re dîwanê vedikin û di rûpela vebûyî de, rastî vê malikê tên:

*Hin ji nik dêrê ve tîn, qesda kenîştê hin dikin*

*Ne ji van im ne ji wan im, min derê xemarê bes*

Ango: "Hinek kes ji aliyê dêrê ve tîn, hinek jî bi aliyê sînagogê ve diçin/ Ez ne ji van im ne ji wan, deriyê firotoxê şerabê ji min re bes e.

Piştî şîrovekirina vê malikê Seîdê Nûrsî ji Huseyn Paşa re

dibêje, ku “Ez ne tevî we dibim ne jî li dij we cih digirim.” Huseyn Paşa jî li ser vê bersivê xatirê xwe dixwaze û diçe.<sup>(12)</sup>

Dîwana Melayê Cizîrî ne tenê li medreseyên Bakur bi dersîti hatiye xwendin, belkî di nav seyda û feqî û medreseyên Başûr de jî cihê xwe girtiye. Heta Mesûd Berzanî der barê bavê xwe û Dîwana Melayê Cizîrî de wiha dibêje: “Ji bilî hinek pirtûkên din, tenê Quran û Dîwana Cizîrî di çenteyê Berzaniyê nemir de bûn. Her dem li bin ber û tiraşekê baregayê xwe danabû, ew her du pirtûk digel bûn...Kak Îdrîs jî yekemîn qesîda Cizîrî heya dawiya wê hemû ji ber kiribû.”<sup>(13)</sup>

Bi qasî Dîwana Cizîrî nebe jî, dîwan û helbestên klasîk ên kurdî yên din jî di nav mela û feqiyên medreseyan de navdar bûne û hatine xwendin.

### 2. 1. 2. *Nirxandînek li ser zaravayên helbest û dîwanan*

Me di pêşiyê de got ku, axaftin li kîjan parçeyê welêt bi kîjan zaravayê kurdî hatiye kirin, helbestvanên wî parçeyî bêhtir bi wî zaravayî helbestên xwe gotine û nivîsandine. Li vê derê dibe ku pirsên wiha bîn hiş mirov: Gelo helbesta kurdî berê bi kîjan zaravayê kurdî dest pê kiriye, çima? Kîjan zarava dereng maye, çima?

Li gorî lêkolînan piştî Baba Tahîrê Uryan helbesta kurdî bi zaravayê hewramî dest pê kiriye. Helbestvanê herî kevn ê ku helbestên xwe bi hewramî gotine û nivîsandine Mele Perşan e (1398-9). Demeke kurt di pey re em zaravayê kurmançî dibînin. Yekemîn helbestvanê ku helbestên wî yên bi zaravayê

kurmançî gihastine roja me Elî Herîrî (1425-1490) ye. Soranî gelek piştî van her du zaravayan bûye zaravayê helbest û edebiyatê. Helbestvanê herî kevn ku helbestên xwe bi soranî gotine Mistefa Kurdî (mirin: 1849) ye. Di navbera sala mirina wî û sala mirina Elî Herîrî de, nêzîkî 350 sal derbas bûne. Lê di demeke kurt de bi pêş ve çûye, dewlemend bûye û dewlemendiya wî hîn jî dewam dike. Gelo sedemên ku hewramî beriya kurmançî, kurmançî jî beriya soranî di helbest û edebiyatê de hatiye bikaranîn, çi ne? Çira hewramî zû şewq daye lê zû jî temiriye? Çima soranî dereng şewq daye lê şewqa wê netemiriye û çiqas çûye zêde bûye û hîn jî zêde dibe? Em ê bi kurtasî li bersiva van pirsan bigerin:

Çawa ku Amir Hassanpour jî dibêje, ji ber du sebebên girîng zaravayê hewramî di warê helbest û edebiyatê de zû xwe nîşan daye: 1) Ev zarava zimanê pîroz ê mezhebê Ehlê Heq bûye. 2) Mîrekiya Erdelanê ev zarava ji xwe re wekî “zimanê serayê yê edebî” qebûl kiribû û lê xweyî derdiket. Dîsa ji ber du sebebên girîng jî vî zaravayî hêza xwe winda kiriye, zaravayê soranî derketiye pêş: 1) Jîholêrabûna Mîrekiya Erdelan 2) Piştî sala 1918’an qebûlbûna soranî wekî zimanê fermî.<sup>(14)</sup> Ji vê ev encam derdikeve holê: Gava ku du xwediyên zimên hebin, ziman bi hêz dibe û pêş ve diçe, gava ji van her du xwediyên bêpar be, bê hêz dibe û li paş dimîne. Ji van her du xwediyên yek dîn e, yek jî îqtîdar e. Ehmedê Xanî hîn 300 sal berê bal kişandiye ser van

her du xwediyên. Çawa ku tê zanîn Xanî di hinek cihên Mem û Zînê de hinek hevokên ku bi “ger...” û “eger...”an dest pê dike bi kar tîne, ji bo nimûne wiha dibêje:

*Ger dê hebûya me padîşahêk  
Layik bidiya Xwedê kulahek  
Teyîn bibûya jî bo wî textek*

*Ger dê hebûya me jî xwedanek  
Alî kerem û letîfedanek*

Di dewama van hevokan de wekî bersiv wiha dibêje:

*Tekmîlî dikir me dîn û dewlet  
Teshûlî dikir me ilm û hûkmet*

*Ilm û huner û kemal û izan  
Şi’r û xezel û kitab û dîwan*

*Ev cinsê biba li ba wî memûl  
Ev neqdê biba li nik wî meqbûl*

### 2. 1. 3. *Nirxandînek li ser cihê helbestvanên klasîk di warê zimên de*

#### 2. 1. 3. 1. *Ji aliyê xwerûkirina zimên ve*

Çawa ku Amir Hassanpour jî ji Raûf Ehmed Alanî neqil dike, dîroka xwerûkirina zimanê kurdî digihîje heya Elî Teremaxî. Ji bo nimûne Teremaxî di kitêba xwe ya rêziman de, di cihê bêjeya “ism” de ku erebî ye, bêjeya “nav” bi kar aniye. Her wiha di cihê terma “nida” de ku ew jî erebî ye, terma “gazîkirin” bi kar aniye.<sup>(15)</sup>

Di dîroka ziman û wêjeya kurdî de bûyera Xaris Bedlîsî û Selîm Silêman di vî warî de bûyereke balkêş e. Xaris Bedlîsî di sala 1758’an de hatiye dinê.

172 sal beriya wî, Şa'irekî kurd bi navê Selîm Silêman dastana *Yûsif û Zelîxa* bi kurdî nivîsandibû lê tê de gelek bêje û termên erebî û farisî hebûn. Xaris Bedlîsî di dema xwe de ev dastan ji nû ve girtiye dest, bêje û termên erebî û farisî jê avêtine, di cihê wan de bêje û termên kurdî yên xwerû bi kar anîne, bi vî awayî di warê xwerûkirina zimanê kurdî de karekî dîrokî kiriye. Em dixwazin çend nimûneyan ji we re pêşkêş bikin:<sup>(16)</sup>

Selîm Silêman: *Yûsif bi cemal...*  
Xaris Bedlîsî: *Yûsif bi rindî...*

Selîm Silêman: *Qerîr bike* li me  
Xaris Bedlîsî: *Bibêje* ji me ra...

Selîm Silêman: *Wextê ji pider* bihist...  
Xaris Bedlîsî: *Wextê ji bav* bihist...

Selîm Silêman: *Kûh* û deştan  
Xaris Bedlîsî: *Çiya* û deştan.

### 2. 1. 3. 2. Ji aliyê kurdîkirinê ve

Mabest ji kurdîkirinê ev e ku di hinek bêje û termên biyanî de hinek guhartin bîn çêkirin û wekî bêje û termên kurdî bîn xebitandin. Ereba di çarçoveya zimanê xwe de ji vî karî re dibêjin "terîb" ango erebîkirin. Di zimanê erebî de, bi sedan bêje û term hene ku ew bêje û term bi eslê xwe bi farisî, romî, hebeşî yan jî yewnanî ne. Ereban qismek hindik ji van bêje û terman bêyî guhartin xistine nav zimanê xwe, lê qismek mezin ji wan pir-hindik guhartine paşê xistine nav zimanê xwe. Di vî warî de meqaleyêke me ji heye

ku ev meqale di kovara Akademik Araştırmalar (Lêkolînên Akademik) de hatiye weşandin. Çend nimûneyên ku di farisî û kurdî de hevpar in û ji aliyê ereban ve hatine erebîkirin û me jî ew di meqaleya xwe de qeyd kirine ev in: *Îwan, butsan, tennûr, simsar, kûb* (kûp), *sirqîn* (sergîn), *kûz, nermeq* (nermik).

Çawa ku di erebî de erebîkirin heye, di kurdî de jî kurdîkirin heye û helbestvanên me yên klasîk di vî warî de jî pisporiya xwe nîşan daye û ji aliyê wan ve gelek bêje û termên erebî û farisî hatine kurdîkirin. Em dixwazin çend nimûneyên ku di Dîwana Melayê Cizîrî de derbas dibin û ji aliyê lêkolîner û zimanzanên kurd ve, di çarçoveya kurdîkirinê de hatine qebûlîkirin ji we re pêşkêş bikin:

<b>Bêje</b>	<b>Wate</b>
<b>Keşşîfî</b>	<i>Diyar bû derket holê</i>
<b>Şewwîşî</b>	<i>Xera bû, tevlihev bû</i>
<b>Nezzîfî</b>	<i>Peya bû, hat xwarê</i>

Di warê kurdîkirin û bêjesaziyê de ramana zimanzanê kurd Reşîd Findî ev e, ku li gor me jî ev raman di navbera ramanên radîkal û neradîkal de reyek navîn e:

1) Heke hinek "zarav (terîm)" yên mîna sînema, televizyon, radyo, kompîtur û dijîtal wekî xwe bimînin dê çêtir be ji wan teqlîdên ku kes guh nade wan. Ji bo nimûne ereban di şûna televîzyonê de terma "*mişwaf*"; di şûna radyoyê de terma "*mizya*"; di şûna kompîturê de jî terma "*hasûb*" xebitandin. Lê ev xebitandin neçû serî û bi avê de

çû. Nexwe bila ev bêjeyên han wekî xwe bimînin. Bêguman hinek nivîskarên kurd jî derketin û li ser vê rêçika ereban dest bi kurdîkirina hinek terman kirin. wekî nimûne wan navê *seyyareyê* kir "gerîn" lê ev neçû serî û zû winda bû. Lê bêguman kurdan bi zîrekane hinek peyvên nû jî dîtine. Bo nimûne ji *teyareyê* re *balafir*; ji *qîtar* ango trenê re jî *şemendefer* hatiye gotin.<sup>(17)</sup>

2) Hinek peyv jî hene ku di eslê xwe de biyanî ne, lê kurdan livînek daye wan û li gorî fonetîka xwe ew nerm kirine. Bo nimûne ji otomobîlê re wan gotiye *trimpêl*.<sup>(18)</sup>

### 2. 1. 3. 3. Ji aliyê termînolojiyê û ferhengnivîsiyê ve

Ji ilmê termînolojiyê re bi "Erebî *"İlmu'l-Musteleh"*, bi kurdî "*zaravesazî*" (ango ilmê çêkirina terman) tê gotin. Reşîd Findî di cihê "term" de "zarav" bi kar tîne û bi kurtasî wiha dibêje: "zarav" ramaneke dûrtir ji ramana bêjeya asayî dide xuyakirin. Hebûna "zarav" an di zimanekî de nîşana hêz û kevnatî û reseniya wî zimanî ye. Zaravesaz, pêdivî ye ku helbest û edebiyata kurdî ya klasîk baş bixwîne û bizane. Lewra ev klasîkên han di vî warî de gelek dewlemend in. Nexwe divê em van klasîkên xwe yên ku bi diyalektên kurdî yên cur bi cur hatine nivîsandin ji vî alî ve bigirin dest û ji wan sûd wergerin.<sup>(19)</sup>

Di konseptê van tespîtan de em dixwazin hinek term û bêjeyên ku di berhemên kurdî yên klasîk de derbas dibin û di warê zaravezanî û ferhengnivîsiyê de girîng in pêşkêş bikin:

### Ji Helbestên Melayê Cizîrî

Term/Bêje	Wate
<i>Sazend</i>	Yê ku li sazê dixê
<i>Afirandin</i>	Çêkirin, xulqandin
<i>Gileh</i>	Gilî, gazin
<i>Zox</i>	Ava birînê
<i>Kerixandin</i>	Westandin
<i>Canwer</i>	Bican, candar
<i>Fereng</i>	Ewropî
<i>Surmedar</i>	Çavkildayî
<i>Îdek</i>	Pelikê kofiyên serê jinan
<i>'Ala</i>	Kofi
<i>Tox</i>	Por
<i>Çîr</i>	Hukumdar
<i>Darîn</i>	Her tiştê ku ji dar çêdibe
<i>Peyal</i>	Qedeha şeravê

### Ji helbestên helbestvanên din

Term/Bêje	Wate	Helbestvan	Cavkanî
<i>Kungir</i>	Keftar	Şemsedînê Xelafî	X <sup>(20)</sup>
<i>Gêresitûn</i>	Keskesor	Mele Mensûrê Girgaşî	X <sup>(21)</sup>
<i>Ruhen</i>	Ronî	Bekir Begê Erzî	X <sup>(22)</sup>
<i>Kalûm(e)</i>	Şûr	Bekir Begê Ezdî	X <sup>(23)</sup>

Klasîkên me ji aliyê bêje û termên olî ve jî gelek dewlemend in. Ji dînê Zerdeşt heya dînê Îslamê her dîn û mezhebê ku kurdan qebûl kirine, sistemeke olî hebûye. Di vê sistema olî de gelek bêje û term derketine holê. Hem Melayê Cizîrî hem jî helbestvanên me yên din, di helbest û dîwanên xwe de gelek ji van bêje û terman bi kar anîne û şirovekerên van helbest û dîwanan ji aliyê dîroka olî ve ew bêje û term şirove kirine. Heke rojekê di warê standardkirina zimên de xebat li ser ferhengan bê kirin, pêşniyara me ji niha ve ev e ku divê ferhengeke taybet der barê bêje û termên olî yên kurdî de bê amadekirin. Ji bo nimûne mirov dikare navê ferhengeke wisa wekî “Ferhenga

Bêje û Termên Olî” deyne. Niha jî em dixwazin çend mîna-kan ji van bêje û terman bidim:

**Furûs:** Navê ferîşteyê wehiyê yê di navbera Ahûra Mazda û Zerdeşt de ye. Çawa ku di Îslamê de ji ferîşteyê wehiyê re tê gotin “Cebraîl”, di Zerdeştîyê de jê re dihat gotin “Furûş”.<sup>(24)</sup>

**Sond:** Keresteyê/melzemeyê kibritê ye. Di Avestayê de wekî “Sogên” derbas dibe. Ev keresteyê kibritê ji bo guneh û gunehkaran dihat ceribandin ku ew jî wiha çêdibû: Gava ji yekî/ê gumanê gunehê bihata kirin jê re wiha dihat gotin: “Vê sondê (ango kibritê) bixwe, heke te ew guneh nekiribe dê tiştê bi te neyê, lê ku te ew guneh kiribe dê hundirê te bişewite.” Kesê

ku ew guneh nekiribû bêtiş kibritê dixwar. Lê kesê ku bi rastî ew guneh kiribû ditirsiya û gunehê xwe qebûl dikir. Ji bo ku ew sond ango kibritê dihat xwarin, ji wê çaxê heya niha “sondxwarin”, tê gotin, lê belê “sondgotin” nayê gotin. Lewra ev ne tiştê gotinê bû, tiştê xwarinê bû.<sup>(25)</sup> Loma di helbestên kurdî yên klasîk de jî wekî “sondxwarin” derbas dibe. Mînak:

#### Ehmedê Xanî:

*Sondê dixwim ez bi Eb û Walid*

#### Feqîyê Teyran:

*Sond dixwim bi şahid û dostan*

#### Melayê Cizîrî:

*Sond bi wan zilfan û xalan...*

**Sema:** Navê giyayekî pîroz e. Eslê wî navî di sanskrîtî de “Soma” ye û wekî “Homa” derbasî Avestayê bûye. Zerdeştîyan agir berdida wî giyayî û li dorê govend digirt. Ev govenda ku îro mewlewî li dora xwe dizivirin û dikin û jê re “Sema” tê gotin jî cureyek ji vê govenda dîrokî û olî ye.<sup>(26)</sup>

Belê ji ber ku van helbestvanên me ev cure bêje û term bi kar anîne, şirovekerên helbestên wan ketine pey wateya wan bêje û termên olî û ji me re ev tişt zelal kirine.<sup>(27)</sup>

#### 2. 1. 3. 4 Ji aliyê çêbûna ekoleke edebî ya muştêrek ve

Çawa ku tê zanîn beriya îslamê gelek zaravayên erebî hebûn. Lê zaravayê helbestî û wêjeyî zaravayê Qureyşî bû. Lewra navenda wî zaravayî ku bajarê Mekkeyê ye, navendeke olî, civakî, aborî û çandî bû. Ji aliyekî din ve Qurana pîroz jî di pey re bi wî zaravayî hat şandin.

Lê beriya Quranê jî gelek helbestvanên ereb ên ku zaravayên wan ên cur bi cur hebûne, helbestên xwe bi zaravayê muşterek ê qureyşî gotine. Bo nimûne Imruulkays ji Yemenê bûye lê helbestên xwe bi zaravayê qureyşî gotine. Ango li dor zaravayê qureyşî ekoleke wêjeyî û helbestî hatibû çêkirin. Tevgerike wiha di nav gelek helbestvanên kurd de jî li dor devoka *botî* tê ditin. Lewra Cizîra Botan di wexta xwe de ji aliyê çand, huner, aborî û civakî ve navenda welêt bû. Reşîd Findî di vî warî de, di kitêba xwe ya bi erebî ya bi navê “*Min Yena-bî’î’s-Şê’ri’l-Kilasîkî el-kurdî*” (Ji Çavkaniyên Şiêrên Kurdî yê Klasîk) de mînakeke balkêş dide ku ew jî ev e: Xalidê Zîbarî (1756-1805) gava xwestiye ku dastana xwe ya bi navê “*Sîseban*” binivîse ji Zîbarê –ku nehiya bajarê Mûsilê ye- hatiye Cizîra Botan û bi zimanê Botî ev dastana xwe nivîsandîye.<sup>(28)</sup>

Em dixwazin çend mînakên jî ji nivîskarên Bakur bidin. Mehmed Uzun di vî warî de wiha dibêje:<sup>(29)</sup> “Divê em li vê derê bi taybetî li ser mîrekiya Cizîra Botan rawestin. Ji ber ku klasîkên herî mezin ên kurdan mîna Elî Herîrî, Mela Ehmedê Bateyî, Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran û Ehmedê Xanî bi navê “*Ekola Kurmanciya Bakur*” eserên xwe anîne pê. Nemaze kurdologên ewrûpî û kurdên Iraqê van klasîkan mîna *Ekola Kurmanciya Jorîn* bi nav dikin.” Ebdurrehman Durre jî di vê fikrê de ye. Li gor wî jî Cizîra Botan di qirna Ehmedê Xanî (1650-1706) de jî di qirna be-

riya wî de jî navenda ekola edebî û helbestvaniya nû bû. Bingeha vê ekola hunermendî jî aliyê Elî Herîrî (1425-1490 z.), Feqiyê Teyran (1590-1660 z.) û Melayê Cizîrî (1570-1640 z.) ve hatibû danîn. Armanç û daxwaza vê ekolê ev bû ku Cizîra Botan bibe navenda yekîtiya zimanê edebî û helbestî, kurmanciya Botan bibe zimanê wêjeyî û helbestî ji bo temamî kurdan.<sup>(30)</sup>

## 2. 2. Di warê rêziman de

### 2. 2. 1. Rêzimana Elî Teremaxî

Yekemîn rêzimanivîsê kurd Eliyê Teremaxî ye. Teremax navê gundê wî ye. Ev gund di navbera bajarê Hekarî û navçeya Muksê de ye. Li gundê xwe medreseyek çêkiriye û tê de darsa feqîyan daye. Di sala 1591’ a zayînî de ji bo ku feqî bi hêsanî hînî rêzimanê erebî bibin, kitêbek bi kurdî nivîsandîye û tê de rêzimanên erebî, kurdî û farisî bi hev re miqayese kirine. Di vê kitêbê de ji aliyê rêzimana kurdî ve hinek agahî û mînakên balkêş hene ku em wan di kitêbên îroyîn de, yê ku der barê rêzimana kurdî de hatine nivîsandin, nabînin. Ji bo nimûne der barê parenga lebatî û tebatî de wiha dibêje:

“*Fesl di behsa ismê fa’ilê* da: İsmê fa’il navê fa’ilê fê’lê ye. Lazim e lefza “ê-” di berî wî kelamî bête zikirkirin. Weku niha: *Ê kuştî.*”

“*Ev beş der barê parenga lebatî* de ye: Parenga lebatî navê kirdeya lêkerê ye.. Lazim e peyva “ê” beriya wê bê gotin. Mînak: *Ê kuştî.*”

“Fesl di behsa **ismê mef’ûlê** da: İsmê mef’ûl nav e, ji bo wî tiştê ku ew fê’l li ser wî waki’ bûye...Di axirê dalifza “y” dibe. Weku niha: *Kuştî*

Emma cem’êd wan jî “ya” û “elîf” û “n”un” dibe. Weku niha: *Kuştîyan*”

“*Ev beş der barê parenga tebatî* de ye: Parenga tebatî nav e ji bo wî tiştê ku lêker li ser wî tiştî hatiye holê. Di dawiya wê de qertafa “-î” tê biqaranîn. Mînak: *Kuştî*

Welê pirjimarên wan bi (qertafa) “-yan” çêdibin. Mînak: *Kuştîyan.*”

**Têbînî:** Ji tespîta Teremaxî tê fêmkirin ku bo nimûne gava Hogir yekê/î bikuje divê ji Hogir re bê gotin “ê kuştî”, ji yê Hogir ew kuştîye re jî bê gotin “kuştî”. Ango divê bi peyva “ê” ev her du kes ji hev bîn ferqîrin. Lê em vê ferqa balkêş di kitêbên rêzimanî yê îroyîn de nabînin.

### 2. 2. 2. Pirtûkên Mele Yûnisê Erqetînî: *Zurûf, Terkîb û Tesrîfa Kurmancî*

Mele Yûnis di sedsala 18’an de li gundê Erqetînê hatiye dinê. Wî jî wekî Eliyê Teremaxî jî bo hêsanîkirina dersên feqîyan xwestiye ku rêzimana erebî bi kurmancî binivîse. Bi vê armançê sê kitêb nivîsandine: *Yek Terkîb* (tehlîla hevokan), *Yek Zurûf* (Hoker), yek jî *Tesrîfa Kurmancî* ye. Çawa ku Feqî Huseynê rehmetî jî dibêje, Eliyê Teremaxî çarsed sal, Mele Yûnisê Erqetînî jî dused sal berê ev kitêb nivîsîne. Feqiyên kurmancan hîn jî van kitêban bi dersîfî dixwînin û ji wan sûd werdigirin.<sup>(31)</sup>

**Zurûf:** “Zurûf” pirjimara “zerf”ê ye ku di pirtûkên li ser

rêzimanê yên îroyîn de bi piranî wekî “hoker” derbas dibe. Çawa ku ji navê wê jî tê fêmkirin, di vê pirtûkê de li ser hokerên erebî bi zimanê kurdî nixrandin hatine kirin. Jixwe pirê hokeran di gelek zimanan de wekî hev in. Kitêb bi vê serbendê dest pê dike:

“Tû bizan hingî eşyayê di dinyayê de hene zerf yan xeyrê zerf in.”

“Tu bizane çiqas tiştên ku di dinê de hene yan hoker in yan jî ne hoker in...”

**Terfîb:** Ev kitêb şîroveya kitêba Ebdulqahir Curcanî ya bi navê “*el-Ewami*” e. Ji ber ku kitêba Ebdulqahir bi hevoka “Bismillahi” dest pê dike, Mele Yûnis jî bi tehlîkirina bêjeyên vê hevokê dest bi kitêba xwe dike û wiha dibêje:

“Tû bizan du mezheb carî bûne di terkîba *Bismillahi* de: Mezhebê Besriyan, Mezhebê Kûfiyan. Li gor mezhebê Besriyan cumleyê fe’lî ye; li gor mezhebê Kûfiyan cumleyê ismî ye...”

“Tu bizan di tehlîla *Bismillahi* de du rêbaz hene: Rêbaza zimanzanên Besrayê, Rêbaza zimanzanên Kûfeyê. Li gorî rêbaza Besriyan *Bismillahi* hevoka lêkerî ye; li gorî rêbaza Kûfiyan hevoka navdêrî ye...”

## 2. 3. Di warê ferhengnivîsiyê de

### 2. 3. 1. Nûbara Biçûkan ya Ehmedê Xanî

Xanî ev ferhenga xwe di sala 1683’yan de ango 11 sal beriya temamkirina Mem û Zînê nivîsandiyê.<sup>(32)</sup> Ferheng ji destpêkekê, 13 beşan û 954 bêjeyan pêk tê. Xanî di malikeke destpêkê de bi zelalî diyar dike ku wî ev fer-

heng han jî bo zarokên kurdan amade kiriye. Malik ev e:

*Ne ji bo sahib rewacan*

*Belkî ji bo biçûkêd kurmancan*

Ji malika di pey de jî tê fêmkirin ku wî xwestiyê piştî xelaskirina Quranê ev ferheng bi dersîti bê xwendin. Xanî di vê malikê de jî wiha dibêje:

*Wekî ji Qur’anê xilas bin*

*Lazim e li sewadê çavnas bin*

Di konseptê standardkirina zimên de di warê termînolojiyê û ferhengnivîsiyê de gelek bêje û termên balkêş di Nûbarê de hene. Hinek ji wan ev in:

Term/Bêje	Wate
<i>Vêk êxistin</i>	Bihevixistin
<i>Çavnas</i>	Zana, agahdar
<i>Qasid</i>	Resûl, elçî, şandî
<i>Mihder</i>	Şefa’et. Pêşniyara Findî ev e ku di nav hemû kurdan de ev zarav bê bikaranîn Di nusxeya destê me de ev zarav wekî “mehder” derbas dibe.
<i>Rewal</i>	Ji ciwanê ku hîn nû simbêlên wî der dîkên re tê gotin. Di nusxeya destê me de wekî “rûwal” derbas dibe. Bi erebî “emred” e.
<i>Bêgav</i>	Bi wateya “mecbûr” e. Bo nimûne: Ez bêgav mam (Ez mecbûr mam).
<i>Hijandin</i>	Îro wek “hêjandin” jî tê bikaranîn.
<i>Kelaştin</i>	Li gelek herêman mîna “qelaştin” jî tê bikaranîn.
<i>Firûzî</i>	Bi mehna “fîkandin” e.

Em dixwazin term û bêjeyên jêrîn digel erebî û tirkîya wan bidin:

Kurdî	Erebî	Tirkî
*Gerew	Rehn	Rehin
*Kuwe?	Keyfe?	Nasıl?
Ejn	Rukbe	Diz(kapağı)
*Birs	Cû’	Açlık
Xasma	Lasiyyema	Özellikle
Dirav	Dirhem	Para
*Ricozar	Sail	Dilenci
Kûr	Hufre	Çukur
Robî	Muhce	Kalp kanı
*Ê çuyî	Zahib	Giden/geçen
*Nivîsayî	Mektûb	Yazılmış/mektup
*Kêşa	Mewzûn	Tartılan
*Evîn	Îşq, mehebbet	Aşk, sevgi
*Nevîn	Buğd, adawet	Kin, nefret, düşmanlık
*Vîn	Îrade	İrade/istek
*Şîn	Qudret	Güç, kudret
Perestîn	İbadet	İbadet
Honijîn	Ni(u)as, sine	Uyuklama
Vêkra	Me’a	Birlikte, beraber
Evreng/wereng	Hakeza	Böyle, böylece, bu şekilde

### 2. 3. 2. Ferhenga Nodeyî

Li gorî Amir Hassanpour Şêx Marifê Nodeyî (1790) bi qasî sed sal piştî Ehmedê Xanî ev ferheng bi Soranî-Erebî nivîsiye, ferhenga wî jî wekî ya Ehmedê Xanî di nav kitêbên dersê yên medreseyê de cihê xwe girtiye. Bi taybetî li herêmen ku bi soranî tê axaftin hîn jî ev ferheng tê xwendin. Wekî ferhenga Xanî ev ferheng jî bi armanca standardkirina zimanê kurdî hatiye amadekirin.<sup>(33)</sup>



### 2. 3. 3. *Gulzara Îsmailê Bayezîdî*

Ferhengeke Kurdî-Farisî-Erebî ye. Çawa ku Kemal Burkay di pirtûka xwe ya "Kürtler ve Kürdistan" (Kurd û Kurdistan) de dibêje, vê ferhengê jî wek kitêbek dersê di medrese-yên Kurdistanê de cih girtiye.<sup>(34)</sup> Der barê bêje û zaravên ku Bazîdî bi kar anîne de, Reşîd Findî bi kurtasî wiha dibêje: Bi rengê ferhengê nivîsînek Bayezîdî heye. Nivîskar di vê nivîsînê de devokên Hekarî û Bayezîdî ji xwe re kirine nimûne. Prof. Marûf Xeznedar di pirtûka xwe ya bi navê "*Le Babetî Mêjûy Edebî Kurdî Kurdîyewe*" de ev "zarav" belav kirine. Findî navê ferhengê nade lê wisa tê fêmkirin ku mebest jê Gulzar e. Em dixwazin çend mînakên ji wan bidin.<sup>(35)</sup>

Term/Bêje	Wate
* <i>Axiftin</i>	Xeberdana mirovek tenê
* <i>Axaftin</i>	Xeberdana mirovek bi mirovek din re
* <i>Êwerge</i>	Cih
* <i>Êwerîn</i>	Niştecih, yê ku di cihek de rûdine
<i>Birek</i>	Li gor Findî ev aletê birandinê jî termek nû ye.
<i>Pizdan</i>	Çiçikê insanan
<i>Guhan</i>	Çiçikê heywanan
<i>Bijwîn</i>	Paqij.
<i>Bêdadî</i>	Zilm, tehdâ, bêdaletî
<i>Bêwecî</i>	Bêfeyde
<i>Pişk</i>	Qur'e, çitik
<i>Cirrenix</i>	Micadele, xirecir
<i>Çekme</i>	Cizme
<i>Xanîmal</i>	Metbex. Findî pêşniyar dike ku kurd vî navê nû wekî standard bi kar binin.
<i>Daberistin</i>	Xebergotin
<i>Dirav</i>	Pere

<i>Mezaxtin</i>	Xerckirin
<i>Suba</i>	Bitenê
<i>Solbend</i>	Kesê ku sol û nalan çê dike
<i>Qilopanik</i>	Teqle
<i>Qîvar</i>	Dirîk, istirî
<i>Lêb</i>	Hîle
<i>Lêbandin</i>	Xapandin
<i>Lêbok</i>	Tiraneger, teqlîdker

### 2. 4. Di warê eqîdeyê de

#### 2. 4. 1. *Eqîda Îmanê ya Ehmedê Xanî*

Eqîda Îmanê, doktrîna îslamê ya baweriyê ye. Xanî ev pirtûka xwe di sala 1687'an de, ango çar sal piştî Nûbara Biçûkan nivîsandîye. Xanî di van çar salên di navbera her du pirtûkan de, ji bo danqebûlkirina Nûbarê wekî kitêbek dersê li gelek medreseyan geriyaye, gelek mela û seyda ziyaret kirine. Çawa ku Hassanpour jî dibêje, girîngiya vê pirtûkê di yekemîn car bikaranîna kitêbeke kurdî di warê ilmek dînî de xwe nîşan dide. Ev kitêb jî bo kitêbên ku di vî warî de paşê hatine nivîsandin, bûye nimûne.<sup>(36)</sup> Nusxeya vê kitêbê ya ku li ber destê me ye, ji 68 malikan pêk tê û ji aliyê Ehmed Hilmî Koxî ve bi kurdî lê bi tîpên erebî hatiye şîrovekirin û li Diyarbekirê hatiye çapkirin. Tarîxa çapê ne diyar e. Tiştê herî balkêş ku em di vê kitêbê de dibînin ev e ku, Xanî ji 7 sifetên Xwedê 6 heb kurdî kirine. Ango 6 heb ji 7 sifetên Xwedê yên ku di gelek zimanan de wekî orijînal erebîya wan tê nivîsandin, ji aliyê Xanî ve hatine kurdîkirin ku ev jî cesareteke mezin e. Ev sifet û kurdîkirina wan ev in:

Sifet	Kurdiya wan
<i>Heyat</i>	Xweşî
<i>Qudret</i>	Şîn
<i>Ilm</i>	Zanîn
<i>Îrade</i>	Vîn
<i>Kelam</i>	Kelam
<i>Sem'</i>	Bihîstin
<i>Beser</i>	Dîtin

Xanî ev sifet di vê malika xwe de civandine.<sup>(37)</sup>

*Xweşî Şîn û Zanîn û Vîn û Kelam Bihîstin digel Dîtinê bûn temam*

#### 2. 4. 2. *Nehcu'l Enama Mela Xelîlê Sêrtî*

Mela Xelîl di sala 1754'an de li Hîzana Bedlîsê li gundê Gulpikê hatiye dinê. Navê bavê wî Mela Hesen e. Li cem bavê xwe dest bi xwendinê kiriye û di pey re li medreseyan cur bi cur xwendina xwe dewam kiriye. Tehsîla xwe di Medresaya Îmadiyê de li cem Miftî Mela Mehmûdê Behdînî temam kiriye û îcazet standîye. Piştî temamkirina xwendina xwe çûye Sêrtê. Li wê derê heyata xwe bi dersdana feqîyan û nivîsandina kitêban derbas kiriye. Li ser medreseyan bandoreke mezin hiştiye. Ji bilî ilmên olî yên mîna Hedîs, Tefsîr û Fiqih, di ilmên ziman, hendese û kîmyayê de jî zana bûye. Di sala 1843'yan jî 1841'an de çûye ber rehma Xwedê.<sup>(38)</sup>

Mela Xelîl 25 kitêb nivîsandine ku yek ji wan *Nehcu'l Enam* e. Ev kitêb der barê eqîdeya îslamê de ye û bi zaravayê kurmancî hatiye nivîsandin. Tê de ji bilî meseleyên eqîdeyê hinek agahiyên cur bi cur jî hene. Em çend nimûneyan ji bêje û termên vê kitêbe jî bidin:

Bêje/Term	Wate	Mînaka Mela Xelî
<i>Guhdêran</i>	Guhdayîn	Tu guhdêre nitq û beyana fesîh
<i>Ji bil..</i>	Ji xeyrê...	Tu me'bûdê bilheq tune ji bil Xwedê
<i>Şola nelê</i>	fê'la nebaş	Riza wî tunîne bi şola nebaş
<i>Pêşîwar</i>	Layîq	Ji bo ins û cin û melek pêşîwar
<i>Vî bal xwe</i>	Bi bal xwe	Vî bal xwe giha
<i>Şehîn</i>	Mêzîn, terazî	Wedi' ket şehîne li dûvê pirê
<i>Birsîn</i>	Birçibûn	Li birsîn cehdê bike mah û sal
<i>Ji ew paş</i>	Piştî ku...	Ji ew paş ku zanî te ev vacibat
<i>Wiha reng e</i>	Wisana e, wiha ye	Wiha reng e ilmê ilaca dilê
<i>Li nik...</i>	Bi aliyê...	Li nik zalimê ve qe meşiyê meke

## 2. 5. Di warê siyerê (Jîne- weriya Pêxember) de

### 2. 5. 1 Mewlûda Melayê Bateyî (1414-1491)

Li gorî ku Qanatê Kurdo ji Aleksander Jaba neqil dike, Melayê Bateyî di sala 820'ê koçî / 1414'ê zayînî de li gundê Bateyê ku gundekî Hekariyê ye, hatiye dinê û di sala 900'ê koçî / 1491'ê zayînî de çûye ber rehma Xwedê. Navê wî Ehmed e.<sup>(39)</sup> Ji qebîleye Ertûşiyana e. Navê wî di hinek berhem û lêkolînan de wekî Hesên, Hisên û Huseyn jî derbas dibe.<sup>(40)</sup>

*Mewlûda* Melayê Bateyî yekemîn mewlûd e ku bi zimanê kurdî gihaştîye roja me.<sup>(41)</sup> Bateyî mewlûda xwe bi zaravayê kurmancî, bi terza mesnewiyê nivîsiye. Mewlûd ji 20 beşan û li gor nuxeyên jihevçuda ji malikan pêk tê. Mewlûd bi vê malikê dest pê dike û bi malika di pey re diqede:

*Hemdê bêhed bo Xwedayê alemîn  
Ew Xwedayê daye me dîne mubîn*

*Bo cemî'ê muslimîn û salih e  
Bo feqîrê Bateyê el-Fatih e*

Çawa ku Zeynelabidîn Kaya dibêje, "Mewlûd ji zarokan re bi dersîfî tê xwendin û çî zarokê ku wê dixwîne hemû ji ber dike."<sup>(42)</sup> H. Mem di xebata xwe ya hêja ya bi navê "*Üçüncü Öğretmen Hanî*" (Mamosteyê Sêyemîn Xanî) de dibêje ku helwesta Xanî helwesteke neteweyî bûye, lê helwesta Melayê Bateyî helwesteke dînî bûye.<sup>(43)</sup> Em jî dixwazin ji H. Mem re wiha bibêjin: Helwesta wî çî dibe bila bibe, digel ku hem di farisî de hem jî di erebî de pispor bûye Mewlûd bi kurdî nivîsiye û ev berhem bûye kitêbeke dersê, ev ji me re bes e.

### 2. 5. 2. Mewlûda Şêx Husên Qazî

Şêx Husên Qazî alimekî soran e. Di navbera salên 1793-1871'ê de jiyaye. Bi zaravayê soranî mewlûdek nivîsandiye Mewlûda wî bi navê *Mewlûd-name* tê naskirin.<sup>(44)</sup>

### 2. 5. 3 Rewdetu'n-Ne'îma Şêx Ebdurrehmanê Axtepî

Li gorî Zeynelabidîn Kaya Şêx 'Ebdurrehman di sala 1270'yê koçî / 1850'yê zayînî

de li gundê Axtepiyê hatiye dinê û di sala 1326'ê koçî / 1910'ê zayînî de çûye ber rehma Xwedê.<sup>(45)</sup> Ji bilî *Dîwana* wî ya bi kurmancî û *Rewdetu'n-Ne'îma* wî ya bi kurmancî çend berhemên wî yê erebî jî hene. Lê hew tenê *Rewdetu'n-Ne'îm* di medreseyên welat de bûye pirtûka dersê.

Nivîskar ev pirtûka xwe ya hanê di sala 1884'ê zayînî de wekî *Mewlûda Melayê Bateyî* bi terza mesnewî, bi yazdeh kîteyan û bi zaravayê kurmancî nivîsiye. Pirtûk ji 35 beşan û ji 4531 malikan pêk tê. Ev berhem Axtepî cara yekemîn di sala 1966'an de ji aliyê Mele Ehmedê Koxî ve hatiye çapkirin lê dewletê ew qedexe kiriye û nehiştîye ku di nav gel de belav bibe. Di sala 1986'an de Mele Zeynelabidîn Amidî kurê Mele Remezana ev behrem çap kiriye û bi zimanê erebî şîrove kiriye. Çapa ku niha di destê me de ye, çapa wî ye. Di sala 1988'an de Zeynelabidîn Zinar û Emîn Narozî *Rewdetu'n-Ne'îm* ji tîpên erebî wergerandiye tîpên latînî.<sup>(46)</sup>

Naveroka pirtûkê bi giranî *Mîraca Pêxember* e. Lê di gelek beşan de carinan ji mijarê vediqete û fikir û ramanên xwe yê li ser kurdîtiyê û zimanê kurdî diyar dike. Em dixwazin çend mînakên ji fikir û ramanên wî yê di vî warî de pêşkêş bikin:

*Me kêşa eziyet evan çendî roj,  
Ji kurdî kîtabek bi saz û bi soz.*

*Ku tirk û ecem qet nebên carekî  
Nehin kurdê şair di misraekî.*

*Bizanin ku şair ji kurdan hene,  
Ji uşaqê tirk û ecem zêde ne.*

*Ji kurmançiya xwe me anî nîzam  
Muella û şêrîn û efsêh kelim*

*Ji kurmanciyê zêde şîrîn niye  
Welêkin xerîdarê çendîn niye.*

*Eger min bidîta xerîdarî qet,  
Rewan dê me bikra bi teşbihê şet*

*Welê îktîfa kir ji nezmê hemîn,  
Çiku kes nehîn bêje min aferîn*

Ji aliyê zimanê kurdî ve ev kitêb gelek dewlemed e. Nivîskar gelek bêje û termên balkêş bi kar anîne û hejmareke mezin ji bêjeyên hemwate xebitan-dine. Gava du bêjeyên hemwate dixebitîne yan her du jî bi kurdî ne, yan jî yek bi kurdî ye ya din jî bi erebî an jî bi farisî ye. Çend bêje û termên balkêş ev in:

*Dîrek - sutûn  
Bêumîd - yeûs  
Li nik - digel  
Mîrov - merdum  
Dirêj - tewîl  
Xerîb - nenas  
Sew - deng  
Lewn - reng*

Termên jêr ji balkêş in:

**Spas:** Gelek dibêjin ku spas bêjeyek nûpeyda ye. Li Bakur ev çend salên dawîn in ku ev bêje tê bikaranîn û yên ku wê bi kar tînin, hinek mirovên siyasî ne. Lê em dibînin ku Axtepî hîn di dema xwe de ev bêje bi kar anîye û wiha gotiye: *Sed spas!*

**Lê bûrîn:** Gelek ji me gava ‘uzrê xwe dixwazin û daxwaz dikin ku hinek wan bibexşînin dibêjin “bibûre!”. Me digot qey ev jî tiştek nû ye. Lê di pirtûka Axtepî de ev jî derbas dibe ku Axtepî wiha dibêje: “*Bibûre di eyb û qusûrê me temam!*”.

**Îzed:** Ango “Xwedê”. Axtepî wiha dibêje: “*Here qurbê (nêzê) Îzed!*”

**Spartin:** Bi wateya teslîm-kirin tê bikaranîn: “*Me mespêre nefsa me ya hikumdar!*”

## 2. 6. Di warê fiqhê de

### 2. 6. 1. *Irşadu'l-Ibada Xelîfe Yûsifê Bazîdî*

Navê kitêbê ye temamî *Irşadu'l-Îbad Min Awami'l-Mu'mînîn* e. Di medreseyan de wekî *Irşadu'l-Îbada Kurmancî* tê nasîn. Ev kitêb ji aliyê el-Hacc Muhammed Nezaket Bahaeddîn el-Huseynî ve ji kurmancî hatiye wergerandin ji bo tirkî. Werger ji du cildan pêk tê û tê de orijînalê kitêbê ya kurmancî jî cih digire. Di serê cilda yekem de der barê Xelîfe Yûsif de bi kurtasî wiha tê gotin: “Xelîfe Yûsif di sala 1885’ê zayînî de li Bazîdê, li gundê Zengezorê hatiye dinê. Li cem melayê Zengezorê Mela Ehmed dest bi xwendinê kiriye. Di pey re çûye medreseya Şêx Mihemedê Celalî û xwendina xwe li cem wî temam kiriye. Di dema Şerê Cihanê de çûye Sêrtê û demekê li ba Mela Hamîd Efendî dersên feraîzê (ilmê mîrasê) girtine. Ji wê derê çûye Cizîrê û li gundê Hedilê çend salan melatî kiriye. Di sala 1925’an de ji şêxê Cizîrê Şêx Mihemed Nûrî Derşewî îcazeta terîqeta Naqşibendî standiye. Di pey re çûye Bexdayê û li wê derê ji Şêx Îbrahîm Heqî jî îcazeta terîqeta Qadirî standiye. Heyata wî tev bi ders û ilmê derbas bûye. Di sala 1965’an de çûye ber rehma Xwedê.<sup>(47)</sup>

Hinek beşên kitêbê ev in: Paqijî, Destmêj, Nimêj, Zekat, Rojî, Hec, Kirîn û Firotin, Emanet, Kirê, Seyd, Qurban, Heywanên ku goştê wan tê xwarin û nayê xwarin, Nikah, Nefeqe, Mafên Mêr û Jinê, Şîrdayîn.

Ev kitêb jî di demeke kurt de cihê xwe di nav kitêbên medreseyê de girtiye. Nivîskar di menzûmeyê xwe ya di serê kitêbê de ramanên xwe yên der barê nivîsandina vê kitêbê de, bi kurdî anîne ziman. Ez dixwazim wekî mînak çend malikan ji we re pêşkêş bikim.

*Ji ewil kesê nediye heta evî zemanî  
Bi vê tertîbê, xasma bi vî zimanî*

*Lîsanê kurmancî çil bav û kalan  
Hê jî nizani bi xwendina mah û salan*

*Tu ku ehmeqî lîsanê abayê xwe nizani  
Şerm û heya bike tu kêmtir ji sani*

*Guh nede wî cahilî, wî bêedebî  
Ku dibêje ilm nûn e ji xeyrê erebî*

*Lewra dîn ibaretê ji mena ne  
Ne ku bi kelîme û lefz û herfan e*

*Tu qedrê kitêba xwe baş bizane  
Nebêje kurmancî ye her kes dizane*

*Kurmancî ye, şîrîntir e ji şekir  
Xwezî bi wî kesî ku zanî, hem ji ber kir*

### Çavkanî:

<sup>1</sup> Cemal Reşîd Ehmed, *Zuhûru'l-kurd Fi't-Tarîx*, çapa duyemîn, Erbil, 2005, cildê duyem, r. 122.

<sup>2</sup> Hasan Kaya, Zana Farqînî, Samî Tan, *Em Zimanê kurdî Binasin*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, çapa yekemîn, Stenbol, 2001, r. 41.

<sup>3</sup> Ebdullah Varlî, *Dîroka Dugelên kurdan*, Weşanên Sîpan, Stenbol 1997, derpêç 1, r. 20, 29, 38

<sup>4</sup> Nazim Hacanî, *Sefehatun Min Tarîxi'l-kurd we Kurdistan*, çapa yekemîn, Erbil 2002, r.181.

<sup>5</sup> Ehmed, *Zuhûru'l-kurd Fi't-Tarîx*, cildê duyem, r. 329-374.

<sup>6</sup> Binêrin Ehmed, *Zuhûru'l-kurd Fi't-Tarîx*, cildê duyem, r. 329-374, 493-510.

<sup>7</sup> Muhemmed Mela Ebdulkerîm el-Muderris, nusxeyek ji vê kitêbê bi dest xistiye û fotokopiya rûpelên 134 û 135'an ku di wan rûpelan de behsa vê alfabe-yê tê kirin di kovara erebî ya bi navê *Gulan* de digel meqaleyekê hatiye weşandin. Navê meqaleyê ev e: *Kane li'l-ekradi eyden hurûfûn yektubûne biha* (Alfabe û tîpên kurdan jî hebûn û û kurdan bi wan dinivîsand). Hogir Tahir Tewfîq di pirtûka xwe ya erebî, ya bi navê *el-Elifbau'l-kurdîyye* (Alfabe-yên Kurdî) de piştî hinek agahiyên ev her du rûpel digel alfabe-ya navborî qeyd kirine. Ebdullah Varlî jî di kitêba xwe ya bi navê *Dîroka Dugelên Kurdan* de heman tişt kiriyê:

Binêrin Muhemmed Mela Ebdulkerîm el-Muderris, *"Kane li'l-ekradi eyden hurûfûn yektubûne biha"*, kovara *Gulan*, Erbil, 1999, hejmar: 40, r. 97; Hogir Tahir Tewfîq, *el-Elifbau'l-kurdîyye*, çapa yekemîn, Erbil, 2005, r. 16, 81; Ebdullah Varlî, *Dîroka Dugelên kurdan*, derpêç 1, r. 38-40.

<sup>8</sup> Ehmed, *Zuhûru'l-kurd Fi't-Tarîx*, cildê duyemîn, r. 126.

<sup>9</sup> Ferhad Hacî Ebûş, *el-Medînetu'l-kurdiye*, çapa yekemîn, Erbil, 2004, r. 140-141.

<sup>10</sup> Ji bo agahiyên bêhtir binêrin *Ansiklopediya Îslamê*, Weşanên MEB, Stenbol, 1970, II, 166-169

<sup>11</sup> Mahmut Aksu, *Bediuzzaman Said Nursî'nin Van Hayatı ve Hayalindeki Üniversite*, Şanlıurfa, 2003, r.16

<sup>12</sup> Aksu, *Bediuzzaman Said Nursî'nin Van Hayatı ve Hayalindeki Üniversite*, r. 46-47.

<sup>13</sup> Axaftina bi munasebeta beşdarbûna di Festîvala Melayê Cizîrî de, kovara *War*, hejmar: 10-11, sal: 2001, r. 52.

<sup>14</sup> Binêrin Amir Hassanpour, *Kürdistan'da Milliyetçilik ve Dil*, wergêr ji bo tirkî: İbrahim Bingöl-Cemil Gündoğan, çapa yekemîn,

Weşanên Avesta, Stenbol, 2005, r. 148-149.

<sup>15</sup> Amir Hassanpour, *Kürdistan'da Milliyetçilik ve Dil*, r. 564.

<sup>16</sup> Qanatê Kurdo, *Tarîxa Edebiyata Kurdî*, Weşanên Öz-Ge, çapa yekemîn, Enqere, 1992, r. 122-123

<sup>17</sup> Findî, *"Pêvaçûnek Li Ser Zaravesaziyê Di Zimanê Kurdî de"* *Ekadîmî: Kovarî Korî Zanyarî Kurdistan*, r. 74-75.

<sup>18</sup> Findî, *"Pêvaçûnek Li Ser Zaravesaziyê Di Zimanê Kurdî de"*, *Ekadîmî: Kovarî Korî Zanyarî Kurdistan*, jimare: 1, Hewlêr, 2002, r. 75

<sup>19</sup> Findî, *"Pêvaçûnek Li ser Zaravesaziyê di Zimanê Kurdî de"*, *Ekadîmî: Kovarî Korî Zanyarî Kurdistan*, r. 71, 75-76.

<sup>20</sup> Findî, *Min Yenabî'i's-Şi'ri'l-Kilasîkî el-kurdî*, Erbil, 2004, I, 52, 54.

<sup>21</sup> Findî, heman berhem, I, 89-90. Li gorî nivîskar ev navekî kevnar e. Li herêma Dihokê jê re dibêjin "Kesk û Sor", li herêma Hewlêr û Silêmaniyê jî jê re dibêjin "Kol-kezêrîne".

<sup>22</sup> Findî, heman berhem, I, 126.

<sup>23</sup> Findî, heman berhem, I, 129; Yûsif Ziyaeddîn, *el-Hedîyetu'l-Hemîdiye Fi'l-Luğeti'l-kurdiye*, çapa duyemîn, Beyrûd, 1987, r. 178

<sup>24</sup> Mes'ûd Xalî Golî, *Ferhengoka Kilasîkên Kurd*, çapa yekemîn, Dihok, 2001, r. 46

<sup>25</sup> Hesen 'Emîd, *Ferhengê Farisî yê 'Emîd*, çapa heftemîn, Tehran, 1369, r. 1250.

<sup>26</sup> Golî, *Ferhengoka Kilasîkên Kurd*, r. 49.

<sup>27</sup> Bo nimûne binêrin Golî, *Ferhengoka Kilasîkên Kurd*

<sup>28</sup> Reşîd Findî, *Min Yenabî'i's-Şi'ri'l-Kilasîkî el-kurdî*, Hewlêr, 2004, r. 70, 72.

<sup>29</sup> Mehmed Uzun, *Antolojiya Edebiyata kurdî*, Weşanên Aram, Stenbol, 2003, r. 18 û jêrenota 12'yan ji rûpela 66'an.

<sup>30</sup> Ebdurrehman Durre, *Şerha Dîwana Ehmedê Xanî*, Weşanên Keskesor, Stenbol, 2002, r. 18.

<sup>31</sup> Feqî Huseyn Sağniç, *Dîroka Wêjeya kurdî*, Weşanên Enstîtuya

Kurdî ya Stenbolê, çapa yekemîn, 2002, r. 446-447.

<sup>32</sup> Reşîd Findî, *Min Yenabî'i's-Şê'ri'l-Kilasîkî el-Kurdî*, Erbil, 2004, r. 101.

<sup>33</sup> Amir Hassanpour, *Kürdistan'da Milliyetçilik ve Dil*, wergêr ji îngilîzî ji bo tirkî: İbrahim Bingöl-Cemil Gündoğan, çapa yekemîn, Weşanên Avesta, Stenbol, 2005, r. 173.

<sup>34</sup> Kemal Burkay, *Kürtler ve Kürdistan*, Weşanên Deng, Stenbol, 1992, cild: 1, r. 207.

<sup>35</sup> Findî, *"Pêvaçûnek li ser Zaravesaziyê di Zimanê Kurdî de"*, *Ekadîmî: Kovarî Korî Zanyarî Kurdistan*, r.76.

<sup>36</sup> Hassanpour, *Kürdistan'da Milliyetçilik ve Dil*, r. 173-174

<sup>37</sup> Xanî, Eqîda İmanê, bi şîroveya Ehmed Hilmî Qoxî, r. 21.

<sup>38</sup> Feqî Huseyn Sağniç, *Dîroka Wêjeya Kurdî*, r. 412-414.

<sup>39</sup> Qanatê Kurdo, *Tarîxa Edebiyata Kurdî*, Weşanên Özge, çapa duyemîn, Enqere, 1992, r. 65

<sup>40</sup> Bo nimûne binêrin: Zeynelabîdîn Zinar, *Mewlûd*, Stenbol, 1992, r. 5 (Pêşgotin); Babê Zêrevanî, "Mela Hisênê Bateyî-1", *Nûbihar*, hejmar:87, sal: 2002, r. 63.

<sup>41</sup> Findî, *Min Yenabî'i's-Şê'ri'l-Kilasîkî el-Kurdî*, r. 100

<sup>42</sup> Zinar, *Mewlûd*, r. 5 (Pêşgotin).

<sup>43</sup> H. Mem, *Üçüncü Öğretmen Xanî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, 2002, çapa yekemîn, r. 42.

<sup>44</sup> Hassanpour, *Kürdistan'da Milliyetçilik ve Dil*, r. 162, 175.

<sup>45</sup> Zeynelabîdîn Kaya, "Şêx Evdirrehmanê Axtepî", *Antolojiya Edebiyata Kurdî* (Mehmed Uzun), Weşanên Aram, Stenbol, 2003, r. 80.

<sup>46</sup> Ji bo agahiyên bêhtir binêrin: Zeynelabîdîn Kaya, "Şêx Evdirrehmanê Axtepî", *Antolojiya Edebiyata Kurdî* r. 80-81

<sup>47</sup> el-Hacc Muhammed Nezaket Bahaeddîn el-Huseynî, *Irşadu'l-İbad Min Awamî'l-Mu'mînîn ve Türkçe Tercümesi*, Weşanên Hîra, çapa sêyemîn, Stenbol, 1998, cildê yekem, r. 7-9


# Rewşa redaksiyona weşanên kurdî

Hevpeyvîn: Yaşar Eroğlu

Me di vê hejmarê de cih da dosyayê li ser redaksiyona weşan û weşanxaneyan. Me xwest ku em balê bikişînine ser redaksiyona weşanên kurdî û problemên wê. Ji bo wê jî pirsên ku me amade kiribûn, me ji weşanxane, rojname û kovarên ku bi zimanê kurdî karê weşangeriyê dikin re şandin. Ên ku me ji wan re ji bo bersivdayîne pirs şandin ev bûn: Azadiya Welat, Avesta, Aram, Dema Nû, Belkî, Elma, Lîs, Nûbihar, Pêrî, Tîroj, Vate û Kovara W.

Ji van kovar, rojname û weşanxaneyan Azadiya Welat, Dema Nû, Belkî, Pêrî û Kovara W'yê bersivên pirsan ji me re şandin. Weşanxaneya Elmayê bi sedema prensîba xwe ya ku ew bi tu awayî bi kes û saziyan re hevpeyvînan nakin, bersiv nedan pirsên me. Ligel ku me çend caran xwe gihand yên mayî jî, lê me ji wan jî bersivên pirsên xwe nestandin.

Me hêvî hebû ku redaksiyonên weşanên kurdî, yên ku bi kurdî kar û barên xwe yên weşanê dikin, dê bi baldarî eleqe nîşanî vê mijarê bidin û pirs û pirsgerêkên xwe ji me re vebêjin. Ligel vê rewşê em dîsan hêvîdar in ku bersivên ku gihîştine ber destên me bala we bikişînin û hinek be jî hûn ji rewş û pirsgerêkên redaksiyonê yên weşanên kurdî agahdar bibin. Nîha em vê dosyaya xwe ku ji aliyê Yaşar Eroğlu ve hatiye amadekirin pêşkêşî we dikin.



## Divê lijneya her weşanekê hebe

Bi taybetî lijne yan jî beşeke we ya redaksiyonê ya rûniştî heye? Hûn karên redaksiyonê çawan pêk tînin?

**Kovara W:** Lijneya me ya redaksiyonê tune ye. Redaksiyona kovarê ji aliyê edîtorê kovarê ve tê kirin.

Hûn li ser kîjan esasan redaksiyonê dikin an jî di warê redaksiyonê de berê xwe didin ku derê? Ji bo çî?

**Kovara W:** A yekem, ji bo ku em ji ruh û mantiqê kurdî dûr nekevin, awayê gotinên ku zêdetir di nav gel de û di pirtûk û weşanan de hatine bikaranîn, wekî bingeh û esas digirin. Piştî jî, tevî ku em bi giştî Celadet Bedirxan wek destpêka nivîsandina sererast û bingeh dibînin jî, di hin xalan de guherînan ku bi nivîsandin û nîqaşên di nav nivîskar û zimanzanan de pêk hatine, ji bo rastnivîsîna

kurdî wekî esas dibînin. Pê re jî, ji bo ku em bizanibin ka gotinên devkî bi çî awayî ne û bi giştî çawan tînin bikaranîn, em Ferhenga Kurdî-Tirkî ya ku ji aliyê Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê ve hatiye weşandin wekî çavkaniya esasî didin ber xwe. Û her wiha rêzik û qaydeyên rêzimana kurdî.

Di warê redaksiyonê de çî pirsgerêk hene û ev pirsgerêk çawa derdikevin pêş we?

**Kovara W:** Pirsgerêkên ku zêdetir derdikevin pêş me ev in: 1) Rik û israra nivîskaran a di warê bikaranîna peyvên gundê xwe û herêma xwe ya teng de 2) Bandorgirtina ji zimanekî din (bi taybetî jî ji zimanê tirkî). Ev jî zêdetir di biwêj an jî di gotinên biwêjî de derdikevin pêşya me. 3) Pirsgerêka din jî, nezanîna an jî kêmanîna kesên a rêzimana kurdî ye ku ev jî gelek astengî û kêmasiyên redaksiyonê derdixe pêş me.

Hûn ji bo van pirsgerêkan çî difikirin? Bi ya we çareserîya van pirsgerêkan divê çawan be?

**Kovara W:** Ji bo çareserîya pirsgerêkan em dikarin van xalan destnîşan bikin: Yek; divê her kesê ku dinivîse, di serî de dev ji rik û înyada xwe berde û bêyî ku xwe ji devok û zaravayê xwe dûr bixîne, ji bo ku karibe bi kurdîyê kurdistanî û yek-

girtîbûyî bi axive û binivîse, bala xwe bide devok û zaravayên din û awayê peyvên ku di hemûyan de hevpar in; yek an jî diduyên wan ku ji ber bikaranîna wan a zêdetir bûne yekgirtî û wan qebûl bike. Û her wiha ji bo nimandin û diyarkirina bikaranîna peyvên a ku herî nêzî rastiya kurdî ye, avakirina lijneyeke ji her aliyên kurdî pêkhatî.

Ji bo serlêdan û kêmkirina şaşiyên, ev lijne divê ji van kes û zanayan pêk bê: Zimanzan, nivîskarên wêjeyê ku baş bi kurdî û rêzimana kurdî dizanin, mamosteyên kurdî, meleyên ku li medreseyan xwendine û ji bo rastbikaranîna û afirandina rast a peyvên nû; psîkolog, mamosteyên matematîkê, yên cografya, yên dîrok, ên spor û disîplîna bedenê, yên wêneyê, yên dibistana seretayî, doktor, pîrik û hemşîre, endezyar û kesên ku di warê xwe de zana ne û bi kurdî dizanin. Didu, ji bo çareserkirina vê pirsgirêkê ji bo Tirkîyeyê, ferhengeke biwêjên tirkî-kurdî dê pir baş be. Her wiha divê zimanzan misêwa bi rexneyên xwe yên çêkîrox û rênûmîn nivîsan binivîsin û avê li tu kesê ku zimên diêşînin venexwin. Sisê, ji bo çareserkirina vê pirsgirêkê divê her kesê ku dest diavêje pênuşê û xwe li nivîsandina kurdî radikişîne, piçekî rêz û hurmetê nîşanî kurdî bide û pêşî hay ji alfabe û piştî jî ji rêzimanê kurdî hebe. Wekî din tu rê û çare tune ye ji bo vê pirsgirêkê.

*Ji her aliyan ve hûn dikarin der barê redaksiyonê de pirsên ku di serê we de çebûne lê me nepirsîne û pêşniyazên we çi ne binivîsin?*

**Kovara W:** Ji bilî van pêşniyazên me yên li jorê, em dikarin vê bibêjin: Divê her weşan, çi rojname, çi kovar û çi jî weşanxane redaktor, an jî lijneyeke wê ya redaksiyonê hebe û ev lijne heta radeya zêdetir hurmetê nîşanî li tiştên ku heta niha hatine kirin û qebûlkirin, bide. Û pê re jî, divê ser û berî her tiştî kesên ku bi kurdî dinivîsin, ber bayê qadên din ên kurdan nekevin û hev qebûl bikin; li hember hev bi sebir, semax û daxwaz bin, da ku qet nebe zimanê kurdî di nav kurdan de bibe yek û yekgirtî!

**Dilawer Zeraq**  
Edîtorê Kovara W'yê

**Belkî**

**Em li gorî krîterên xwe karê weşanê dikin**

*Bi taybetî lijne yan jî beşeke we ya redaksiyonê ya rûniştî heye? Hûn karên redaksiyonê çawan pêk tînin?*

**Weşanên Belkî'yê:** Em bi edîtor, redaktor û lektor xebatên xwe dimeşînin, her yek ji van kesan bi kêmanî 3 caran berhe- ma ku wê biweşe, dixwîne û pêşniyarên xwe pêşkêş dike; ango berhemek di zik hev de nêzîkî deh caran tê xwendin. Gava zimanê berhemê gelek

xerab be, revîzekirin, carinan digihîje pazdeh caran jî. Ango em ji nivîskarê pirtûkê bêhtir wê dixwînin.

Li gorî me her peyva kurmancî divê di laboratuwarê de li serê xebatê bê kirin, em weşanxaneyê xwe Belkî'yê weke laboratuwareke ziman û edebiyata kurdî dihesibînin. Ji gramerê bigirin heta bi xalbendî, rastnivîs û "derizandinên êqil" em berhemê bi dehan caran qontrol dikin, heta ku bigihîje asta stabilîzasyonê. Piştî hemû sere- rastkirina çewtiyan, xebat û guherînan ku di berhemê de pêk tînin, em wê dişînin ji nivîskarê wê re, ger ew jî "okey" bike em berhemê dişînin çapê, ger qebûl neke em çapa pirtûkê disekinînin û wê ji programa weşanê dikişînin.

Mantalîteya me ya zimên ne statîk e, ger zimanzanek an jî nivîskarek bi sermîyanê xwe yê lîngûîstîk û gramatîkê me îqna bike em tafîlê wê yekê ji xwe re dikin prensîb.

Ji ber ku em ji bilî berhemên bi kurmancî tu pirtûkan naweşînin, roj bi roj sermîyanê me yê edebiyat û zimanê kurdî bilindtir dibe û kirasê otorîteyê her ku diçe baştir li me difesile.

*Hûn li ser kîjan esasan redaksiyonê dikin an jî di warê redaksiyonê de berê xwe didin ku derê? Ji bo çi?*

**Weşanên Belkî'yê:** Cihê ku berê kurmancî lê hebe, hemû cih, oryantasyona berê me ye. Qûça me kurmancî ye. Referansên me hemû senteza pratîk û orijîna kurmancî ye, em li gorî wê sentezê redaksiyonê dikin, heta niha çi berhemên gramerî û

yên lîngûstîk ên ku bi kur-mancî derketibin hema bihesi-bîne gişt me şopandine û hîn jî em dişopînin, em ji giştan, di laboratuwara xwe de senteza herî rasyonel û lojîk weke standart ava dikin û ji xwe re dikin krîter. Ji elementên ku kurman-cî karakterîze dikin ji tuyan em tawîzê nadin, ev element; za-yendî, ergatîf û tewang in û vê dawiyê me “şedde” jî li van krî-teran zêde kir, ji ber ku gava di hinek peyvên de me şedde bi kar nedianî wateya peyvê li he-wa dima û nedihat fehmkirin, jixwe hingê fonksiyona nivîsê jî îflas dikir; weke hemû zimanên Hind-Ewropayî me jî xala şeddeyê li redaksiyona xwe zêde kir. Her wiha me bi vê zê-dekirinê, di xwendinê de şikes-tina şîûrê jî ji holê rakir.

*Di warê redaksiyonê de çi pîrsgirêk hene û ev pîrsgirêk çawan derdikevin pêş we?*

**Weşanên Belkî'yê:** Ji ber ku kurmancî hîn nû li ser binge-hên xwe dilûse, reqsokiya qaydeyan hinekî serî li me digêrin. Ji ber ku ji berê de, her peyv laboratu-war nebûye, carinan hinek peyv bi toza xwe ya feodalî û bi ge-mara xwe ya asimîlasyonî tên ber me, halên wan ên kevn nayê xwarin an jî patolojiyekê dika-rin ji zimên re çêkin; ji lew re em her peyvê qeyd dikin û ji bo modernîzekirina wê û vejîna wê dikevin nav livbaziyan.

Problemeke din jî nivîskar in, bi awayekî dilînî nêzikî gram-erê dibin. Mînak, ji bo qafiyeye-ke xwe xera nekin, carinan qaydeyên zimanekî dikarin bi-kin qurban ji bo rêzîkekê. Ji ber ku di pêvajoya nivîsînê de guh

nadin zimanê xwe, bi dû re se-rerastkirina hinek tiştan jî gelek zehmet dibe. Weke mînak; li ser hevokên xwe hîç naxebite û di-nivîse, di paragrafekê de neli-hevkirina kîpan-deman, xwen-dinê sabote dike, haya wî jê tune; xalbendiyê, rastnivîsê, za-yendê, tewangê, ergatîfê giştan di ser guhê xwe re diavêje, yan jî sistematîk bi kar nayne, bi kê-masî bi qasî xwendevanekî guh nadine wan; ê wî, ji ber ku wî (wê) nivîsiye bi awayekî sem-yolojîk jî mabe, baş jê fehm dike, lê li xwendevên û redak-siyona weşanxaneyê hîç nafi-kire, nafikire ku zimanekî ne-estetîk û nesistematîk xwendina bi kurmancî li ber çavên xwen-devanan reş dike.

Bi vê problemê girêdayî ne-firota pirtûkan jî problemeke me ya sereke ye. Ji her weşan-xaneyê bêhtir, ji ber ku em ji sedî sed bi kurmancî weşanê dikin, em derbên giran di-xwin. Weşanên din jî ber ku ji sedî heftê-heştê bi zimanê ser-dest weşanê dikin xwe sirkule dikin û qazancê jê dikin.

*Hûn ji bo van pîrsgirêkan çi difikirin? Çareserîya van pîrsgirêkan divê çawan be?*

**Weşanên Belkî'yê:** Çareser-riya van pîrsgirêkan cidiyeta ni-vîskêr e, ji ber ku ji bo fenome-na zimên, nivîskar “toxim” e; ger toxim-tov ji serî de riziyayî be bi zorê tu tajî naçin seydê. Nivîskar çiqas profesyonel bi-xebite, binivîse; ziman jî ew qas wê ji kêmasiyên xwe dawerive; nivîskar çiqas berhemên biqa-lîte biafirîne; firotin û sirku-lasyon wê ew qas baş be û her wiha...

Lê berhema nivîskarekî (ê) ji dêvla çend xwendevanan li tîraja kurmancî zêde bike; ji ber ku bêqalîte ye, edebiyata kur-mancî li ber çavên xwendeva-nên heyî jî reş û xerabtir dike. Ji lew re em weşana her pirtûkê bi erênî pêşwazî nakin.

Problemên weke polîtîka û model polîtîkvanên ji bo xwen-dina bi kurdî ya civaka xwe û her wekî din hene, ji ber ku êdî me ji bo pêşdebirina kurdî destê xwe ji têgeha polîtîkaya kurdî şuştîye ne hewce ye ku li vir bê qalkirin.

*Ji her aliyên ve hûn dikarin der barê redaksiyonê de pîrsên ku di serê we de çebûne lê me nepîrsînê û pêşniyarên we çi ne binivîsin?*

**Weşanên Belkî'yê:** Pîrsgirê-kên fonetîkî çêdibin, wekî peyvên; winda, wenda, wunda, hinda... Em wan qeyd dikin û ji lêkolîn û ji weşanên heyî qont-rol dikin, bi dev dipîrsin û guhê xwe li gorî populerbûna wan bel dikin, kîjan bi binge-h û po-puler be em wê tercîh dikin.

Problema herî serê me diê-şîne ya tewangê ye, ji ber ku em li standardîzasyonê digerin û tewang hem tê bikaranîn di hinek cihan de û hem jî nayê bi-karanîn di hinek cihan de, serî li me gêj dike. Lê ji ber ku pren-sîbên me yê kurdî-karakterîstîk hene yê wekî “tawîznedana xu-sûsiyetên kurmancî” em wê çar-eser dikin, lê ev, hemaliyekê bi xwe re tîne, ji ber ku em mecbûr dimînin di berhemekê de ele-mentên tewangî giştan destnî-şan bikin û biguherînin.

Pîrsgirêkên xalbendiyê he-ne; wekî mînak berî yan jî piştî

gîhaneka “û”yê yan jî “ku”yê bikaranîna (.) bêhnokê û her wiha xalbendiyên din... Ji ber ku em nikarin li gorî tesîra zimanê serdest xalbendiyekê ji kurmancî re ava bikin.

Di lêker û di kişandina wan de pirsgirêk derdikevin, wek mînak, di condîsyonel û subjontîfa kurmancî de me hin problem destnîşan kirine, em li ser difikirin û dixebitin. Lê gava mînak zêde bibin, xebat û konsantrasyon gurtir bibin wê ew ê jî çareser bibin.

**Rênas Jîyan**  
Edîtorê Weşanên Belkî'yê

Rojnameya hefteyî ya siyasî û çandî  
**DEMA NÛ**

### **Avakirina saziyeke neteweyî ya ziman pêwîst e**

*Bi taybetî lihe yan jî beşeke we ya redaksiyonê ya rûniştî heye? Hûn karên redaksiyonê çawan pêk tînin?*

**Dema Nû:** Ger em karê redaksiyonê bi kadro û bi hewcedariyên din ên teknîkî dabeş bikin, rewşa me ev e:

a) Ji ber ku rojnameya me bi zimanê tirkî û kurdî hefteyî tê weşandin, xebatkarên redaksiyonê jî bi vî awayî hatine cihêkirin. Ango lijneyên redaksiyonê cuda cuda ne. Hevalên ku li beşa tirkî dinihêrin hejmar wan sisê (3) ne. Carinan jî ku

hewce bike ji derve jî hevalên me daxilî nav karên redaksiyonê dibin û ev hejmar zêde dibe.

Hevalên ku li beşa kurdî, zaravê kurmancî dinihêrin jî sisê (3) kes in. Ji bo sererastkirina zaravayê dimilî/zazakî jî kesek (ne li navenda rojnameyê, lê li derveyî wê) beşdarî karê redaksiyonê dibe. Her wiha dîsan li gor hewcedariyê jî bo beşên kurmancî û dimilî jî ji derveyî welat an derveyî navenda rojnameyê, ji kesên zimanzan û pisporê ziman jî alîkarî tê standin.

b) Mebest ji hewcedariyên teknîkî, di serî de odeyeke redaksiyonê ye. Lê mixabin derfeteke me ya wisan tune ye. Digel di vî warî de tengasiyeke me ya mezin tune be jî, redaksiyon û amadekirina nûçeyan ligel hev tînin çêkirin û tînin dabeşkirin.

Hewcedariyên din yê teknîkî jî, hebûna materyalên redaksiyonê û pisporiya xebatkarên redaksiyonê ye. Di warê materyalan de tu kêmasî tune ye. Mebest ji kêmasiyan fêrîheng, rêziman û hewcedariyên ku tînin zanîn in. Em di wê baweriyê de ne ku xebatkarên me yê redaksiyonê di karên xwe de serkeftî ne. Lê di warê xwe de ne xwedî pisporiyeke herî baş in.

*Hûn li ser kîjan esasan redaksiyonê dikin an jî di warê redaksiyonê de berê xwe didin ku derê? Ji bo çi?*

**Dema Nû:** Em li ser esasên rêzimana kurdî ya Celadet Bedirxan û Kamûran Elî Bedirxan karên xwe yê redaksiyonê dimeşînin. Sedemê vê yekê jî diyar e. Lewra her kes dizane ku xebatên Mîr Celadet Bedirxan

bingeha rêzimana zimanê kurdî ne. Ji xebatên wî pê ve referansekê tevahî tune ye.

Lê em dizanin ku ev ne bes e. Ji ber ku xebatên Celadet Bedirxan di heman demê de destpêkek e, di kar û barê ziman de. Li ser xebatên wî gelek xebatên din hatine kirin û gelek guhartin çêbûne. Xasîma jî li derveyî welat wek saziyên Enstîtuya Kurdî ya Parisê, ya Stenbolê, ya Weqfa kurdî ya Swêdê, ya Berlînê gelek xebatên zanyarî kirine û di warê standardîzasyonê de xwedî gelek xebat in. Em her wiha ligel van saziyan ji tecrûbeyên gelek zimanzan û mamosteyên zimanê kurdî yê serbixwe jî îstifade dikin.

*Di warê redaksiyonê de çi pirsgirêk hene û ev pirsgirêkan çawan derdikevin pêş we?*

**Dema Nû:** Di karê redaksiyonê de pirsgirêka herî mezin helwestên cur bi cur ên nivîskaran e. Ango her nivîskarek bi awayekî dinivîsîne. Hin nivîskarên me bi zimanekî hêsan ku wê her kes bikaribe jê serwest bibe dinivîsînin. Lê hin nivîskarên me jî zimanekî girantir bi kar tînin. Ev tengasî zêdetir jî bo xwendevanan xwe dide pêş. Lê yê ku xebatkarên me yê redaksiyonê diêşîne ev in:

Wek tê zanîn hin şertên rêzimana kurdî tevlihev in û hê jî nehatine standardîzekirin. Wek dabirê (apostrof). mîna 1992'yan an jî Mihemed'ê rojnamevan. Hin kes piştî hejmar û serevanan veqetandekê bi kar tînin, hin kes jî naynîn (Em dabirê piştî hejmar û serevanan bi kar naynin). Dema ku em li gor xwe sererast dikin hin nivîs-



karên me xwe nerazî dikin û dibêjin: “Em dabirê wek hewcedariyekê dibînin û bi zanebûn bi kar tînin. Divê hûn mudaxele lê nekin.”

Hin kes jî di meselaya beriya tîpa “h” û “y” de bikaranîna tîpa “î” û “î” yê de zelal nîn in û her kes li gor xwe dinivîse. Wek; “di nav vê tengas(i/î)yê de fetisîm; bê c(i/î)h û war im.” Di vir de vê yekê dispêrin du mantiqên cuda. Yek ji wan ev e: Dibêjin, rastiya gotinê çî be divê wisan bê nivîsandin. Yanê wek tengasî û cî. Mantîqa diduyan jî ev e: Dibêjin; dengê “h” û “y”yê niv dengê dengdêr (seslî) derdixe, dengê “î”jî dengdêr e, dema ku “î” beriya dengê “h” û “y” wek “ih” an “iy” bê nivîsîn, jixwe wek dengê “î” derdikeve. Yanê li gor vê mantiqê wek “tengasiyê û cih” tê nivîsîn (em jî bi vî şeklî dinivîsin). Hin kes jî nav û navdêran cuda dinivîsin. Wek; “çareser kirina pirsê kurdî yan xuya kirina asoyek dûrbîn.” Li gorî me gotinên; çareser kirina û xuya kirina, nav in û wek “çareser kirina û xuyakirina” bi hev re tînin nivîsîn. Yê wiha ji hev cuda dinivîsin jî, xwe dispêrin hin xetên rêzimana Mîr Celaded Elî Bedîrxan.

Wekî din hin kes gotinan li gor herêmên xwe dinivîsin: wulo, wûlo, welî, wusa, weha, hûn, hun, û hwd. Her wiha em dikarin mînakên zêde bikin. Wek nivîsandina zimanan, ango Kurdî/kurdî, Tirkî/tirkî û hwd... Wek pirsê tewangê. Wek pirsê kumikê. Lewra hê jî nivîskarekî me M. Emîn Bozarşan li gor esasên Kamûran Bedîrxan dinivîsîne. Ango tîpên i-i yê wek i-i dinivîsîne. Astengiyêke din

ku em girîng dibînin; hin nivîskarên ku ji me re nivîsên xwe rê dikin, xwe, di warê rêzimana kurdî de wek ekolek dibînin û nahêlin kes dest bide nivîsên wan. Ev yek jî di tekûzkirin û standardîzekirina ziman de me dixê nav tengasiyê.

*Hûn ji bo pirsgerêkan çî difikirin? Çareseriyê van pirsgerêkan divê çawan be?*

**Dema Nû:** Çareseriyê pirsgerêkan redaksiyonê bi çareser kirina pirsên ziman ve girêdayî ye. Ew heta radeyekê bi pirsê azadî û rizgariyê gelê kurd ve jî girêdayî ye. Lê di dirêjahiyê tekoşîna pêvajoya azadî û rizgariyê de gelek karên ku li ser ziman bînin kirin hene. Em jî ji bo çareser kirin û kêmkirina pirs û pirsgerêkan zimanê kurdî, avakirina saziyêke neteweyî ya ziman difikirin an jî dikarên pêşniyar bikin. Divê ev sazî, yekser bi tu dezgeheke siyasî ve girêdayî nebe. Lê divê hemû dezgehên siyasî yan siwîl alîkarî û piştgiriya wê bikin. Ji bo avakirina saziyêke neteweyî, divê gelek civîn û konferansên li ser ziman bînin çêkirin û di encamê de biryareke wiha bê wergirtin. Divê ev sazî bi tenê ji bo kurdên bakur be û divê di warê zaravayên kurmançî û dimilî de kar û barên standardîzasyonê bike. Her wiha gotin, metelok, zargotin, gotinên pêşyan, çîrok û hwd. yê ku li ber windabûnê ne berhev bike û di vî warî kar û barên weşanê bike.

Ji ber ku li her parçeyên Kurdistanê, pirs û pirsgerêkan ziman û alfabe yê cuda cuda ne. Divê sazîyên li ser ziman jî li gor wan parçeyan cuda bin. Lê, divê ji bo çareser kirina pirs û

pirsgerêkan giştî yê zimanê kurdî jî saziyêke wek federasyonê hebe. Wezîfeya vê federasyonê jî, çareser kirina pirsgerêka alfabe yê latînî û erebî be.

**Desteya beşa kurdî ya rojnameya Dema Nû / Amed**

**Welat**  
Azadiya

**Ji bo karê redaksiyonê hewcedarî bi perwerdehiyê heye**

*Bi taybetî li jine yan jî beşeke we ya redaksiyonê ya rûniştî heye? Hûn karên redaksiyonê çawan pêk tînin?*

**Azadiya WELAT:** Lijneyêke me ya redaksiyonê ya rûniştî nîn e. Zêdetir ji aliyê edîtoriyê wê ve tê kirin û piştî edîtor jî ev kar ji aliyê kesek-du kesan ve pêk tê. Piştî rûpel amade bû, li ser rûpelê tê redaktekirin.

*Hûn li ser kîjan esasan redaksiyonê dikin an jî di warê redaksiyonê de berê xwe didin ku derê? Ji bo çî?*

**Azadiya WELAT:** Bi giştî em li ser esasê rastnivîsa Celadet Bedîrxan karê redaksiyonê pêk tînin. Her wiha wek referans jî em pirtûka Rêziman û Rastnivîsa Zaravayê kurmançî ya Samî Tan esas digirin. Jixwe em di wê baweriyê de ne ku

kevneşopa weşanên Welat ku sal sal bêhtir li pey xwe hiştine, lîteratûreke xweser a rojnamegeriyê afirandiye. Di vî warî de qalib û termên têr afirandine. Em jî xwe wek peyrewê vê çandê dibînin û li ser van rêz û rêçikên ku berhema vê çandê ne, karê redaksiyonê pêk tînin.

*Di warê redaksiyonê de çi pirsgirêk hene û ev pirsgirêk çawan derdikevin pêş we?*

**Azadiya WELAT:** Pirsgirêk ji gelek aliyên ve hene. Ji ber ku zimanê kurdî negihîştîye hinek standardên hevbeş. Jêderkên nûçeyan, nivîskar li gorî têgihîştin û devoka xwe dinivîsin. Werger gelek li gorî mantiq û mantalîteya tirkî tê kirin. Di warê çêkirin û avakirina hevokan de gelek caran aloziyên sosret çêdibin. Her wiha di warê sazkirina nûçeyan de zimanekî yekgirtî, qalib û termên lîteratûra rojnamegeriyê ji ber ku baş nayên zanîn, gelek caran alozî çêdibin. Her wisan di warê bikaranîna demê de gelek alozî rûdidin. Gelek caran di heman hevokê de, du demên cuda tînin bikaranîn. Li aliyê din hin caran pîvanên ergatîfîyê li ber çavan nayên girtin û di warê nêr û mêtîyê de jî gelek alozî diqewimin.

*Hûn jî bo van pirsgirêkan çi difikirin? Çareseriyên van pirsgirêkan divê çawan be?*

**Azadiya WELAT:** Berî her tiştî divê di ziman de standardek pêk were û kesên ku bi vî karî radibin, divê li ser hin pîvan û rêgezan li hev bikin. Divê mekanizmeyeke xurt a biryargirtinê wek Saziya Bilind a Zimanê

Kurdî bête damezirandin da ku hemû alî li dor wê kom bibin.

*Ji her aliyên ve hûn dikarin der barê redaksiyonê de pirsên ku di serê we de çebûne lê me nepirsîne û pêşniyarên we çi ne, binivîsin.*

**Azadiya WELAT:** Ji bo ku redaksiyoneke rêkûpêk pêk were, berî her tiştî divê nûçegihan, rojnameger, weşangerên kurdî baş bîne perwerdekirin. Bi kurdî bijîn da ku bikaribin bi kurdî hilberînin...

**Omer Dilsoz**  
**Endamê Beşa Redaksiyonê û**  
**edîtorê Azadiya WELAT**



**Redaksiyona weşanên**  
**kurdî hîn amator e**

*Edîtorê weşanên Pêrî birêz Ahmet Onal bi awayekî giştî bersiv daye pirsên me û em jî wekî ku çawan ji me re şandiye, em wisan diweşînin.*

Berî her tiştî weşangeriya me ya kurdî, bi awayekî giştî, ji aliyê redaksiyonê de cihê xwe negirtiye. Weşanxaneyên me yê kurdî jî ji bo redaksiyonê weke qefle, ango ekîp û komîsyonan redaksiyonê bi kar nayînin. Ev

ne ji kêmaqilî û nezaniyê ye. Belkî ji bêmecaliyê ye. Li Tirkiyeyê jî çend weşanxaneyên ku weke holdîng ango pirpar (Yapı Kredi, Doğan Kitap, İş Bankası, Alfa, hwd.) bes dikarin qefleyê redaksiyonê ji bo tirkî bi kar bînin û tînin.

Weke ku tê zanîn redaksiyon; ji aliyê edebî, rêziman, tarîx, plan, kompozîsyon, aborî, zanyariya pîraliyê û hwd. hunera derbirîne ya nivîsînê ye. Redaktorê nivîsê, nivîsê bi her awayî serrast dike, xweşiktir dike, asantirîn û herikbar dike û bi rasterastî dide fêmkirin.

Karê redaksiyonê nîn e ku peyvan bifafrîne û ziman û rêziman standardîze bike. Ev li ser zimanê ku standardîze bûye têgihîştîye û wan esasên zimanî di karê xwe yê rastnivîsê de ji her awayî ve bes bi cih dike.

Yek jî, civata me ya weşangeran peyva "tashîh" û "redaksiyon"ê wekî hev dinirxînin. Ev çewt e. Tashîh; bes rastnivîsa peyvan dide ber xwe, lê redaksiyon rastkirin û rastnivîsa hemû nivîsê, ango mirov dikare bibêje rastnivîsa pirtûkê ji her aliyê ve dide ber xwe û berpîrsyar e ku hemû pirtûkê ji her aliyê ve rast bike û heya mecalê nede çewtîyên nivîskarî jî.

Ji bo wê, karê redaksiyonê karekî etîk e. Ji bo ev kesên ku xwe wekî redaktor dihesibînin berî her tiştî şarezayîya ziman, rastnivîs, edebiyat, tarîx, siyasî û zanyariya pîralî divê. Ku ew nebe, nikare ji bin karê redaksiyonê derkeve û bi ser bikeve. Ku wan şertan nekaribe bi cih bike, nikare bibe redaktor û karê redaksiyonê bi cih bîne.

Ji bo redaksiyonê ev rawer-deyên jorîn ku mirov bîne ber çavan, problemên redaksiyona weşangeriya kurdî bi asanî berbiçav dibin.

Her kes dizane ku perwerdeya bi zimanê kurdî bi awayeki fermî tune ye. Her çiqas zimanê kurdî, bi taybetî jî zaravayê kurmancî û soranî ji aliyê standardîzebûnê ve gelekî bi pêş ve çûbin jî, lê hîn di gelek babetan de xwedî problem e. Hîn di destên me weşanger, nivîskar, xwendekar û redaktorên de ji bo rastnivîsê rêbera rastnivîsa peyvan nîn e. Hîn nivîskarên me xwe ji devoka herêman û ji devoka dayika xwe rizgar nekirine û gelek ji wan nikarin bi zimanê neteweyî ramiyar bibin. Neteweyetî û roman sedî sed bi hev re afirîne û hev û din bi pêş ve dixînin. Lê gelek nivîskarên me, bi zimanê modern ê neteweyî na, bi zimanê dayika xwe radibin romanên xwe dinivîsin û dibêjin "Min romana moderen nivîsiye."

Hinek nivîskar jî bi zimanê serdest weke tirkî, erebî û farsî ramiyar dibin û dixwazin berhemên xwe bi kurdî binivîsin û dinivîsin. Ev pêngavek e ji bo kurdî, lê divê redaktorê kurdî ji bo wan alîkar bibin û wan ber bi vê ramiyariya kurdî ve bikişînin û berhemên wan bi kurdî derînin..

Mîmkun e ku nivîskar ji aliyê neteweyî ve berfireh tê bigihîje û karakterên modern di asoya xwe de bi cih bike. Lê ku bi tesîra zimanê dayikê, yan jî bi zimanê serdest binivîsin; redaksiyon dikare wê kêmasiya nivîskarî/ê bi hunera xwe ya

redaksiyonê ji holê rake û edebeke neteweyî derxîne holê.

Sêzdeh sal in ku ez wekî xwedî û edîtor, bi şêweyekî berpirsariya weşanxaneyekê dikim. Me berê gelek astengî dîtîn. Kîjan nivîskarî ku dosya xwe dianî, me bi wî awayî didan çapê. Ji bo wê gelek berhemên me bi çewtiyên tevî dihatin weşandin û xwendevanan em gelek di cih de rexne dikirin. Me nedikarî ku em xwendevanan bibersivînin.

Min da ber xwe û yek û yek pirtûkên kurdî xwendin. Ji metropolan derketim min da ber xwe û berê li bakurê Kurdistanê cuda cuda herêman geriyam. Bi înat ez bi kurdî axivîm û min xwend. Paşê jî ji Tirkiyeyê derketim, li başûr û rojavayê Kurdistanê di nav gel de mam û min xwe ji tirkî dûr xist. Têr nekir. Ez çûm li Universîteya Upsalayê beşa zimanî de salekê kursa kurdî bi şêweyekî ku bibim mamoste xwend. Armanca min a esasî ev bû ku ez xwe li ser redaksiyona zimanê kurdî perwerde bikim û di karê weşangeriyê de pêk bînim. Ez mirovekî bi serê xwe me û karê weşangeriyê dikim. Li gorî wê perwerdeyîya xwe karê redaksiyona pirtûk û nivîsên kurdî dikim. Me gelekî karê redaksiyonê pêş ve biriye. Lê hîn pir kêmasiyên min û me hene.

Çareseriya redaksiyona kurdî bi perwerdeyîyê ve girêdayî ye. Dixwazî biçe li dibistanekê bixwîne, dixwazî grubek di nav xwe de çawa ku diçe dibistanê û weke xwendekar bi rewşeke planî, disiplînî, rêzkariya bi ar-

manca ku bibe pisporê zimanê kurdî divê. Tabî ev jî dirav û debar divê ku mirov xwe, ango redaktorên nivîsa kurdî weke şêweyike profesyonel bikare derbixîne.

Problema me ya redaksiyonê, bi pirsgirekên problema kurd û Kurdistanê ve girêdayî ye. Ango miletekî ku bi şûn ve mabe û hin ne bi mêjiyê xwe re, lê bi zikê xwe re mijûl be. Hîn ji zar û nalîna tenduristiyê bextewar be, jî şert û tehdariya dewletê xwe xelas neke, her dem li ser şehîd û şûhudên xwe çavhêsirî be, çawa bi piranî xwendekar, xwendevan, rexnegir û redaktor jê derbikevin? Zor e! Wê demê jî karê redaksiyonê dimîne li ser milê çend amatorên wekî min.

Her pirtûkek ango kovareke ku çap dibe 1.500-2.000 ango bi deh hezarî xwedî tîraj e. Her xeteriyek qasî hejmara tîrajê lê zêde dibe. Her xwendevanek ku çewtiyekê weke "rast (!)" fêr dibe û fêr dike, çewtiyê her ku diçe mezin dike û ya ku bi ser dikeve çewtî dibe. Pirtûk ango nivîsa ku bi çewtî biweşe; xwendevan ji pirtûkê sar dike, hestê xwendinê yê dilê xwendekar û xwendevanan dişkîne û jê dûr dixîne.

Ev krîtikên jorîn diyar dikin ku em weke cîhana weşangeriya kurdî û redaksiyona weşanên kurdî; çi qasî roj bi roj bi pêş bikevin jî, em hîn gelek amator in. Xwendin û perwerdeyîya kurdî ya bilind divê!

**Ahmed ÖNAL**  
Xwedî û edîtorê Weşanên Pêrî

# Dîroka pêşveçûyîna hîndekariya zanistî

Cîhan Pola

Li gorî rêgez, azîn (metod) û teknîkan, ji lêkolînkirina mijaran a gelemperî re dibêjin “hîndekariya zanistî.”

Koka “hîndekariya zanistî” jî yewnanî ye û ji “dîdaskîo”yê tê. Hemû gelên dinyayê ji vê jêderkê sîd girtine û ev jêderka hanê li gorî zimanên xwe emilandine. Almanan jê re gotiye “dîdaktîk”, îngilîzan jê re “dîdactîcs”, fransîzan jî jê re gotine “dîdactîque”. Lê di zimanê me de jî jê re “hîndekarî” hatiye gotin.

Zanîna hîndekariyê, bi xebat û hewldanên bi salan, hatiye rewşa îroyîn. Ji bo dirûvgirtina zanîna hîndekariya îroyîn, gelek zan-yar û ramanweran xebat kirine.

Sokrates (B.Z. 470-399) li ser navê xwe “Azîna Sokratîk” afirandiyê. Azîna Sokratîk, azîneke pîrs-bersîv û azîna gengeşiyê ye. Bi vê azîne di navbera mamoste û xwendekaran de, bi vegotina devkî, ragihandin bi pîrs û bersivan dest pê dike û bi dahûrandina bersivan re heta dî-tina rastiyê berdewam dike.

Eflatûn (B.Z. 427-347) xwendekarê Sokrates e. Eflatûn pêhesîn li azîna Sokrates a pîrs-bersîv û gengeşiyê zêde kiriye û azîna Sokrates bi pêş ve biriyê, dorfireh kiriye.

Arîsto (B.Z.384-322), wî jî di hîndekariyê de azîna çavdêrî û taqîkirinê bi kar aniye û ji hîmê hîndekariyê ya nûjen re pêşengî kiriye.

Di sedsala 17’an de, W. Ratke

(1571-1635) bi azîna dîdaktîk (zanîsta hînkariyê), hîndekarî hêsantir kiriye. Li gorî vê azîne, di serî de bi danasîna heyberan re hîndekarî dest pê dike. Dûre jî têgihên van heyberan tîn naskirin û hînkirin. Ratke, di hîndekariyê de girîngiyê dide dubarekirinê û azîna pîrs û bersivdayînê jî dixebitîne. Ratke, bandoreke mezin li ser hîndekarên ku di pey wî re hatine, kiriye.

J. A. Comenîûs (1592-1671), di sedsala 17’an de navekî girîng e. J.A. Comenîûs di warê hîndekariyê de nivîskarê pirtûka hîndekariyê ya ewil e. Wî di pirtûka bi navê “didactica magna” (dîdaktîka mezin) de, di azîna hîndekariyê ya zanistî de li ser hîndekariyê sekîniye û di wî warî de pêşengî kiriye.

Comenîûs jî bo hêsantirkirin û baş femkirina mijaran, di pirtûkên hîndekariyê de cih daye wêneyan.

John Locke (1632-1704) ramangerekî îngilîz e, wî jî bo şixulandina zêhna mirovan xebateke akademîk bi pêş xistiye. Li gorî vê zanyariyê, di hîndekariyê de zêhna zarokan vala û wek lewhayan e. Locke dibêje ku zarok û ciwan bi sehekan hîn dibin. Ji bo vê jî pêwîst e ku di şûna hîndekariya bibîranînê de, hîndekariya sehekan bê bikaranîn.

Sedsala 17’an di warê ilm, huner û ramanê de li Ewropayê pêşketinên pîr mezin derxistine holê. Ji vê serdemê re dibêjin “serdema ronîbûnê.” Van pêş-

ketinên mezin û ronîbûnê, bandora xwe li ser hîndekarî û perwerdehiyê jî kiriye.

Di warê hîndekarî û perwerdehiyê de, hevoknasî û hêvokerî jî geş kirine. Di vê demê de hevojeran di warê bername, azînen hîndekariyê û dsîplîne de jî nêzikîtdayîna biaqil û mirovhez derxistine pêş.

J. J. Rausseau (1712-1778), di sedsala 18’an de, di warê hîndekarî û perwerdehiyê de ji hêvojeran (perwerdekar) re pêşengî kiriye.

Jan Jack Rousseau, teoriya perwerdehiyê ya ku mirov ji dayikbûyîne siruştiya xwe ya pak bi xwe re tîne, teoriya hîndekarî û perwerdehiyê bi pêş xistiye. Di romana xwe ya “li ser perwerdehiyê” ya pedagojîk de dibêje ku mirov pak û paqij tîn dinyayê, bi dû hatina dinyayê re tîkildariya mirovan a bi civatê re û ya bi derdorê re, kesatiya mirovan xera dike. Li gorî Jan Jack Rousseau, pêwîst e ku perwerdeyî li gorî rewşa zarokan a biyolojîk û psikolojîk bê rêkûpêkkirin. Di zanyariya hîndekariyê de, cara ewil e ku Jan Jack Rousseau zarok û ciwanan di warê perwerdeyî û hîndekariyê de jî hev cihê dike û ji bo hîndekariya zarokan bername çêkiriye.

J. H. Pestalozzi (1746-1827); di sedsala 18’an de, di warê perwerdeyî û hîndekariyê de cihekî J. H. Pestalozzi yê girîng heye. Vê zanyarê di perwerdeyî û hîndekariyê de teoriya bi navê Pes-

talazzi pêk aniye. Pestalozzi, di teoriya xwe de azîna çavdêrî, tê-gihîştin, lêgerîn, sepan û dançêkeriyê bi pêş xistiye û ev azîna hanê jî di dibistana ku li ser navê xwe vekiriyê de, de tetbîq kiriyê.

Di sedsala 19'an de li Ewropayê di warê endrûstriyê de pêşveçûn û pêşketin bi lez bûne. Ramana demokratîk roj bi roj geş bûye. Van pêşveçûnan, bandor û hêza xwe daye perwerdeyî û hindekariyê jî. Di vê sedsalê de perwerdeyî û hindekarî ketiye rewşa xwe ya îroyîn.

J.F. Herbart (177-1841); hêvojerê alman e ku li dinyayê cara pêşîn li ser perwerdehî û hindekariyê xebateke zanistî kiriyê. Herbart, li gorî xwe azînek bi pêş xistiye. Ev azîna Herbart ji pênc pêlikan pêk tê.

1) Amadekarî, 2) Pêgotin, 3) Hevberkî, 4) Sepan (fetbîq) û 5) Gelemperî. Ev azîna hanê îro jî ji bo perwerdehî û hindekariyê tê bikaranîn.

F. Froebel (1787- 1852); zanyarekî alman e û damezirînerê zarokxane û pola destpêkê ye. Vî mamosteyî dibistan wek civateke biçûk dîtîye. Li gorî Froebel, perwerdehî û hindekarî ne ji bo amadekariya jiyane ne. Perwerdehî û hindekarî ji bo tevlêbûna jiyane ne.

Froebel, ji bo bipêşxistina perwerdehî û hindekariyê, sûdgirtina ji listok û pêwendiyê jî parastîye. Azîna ji berbiçavîyê ber bi razberiyê ve, bi pêş xistiye û di dibistanan de ji bo listok, muzîk û şahiyê, veqetandin û terxankirina demê pêwîst dîtîye.

Wilhelm Wunelt (1833-1920) ê alman jî, li dinyayê cara ewil laboratuwarekî psîkolojiyê vekiriyê.

Francis Galton (1882-1911) ê îngilîz, teknîka îstatîstîkê çêkiriyê. J. Keken. Cattel (1860-1914), hindekarê amerîkî ye. Azîna pîvan û nirxandinê bi pêş xistiye.

Di sedsala 20'an de, di warê felsefe, sosyolojî, antolojî û antropolojiyê de hûmêrîn û lêgerînên mezin çebûne. Van pêşketinên girîng, di hindekarî û perwerdehiya dibistanan de jî, ji aliyê armanc, azîna, naverok û rêgezan ve, bandorên mezin kirine.

Perwerdehî û hindekariya sedsala 20'an, bi gelemperî ji bo jîndariyê ye.

E. L. Thrdike (1874-1949), psîkologê amerîkî ye. Li ser mijara jihevderxistina probleman, pîvana zêhn, bidûketin, cihêketina kesan û pêwendiyên sekiniye. Bi nêzîktêdayîn û feraseteke nû, pêvajoya hindekarî û perwerdehiyê bi pêş xistiye.

George Krschenstener (1854-1932), hêvojerêkî alman e. Bal kişandiyê ser pêwîstiya perwerdehiya di nav kar de ya zarok û ciwanan. Li gorî George Krschenstener, zarok zanîne di nav xebat û daneçêkirinan de bi awayekî mayînde hîn dibin û bi vî awayî jî zanîna nayên jibîrkirin. Ew li dijî zanîna jiberkirinê ye, ew dixwaze ku hindekarî di nav kar de pêk bê.

John Dewey (1856-1952), hêvojerêkî welê ye ku di sedsala xwe de ji tetbîqkirina perwerdehî û hindekariya nûjen re rê vekiriyê. Dewey, demeke dûvedirej bandoreke pir mezin li ser perwerdehî û hindekariyê hiştiye. Dewey, di sala 1896'an de li Şikagoyê bi jina xwe re dibistanek vekiriyê û ev dibistana wek laboratuwarekê bi kar

aniye. Taybetmendiya vê dibistanê ew e ku, di dibistanê de dem û bername nîn e. Dewey bernameyeke aktîv pêk aniye, li gorî vê bernameyê zarok dê li dibistanan bi gengeşî, ger, çavdêrî, listok, çîrok û vegotinê pewerde bibin.

Dawey di xebatên xwe yên perwerdehî û hindekariyê de metodolojî jî bi pêş xistiye. Wî metodolojiya çareserkirina probleman, azîna herî baş dîtîye û bi kar aniye.

John Dewey xala herî balkêş ya ku li ser sekiniye, xala ji bo demokrasiya perwerdehiyê ye. Demokrasi, ji bo tekîldariya xwendekaran û ji bo pêşveçûna perwerdehiyê, mercê yekemîn dîtîye. Dawey dibêje, ji bo ku xwendekar di dibistanan de xwe bi rê ve bibin, plansazî û bername pêwîst in ku bo tevlêbûna xwendekaran bên çêkin.

Di dîrokê de demeke dirêj li ser hindekarî û perwerdehiyê hatiye rawestandî, xebatên bêhempa hatine kirin û kedekê mezin di ber wan de hatina dayîn. Ramanger, zanyar û feylesofan jiyê (emrê) xwe daye vê xebata birûmet. Loma jî ev qas berhem tomar bûne û heya roja me hatine. Em ên ku îro di qada perwerdehî û hindekariyê de dixebitin û mamostetiyê dikin, ji ber xebatên van xebatkarên hindekarî û perwerdehiyê, em spasdarên wan in. Ji ber ku di wanedayîne (dersdayîne) de rêgezan (prensîban) li ser çend beşên jêrê dabaş kirine.

- Zanîna hindekariyê
- Rêgezên hindekariyê
- Di hindekariyê de stratejî,
- azîna û teknîk
- Plankirina hindekariyê
- Bernameyên hindekariyê û

tetbîqkirina van bernameyan  
- Tekûzkirina nêvengên  
(meydanên) hîndekariyê  
- Nirxandina hîndekariyê.

Ev hêmanên girîng ên hîndekariyê bi destê van zanyar û pisporan hatine birêkûpêkkirin. Bi gotineke din û bi nêrîneke cihê, ev zanyar û pisporên ku mora xwe li dîroka hîndekarî û zanyariya perwerdehiyê xistine, hemû jî mamoste ne; yanî dîroka pêşveçûna hîndekarî û perwerdehiyê bi destê masmoteyan hatiye honandin û geş bûye. Ji ber ku li vir qala mamostetiyê hat kirin, ez dixwazim li ser mamostetiyê hûr bibim û çend gotinan bibêjim.

Şarezayîbûn û girêdayîbûn a di karê xwe ve; riya serkeftina mamosteyan e. Ji ber ku di hîndekarî û perwerdehiyê de mamoste xwediyê erka sereke ye. Gava ku hêmanên hîndekariyê tîr dahûrandin, mamoste di xala yekem de cih digire. Loma jî, di hîndekarî û perwerdehiyê de serkeftin û pêşveçûna xwendekaran girêdayî zanabûna mamosteyan e.

Li dibistanan plansaziya çalakîyên hîndekariyê, amadekirina nêvenga fizîkî, pêkanîna amûr û ambûrînan, tetbîqkirin û pêkanîna çalakîyên hîndekariyê û nirxandina wanedanê, gihandina nîfşên zana, jêhatî, çêker û afirîner jî, karên mamosteyan e. Ji bo têgihîştin û hîndekariyê ev qas peywirdarî û berpirsiyarî, liigel girîngiya qedr û qîmetdayîna mamosteyan, bi awayekî baş têgihîştandina mamosteyan jî tîr rojevê. Ji ber ku mamosteyên baş têgihîştî dê bikaribin mirovên têrtîsî bigihînin. Têgihîştina mirovên biwesf jî, tê-

gihîştina civakeke şareza pêk tîne.

Bi avahiya dibistaneke pir baş re şadbûn, şadbûna bi karxaneyaya keviran re ye. Lê belê dibistaneke mamosteyên wê baş hatine perwerdekirin, dibistaneke baş tê hesibandin. Der heqê dibistanekê de biryardayîn, biryardayîna der heqê mamosteyan de ye. Başbûna mamosteyan, wekî başbûna dibistanê jî tê hesibandin. Hemû pişekarî li gorî banê xwe zanîneke taybet a şarezahîyan û teknîkan dixwaze.

Mamostetî jî ji bo pêkanîna hîndekarî û perwerdehiyê serketî, divê xwediyê çandêke gelemperî, zanîneke nêvengî ya kûr û dorfirêh û ji bo pişekariya beşa xwe jî, divê xwedî zanîna şarezayî û teknîkan be.

Mamostetî, pişekariyê taybet a pisporiyê ye. Ji bo vî qasî jî gihandina mamosteyan pêwîst e ku di qada herî bilind de, bi awayekî bijûn li ser van sê xalên girîng kuta bibe:

1) Zanîna nêvengî, 2) çandêke gelemperî û 3) zanîna pişekariya mamostetiyê ya ji bo formasyonê.

Nemaze divê ku pişekariya mamostetiyê xwediyê hin teferrûat û hostatiyan be jî. Ji ber ku amûr û alavên ragihandinê yê ku di qada hîndekarî û perwerdehiyê de tîr bikaranîn, ji aliyê din ve jî pêşketinên teknolojîk, berpirsî û karê mamosteyan jî hê ew qas girantir dike. Mamoste dê ji van alav û amûran çî qas û bi çî awayî bikaribe sûd wergire û di hîndekariyê de bi kar bîne?

Di dinyaya îroyîn de, hemû tişt bi awayekî berdeyamî û bi

lezgînî tîr guhartin. Lê tu kes nikare bi awayekî serhişkî li ber vê çerxa guherînê bisekine. Pêşketinên zanistî, teknolojîk û civakî, bi lez û bez bi pêş ve diçin. Mirovekî sade jî li gorî demboriyê, hîn zêde bi pêdiviyên zanîn û pisporiyên re, rû bi rû dimîne.

Li aliyekî din, mirov dikare bibêje ku gel û welatên bi pêşketine, pêşketina wan jî girêdayî mirovên wesfdar in. Lê hêza mirovên wesfdar jî girêdayî hîndekarî û perwerdehiya biwesf e. Zanîn û hînbûn (hîndekarî û zanîn) di jiyana civak û mirovan de, beşeke herî girîng e, nemaze gava ku ev beşa girîng tê hilsengandin, hewce ye ku têgih bi awayekî baldarî bîr ravekirin. Heke ev mijar, nemaze nîqaşeke li ser çand, wêje, perwerdehî û hîndekariya gel be, wê demê bandora mijarê hê jî hêjatir dibe. Ev jî bi xwe re du car fikirînê tîne. Ji ber ku hemû gelê dinyayê ji bo pêşketinan, neteweya xwe di nav beroşa çand, wêje, hîndekarî û perwerdehiyê de, li gorî armanc û berjewendiyên xwe bi awayekî bijûndar pijandiye. Ji ber vî qasî jî, gava ku hîndekarî û perwerdehî tê pêşnûmakirin, pêwîst e ku hewldan di nav asta herî bilind de be. Bi taybetî ji bo şarezahiyê, zanîna hîndekarî û perwerdehiyê çî qas cihekî girîng bigire, pêwîstiya dîroka zanîna hîndekariyê jî, cihekî ew qas girîng digire.

Zanîna hîndekariyê, piştî xebatên zehmet û dîr û dirêj a bi sedsalan dom kiriye û ancax hatiye rewşa xwe ya îroyîn. Ji bo pêşketina zanîna hîndekariyê jî, gelek zanyar û ramangeran ke- da xwe daye.

# Çavdêriyên min ên li ser Aspeşînê

Yaşar Eroğlu

Dema ku ez ji bo hevpeyvînê çûme Aspeşîna Wanê, serê meha sermawezê ya payîza dereng bû. Li gorî demsalê he-wayeke xweş, rojêke germ û çê, li ser Wanê û Aspeşînê danîbû. Dema ku ez, rêberê me Halîl Hanay û zimanzanê zimanê ûrartûyî Mehmet Kuşman bi trambêlê bi rê ketin, min dizanibû ku em ê ber bi dilê dîrokeke kevnar ve derkevîne rêwîtiyêke biheyecan, lê min nizanibû dê çi derkeve pêşya min. Ev rêwîtiya min a Aspeşînê (Çavuştepe) ya yekem bû.

Wekî ku em derketin nav dilê dîroka kevnar tiştêkî ku me bigota ku ev der balkêş e yekser li ber çavên me peyde nebû. Jixwe her tiştên wê dîrokê jî di nav vebalkêşiyê de veşartî bû. Em her çûn, me ew rastî dît û wek anekdot qeydî kasetê xwe kir. Bi rastî jî ne şingêşinga şûr, ne şehîna hespan, ne jî rimîniya dergehane hebû, lê mirov gava li rîya pêşberî xwe dinêrî, rastiya serdema îroyîn bi çavên zelal didît ku wa ye bêhesp, bêşûr artêşeke nûjen a tirkî bi tank, bi top û bi silahên din, bi dehan erebeyên bizirx, bêzirx jî sînore ku ji bo operasyonan çûbûn, lê ji wir vegeyabûn nalên xwe dibiriqandin û posîde dihatin.

Rastiya îro û rastiya 30 000 sal beriya îro, mirov xirbeyên Ûrartû û rastiya îroyîn dibîne, bivê nevê mirov xemgîn dibe. Ez ê di vebalkêşiyê de çavdê-

riyên xwe yê Aspeşînê yê dîroka kevnar a Ûrartûyan wek notan raxim ber we.

Berî her tiştî mirov li ser kela ku di nav wê deştê de bilind dibe û ji ber bêxwedîtiyê heybeta wê ruxiyaye, mirovekî bi qasî wê kelê wek peykerekî zindî Mehmet Kuşman dibîne. 40 sal in bi vê re bûye yek. Kî diçe tê salox dide, dide nasîn û bi zîmanê ûrartûyî bêcîrîyayî siyê li ser dîrokê radike û li ber çavan zelal dike. Ji vê dîrokê jî kurdan re xirbeyek maye (ew jî ne tam), yek jî Mehmet Kuşman. Xirbe û kavil, malê dîrokê ye lê ew zindî ye û şanaziyeke me ye ku hîn jî li ber çavan e.

Pîr tişt hene ku em binivîsin, lê nivîsa ku li ser kevirên bazalt bi zîmanê ûrartûyî hatiye nivîsandin û edî divê mirov wek nasnameya şaristaniya wê kelê bi dilrihetî qebûl bike, heye ku ez ê ji wê dest pê bikim. Bi zîmanê ûrartûyî û bi wergera wê ya kurdî wiha ye:

“Dîngir îrmûşînî ayniyê sûsînî a Sersûrî îşe Argîştînî, îvlû adniye fî mentûyînî ye Serdûrî şe aliye. Îş tiynîşe bî maû dîngir Xaldî. Eştiye şîdî maûla meş eba îye dîngir Xaldî



şe eba û gûgûniye. Rî bû şeştî bî maû a eştiye şîla. Eba eşnûme şîdî maû eba eştiye Serdûrî hî-nîlî. Bî ma eş bû ûla Argîştînîni şe bî maû. Eştiyenî bî maû Argîştî şebî ma eştiye Tûşba î-nîne. Dîngir Xaldî bîma ûla bîaîni şe. Eştîşe bîma ûla me. Ferdîşe bîma û eş bîma ûla eba eştiye lê. Dîngir Xaldîni eba men ku ra naniyer.

*(Serdûriyê kurê Argîştînî li vir, ji bo xwedawendê xwe Îrmûşînî perestgehek çêkiriye. Qralê Serdûrî dibêje li vir tiştêk tune bû, çiya bû. Bi îzna Xaldî min li vir navenda eyaletê çêkir. Min bi îzna Xaldî ev navên xweş evên berê, min ji Çemê Gûgûnê heta vir cokên avê anîne. Min bi vê avê rez, bax û bajarekî spehî çêkiriye. Min navê xwe lê kiriye Bajare Serdûrî ye. Ev hemû jî min ji bo bavê xwe*

*Argîştîni çêkirine. Bavê min qralê Tûşbayê bû. Min ji ber vê yekê çêkiriye. Bi îzna xwedê bavê min efendiye tev Bîaniyan bûye. Hemû jî min çêkirine. Piştî çêkirina min a van eseran, yê ku xera bike, yê zerarê bidê û îmha bike, xwedayê Xaldî wan bikuje, li ber tavê bişewitîne, belayê bîne ber wan.)*

Ev agahiyên em didin tev ji yên ku Mehmed Kuşman dane me ne. Em der barê jiyana şaristaniya Ûrartûyan ya civakî, aborî, çandî, siyasî de gihîştine tiştên balkêş.

Dewleta Ûrartûyan beriya zayînê di sala 850-40'an de ava bûye. Ûrartû ji xwe re dibêjin Bîanînî, navê Ûrartû jî, ji binavkirîna Asûran maye. Heft eyaletên wan hene, ji aliyê girîngiyê ve di rêza sisêyan de Aspeşîn tê. Ûrartû ne dewleteke şerkar bûye. Giranî daye hilberîna çandiniyê, pişeyên destan, cihok, bendav û hwd. Aliyê wan ê manewî xurt e. Dewleteke pirxwedayî ye. Xwedayên her tiştên girîng bi serê xwe ne. Xwedayê herî mezin Xaldî ye. Xaldî li her eyaletê, li ser her tiştî tê temsîlîkirin.

Ûrartûyan alfabeya xwe jî çêkiriye û wan ev alfabe jî, ji Asûran girtiye û li gorî zimanê xwe tîpên we li hev anîne. Bi riya vê alfabeyê li ser kevirên bazalt kîtabe nivîsîne û wan pê şaristaniya xwe mayînde û nemir kiriye. Ew kîtabeya ku me di nav nivîsê de da jî vê rastiyê dide xuyakirin.

Navendên dewletê û cihên rêvebirina wê kel in. Kel, li gorî ewlehî û parastina dewletê, li cihên stratejîk hatine avakirin. Bilind in, kes nikare bigihîje wan. Gel ji navenda dewletê dûrtir û di deştan de dijî. Kel cihê parastîne ne, lê di heman demê de stargeh in jî. Di dema şer de her kesên li gorî dewletê girîng ini di kelê de kom dibin. Ji ber wan sedaman, kel depo ne û cihê hilberîne ne jî.

Sîleh, muhîmat li wir çêbûne. Genim û pêdiviyên din li vir hatine stokkirin. Bi dehan depo hene ku belkî hê jî genim tê de heye. Dema Medan kel rûxandine û şewitandine, agir berdane depoyên genim jî. Ji çalekê Mehmet Kuşman bi xwe genimê şewitandî derxist û min bi çavên xwe dît û wêne jî kişand.

Bi dehan sarincên mezin ên avê hene.

Di nav kelê de haremî û selamî heye. Temîz û paqij in. Hemamên wan, metbex û cihên ku dehiyan (adak) lê şerjê dikin hene. Kelên herî girîng Wan, Topra kale, Aspeşîn û yên din li pey wan tên.

Heft heb eyaletên wê hene: Adilcewaz, Aspeşîn, Xerpût, li Sûriyeyê yek, li Îraqê didu, yek jî li Ermenîstanê ye. Waliyên leşkerî, serekên wan in. Çandîniyê didin kirin, bacê kom dikin û dema şer çêbe leşkeran ber hev dikin.

Cografyaya Aspeşînê pir bi dar û ber bûye. Ji wir heta Dicleyê jî bo ku leşker rihet bimeşin dar hatine birîn.

Îro di muzexaneyê Wanê de 51 hezar berhemên Ûrartûyan hene.

Kela Aspeşînê êdî xerabe ye. Hindik tişt ji wê kela kevnar mane. Mirov li resmê wê yê berê yê temsîlî dinêre pir mihteşem e. Ew kel, bi çar hezar kevirên mezin hatiye çêkirin, îro jî xerabe û bêxwedî hatiye hiştin. Dewlet lê xwedî dernakeve, mîna pir kel û avahiyên dîrokî yên din. Aspeşîn tenê bi çavdêrî û parastina Mehmet Kuşman li hemberî xwezayê û civakê li ber xwe dide.

Piştî van daxuyaniyan îcar ez dixwazim bersivên ku birêz Mehmet Kuşman dan pirsên me pêşkêş bikim. Lê divê ku ez der barê zimanê Mehmet Kuşman de tiştêkî girîng diyar bikim. Digel ku me pê re bi kurmancî hevpeyvîna xwe kir jî, lê belê zimanê wî têra xwe di bin bandora zimanê tirkî de mabû. Ji ber vê rewşê em neçar man ku hinekî têkîlî zimanî wî bibin.



Dema êrîş li Kela Aspeşînê bûne, embarên genim jî hatine şewitandin.



*Hevpeyvîn bi Mehmet Kuşman re*

## Dîroka Şaristaniyeke Kevnare; Ûrartû

*Mamoste em wek kovara Zendê ya Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê dixwazin bi we re der barê Ûrartûyan û zimanê wan de hevpeyvînekê bikin. Beriya ku em bihatana hevpeyvînê, me der barê we de lêkolîneke biçûk kir. Gelek kes û saziyên ku li ser Ûrartûyan lêkolîn û xebatan dikin, behsa we dikin. Hûn ji 35 kesên ku li ser Ûrartûyan dixebitin û zimanê wan dizanin yek in.*

M. Kuşman - 38 in.

Belê min 35 derxistibû. Serê pêşîn em we nas bikin; kî ye Mehmet Kuşman?

Navê Min Mehmet Kuşman e. Ez di sala 1940'î de, li gundê Aspeşînê (Çavuştepe) ku bi ser Payîzavayê (Gurpinarê) ve ye hatime dinyayê. Min dibistana seretayî li gundê xwe xwend. Piştî wê ez çûme eskeriyê. Di sala 1962'yan de terhîs bûm. Wê gavê di gundê me de vedan û kolanên li ser Aspeşînê dibûn. Unîversîteya Stenbolê ev kar dikir. Ez jî tevî vê xebatê bûm. Herhal profesor ez hinekî cesûr dîtîm ku ez hemen kirim hostayê freskan. Fresk min derxistin. Sala din jî profesor çû Wanê hat, gote min 'Tu beqçî yî'. Min got: "Xoce, hê min dilekçe nedaye, miracat nekirîye". Keniya got: "Min li şûna te dilekçe jî daye, min sexte îmze jî kirîye, tu beqçî yî." Min got, "Baş e, lê ez ê çi bistînim?" Got: "Meha te 240 panot e. Ji wî pereyî wê 60 panot bê birîn, 190 panot wê bigihîje destê te." Min qebûl kir. Ez ji 1965'an bi vir de heta niha beqçî me. Ha tu

yê bêjî ev kar ji te re çawa bû meraq!

*Belê sihetxweş. Pirsra me ya di dorê de jî heman ev pirs e.*

Di van vedan û kolanên de kîtabe derdîketin, tablet derdîketin, kevirên binivîs (berdenûs) derdîketin. Ew ne branşa Xoce bû, ya Asli Erzen. Dema materyal derketana Profesor Emîn Bîlgîç ji Enqereyê dihat, wî dixwend. Rojekê dîsa materyalek derket. Ji asîstanê xwe re got: "Em kê bînin?" Wî got: "Em her tîm Emîn Bîlgîç tînin şerm e, eyb e." Wî çaxî jî telefona tune, ya bêrikê tune, tenê telefona bimanyeto heye. Hê neanî, got: "Ev wiha çênabe, gere yek hebe filan"... Ez jî hê xort bûm. Min digot qey profesor her tiştî dizanin yanî tip jî tê de tev her branşan dizanin. Bawerîya min ev bû. Min got: "Xoce tu nizanî?" Got: "Na, nizanî." Min ji wî re got: "Belê, çima nizanî?" Wî got: "Ne branşa min e." Tabî hinekî hêrs bû. Min jî got: "Xoce, gelo ez nikarim hîn bibim?" Ji min re got: "De wê de here lo!" Bi vê gotinê ez qehirîm, bi min zor hat. Min got: "Ez ê ji bo hînbûna wê hewl bidim."

Çend heb asîstanên wî hebûn, min ji wan re got: "Hînbûna wê pir zehmet e?" Wan got: "Weleh tu hewl bidî ew qas ne zehmet e, hewl nedî helbet zehmet e." Ez bi vir de, wê de bi kîtaban, min navê Xaldî,



Xaldî, Xwedayê Ûrartûyan ê herî mezin

navê Teîşaba, Şîdîdî, navên qralan, qralîçeyan min derxistin lê ne bes bûn. Ez çûm Enqereyê, Stenbolê. Li Stenbolê nasekî min hebû, niha dekan e, li Fakulteya Edebiyatê ye. Wî alfabekeke biçûk da min. Got: "Hemû jî ji vî cureyî ne. Tu dikarî temam bikî." Min jî ew anî temam kir, alfabe çêkir û bi hemû zanistên dinyayê da qebûlkirin. Lê ez nizanîm çi dibêje, min pir zehmet bi wê dît. Ez dixwazim pere qezenc bikim.

Min pirsî, gotin li Stenbolê, li Beyazîdê lugatên Çeçenînguşan hene, tu karî yekê peyda bikî. Min yek peyda kir. Nêzikî 300 peyvî min jê feyde dît. Piştî wê ez rojekê hatim, dîsa vedan û kolana dom dikir. Kîtabeyek derket. Profesor gote asîstanê xwe: "Em vê bi kê bidine xwendin?" Asîstan lê vegerand got: "Em bi Mehmet Kuşman bidin xwendin." Gote min: "Tu dizanî bixwîni?" Min jî got: "Xoce, tê bîra te, beriya 15 salan pirseke min a bi vî awayî çêbû, lê we azar dabû min." Keniya û şekirek da min. Min dest pê kir xwend. Ji wê rojê bi vir de ez dixwînim. Lê min nihêrî pere qezenc nake, min jî dest bi verojîyê (heqaqî)

kir. Di verojyê de min karibû ez hemû zarokên xwe bidim xwendin. Min ji xwe re erebe kirî, avahî kirî, muafiq bûm.

Îcar diçime sempozyûman, genel mudurlug (miduriyeta giştî) me dixwaze. Di wextê sempozyûman de em tevî dibin, tiştên xwe radixin, difiroşin. Ewên ku nivîsa bizmarî ya Êrtartûyan dizanin bi wan re eleqedar dibin.

*Em ji we hinekî berfireh dikarin der barê Êrtartûyan de agahiyan wergirin? Helbet hûn bi salan e di nav vê xebatê de ne û gihîştine pir belge û vedanan. Êrtartûyî kî ne?*

Li Doxu Anadolîyê (Anatoliya Rojhilat) berî Êrtartûyan, Hûrî û dewleta Huriyan hebûye. Dema dewleta Huriyan belav bûye, mirovên ku ji wê dewletê mane çûne di bin serwêriya Asûran de cih girtine. Asûran her tim li wan zilm û tehdeyî kirine. Ew parçe bûne. Ji wan re naîrî hatiye gotin, begîtîyên biçûk. Di wê navberê de ji ber çî ye nizamî; eger xela, eger nexweşî be ji Transkafkasyayê mirovan kom bi kom koç kirine û hatine vê derê û tevî wan welatîyên Naîrî bûne. Beriya zayînê di salên 850-40'an de bi navê Aramo mirovekî zîrek û hişyar ew begîtîyên naîrî tev li dora xwe kom kirine û gotiye: "Werin em jî ji xwe re dewletekê ava bikin û li hemberî Asûrên dijminê me, em li ber xwe bidin." Ev pêşniyara wî tê qebûkkirin. Aramo dibe qral, Kela Wanê bi navê Tuşba dibe paytext. Bi wî awayî dewleta Êrtartûyan tê avakirin. Dewleta Êrtartûyan hinga qayet biçûk bûye. Di navbera Gola Wanê,

Gola Sêwanê û Gola Urmîyeyê de, yanî di wî sêgoşeyî de dewleta Êrtartûyan ava dibe.

Mirovên Êrtartûyî pir xebatkar bûne, zehf zana bûne. Wan qîmet daye ser xwedîkirina heywanan û zîraetê; çêkirina keleyan, qanalên avê, bend, çêkirina sîlahan, sinetên bi destan; di van hemû waran de jî dewlet û mirovên wê serketî bûne. Çêkirine, fîrotine, dewletên cîran û dewleta xwe mezin kirine. Dewleta wan heta beriya zayînê (BZ) 612'an dom kiriye.

*Yanî heta Medan?*

Erê, BZ, di 612'an de, di Rojhilat de Med, Kîmer û Îskîtan bi hev re îtîfaq danîne, bûne yek û medeniyeta Êrtartûyan ji navê rakirine. Hemû cih û warên wan şewitandine. Piştî du sed salî dewleta Medan dom kiriye, lê dîsa bi sedemeke ku nayê zanîn vekîşiyaye Îranê. Êrtartû jî ji holê rabûne.

Ji me re jî Êrtartûyan çî maye? A niha jî mirov ji bendên wan, ji qanalên wan sûtê werdigirin. Bi berhemên wan muzexane hene. Di Rojhilata Anatoliyê de muzexane hemû bi berhemên wan tijî ne. Em zehf

spasiyên xwe pêşkêşî Êrtartûyan dikin.

*Hûn dikarin hin taybetiyên dewleta Êrtartûyan me bidine nasîn? Mesela Êrtartû bi leşkeriya xwe an bi hilberîna xwe yan jî bi çiyên xwe tén naskirin?*

Ordiya Êrtartûyan heye. Qraliyet heye. Piştî qraliyetê heft heb eyaletên wê hene. Nêzikî çil hebî jî kelayên wê hene. Dema herb derdikeve waliyên eyaletan hem bacê ber hev dikin hem jî leşkeran. Em tê derdixin ku wek mîlîsan, wek qoruciyên tirkên ên niha ne.

*Wextê em li kelê digeriyan we behsa paqîjiya wan dikir; Asûr bi rî bûne, ew bi riyê kurkirî?*

Mirov tê digihîje ku miletekî temîz û paqîj bûye. Îşên wan çawa temîz bûne bedena wan jî temîz bûye. Di wextê wan de tuwalet jî hatiye bikaranîn. Di 2005'an de hê jî li derûdorên me gund hene qet di yekî de jî tuwalet tune ye. Li derve vî karî pêk tînin. 2700 sal yanî 27 asiran pêşiya niha wan tuwalet zanibûye. Mirov dizane ku temîz in.



Li ser kevirên bazalt kitabeya Serdûriyê kurê Argîştîni



*Belê jiyana wan a din çawa bûye?*

Libasên wan temam bi hiriyê hatine çêkirin. Hirî honandine. Dezgehên wan ên honandinê hebûne. Di kelayan de em pir rastî hestiyên heywanan tên. Em dikarin bibêjin ku mirovên ûrartûyî gelek goştخور bûne, goşt mezaxtine.

*Di jiyana te ya rojane de tiştêkî balkêş ku tu lê rast hatibî heye, hebe çi ye?*

Tiştên ku em di vedanan de çavdêrî dikin ev in. A din her kes di zeviyên xwe de bûye, bi îşê xwe ve bûye, bi ziraeta xwe ve bûye. Jixwe cihên vedanan, cihên dewletê ne. Xelq li vir na, dûrî vir jiyaye.

*Hûn rastî şopa koletiyê hatin, ev emare hatine dîtîn?*

Ez bi qethî bibêjim koletî di nav Êrartûyan de tune ye. Dari-zandin jî tune ye. Tu kes heqaretê li kesî nake. Ji bo wê jî mahkeme tune ye. Mirov tê derdixe

ku zehf tabî'ê dewlata xwe ne.

*Baweriyên wan çi ne? Xweda û xwedawendên wan hene?*

Êrartû, xalidî ne. 63 an jî 64 xwedayên wan hene. Ji wan 3 heb, ên bi giştî ne. Xwedayên mezin in. Ew kî ne? Yek Xaldî ye, xwedayê dewletê û yê şer e. Ê duyemîn Teîşeba ye, xwedayê bahoze ye. Yê sêyemîn Şidînî ye, xwedayê rojê ye. Ew xwedayên din êdî hemû yên biçûk in. Mesela xwedayê rîyan, xwedayê giran, ê çîyan, ê daristanan, xwedayê behran, xwedayê zevîyan, ê bereketê û didome. Her tiştêkî xwedayekî wî heye.

*Belê simbolên wan çi ne? Bi kevîran çêkirine, çi çêkirine?*

Simbolên Êrartûyan çar hebin. Yek şêr e, yek mar e, yek dûpişk e, yek jî baz e. Dirinde û jehrî, çar simbol ev in.

*Bala me kişand, em rastî peykeran nehatin. Gelo sedema vê yekê çi ye?*

Erê rast e. Di şaristaniya Êrartûyan de peyker tune ne, di ya Asûran de heye. Bi qethî tu peykeran nabîni. Ancax li ser mortal û kimzirxan (mîxfer) resmê qralên xwe, xwedayên xwe bi xetan xêz kirine. Ji bilî wê tiştêk nîn e. Lê xişrên wan qayet rind in. Berî her tiştî wan aqîq bi kar aniye. Jinên wan bidilê te xişir bi kar anîne. Zêr, bronz, aqîq di rewacê de ne. Ziv di wextê wan de hindik e.

*Di vê herêma Rojhilata Navîn û di Mezopotamyayê de hesp hatiye kedîkirin. Girîngiya hêsp di nav Êrartûyan de heye? Hesp çawan tê dîtîn, cihê hêsp çi ye?*

Tabî, hesp ajaleke pîroz e. Di heman demê de jî xelaskar e. Jixwe hemû herb, dawê û doz li ser piştê hêsp hatine kirin. Hesp pir binirx e. Hesp mîna tanqekê, mîna topekê, teyarekê biqîmet e.

*Qralan girîngiya hespan çawan diyar kiriyê? We behsa tablêtên ku li ser hespan e, dikir.*

Rojekê qral hêza xwe ber hev dike, dibêje ez ê herim ser dijminê mezin Asûr, evda xwe jê vekim. Di kîtabeyan de dîni-vîse, dibêje min çil gundên wî xira kirin. Min di newalan de xwîn mîna avê herikand. Ew qas zeîyet da wan; 25 hezar pez, 8 hezar dewar talan kirin. Di vê êrişê de talana herî girîng tam heft heb hesp in ku min ji wan bi dest xistin. Mirov difikire ku talana heft hespan li aliyekî, talana din tev jî li aliyekî tê dîtîn, ev rastiya girîngiya hêsp radixe ber çavan.

*We behsa kincên wan dikir.*

Cilên wan, mirov bi xêzên wan dinêre ferq dike ku zehf nêzikî azeriyan e. Dişibe wan. Milên wan qol in. Navtenga wan teng e, pêşa wan fireh e.

*Mamoste em dixwazin hinekî jî taybetiyên zimanê Êrartûyan hîn bibin. Zimanê Êrartûyan zehmet bû, astengên wî hebûn? Tu çawan hînî wî zimanî bûyî?*

Belê zehmet bû. Min bê mamoste xwe gihand. Lê niha zehmet nîn e. Wextê mamoste hebe zehf hêsan e.

*We, ew çawan deşifre kirin? Metodeke we hebû?*

Qet tişteki min tune bû. Gotina ku wî profesori ji min re got, bi min giran hat. Ez memnûn im jî, ji ber ku bi min giran hatiye. Jixwe giran nehata min dest pê nedikir. Min dest bi vî karî kir. Piştî wê min herfên wê çêkirin, hece çêkirin. Li Stenbolê jî asistanek hebû, alfabe-yeke biçûk da min. Ji wê min sûd wergirt. Min alfabe damezîrand û min bi hemû zanyarên dinyayê da qebûl kirin. Ew alfabe ku we îro dît, ew e.

*Alfabe ya Êrartûyan çend tîpên wê hene?*

Eynî jî ya Asûran e. A Asûran 80 hebin. A Êrartûyan 62 herf in, ji wan 3 heb nayên bikaranîn. Mîna ya tirkan çawan ku herfa "j"yê zêde nayê bikaranîn, wisan e. Qa, qî, qû ew kêmtên xebitandin. Ji ber vê yekê 59 heb tîpên naskirin. Hece ne. 5 hebên wê dengdêr in: a, e, î, û, ü: Ew bi serê xwe

ne. Ên mayî dengdar in û hece ne; ba, be, bî, da, de, dî, ga, ge, gî, ha, he, hî, ka, ke, kî, la, le, lî, ma, me, mo, na, nî, nû, pa, pî, pu, ra, rî, rû, ar, îr, sa, sî, sû, şa, şî, îş, te, tî, tû, at, et, za, ze, zî. Tîpên wan ev in, hece ev in. Peyv bi van tîpên çêkirin.

*Di alfabe ya Êrartûyan de kîjan tîp tune ne?*

Ev tîpên ku min ji we re gotin, ev temam jî tîpên xwendin. Lê di zimanê Êrartûyan de mîna yê tirkan, mîna yê ereban şert nîn e ku yekî dengdêr bikeve nav du dengdaran û bîrêdan.

*Çawan tê girêdan?*

Mesela "haldî", du hep hece ne; "ha-danî-dî". Nayêne nav ya dengdêr. "Serdûrî", "ardîştî", "menûa", "wûsa", ev temam wisan dibin.

*Hîn tîpên ku dengê wan di zimanê kurdî, tirkî, erebî de hene lê yê di alfabe ya Êrartûyan de tune ne, hene?*

Belê, gelek in. Di alfabe ya asûran de c, ç, f, g, o, ö, û, yî hene, lê di ya Êrartûyî de nîn in. Ji ber ku zimanê wan diguhere. Zimanê asûriyan di malbata semîtîk de cih digire. Yê Êrartûyan jî di koma Transkafkasan de cih digire.

*Wek me berê jî gotibû, em dixwazin hîn taybetiyên zimanê Êrartûyan fêr bibin. Ji bo vê yekê jî em dê hîn hevokan bipirsîn. Beramberiya wan bi zimanê Êrartûyî hîn bibêjin. Navê min, te, wî, wan çi ye? Nav çawan tê pirsîn?*

Nav naguhere, eynî ye. Navê çiya eynî ne. Deşt, bajar û mirov eynî ye. Nav tu wext naguhêrin, sifata naguhêrin.

*Yanî tu bibêji "navê te çi ye?" tu dê çawan bibêji?*

Meştî şe la? Yanê navê te çi ye.

*Navê wî çi ye*

Meştî şu a?

*Navê wan çi ye?*

Meştî şe a (şî a, me da) diguhere wisan. Di fiilan de jî diguhere. Tabî fiil ne ez, tu profesora jî hemûyan nizanin. Hîn jî bi qasî ku têrê bike, zimanê Êrartûyan deşifre nebûye. Ancax, di kolan û vedanan de kîtabe derkevin. Di çavkaniyên asûran de jî qet behsa Êrartûyan neyê kirin. Neheqîyeke dikin. Ji ber ku dijminên hev in, diviya behs bikirana. Hemû çavkaniyên Êrartûyan di kîtabeyên asûran de nivîsine.

*Ez çûme malê, ez diçim malê. Çawan tîpên gotin?*

Meştî şî ka (yanî Ez diçim malê).

*Ez çûm malê.*

Meştî şu ka.

*Ez nan dixwim."*

Meştî pa na.

*Ez nanan dixwim.*

Meştî pî nana.

*Min nan xwar.*

Mî pa şî.

*Mesela em bibêjin: Mala min mezin e.*

Ma paştî şe lû.

*Mala te mezin e.*

Meştî şîla.

*Mala wî mezin e*

Ez wê nizanîm. Nayê bîra min.

*Mala wan mezin e*

Meştî ural la şe. (Mala wan zahf mezin e)

*Emrê min zêde ye*

Eş tî şe ma bîma îla, Eş tî şe ma bî ma ula. Ez mirovekî ex-tiyar im (mezin im).

*Ez ciwan im.*

Meş tî şema bî ma rîye.

*Ez bav im.*

Meştî şe la hî.

*Birayê min, xwişka min” çawan tèn gotin? Berê ‘birayê min.’*

Îş tî şa be (birayê min.) Îş tî ma şa be (xwişka min). Yanî na-şibe yê ermeniyar jî. Gelek ermeniyar xwend, wan got naşibe zimanê me.

*Ez dê pîrsekê bikim. Hevokê bibêjim. Dixwazim ku hevoksa-zîya vî zimanî hîn bibim. ‘Ez îro bi erebeyê diçim Wanê.’ Yan jî tu cihekî bibêje. Mesela ‘Ez îro bi hesp diçim gund.’*

Meştî şî ra (Ez îro diçim):

*Baş e, Ez bi hêsp diçim gund?*

Meştî şî çîre a.

*Wî hevalî nîşanî min bide.*

Meş ra şî şe a (wî nîşanî min bide)

*Were nên bixwe.*

Rî me tî pa.

*Di mala me de.*

Mî şî rî ha.

*Li mala me av heye.*

Me şî rî ya lû aêş.

*Ji min re bibêje.*

Miştî şî ra fi.

*Bi navê min mal çêkirine.*

Meştî şî ra ra lû eştî ye a.

*Em van peyvvan jî bipîrsin. Bav, çi ye?*

Sarî.

*Dê çi ye?*

Barî.

*Bira?*

Berarî.

*Xwişk?*

Şîrarî.

*Keç (qîz)?*

Çîzaşe.

*Hejmara heft.*

Heft tune ye. Tu kes nikare bibêje ez yekê heta dehan dikarim bijimêrim.

*Heta bîstan hejmarên tèn zanîn çi ne?*

Şî (hezar), ne (sed).

*Yek?*

Lûa.

*Didu?*

Di zimanê asûran de heye, lê di yê ûrartûyan de tune ye.

*Çiya?*

Dîlaşe.

*Baja, heye?*

Bajar tune ye.

*Çem?*

Eştîye.

*Gund?*

Navê gund tune ye, lê “cî-war” heye. Ew jî “aşe” ye. Aşe, navê civata wê ye.

*Dar?*

Yanê daristan “lûgar” e.

*Navê tenê darekî*

Lû.

*Lûgar jî daristan e, ne?*

Erê.

*Cihekî ku bi zimanê ûrartûyî perwerde dide heye? Mirov dikare bi perwerdeyê vî zimanî hîn bibe û hejmara zanayê vî zimanî zêde bike?*

Na xêr. Em têne ba hev, tu kes nikare bibêje ji 1'ê heta 10'an bêqusûr bijimêre. Yanî wiha ye, here, were filan bêvan dibe lê wekî din nabe. Hê qasî ku têrê bike nîn e ji bo zimanê ûrartûyan. Dewlet jî alîkariye nadê, millet jî tembêl e. Niha tu

bala xwe bidê, min ji te re got, di dinyayê de 38 heb kes hene ku bi zimanê ûrartûyî dizanin û yek jî ez im. Lê herî ciwan ez im, ez jî 65 salî me. Çar sal bi şûn de yek, kitek namîne, dê xelas bibe here.

*Yanî xetere heye ne?*

Xelas dibe, yanî bi vedan û kolanê êdî nayê berhevkinin.

*Li ser zimanê Ûrartûyan bêhtir kî bi te re eleqedar dibe, tên, dipirsin, lêkolînê dikin, jî miletan an jî ji kesan?*

Min çû mireceat kir, min got, qursekê vekin, bila çêbe. Kes eleqedar nebû. Dewleta Swîsreyê ji serokkomarê me re nameyekê dinivîse. Ew jî ji wezîrê çandê re, ew jî ji mudîrê giştî re, ew jî ji walî re dinivîse. Walî rojekê gazî mudîrê çandê dike, azarê didê û dibêje di wîlayeta min, di bin hîmayeya min de yekî wiha heye, çima ez nizanîm, çima serokkomarê Swîsreyê pê dizane. Wî jî gazî min kir, azar da min. Min jî got. "Tu çima azar dikî, min qebêhet nekiriye, tiştê nekiriye." Îsal halk egîtîmîyê (Saziya perwerdehiya gel) gazî min kir. Mudîr got "Were em ê qursekê çêkin," walî gazî te dike. Ez çûm ba walî, min got. "Ez êdî ji 65'an derbas bûm, pêwîst e ku êdî ez hinekî li rihetiya xwe binihêrim." Min qebûl nekir. Ji Almanyayê dixwazin, dibêjin çi qas pere dixwazî were, ji Amerîkayê dixwazin. Ji gelek dewletan dixwazin. Ji gelek welatan tên. Tenê li Rûsyayê 3 heb kes hene ku ji zimanê ûrartûyan fêhm dikin, ew nayên, ji bilî wan di dema sempozyûman de tên. Li Tirkîyê vedan û ko-

lanan jî dikin.

*Mesela, bi taybetî pîrsa çi dikin?*

Eynî mîna ku tu pîrsên ji min dikî; jiyana wan, zimanê wan, lîbasên wan, zêdetir pîrsa wan dikin.

*Koka wan bi ku ve girê didin?*

Ew mîna arkeologan nizanin. Her kes zane ku Ûrartû ji Transqafqasyayê hatine. Zimanê wan ne di nava zimanên Hîndo-Ewropayê de ye. Ew jî dizanin, her kes dizane.

*Tu di nav dîrokê de dijî, zimanê Ûrartûyan hîn bûyî, kurd î û bi kurdî re jî eleqedar î. Bi rastî tesîra vê yekê çawan li ser jiyana te, hestên te dibe?*

Mîrov tiştêkî ezîm bike, mîrov dikare bike. Ezîm tune be nikare. Tiştê ku te ezîm kir, baş çêdibe. Tu di ser serê xwe re biavêjî xêra wî îşî tune. Tu vê dipirsî?

*Na mamoste, yanî tesîra wî li ser te çi ye, hestên te çawan in*

Haa! Ez bi hezkirin dikim. Ezehf hez dikim. Li gorî wê jî

ez muwafaq bûm. Jixwe niyeta min ew nebû ku ez bibim alimê vî îşî. Min xwest tiştêkî jê bigirim û bikaribim zarokên xwe bidim xwendin. Fikra min ev bû, ez bi ser jî ketim.

*Tu van xebatan dikî, debara xwe bi çi pêk tîni?*

Ez hem peywira xwe dikim û hem jî verojîyê (oymacilixê) dikim û ji wê jî pereyan qazanc dikim. Difiroşime turistên derve û hundir. Jixwe dizanin ez li vir im. Telefon dikin. Em hev dibînin. Ez wan dibim digerrînim, kevirên xwe difiroşim. Bi wan pereyan jî zarokên xwe didim xwendin.

*Mamoste pîrsên me bi dawî bûn. Îro roja beriya cejna remezanê ye. We wextê xwe yê pir binirx ji bo me veqetand. Serê pêşîn cejna we û ya malbata we ya remezanê pîroz be. Em spasdar in ku we wextê xwe da me. Em pir kêfxweş bûn. Her wiha li ser navê Enstîtûyê û navê Zendê jî spasîyên xwe pêşkêşî we dikin.*

Heke hûn jê sûd wergirin ez ê jî memnûn bibim. Ez jî spasiya we dikim.



Kuşman bi xîrbeyên Aspeşinê xemgîn e.

# Zimanzanîn

## Adar Jîyan

Ziman, hem wekî navgîna ragihandin û pêwendiyên civakî û hem jî wekî ragira hemû cureyên zanîne, tê navandin û ravekirin. Belê digel vê yekê jî, di sînan pêdiviya zimên her gav û her demê bi zanîn û zanyariya zanistî heye. Ev jî bi dozîneya zimanzanîneke nûjen û hevgerî bi dest dikeve. Zimanzanîn (linguistik), wekî dahûrandin û lêkolîna ku zimên mîna pergaleke birêkûpêk dibîne û her wiha çawanî, bastûr, yeke û veguherînên zimên hildide dest, tê zanîn û pejjirandin.

Her çendî ku tîkiliya zimanzanîn û rêzimanîyê bi hev û din re hebe jî, ev her du zanyarî du mijarên cihê û xweser in. Em ê di vê mijarê de hinekî li ser zanyariya dozîneyî ya zimanzanîne rawestî û li gorî zimanzanîna gelemperî ya dinê cure û şaxên wê yê bingehîn hildin dest û binirxînin.

Xebat û hewldanên ku ji do heta îro li ser zimên hatine kirin û bînavber didomin, xwe dispêrin dem û domanên berê yê kevînar. Belê ev xebat û hewldanên domdar, demeke pir dirêj durrî rêbaz, teknîk û azîneyên zanistî pêk hatine. Û ev yek jî hem bêyî zanîna zimên û hem jî bêyî zimane zanîne bi awayekî

jixweber û ketberê domiyaye.

Li gorî çavkaniyên dirokî, xebat û hewldanên li ser rêzimanîyê, cara pêşîn di sedsala 5'an a Berî Zayîne (Berî Îsa bi 500 salî) li Girava Hindistanê bi mebesta zimaneke yekgirtî (standart) û tektese, dest pê kiriye. Pirtûka Panînî yê ku wekî rêzimanzanê hindî tê zanîn a ku ji *Sutra* 'yan (rêzikên kurt û puxtedar) pêk hatiye jî, wekî pirtûka rêziman a yekem tê hesibandin. Her wiha xebatên feylesofên yewnanî yê li ser zimên, cara pêşîn di sedsala 6'an de (BZ. 600 sal) dest pê dike. Xebat û hewldanên ku feylesofên yewnanî dane ber xwe bêhtir li ser cudatiya navbera zimane xwezayî û zimane civakî bûne. Belê Arîstoteles cara pêşîn dahûrandinên xwe yê li ser zimên ji felsefeya giştî vediqetîne û arasteyî rêzimanasiyê xweser dibe. Bêjeyan (peyvan) li gorî bastûra wan tesnîf dike û dinijînin.

Di dema ramanwerên stoaparêz de, dijraberiyan zimanzanîne bi tevahî ji hev tene veqetandin û cihê cihê tene navandin û watedarkirin.

Xebatên li ser zimên, di Serdema Navîn de jî bînavber didomin. Xebata ku ji hêla feyle-

sofên ku wekî koma *modistae* dihate binavkirin, yek ji van xebatan e. Li gorî van feylesofên ku wekî skolastparêz tene binavkirin, li gel pergala dinê pergaleke zimên diparêzin. Û ew jî bêhtir li ser pêwendiya navbera heyînen xwezayê û pergala zimên radiwestin û geşedaniya zimên bi nasîna xwezayê ve girê didin.

Bi ronensanê re zanyariya rêziman digihîje qonaxê nû. Û rêzimanîya spekulatîf hin bi hin ji holê radiibe. Bi dahûrandin û lêgerînên li ser zimane Ewropayê yê cîgeyî (mehelî) re, fêrbûna zimane dinê yê nû û nûjen dest pê dike.

Têgîna zimanzanîna zanistî, cara pêşîn di sedsala 19'mîn de wekî nêzikayîtedaneke nûjen ji hêla filologên demê yê ku zimên ji filolojiya kevneşop (vekolîna heyînen zimên) vediqetînin ve, derketiye holê. Lewre filolojiya klasîk (kevneşop), ji zimane heyî û rojane bêhtir, bi tekstên nivîskî yê dirokî têkildar bûye. Belê zimanzanîn, ji pêkanîna zimên bigirin heta guherîn û veguherînên ku bi demê re rûdane; ji bastûr û koka zimên (rehpeyviyê) bigirin heta awa, şewe û çawaniya zimên; ji danûstandinên navbera zima-

nên din ê bigirin heta pêwendiya navbera ziman û zanyariyên dinê... hemûyan dadihûrîne û derdixê holê.

Zimanzanîna sedsala 19'în a ku bi felsefeya dîrokî ya romantîk re pêk tê, her wiha di sedsala 20'î de jî, li ser tevahiya civak û welatên dinê hikum dike û bandoreke mezin dihêle. Di pey re jî, digel pêşveçûna zanyariya rêzimanîyê, dozîneya zanistî ya zimanzanîne jî derdixê holê. Ji hêla hin zimanzanên berê ve, dihate angaştîkirin ku "mirov, ji bo ku der û dora xwe, dinê û piştê jî xwezayê nas bike, bide navandin û nasandin, ziman afirandiye." Belê ramanwerên mîna Herder û Wilhelem, berevajî ve yekê difikirin û fikir û feraseta "mirov, xwezayê ne wekî ku dixuye dibîne; wekî ku zimanê wî/wê, xwezayê bi çi awayî nîşanî wî/wê dide, dibîne û dide navandin." Her wisan ramanwerê qirnê 20'î Humboldt jî vê ramanê diparêze û dibêje: "Mirov, bi qasî ku zanîna zimanê xwe yî zikmakî, xwezayê dibîne û dide nasandin."

Li gorî feraseta klasîk û feylesofên berê, ziman wekî pêkariyeke bêlayan a ku mirov ber bi rastîniyeke camidî (objektîf) ve dike, dihate zanîn. Belê li gorî hizirîna nû, ziman bi xwe jî raman û ramayariyekê di xwe de dihewîne û li ser rewş û jiyana mirov a civakî hikum dike.

Îcar digel ku nîqaş û geşiyên der barê pêkhatin, guherîn û veguherîne zimên hê didomin jî, îro hevgerîneke hevpar a giştî ku cure û şaxên zi-

manzanîne ji hev vediqetîne derketiye holê. Her wekî din jî, hewldan û xebatên nû yên li ser zimên ên ku li gorî zanîna û azîneyên zanistî pêk hatine, di nav xwe de wekî gelek beş û şaxên zimanzanîne hatine senifandin û her yek ji wan wekî mijareke bi serê xwe tê navandin.

Zimanzanîn, têgîneke berfireh e. Her wiha gelek beş û babetên girîng û bergêhdar di xwe de dihêwirîne û her şaxekî zanîne jî, ji hêla cure û şaxên xwe ve, cihê cihê tene kategorîzekirin.

### Cureyên Zimanzanîne

Zimanzanîn, ji hêla cureyî ve wekî sê birên bingehîn tê senifandin:

1) Zimanzanîna giştî/gelemperî

Zimanzanîna ku bi pêkhatina zimanê mirov re derketiye holê û belavbûna zimên re eleqedar e, wekî zimanzanîna giştî tê binavkirin. Zimanzanîna giştî, rêzik û rêbazên zimên dadihûrîne û taybetiyên zimên hildide dest.

Zimanzanên ku bi zimanzanîna giştî re eleqedar dibin, nemaze li ser taybetî û hêlên hevpar ên hemû zimanzanên dinê radiwestin û rewşa zimên bi awayekî giştî dadihûrînin û vedikolin.

2) Zimanzanîna taybet

Zimanzanîna taybet, tenê bi zimanekî û her wiha bi lêgerîn û dahûrandina taybetiyên vî zimanî têkildar dibe.

Zimanzanên ku bi zimanza-

nîna taybet re eleqedar dibin jî, bêhtir xêzan, zarava, devok û şeweyên wî zimanî vedikolin û li ser pêkhatin, geşedanî, guherîn û veguherînen vî zimanî hûr dibin. Ji bo nimûne, zanîna dîroka pêkhatina zimên, erdnîgarî, herêm, cudatî û şeweyên zimên hemû di vê cureyê de cih digirin.

3) Zimanzanîna rûberî/hevberî

Zimanzanîna rûberî, du zimanzanên cihê rûberî hev dike û şibandin û cudatiya wan derdixê holê. Zanyarên ku bi zimanzanîna rûberî re têkildar in jî, li ser peyvên ku ji zimanekî derbasî zimanê din bûne radiwestin û hevhişkariya wan her du zimanan derdixin holê. Her wiha peyv û gotinên wan ên hevdeng û hemwate ji hev derdixin.

Zimanzanîna nûjen, di he-man demê de bi şax û birên zimên ên giştî re eleqedar dibe û hemû zimanan ji hêla awa û çawaniya wan ve rave û şîrove dike.

Berî ku em têkilî qad û şaxên zimanzanîne bibin, divê em têgihên ku bi cureyên zimanzanîne re eleqedar in tevî hev û din nekin û beriya wê jî divê ku em têgihên şaxên zimanzanîne ji hev veçirin û cudatiya wan derxin holê. Her wekî din jî, divê ji hêla sefandin û dabeşkirinê ve, em hin şaxên zimanzanîne jî kêm zêde ji hev veqetînin. Ji bo wê jî hewcetî bi dabeşkirina şaxên zimanzanîne yên ku hemû çawanî û taybetiyên zimên li ber çavan radixin, heye.



### Şaxên Zimanzanînê

Şaxên zimanzanînê yên ku bi gelek zanîne din re têkildar in (ên bingehîn) ev in:

#### 1) Dengnasî (fonolîjî)

Dengnasî, wekî zanyariya denga tê binavkirin û nemaze dengên ku di hemû zimanan din de pêk tên hildide dest û pêwendiya wan dadihûrîne. Li gorî vê yekê, zanyar û zimanzanên ku bi vê şaxê re têkildar in, li ser çawanî, taybetî, bûyer, zagon, rêbaz û veguherînên dengên ku di hemû zimanan de pêk tên, radiwestin û lêgerîn û dahûrandinên zanistî dikin. Her wiha li ser dengên ku ji hêmayên (organên) axaftinê der dibin, hûr dibin.

Mînak; dengê “x” ya kurdî, di tirkî de wekî “h” der dibe. Ango, peyva (navê) Xeyrî ya bi kurdî, di tirkî de wekî Hayrî der dibe û tê bilêvkirin

Her wisan dengê “r” ya kurdî di fransîzî de wekî “x” der dibe. Yanê, “garçon” a ku wekî “gaxson” tê bilêvkirin, di kurdî de wekî garson der dibe.

#### 2) Têşezanî (morfolojî)

Têşezanî (an jî teşenasî), bi çêbûyîn, kêşan, tewang û bikaranîna peyvê re têkildar e. Rê û rêçik û çêbûyînên bêjeyê, yên ku di zimên de cih digirin dadihûrîne û bi nav dike. Têşezanî, taybetiyên awa, şêwe û cureyên zimên derdixe holê. Têşezanî, di domana xebatên zimanzanîna rûberî de jî roleke pir girîng û diyarker dileyîze.

Gava ku mirov ji hêla têşezaniyê li rewşa zimanan dinê

dinihêre, mirov di navbera hin zimanan de gelek cihewaziyan girîng (berbiçav) dibîne.

Mînak, ji hêla teşeyê ve zimane tirkî, pêvekî; zimane kurdî, tewangbar û zimane çînî jî, yekkîteyî ye.

#### 3) Zanîna tîprêziyê

Zanîna ku di zimên de bi tîprêzî, peyvsazî û hevoksaziyê eleqedar dibe wekî şaxê zanîna tîprêziyê tê dîtin û pejirandin. Girêdana tîpan, pêwendiya navbera peyvan, rêzbûna bêjeyan a di hevokê de û hwd. hemû mijarên vê şaxê ne.

Mînak, rêzbûna hêmanên hevokê, di kurdî de hevoka “Azad çû dibistanê” wekî kirde+bireser+lêker rêz dibin. Belê di erebî de heman hevok wekî “Çû dibistanê Azad” tê bilêvkirin û hêmanên wê jî wekî lêker + bireser+ kirde diguherin û rêz dibin.

#### 4) Watezanî

Zanîna ku bêjeyê ji hêla wateyê ve hildide dest, wekî şaxê watezaniyê tê navandin. Ev şaxê zimanzanînê nemaze li ser dahûrandina wate, wergir û bergeha peyvê hûr dibe û li ser peyvên hemwate, diwate û pirwate radiweste. Her wiha veguhastina têgih, rêman, biwêj, gotinên pêşiyar û gotinên xweş jî vedikole.

Wekî din jî werger, rave û şirovekirina gotin û bêjeyên ku di tekstên nivîskî de cih digirin jî mijara vê zanîne ye.

#### 5) Rehzanî (genetic)

Zanyariya ku qurm û ripinê

peyvê dadihûrîne û li ser geşedaniya peyvê û guherandina wê hûr dibe, wekî zanîna ripinê (rehzaniyê) tê watedarkirin.

Mînak, peyva çawa ji koka du peyvên cihê (çi + awa) hatiye û di pey de bi hêsan kirina peyvê re li çawa (ç + awa =çawa) dageriyaye.

#### 6) Peyvnasî (etimolojî)

Peyvnasî, bi hebûn û pêkanîna peyvê re eleqedar dibe. Kartêkeriya ku bandorê li ser pêkanîna peyvên ku derbasî zimên dibin, vedikole û dadihûrîne. Di zimên de dariştin, çêkirin, berhevkirin û pevgihandina peyvê û hwd. tev mijarên şaxê vê zimanzanînê ne.

Mînak, peyva “mamoste” ji koka “mam” û “hoste” (mamê/apê hoste) hatiye dariştin û li mamoste dageriyaye.

Her wisan zanîna peyvên hevedudanî, peyvên nenas û peyvên ku ji zimanan din hatine û tevî zimên bûne jî dîsan di vî şaxî de cih digirin.

Mînak, peyva kefgîr ji koka peyva “kef” û “girtin”ê tê û li kefgîrê dageriyaye. Heman peyv derbasî zimane tirkî jî bûye.

Dîsan peyva “deste” ku ji deh tiliyên destên mirov pêk tê, di tirkî de wekî *deste* (*dehik*) tê bilêvkirin û bikaranîn

#### Çavkanî

- 1) Grolier International Americana Encyclopedia
- 2) AnaBritanica
- 3) Meydan Larousse
- 4) Türkiye Türkçesi Grameri (Rêzimanê Tirkiya Tirkiyeyê) Prof. Dr. Zeynep Korkmaz

# Bidestxistina rayeka lêkeran

Zana Farqînî |

Lêker, ji rayek û qertafan pêk tên. Di zimanê me de, du rayekên (ango kokên) lêkeran hene. Ev rayekên hanê jî di demên cuda de, tên bikaranîn. Bi gotîneke din, rewşa bikaranîna wan ji hev cihê ye. Her wiha, digel vê qasê di zimanê me de, rayeka lêkeran jî diguhere. Di rayekê de, ne tenê dengdêr, her wiha dengdar jî li dengên din dadigerin. Ev rewş, taybetiyeke zimanê me ye ku em jê re tewanga lêkeran dibêjin. Ji ber ku mijar û dabaşa nivîsa me ne li ser tewangê ye, em dê li ser vê yekê ranewestin û jê behs nekin.

Gava em raderê (mesderê) jî lêkerê bikin, em rayeka ji bo demên borî bi dest dixin. Lêker gerguhêz an negerguhêz be ferq nake, rewş her ev e. Hemin gotin hatiye serê, ji niha bi şûn de ez dê ji bo vê rayekê, gotina rayeka dema borî jî bi kar bînim. Gava em vê rayekê ji bo demên borî bikêşin û biçevînin, em dê bibînin ku tu guherînek di dengdar û dengdêrên vê rayekê de çênabin. Bi awayekî giştî, qertafên (pirtikên) demê, tên dawîya vê rayekê. Wekî, ji bilî çîrokiya dema niha (diçû), çîrokiya dema niha ya hevedudanî (diçûbû), çîrokiya dema bê (ez ê biçûma) û çîrokiya dema bê ya hevedudanî (ez ê çûbim).

Bidestxistina vê rayeka ji bo demên borî gelek hêsan û sanayî ye. Tê de qet gelş û alozî nîn in. Lê belê, rayeka ku ji bo de

ma niha, dema bê û raweya fermanî tê bidestxistin, hinek na, têra xwe zor û çetîn e. Gêjahiyên wê hene. Ji ber ku guherîna dengdar di vê rayekê de diqewime. Ji lew re jî, tewanga lêkeran tenê di vê rayekê de çêdibe.

Em dê ji berêvkî ve, xal bi xal bi mijara xwe de herin û li gorî mijar û dabaşê li ser rayekên lêkeran û guherînan dengên di wan de rawestin. Em dê tenê qîma xwe bi aşkerakirina rewşê neynin, heta ji me bê û zanîna me têrê bike, em dê lê bixebitin ku rêzikên heyî tespît û formûle bikin.

Pêşî em mijara xwe ji du aliyan ve hildin dest. Sedem jî ev e ku, du cure raderên me hene. Em dê bi navbernavan bi mijarên xwe de herin, da ku mijar hêsan bibin û serwestiya ji mijarê sivik bibe.

## A) Lêkerên ku radera wan /-in/ e

Wekî tê zanîn, di kurmancî de radera lêkeran an /-in/ e an jî bi tenê /-n/ ye. Ji lew re li gorî radera lêkerê em nikanin ji aliyê şêwe ve lêkerên xwe bisenifînin. Ji ber ku di dema bidestxistina rayeka lêkeran ên ji bo dema niha de, (ji niha pê ve ez ê ji bo rayeka demên niha, bê û raweya fermanî “rayeka dema niha” bibêjim) hem deng ji rayeka lêkerê dikevin û hem jî deng li dengê din dadigerin.

Loma min serî li riyeye wiha xist ku, ez di bin du rasernavan de vê mijarê hildim dest û li ser wan hûr bibim. Pêşî em ji lêkerên ku radera wan /-in/ e, dest pê bikin û van jî di bin çend jêrenavan de bisenifînin. Her wiha bi awayekî serkî be jî, em hin kitekitên wan û taybetiyên wan raxin ber çavan. Bi ya min, bi vî awayî em dê hêsantir karibin ango bişên ku derbarê van cure lêkeran de serwest bibin.

## 1) Lêkerên ku dawîya wan bi /-andin/ê diqedin

Sedema ku ez dibêjim lêkerên ku bi /-andin/ê diqedin ev e: A rast min dikaribû bigota, lêkerên ku kîteya wan a dawî /-din/ e, lê çend cure lêkerên me hene ku li derveyî vê rêzikê (qaydeyê) ne. Mîna “xwendin”, “şandin” û “çandin”ê. Çendî di van lêkeran de /-andin/ heye jî, lê di rastiya xwe de ew cihê ne û bi domana demê re guherîna di wan de çêbûye ango ew teşeguherî ne. Li aliyê din, di rayeka van a dema borî de gelş tune ye. Eger radera wan a /-in/ bê avêtin, rayeka wan a dema borî bi dest dikeve. Lê di dema peydekirina rayeka dema niha ya negerguhêz de gelş heye. Ez dixwazim ku di bin sernavekî din de ji van cure lêkeran behs bikim û li ser wan rawestim. Em niha li vir tenê balê bikêşin ser wan dê baştir be.

Lêkerên ku dawîya wan bi */-andin/ê* diqedin û kuta dibin, bêawarte tev de lêkerên gerguhêz in, bi gotineke din têper in. Ev taybetiyeke van cure lêkeran e û ji bo kesên ku hê nû hînî zimanê kurdî dibin jî, ev yek ji bo wan hêsaniyek e. Piştî ku rader ji wan bê avêtin, rayeka wan a dema borî tê bidestxistin. Ev cure lêker, di zimanê me de xwedî rêjeyeke pir a berbiçav in.

Ev lêkerên hanê, di rastiya xwe de lêkerên çêkirî, lêkerên dariştî ne. Bi awayekî giştî an ji navdêrekê an jî, ji rengdêrekê hatine dariştin. Ji bo rewşa gerguhêz bi */-andin/ê* û ji bo rewşa negerguhêz jî bi */-în/ê* çêbûne. Ligel vê yekê, rêjeya wan kêm be jî, ji bo rewşa gerguhêz bi */-isandin/* û */-ijandin/ê*, ji bo rewşa teneper ango negerguhêz jî bi */-isîn/* û */-ijîn/ê* jî çêdibin. Mîna lêkerên ku ji “rep” û “germ”ê pêk hatine:

*rep+isandin* û *rep+isîn*,  
*germ+ijandin* û *germ+ijîn*.

Çendî ev lêker lêkerên dariştî bin jî, lê mîna ku ew lêkerên sade bin, tên xuyakirin û ji lew re jî bûne xwedî rêzikên cuda. Ji ber vê rewşa wan a taybet, averêbûnek di wan de pêk hatîye û ez dibêjim ku ji lêkerên me yên din cuda, rewşeke wan heye.

Li aliyê din, di zimanê me de cewiyên van cure lêkeran hene ku dawîya wan bi */-tin/ê* diqedin. Her wiha, bi ya min şêweya wan a seretayî û destpêkê jî, ev awa bi xwe bûye. Mînak:

*malişandin* û *malaştin*  
*temirandin* û *temartin*  
*guherandin* û *guhartin*  
*zivirandin* û *zivartin*.

Digel van yekan, me gotibû rewşeke cihê ya van lêkeran heye, ku di lêkerên din de em rastî van taybetiyan nayên. Niha em hinek bi kitekit li ser wan rawestin. Ji van cure lêkeran piştî avêtina radera */-in/ê* rayeka dema borî ya gerguhêz tê bidestxistin. Piştî ku ji rayeka dema borî ya gerguhêz dengdara */d/* bikeve û dengdêra */a/yê* jî, ku di kîteya dawî de ye, bibe */î/*, îcar rayeka dema niha ya gerguhêz tê himatê. Di pey vê yekê de vê carê em rastî rewşeke din tî. Ew jî ev e: Rayeka dema niha ya gerguhêz wekî ku lêkera raderin a negerguhêz be tê pejirandin û bi ketina radera */-n/yê* rayeka dema borî ya negerguhêz û bi ketina dengê */-î/yê* jî heman rayekê, rayeka dema niha ya negerguhêz pêk tê.

Ji van cure lêkerên navborî, em çend heban ji wan wek nimûne bidin û awayên wan ên radera dema borî destnîşan bikin: *Qedandin*, *standin*, *afirandin*, *guherandin*, *gerandin*, *kelandin*, *qelandin*, *qewirandin*, *pejirandin*, *pekandin*, *temirandin*, *zivirandin*.

Eger em raderên van lêkeran, ku gişt */-in/* in, ji wan bikin, di destê me de rayeka wan a dema borî dimîne: Mînak: *qedand* (-in), *stand* (-in), *afirand* (-in), *guherand* (-in), *gerand* (-in), *keland* (-in), *qeland* (-in), *qewirand* (-in), *pejirand* (-in), *pekand* (-in), *temirand* (-in) û *zivirand* (-in). Ji bo têngihîştin û zelaliya mijarê, em bi hevokan daxuyaniyên xwe bidomînin.

*Min qedand*, *min diqedand*,  
*min dê biqedanda*, *min qedandibû*.

*Te stand*, *te distand*, *te dê bista*, *te standibû*

*Wê afirand*, *wê diafirand*,  
*wê dê biafiranda*, *wê afirandibû*

*Me guherand*, *me diguherand*,  
*me dê biguheranda*, *me guherandibû*

*Wan qeland*, *wan diqeland*,  
*wan dê biqelanda*, *wan qelandibû*.

Dêhna we kişandibe, tu guherîneke dangan di wexta kişandinê de, di van rayekên lêkeran de çênebûye, tenê qertafên deman li wan zêde bûne, hew.

Niha ji van rayekan, îcar em rayeka dema niha ya gerguhêz peyde bikin. Serê pêşîn ji rayeka dema borî dengdara */d/yê* tê xistin, piştî jî */a/ya* di kîteya dawî ya rayeka mayî de li dengdara */î/yê* tê dagerandin. Em bidin xuyakirin ku ev guherîna dangan, taybetiyeke tewanga lêkeran e. Di zimanê me de, di dema kêşana lêkeran de, nemaze di rayeka wan a dema niha de, dengdar û dengdêr li dengên din dadigerin. Em ji vê yekê re dibêjin tewanga lêkeran.

Bi gotina kin û kurt, bi vî awayî ji rayeka dema borî ya lêkerên ku bi */-andin/ê* diqedin, rayeka dema niha ya gerguhêz tê çêkirin. Bi dayîna nimûneyan, em vê rêzika hanê bişopînin. Lêker bila ev bin: *Qedandin*, *afirandin*, *guherandin* û *gerandin*.

Gihaneke yekemîn, em raderan ji lêkeran bikin. Raderên van lêkeran */-in/* in. Piştî avêtina wan raderan *qedand* (-in), *afirand* (-in), *guherand* (-in) û *gerand* (-in) li rastê dimînin.

Gihaneka duyemîn, îcar em dengê wan ê dawî ji wan bikin ku ew deng tîpa /d/yê ye: *qedan* (-d), *afiran* (-d), *guheran* (-d) û *geran* (-d).

Em daxuyaniyekê li ser vê rewşa hanê bidin. Ev rayekên hanê, di rastiya xwe de êdî navdêr in jî, ku ji lêkeran hatine çêkirin. Gava mirov bixwaze ji lêkeran navdêran çêke, ev rêbazê zimanê me ye û divê bi vê riyê mirov tev bigere. Wekî mînak em çend hevokên nimûneyên ku bi van navdêran çêbûne rapêş bikin: *Afirana cîhanê, gerana me ya li bajêr, guherana teşeyê deng* û hwd.

Gihaneka seyemîn jî guherîna dengê /a/ya di kîteya dawî de, bi dengê /î/yê ye. Rewşa dawîn ev e: *Qedîn* (qedan), *afirîn* (afiran), *guherîn* (guheran) û *gerîn* (geran). Bi vê rewşê em rayeka dema niha ya gerguhêz bi dest dixin. Em dîsan, bi hevokên nimûneyî li mijara xwe bidomînin.

*Ez diqedînim, ez ê biqedînim*  
*Ew ê biafirîne, biafirîne*  
*Em diguherînin, em dê biguherînin*  
*Tu nagerî, tu dê bigerî*

Lê belê, li vir tiştek derdikeve pêşberî me. Rayeka dema niha ya gerguhêz, her wiha lêkera raderîn a negerguhêz a van cure lêkeran e. Heke em bi lêkerên nimûneyî berdawamiyê bidin bi gotin û daxuyaniyên xwe û mijara xwe rave bikin, dê baş be. *Qedîn afirîn, guherîn* û *gerîn* ku rayekên dema niha yê gerguhêz ên lêkerên *qedandin, afirandin, guherandin* û *gerandin* in, her wiha, di heman katê de lêkerên negerguhêz ên eynî lêkeran in jî. Ji van rayekan,

îcar em rayekên demên borî yê negerguhêz û yê dema niha yê negerguhêz bi dest dixin.

Ji bo nimûne: *qedîn afirîn, guherîn* û *gerîn*, bila dîsan lêkerên me yê mînak bin. Em radera wan ku /-n/yê ji wan bikin, em dê rayeka wan a dema borî û heke em ji vê rayekê dengdêra /-î/yê ji wan bixin, hingê rayeka wan a dema niha çêdibe. Di van her du rayekan de tu guherîna dangan pêk nayê. Guherîna denganiyê tenê di dema pêkhatina rayeka dema niha ya gerguhêz de pêk tê.

Bi dayîna hin lêkerên mînak, em dabaşa xwe rave bikin: *Qedîn, afirîn, guherîn, gerîn, kelîn, qedîn, qewirîn, pejirîn, pekîn, temirîn* û *zivirîn*. Wek merheleya pêşîn em radera wan ji wan bigirin biavêjin û rayeka dema borî ya negerguhêz ji wan peyde bikin: *Qedî* (-n), *afirî* (-n), *guherî* (-n), *gerî* (-n), *kelî* (-n), *qedî* (-n), *qewirî* (-n), *pejirî* (-n), *pekî* (-n), *temirî* (-n) û *zivirî* (-n).

*Ez qedî..*  
*Ew afirîye.*  
*Em guherîne.*  
*Tu negerîyayî.*  
*Av keliyabû.*  
*Goşt nediqeliya.*  
*Ew biqewirîna.*  
*Çira ditemiriya.*  
*Li dorê zivirîbûbûn.*

Wek gihaneka diduyan jî, em îcar dengdêra /î/yê ji rayeka dema borî bixin û rayeka dema niha ya negerguhêz bi dest bixin. Em awayên mayî, ku piştî hildana qertafa /-n/yê li rastê mane, ew wek nimûne derpêş bikin: *Qed* (-î), *afir* (-î), *guher* (-î), *ger* (-î), *kel* (-î), *qel* (-î), *qewir* (-î), *pejir* (-î), *pek* (-î), *temir* (-î) û *zivir* (-î).

Ev rayekên li jorê, rayekên lêkerên fermanî ne, her wiha di rewşa navdêrê de ne jî, ku ji lêkeran çêbûne. Bi gotineke din, em dikarin bibêjin jixwe ev peyvên resen in, ku lêker ji wan hatine çêkirin. Li hêla din, bi vî awayî em hem navdêran ku ji lêkeran çêdibin bi dest dixin û hem jî em dikarin wan wek parkîtan (paşgiran), ku ji rayeka fermanî ya lêkerê çêbûne, bi kar bînin û bi wan navdêr û rengdêran jî çêkin. Serê pêşîn em ji bo kêşana demê, wan hildin dest û li ser wan bisekinin.

*Ez diqedim, ez ê biqedim...*  
*Ew diafire, ew ê biafire...*  
*Em diguherin, em ê biguherin...*  
*Tu nagerî, tu dê negerî...*  
*Av dikele, av dê bikele...*  
*Goşt diqe, goşt dê biqe...*  
*Ew diqewirin, ew ê biqewirin...*  
*Çira ditemire, çira dê bite-mire...*  
*Li dorê dizivire, li dorê bizivire...*

Li vir ez dixwazim wek agahî bidim zanîn ku, min qertafa dema bê bi zanebûn bi du awayî bi kar anî. Mîna /dê/ û /ê/. Me got ku bi van rayekan em dikarin navdêr û rengdêran jî çêkin, îcar ji bo wan em çend nimûneyan bidin. *Roj+ger, agir+temir, teşe+guher, balafir+qewir...* û hwd.

Ji bo lêkerên me yê bi vî teşeyî, ango ji bo lêkerên me yê gerguhêz ên ku dawîya wan bi awayê /-andin/ê diqedin, em dikarin behsa çar rewşa rayekan bikin. Yek ji bo demên borî, yek ji bo dema niha ya di rewşa gerguhêz de, yek dîsan ji bo dema borî ya negerguhêz û ya din jî dîsan ji bo dema niha, lê belê ji bo rewşa negerguhêz.

Em careke din hin lêkerên ku me ji bo vî sernavî wek mînak dabûn, hildin dest û sedema van gotinên xwe yên navborî aşkera bikin, lê belê bi awayekî kurt. Lêker ev in: *Qedandin, afirandin, guherandin, gerandin, temirandin û zivirandin*.

Gihaneka pêşîn, heke radera /-in/ê ji wan bikeve, di dest de rayeka dema borî dimîne. Ji bo vê jî em tenê rewşa wan a rayekê nîşan bidin: *Qedand, afirand, guherand, gerand, temirand û zivirand*.

Gihaneka duyemîn, pêşî dengdara li dawîya rayekê dikeve ku ew jî /d/ ye. Bi dû re, îcar dengdêra di kîteya dawî de ku /a/ ye, li dengdêra /i/yê dadi-gere. Em vê rewşê jî bi awayekî kurt nîşan bidin: *Qedan (-d), afirand (-d), guherand (-d), gerand (-d), temirand (-d) û zivirand (-d)*. Di pey vê rewşê de li rastê ev awa dimînin: *qedan, afirand, guherand, gerand, temirand û zivirand*. Em guherîna dengdêra /a/yê bi dengdêra /i/yê jî di rayekên ku di destê me de mane, pêk bînin: *Qedîn, afirîn, guherîn, gerîn, kelîn, temirîn û zivirîn*.

Ev ên hanê, rayekên dema niha yên lêkerên gerguhêz in ku bi /-andin/ê diqedin. Li vir tiştekî balkêş heye ku ew ji cure lêkerên me yên din cihê dibe.

Gihaneka sêyem; em vê rewşê jî bi rayeka dema niha ya gerguhêz bidin xuyakirin: *Qedîn, afirîn, guherîn, gerîn, temirîn û zivirîn*. Ewîl em radera wan ji wan bikin ku tenê /-n/ ye. Em vê kirina hanê jî destnîşan bikin: *Qedî (-n), afirî (-n), guherî (-n), gerî (-n), temirî (-n) û zivirî (-n)*. Li rastê ev halê wan dimîne û ev jî rayekên de-

mên borî ne: *Qedî, afirî, guherî, gerî, temirî û zivirî*. Ev êdî rayeka dema borî ya negerguhêz e.

Gihaneka çarem: Piştî ku ji rayeka dema borî dengdêra /i/yê bê avêtin îcar rayeka dema niha ya negerguhêz pêk tê. Em vê yekî jî diyar bikin: *Qed (-î), afir (-î), guher (-î), ger (-î), temir (-î) û zivir (-î)*. Em halê dawî careke din pêşkêş bikin û bidin xuyakirin ku ev rayeka dema niha ya negerguhêz e: *Qed, afir, guher, ger, temir û zivir*.

Piştî diyarkirina vê rewşê, niha em balê bikêşin ser riyekê din a bidestxistina van rayekan. Em dikarin ji bo bidestxistina rayekên van cure lêkeran serî li riyekê din jî bidin. Heke em /-andin/ê ji van lêkeran biavêjin, wê gavê rayeka lêkerê ya negerguhêz bi dest dikeve. Bi dayîna heman lêkerên mînak, em dabaşa xwe ronî bikin: *Qed (-andin), afir (-andin), guher (-andin), ger (-andin), temir (-andin) û zivir (-andin)*. Em awayên mayî, ku piştî hildana qertafa /-andin/ê li rastê mane, ew wek nimûne derpêş bikin: *Qed, afir, guher, ger, temir û zivir*.

Em îcar ji vê, awayê bidestxistina rayeka dema borî ya negerguhêz bi dest bixin. Em qertafa /-i/yê li ser rayeka dema niha ya negerguhêz zêde bikin, rayeka dema borî ya negerguhêz çêdibe. Em vê yekê nîşan bidin: *Qed+î, afir+î, guher+î, ger+î, temir+î û zivir+î*.

Merheleya din jî ev e: Em /-n/yê li van rayekan zêde bikin, wê gavê jî rayeka dema niha ya gerguhêz tê himatê. Mînak: *Qedî+n, afirî+n, guherî+n, gerî+n, temirî+n û zivirî+n*.

Ji bo ku em rayeka dema borî ya gerguhêz ji van lêkerên ku dawîya wan bi /-andin/ê diqedin çêkin, em tenê radera /-in/ê ji wan dikin ew qas. Mînak: *Qedand (in), afirand (-in), guherand (-in), gerand (-in), temirand (-in) û zivirand (-in)*.

Em gotin û daxuyaniyên xwe yên der barê lêkerên ku bi /-andin/ê diqedin, bi awayekî hêsan formûle bikin:

I) Bi hilanîna radera /-in/ê, rayeka demên borî bi dest tê xistin, ku ev rayek ji bo rewşa gerguhêz e.

II) Ji lêkerê, bi avêtina /-andin/ê, rayeka dema niha ya negerguhêz bi dest tê xistin.

III) Bi avêtina dengê dawî ji rayeka demên borî û bi guhartina dengdêra /a/ya di kîteya dawî ya vê rayekê de bi dengdêra /i/yê, an jî bi gotineke din, bi zêdekirina /-in/ê li rayeka dema niha ya negerguhêz, îcar rayeka dema niha ya gerguhêz tê çêkirin.

IV) Lêkera raderîn a lêkerên ku bi /-andin/ê diqedin, hem rayeka dema niha ya gerguhêz e û hem jî lêkera raderîn a heman lêkerê ya negerguhêz e.

V) Ev cure lêkerên me, ji bilî lêkerên wekî "xwendin", "çandin" û "şandin"ê gişt xwedî rêzik in û bidestxistina rayekên wan ên deman gelek hêsan in û rêzikî ne.

## 2) Lêkerên ku dawîya wan bi /-stin/ê diqedin

Rêjeyeke zêde ji lêkerên me, kîteya (heceya) wan a dawî bi /-tin/ê diqede. Lê ji ber ku di hin lêkerên bi vî cureyî de hem dengdêr û hem jî dengdar di rayeka dema niha de li dengine

din diguherin, min hewcetî pê dît ku ez wan ji hev cihê hildime dest. Tişteke heye ku min divê ez bibêjim; di van cure lêkeran de jî piştî avêtina raderê, rayeka dema borî bi dest tê xistin û tu guherîneke dangan, ango rewşa tewanga lêkerî di wan de naqewime û rûnade.

Piştî van daxuyaniyan em vegerin ser lêkerên ku li dawîya wan /-stin/ heye. Lêkerên me yê ji bo nimûneyê ev in û ev lêker, lêkerên sade ango xwerû ne, ne yê çêkirî û dariştî ne. Gerçî lêker dariştî ango çêkirî bin jî, ji aliyê encamê ve tişteke naguhere. Tenê ji aliyê serwestkirinê ve me xwest em yê sade wek mînak rapêş bikin: *Xwestin, parastin, gestin, perestin, çêstin, xistin, ristin, listin, bihîstin* û *birûstin*. Dibe ku bala we kişandibe, beriya /s/yê dengdêrên /a/, /e/, /ê/, /i/, /î/ û /û/ hatine. Min bi taybetî ev cure lêker bijartin û min xwest bê ka çi guherîn di rayeka wan a dema niha de çêdibe, raxim ber çavan.

Ji bo gihaneka pêşîn, rêzik ev e: Radera wan ku /-in/ e, ji lêkeran tê xistin, bi vî awayî rayeka dema borî pêk tê. Bi nîşandanê em mijarê ronî bikin:

*Guhast* (-in), *parast* (-in), *gest* (-in), *xwest* (-in), *çêst* (-in), *xist* (-in), *rist* (-in), *list* (-in), *bihîst* (-in) û *birûst* (-in).

Ji bo serwestbûn hêsantir bibe, em halê mayî careke din binivîsin: *Guhast, parast, gest, xwest, çêst, xist, rist, list, bihîst* û *birûst*.

*Min guhast, min guhastibû...*

*Wî diparast, wî dê biparast...*

*Wan gestibû, wan dê bigesta...*

*Ez perestim, ez dê biperestima...*

*Min çêst, min çêstiye...*

*Wan xist, wan dixiste...*

*Wê rist, wê ristibû...*

*Ez listim, ez dilistim...*

*Min bibihîsta, min dê bihîstibûya...*

*Ez birûstibûm, ez birûstibûma...*

Ev çend nimûne, ji bo zelalbûna dabaşa me ji min tirê bes in. Wek ji van mînan jî xuya bû, guherîneke danganî di rayeka demên borî de çênebûye û qertafên deman li wan zêde bûne.

Îcar em bîn gihaneka duymîn. Ji bo ku rayeka dema niha pêk were, serê ewilî dengê ji rayeka dema borî dikeve. Ev deng jî tim dengdara /t/yê ye. Em ji bo zelalbûn û ronîbûna mijarê dîsan serî li mînakên xwe yê li jorê bidin. Jixwe me raderên wan ji wan avêtibûn û tenê rayekên wan ên demên borî mabûn. Niha em wan bi vî rewşê hildin jêrê û dengê wan ê li dawî jî ji wan bigirin biavêjin. Ji ber ku lêkerên bi vî şeweyê, di vî halî de, tenê dengdara /t/yê li dawîya wan heye, lewma min wiha got. Em vî yekê jî di nav kevanekê de nîşan bidin: *guhast* (-t), *paras* (-t), *ges* (-t), *peres* (-t), *çêst* (-t), *xist* (-t), *rist* (-t), *list* (-t), *bihîst* (-t) û *birûst* (-t).

Piştî vî kirinê, li dawîya hemû mînakên me, yê ji lêkerên ku dawîya wan bi /-stin/ê diqedin, dengdara /s/yê dimîne. Di serî de ev dengdara hanê, bi awayekî giştî li dengdara /z/yê dadigere. Lê belê, hin awarte (îstisna) ne tê de, dengê /s/yê bi

piranî dibe /z/. Ev ji bo hemûyan wisan e. Îcar em bîn ser dengdêrên di van lêkeran de, bê ka ew li çi dengdêrî dadigerin û ev wek rêzikekê pêk tê an na, em bi hev re bibînin.

Em berêvkî dest pê bikin û ji dengdêra /a/yê pê bikevin û bi mijara xwe de herin. Ev dengdêra hanê bi awayekî giştî di van cure lêkeran de li dengdêra /ê/yê dadigere. Lêkerên ku di wan de dengdêra /e/yê heye; bi awayekî giştî ev deng bi biryardarî li dengê danagere. Hem wekî xwe dimîne û hem jî li dengdêra /ê/ û li ya /i/yê dadigere. Herçî dengdêrên /ê/, /i/ û /û/ ne, wekî xwe dimînin. Heke em bi awayekî din bibêjin, ev her sê deng, hebûna xwe di rayeka dema niha de diparêzin.

Di pey van amajepêkirinan de, niha jî em bi dayîna mînan li ser mijara xwe rawestînin. Ewîlî em bi rewşa wan a ku dengdara /t/yê ji wan ketiye, wan hildin dest: *Guhast, paras, ges, peres, çêst, xist, rist, list, bihîst* û *birûst*. Me gotibû ku dengdara /s/yê ya li dawîya wan bi awayekî giştî dibe dibe /z/. Nexwe bi vî halî, bi rewşa ku dengdêra /s/yê li dengdara /z/yê dage-riyaye em careke din van mînan derpêş bikin: *Guhaz, paraz, gez, Perez, çêj (?) , xi (?) , ris (?) , lîz, bihîz* û *birûs (?)*.

Beriyaya ku ez derbasî mijara guherîna dengdêran bibim, min divê ez balê bikişînim ser hin awarteyan, ku min bi nîşana xalêpîrsê ew diyar kirine. Yek jê lêkera çêstin e. Çendî di kurmancî de wiha cih girtibe jî di rastiya xwe de ew çêstin e. Ji ber ku rayeka wê ya dema niha "çêj" e û em dizanin ku dengên

/s/ û /j/ bi hev diguherin. Ji lew re di rayeka dema niha de em nabêjin “ez diçêzim” lê belê em dibêjin “ez ez diçêjim”. Çendî ev jî lêkerêke ji aliyê şeweyê ve teşeguherî be jî ez dê dîsan di nav mînakan de cih bidimê.

Lêkera din jî “xistin” ne, ku rayeka wê ya dema borî /xist/ e. Gava ku ev rayek li rayeka dema niha dagere, ku divê serê pêşîn dengdara /t/yê jê bikeve, hin guherînên derî rêzikê tê de çêdibin. Diviya ku dengdara /s/yê bibûya /z/, lê ev yek neqewimiye. Bi ser de dengdara /s/yê jê ketiye û mîna /xi/ maye. Mesela, gava ku me ji bo dema niha bikişanda gerek me wiha ev rayek bi kar bianiya. Ku rayek “xiz” an jî em bibêjin guherîna dengê tê de çênebûya û mîna “xis” bimaya: *ez dixizim (dixisim)* û *ez ê bixizim (bixisim)*. Lê îro em wê wek “ez dixim” û “ez ê bixim” bi kar tînin. Heta em tiştêkî din jî dikin û wê wekî “ez dixînim” bi kar tînin. Ev rewşeke awarte û ya derî rêzikê ye. Guherîneke derî adet tê de çêbûye û ew êdî şeweyêke teşeguherî (deformebûyî) ye. Eger em /xîn/ wek rayeka dema niha bipejirînin, divê ku îcar em rayeka wê ya dema borî jî wiha qebûl bikin: “xîntin” an jî “xînanandin”. Lê tiştê ku em dizanin ev awa tune ne.

Ji bo rayekên “ris” û “birûs”ê jî ez vê bibêjim ku li ber wan jî nîşana xalepîrsê heye. Awarte li vir, danegerîna dengdara /s/yê li dengdara /z/yê ye. Ev jî di zimanê me yê devkî de bêyî ku ev guherîna dengê pêk were, tînin bikaranîn û bilêvkirin.

Der barê guherîna dengdara /a/yê de jî ku li dengdara /ê/yê diguhere, ez mînakeke derî rê-

zikê derpêş bikim. Çendî ku bi awayekî giştî dengdêra /a/yê li dengdêra /ê/yê dadigere jî, em dibînin ku lêkera me ya “xwastin” (ku wekî xwestin jî tê bikaranîn û awayê wê yê kevn jî xwastin e) li derveyî vê rêzikê dimîne. Mînak: *ez dixwazim, ez ê bixwazim, min xwast, min xwastiye...* Hat dîtin ku dengê /a/yê li dengêkî din naguhere. Ev jî awarteyêke vê lêkerê ye.

Niha em rewşa van lêkeran a dawî ya rayekên dema niha derpêş bikin û guherîna dengdêran jî di wan de pêk bînin. Me li jorê jî gotibû ku bi awayekî gelemperî dengdêra /a/yê dibe /ê/ û carinan jî dengdêra /e/ dibe /i/ an jî /ê/. Bi hevokên nimûneyî em li mijara xwe bidomînin: *Guhêz, parêz, gez, periz, çêj, xî, ris, lîz, bihîz û birûs.*

*Ez diguhêzim, ez ê biguhêzim...*

*tu diparêzî, tu dê biparêzî...*

*Ew digeze, ew ê bigeze...*

*Em diperezin, em biperizin...*

*Hûn diçêjin, hûn ê biçêjin...*

*Ew dixin, ew ê bixin...*

*Ez dirisim, ez ê birisim...*

*Tu dilîzî, tu dê bilîzî...*

*Ew dibihîze, ew ê bibihîze...*

*Em dibirûsin, em ê bibirûsin....*

Li vir, bi vê mijara hanê ve eleqedar, ez dixwazim çend tiştên din jî bibêjim. Lêkerên “ristin” û “lîstin” bi awayê “rêstin” û “leyîstin” jî hene û li hin deveran tenê awayekî wan heye. Ji bo nimûne li hin cihan dibêjin “ez leyîstim”, nabêjin “ez lîstim”. Her wiha ev lêker li hin herêman gerguhêz û li hin herêman jî negerguhêz e. Ji vî aliyê ve jî ev lêker xwedî tevlihevî û gêjahiyekê ye.

Dîsan hin lêkerên me yên ku dawîya wan bi /-stin/ê diqedin û li derî rêzikê tînin kişandin û bikaranîn hene, wekî: *Westin, bestin, pestin û verestin.*

Gava em van lêkerên navborî li gorî dema niha dikişînin û diçevînin, tenê rayeka wan /-in/ ji wan dikeve û hew. Li gorî rêzikê, diviya ku /t/ya li dawiyê jî ji wan biketa, tewanga lêkerî di wan de biqewimiya. Lê wişan nabe. Ji lew re ev cure lêker (*westin, bestin, pestin, verestin*) derî rêzika heyî, bûne xwedî rêzikeke din. Mînak:

*Ez diwestim, ez ê biwestim*

*tu dibestî, tu ê bibestî*

*Ew dipeste, ew ê bipeste*

*Ew vedireste, ew ê vereste*

Niha jî, ji bo demên borî em van lêkeran bikişînin. Serê pêşîn îcar divê mirov van lêkeran wekî “*westîn, bestîn, pestîn û verestîn*” bibîne û radera wan jî mîna ku tenê /-n/ be bipejirîne. Digel vê yekê, ji bo demên borî du cure awayê kêşana van lêkeran derdikevin ber mirov.

*Ez diwestîm (diwestiyam)*

*Tu dibestî (bestiya)*

*Em pestîne (pestiyane)*

*Hûn verestîn (verestiyam)*

Tê dîtin, ev lêkerên ku dabaxa me li ser wan e, xwedî rengekî cuda ne û derî rêzikên heyî, xwedî rêzikên cihê ne. Loma çendî ev lêker di rastiya xwe de awayê wan ê raderîn *westin, bestin, pestin û verestin* be jî, lê ji ber sedemên cihê ketine şeklekî din û awayê wan ê raderîn *westîn, bestîn, pestîn, verestîn* e. Ji lew re wekî ku qertafa wan a raderê /-n/ e be tînin kişandin û rayeka wan tê bidestxistin.

Ji bo cihêrengiya wan cure lêkeran ez wek nimûne lêkerekê din a negerguhêz jî bidim ku îcar awayê wê yê raderîn neguheriye, lê dîsan jî ji rêzika giştî averê bûye: *Nivistin*; angî *razan*, *xew kirin*. Ev lêker wek lêkerekê rêzikî xuya dike û gava mirov radera wê biavêje, rayeka dema borî dimîne li holê. Ji vî aliyê ve gelş nîn e. Lê gava ku em bixwazin rayeka wê ya dema niha, li gorî rêzikên giştî yên wan cure lêkeran bi dest bixin, em dê bikevine tengasiyekê. Em berêvkî pê de herin: *Nivist* (-in), bi avêtina raderê “*nivist*” dimîne. Çend hevokên nimûneyî: *Ez nivistim, ez dinivistim, ez dê binivistima, ez nivistibûm...*

Niha jî ji bo rayeka dema niha, em li ser vê lêkerê rawestî. Li gorî rêzikê, divê ku pêşî dengdara dawî /t/ bikeve, (nivis-t) û li rastê “nivis” bimîne. Her wiha dengdara /s/yê jî hewce ye bibe /z/ (an jî dibe ku wek derî adet wekî xwe bimîne). Lê belê, çî heye ku kes îro di zimanê devkî de vê şeweyê bi kar nayê û mirov rastî vê jî nayê. Li vir em dikarin bibêjin ku dengê /s/yê ketiye û /nivi/ bi tena serê xwe maye. Ji lew re wiha tê bikaranîn. *Ez dinivim, ez ê binivim, binive...* Em vê jî bibêjin ku dengdêra /i/ya li dawî jî ber qertafên lêkera bûnê yên kesane dikeve.

Jixwe ev cure lêker negerguhêz in. Ji bo ku mirov van gerguhêz bike, piştî jî wan avêtina raderê, mirov qertafa /-andin/ê bi ser wan ve dike. Bi vî awayî lêkerên gerguhêz ên ji desteya lêkerên sade (xwerû, neçêkirî) pêk tên.

Der barê van cure lêkeran de,

em gotinên xwe zelaltir bikin û bi çend xalan diyar bikin.

I) Bi avêtina radera /-in/ê, rayeka demên borî pêk tê. Di vê rayekê de tu guherînên dangan çênabin. Qertafên kêşanê yên deman li van rayekan zêde dibin.

II) Ji rayeka demên borî, piştî avêtina dengdara /t/yê, rayeka dema niha tê himatê. Lê bi awayekî giştî dengdara /s/yê ya li dawiyê, li /z/yê û dengdêra /a/yê jî ya kîteya dawî, li /ê/yê dadigere. Herçî dengdêra /e/yê ye, ew bêstiqrar e. Geh li /ê/yê û geh jî li /i/yê dadigere.

III) Hin ji van cure lêkeran negerguhêz in û ji lew re li derî rêzika giştî dimînin.

IV) Çendî di van lêkeran de serûberiyek heye jî, bi qonaxa demê re, ji ber sedemên cihê, hin guherîn di wan de pêk hatine. Ji wan deng kêman bûne, teşeguherî bûne, li derî rêzika asayî mane û bûne xwedî hin rêzikên din. Ji lew re em dibêjin awarteyên van cure lêkeran hene.

### 3) Lêkerên ku dawiya wan bi /-ştin/ê diqedin

Ev lêkerên ku dawiya wan bi /-ştin/ê diqedin, bi awayekî giştî ew jî xwedî rêzik in, mîna wan rêzikên lêkerên ku bi /-stin/ê diqedin. Di van lêkeran de jî, piştî avêtina radera /-in/ê rayeka dema borî pêk tê û guherîna dangan di vê rayekê de nayê pê. Dîsan tenê guherîna dengdar û dengdêran di rayeka dema niha de çêdibe. Di lêkerên xwediyê vî teşeyî de, dengdara /s/yê û ya /j/yê bi hev diguherin. Digel vî qasî, awarte jî hene. Dîsan dengdêra /a/yê bi dengdêra /ê/yê diguhere. Dengdêrên din hema

bibêje mîna xwe dimînin. Em lêkerên xwe yên nimûneyî yên ji bo vê xalê pêşkêş bikin û li ser wan bisekinin: *Biraştin, malaştin, rahiştin, keliştin, kuştin, şûştin, gihîştin, niştin, koştin, rihostin*.

Wek gava destpêkê, em pêşî radera wan a /-in/ê, ji wan bikin, em vê yekê jî di nav kevanekê de nîşan bidin: *Biraşt* (-in), *malaşt* (-in), *rahişt* (-in), *kelişt* (-in), *kuşt* (-in), *şûşt* (-in), *gihîşt* (-in), *nişt* (-in), *koşt* (-in) û *rihoşt* (-in). Rewşa dawî ya rayeka dema borî ya van lêkeran ev e: *Biraşt, malaşt, rahişt, kelişt, kuşt, şûşt, gihîşt, nişt, koşt û rihost*.

Bi vê kirinê, me rayeka dema borî bi dest xist. Êdî ez naxwazim mînakên ji bo hevokên nimûneyî bidim. Ji ber ku me li jorê ev yek kiribû û me ji bo serwestbûna tam a jî mijarê, hevokên nimûneyî derpêş kiribûn. Ez bawer dikim êdî gotinên me fehmar û fesih in. Mebesta me tê fehmkirin, lewma hewce pê namîne ku em hevokên mînak ji niha û bi şûn de pêşkêş bikin.

Ji bo gihaneka diduyan, îcar em dengdara dawî ku /t/ ye, ji wan rayekên dema borî bigirin biavêjin. Em vê jî dîsan di nav kevanekê de diyar bikin bê ka çawan tê avêtin: *Biraş* (-t), *malaş* (-t), *rahiş* (-t), *keliş* (-t), *kuş* (-t), *şûş* (-t), *gihîş* (-t), *niş* (-t), *koş* (-t) û *rihoş* (-t). Em rewşa wan a dawî careke din binivîsin: *Biraş, malaş, rahiş, keliş, kuş, şûş, gihîş, niş, koş û rihosh*.

Me di serî de gotibû ku di van cure lêkeran de, bi awayekî giştî dengdara /s/yê di rayeka dema niha de dibe /j/. Lê çî heye ku hem awarteyên vê yekê hene



û hem jî dengê /s/yê ji hin rayeka dema niha ya lêkeran ketiye. Li aliyê din dîsan, me gotibû ku dengê /a/yê di rayeka dema niha de dibe /ê/ û dengdarên din hema bibêje qet naguherin û mîna xwe dimînin. Em van yekan bidin nîşandan ango em /s/yan bikin /j/ û /a/yan jî bikin /ê/: *Birêj, malêş (?), rahêj, kelij, kuj, şû (?), gihîj, nîş (?), koj û rihoj.*

Wekî di mînakên “malêş” û “nîş”ê de tînin dîtin, ku min xalepirs li ber wan daniye, dengê /s/yê li dengê /j/yê danegeriyaye. Li vir awarteyek derdikeve pêşiya me. Her wiha di lêkera “rahiştin”ê de jî dengdêra /i/yê ji bo rayeka dema niha bûye /ê/, lê di lêkera “keliştin”ê de ev yek çênebûye. Her wiha di lêkera “şûştin”ê de ku dîsan xalepirs li ber heye, dengê /s/yê li dengê /j/yê danegeriyaye, berevajiyê wê, ew deng ketiye û tenê ji bo rayeka dema niha “şû” maye. Li gorî rêzikê diviya ku mîna “şû” bimaya, lê wekî “şûş” jî rayeka xwe neparastîye. Ji ber ku di hin lêkeran de, dengê /s/yê nabe /j/ û her mîna xwe dimîne. Digel vî qasî dengê /û/yê di rayeka dema niha de /o/ ye.

Bi kurtasî, bi awayekî giştî dengdarên /s/ û /j/ û dengdêrên /a/ û /ê/ bi hev diguherin. Di lêkera mînaka rahiştinê de jî dengdêra /i/yê bi dengdêra /ê/yê diguhere. Lê li hin herêman jî naguhere, mîna xwe dimîne. Dengdêrên din ên wekî /e/, /î/, /o/ û /u/ mîna xwe dimînin.

Li hêla din, em dibînin ku di lêkerinan de deformebûnên wiha hene û di zimanê devkî de hin jê bi temamî wiha, hin jê jî wekî rêzika heyî, berdeamiya

xwe didomînin. Mîna “rihotin” û “rihoştin”, “firotin” û “firoştin”, “kotin” û “koştin.”

Ji bo rayekên dema niha em çend hevokên nimûneyî bidin:

*Ez dibirêjim, ez ê bibirêjim...*

*Tu dimalêşî, tu dê bimalêşî...*

*Ez dişom, ez ê bişom...*

*Ew digihîje, ew dê bigihîje...*

*Em dirihojin, em ê birihojin...*

*Ew dikelijin, ew dê bikelijin...*

Em rast lê tînin ku li hin herêman rayeka demên borî ya lêkeran şeweya xwe ya berê parastîye, lê li hin deveran ev yek bi bintûtî nemaye. Wek nimûne, em lêkera “avêtin” hildin dest. Rayeka wê ya dema niha “avêj” e, li hin deveran rayeka wê ya dema borî jî “avêşt” e. Lê bele, bi piranî ev rayek wek “avêt” tê bikaranîn. Li gorî rêzikê divê ku ne “avêt” lê belê “avêşt” be.

Di san em dibînin ku hin lêkerên me yên xwedî vê şeweyê, rastî teşeguherîneke zêde hatine. Di serê pêşin de ji mirov kirê ku ev cure lêker ne lêkerekên rêzikî (biqayde) ne. Bila ji bo vê jî, mînak lêkera “rûniştin” be. Pêşî em vê bidin xuyakirin ku lêker, lêkereke çêkiriye, bi pêrkîta /ro-, rû-/ çêbûye. Mîna lêkera ro-kirin (rokirin).

Ji bo demên borî rayeka wê “rûnişt” e, lê ji bo rayeka dema niha, diviya ku rayeka wê “rûnij” (an jî heke /s/ nebûya /j/ gerek “rûniş”) bûya, lê îro di zimanê devkî de em leqayî van şeweyan nayên. Ew wekî “rûn” dertê pêşberî me û em wiha bi kar tînin: *Ez rûdinim* (an jî *rûdinê*). Ji ber ku lêker, lêkereke çêkirî ye qertafa dema niha /di/ dikeve navbera pêrkîta /rû-/ û rayeka lêkerê ya ji bo dema niha, ku mînanî /n/ tenê maye.

Der heqê van cure lêkeran de jî em ramanên xwe di bin çend xalan de careke din diyar bikin:

I) Bi avêtina radera /-in/ê, rayeka dema borî pêk tê. Di vê rayekê de tu guherînen dangan çênabin. Qertafên kêşanê yên deman li van rayekan zêde dibin.

II) Ji rayeka dema borî, piştî avêtina dengdara /t/yê, rayeka dema niha çêdibe. Lê bi awayekî giştî dengdara /s/yê ya li dawiyê li /j/yê û dengdêra /a/yê jî, ya kîteya dawî li /ê/yê dadigere. Herçî dengdêra /i/ ye, ew carinan li /ê/yê dadigere. Lê ev guherîn ne guherîneke biîstiqrar e. Li gorî devokên herêman diguhere.

III) Hin ji van cure lêkeran, negerguhêz in.

IV) Çendî di van lêkeran de serûberiyek hebe jî, bi domana demê re, ji ber sedemên cihê, hin guherîn di wan de pêk hatine. Ji wan deng kêman bûne, deforme bûne, li derî rêzika asayî mane û bûne xwedî rêzikinên din. Ji lew re em dibêjin awarteyên van cure lêkeran hene.

#### 4) Lêkerên ku dawîya wan bi /-rtin/ê diqedin

Ev cure lêkerên hanê, yên ku li dawîya wan /-rtin/ hene, bi awayekî giştî xwedî rêzik in. Ji van lêkeran jî piştî avêtina radera /-in/ê rayeka dema borî pêk tê û guherîna dangan di vê rayekê de çênabe. Tenê guherîna dengdêran di rayeka dema niha de pêk tê. Di lêkerên xwedî vî teşeyî de, bi awayekî giştî dengdêra /a/yê bi dengdêra /ê/yê diguhere. Em bi dayîna nimûneyan, van taybetiyên lêkerên jî vê şeweyê bidin xuyakirin: *Bihartin, bijartin, jimartin,*

*efsartin, dawertin, givêrtin, hêrtin, girtin, rabirtin, gewirtin, vemirtin û bihurtin.*

Heke we baş dêhn û bala xwe dabe wan, min mînakên ku piştî dengdara /r/yê dengdêrên /a/, /e/, /ê/, /i/ û /u/ tên dane. Min ev mînak jî bi zanebûn hilbijartin da ku em jê agahdar bibin bê ka kîjan dengdêr li dengdêrên din ditewin, ango ka bûyera tewanga lêkeran çawan diqewime.

Wek gava pêşîn, em radera wan ji wan bigirin biavêjin û vê yekê jî di nav kevanekê de bidin xuyakirin: *Bihart* (-in), *bijart* (-in), *jimart* (-in), *efsart* (-in), *dawert* (-in), *givêrt* (-in), *hêrt* (-in), *girt* (-in), *rabirt* (-in), *gewirt* (-in), *vemirt* (-in) û *bihurt* (-in).

Belê, bi vî awayî rayeka dema borî bi dest dikeve, her wiha tu guherîna dengan di wan de çênabe. Wekî mînakên ku me li jorê, di bin sernavên cuda de dabûn, qertafên kêşana demê li wan zêde dibin û hew.

Ji bo gava duyem, ev vê bibêjin. Ji van jî dengê dawî ku /t/ ye ji rayeka demên borî dikeve û tevî guherîna dengdêran, îcar rayeka dema niha bi dest dikeve. Bi gotineke din ku em bibêjin. Di van cure lêkeran de dengdar naguhere, ango dengdara /r/yê li dengdareke din danagere. Di van mînanan de jî tiştê ku dixuye, dengdêra /a/yê ya di kîteya dawî ya rayekê de, li dengdêra /ê/yê dadigere. Ligel vê yekê, eger kêmbê jî carinan dengdêra /a/yê ditewe dibe /i/ jî.

Pêşî em rayeka dema borî ya van lêkeran wek mînak bidin û piştê jî ketina dengdara dawî nîşan bidin: *Bihart, bijart,*

*jimart, efsart, dawert, givêrt, hêrt, girt, rabirt, gewirt, vemirt û bihurt.*

Bi mînanan em amaje pê bikin: *Bihar* (-t), *bijar* (-t), *jimar* (-t), *efsar* (t), *dawer* (-t), *givêr* (-t), *hêr* (-t), *gir* (-t), *rabir* (-t), *gewir* (-t), *vemir* (-t) û *bihur* (-t).

Em bi rewşa ku guherîna dengan jî di wan de pêk hatine, rayeka van lêkeran a dema niha derpêş bikin: *Bihêr, bijêr, jimêr, efsir, dawer, givêr, hêr, gir, rabir, gewir, vemir û bihur.*

Ji van cure lêkeran, eger kêmbê jî, lêkerên negerguhêz hene. Wekî lêkera "mirtin" (ango mirin). Em li ser van cure lêkeran jî ramanên xwe di bin çend xalan de formûle bikin

I) Bi avêtina radera /-in/ê, rayeka dema borî tê holê. Di vê rayekê de tu guherînen dengan rûnadin. Qertafên kêşanê yên deman li van rayekan zêde dibin.

II) Ji rayeka dema borî, piştî avêtina dengdara /t/yê, rayeka dema niha pêk tê. Di van lêkerên ku dawîya wan bi /-rtin/ê diqedin de, di rayeka dema niha de, tenê dengdêr diguherin ku ew jî bi awayekî giştî /a/ li dengdêra /ê/yê dadigere.

III) Hin ji van cure lêkeran, çendî ku pir û pir hindik in jî, negerguhêz in.

### 5) Lêkerên ku dawîya wan bi /-ftin/ê diqedin

Lêkerên me yên ku dawîya wan bi /-ftin/ê diqede, mîna lêkerên ku dawîya wan bi /-stin/, /-ştin/ û /-rtin/ê temam dibe, xwediyê rêzikan e. Ji van lêkeran jî, piştî avêtina radera /-in/ê, rayeka demên borî çêdibe û tu guherîna dengan di van ra-

deran de pêk nayê. Dîsan, guherîna dengan di rayeka dema niha de ye. Bi dorê, em bi mînanan vê riya hanê bişopînin. Lêkerên me yên mînak ev in: *Axaftin, xunaftin, quraftin, bişkaftin, keftin, qeşiftin, perçiftin, peyiftin û suftin.*

Em radera van lêkeran ji wan bikin û vê yekê jî di nav kevanekê de bidin nîşandan: *Axaft* (-in), *xunaft* (-in), *quraft* (-in), *bişkaft* (-in), *keft* (-in), *qeşift* (-in), *perçift* (-in), *peyift* (-in) û *suft* (-in). Rewşa dawî em nîşan bidin: *Axaft, xunaft, quraft, bişkaft, keft, qeşift, perçift, peyift û suft.*

Wekî hat dîtin, piştî ketina raderan, rayeka dema borî tê himatê û qertafên kêşanê yên deman li wan zêde dibin. Rayek her wekî xwe dimînin. Îcar jî em bi avêtina tîpa dawî ya di van rayekan de ku /t/ ye, bidestketina rayeka dema niha bidin xuyakirin. Di van cure lêkeran de jî, guherîna dengan di rayeka dema niha de diqewime.

Mîna gava duyemîn em gihaneka pêkhatina rayeka dema niha bi mînanan bidin xuyakirin û em ê ketina dengdara /t/yê, di nav kevanekê de nîşan bidin: *Axaf* (-t), *xunaf* (-t), *quraf* (-t), *bişkaf* (-t), *kef* (-t), *qeşif* (-t), *perçif* (-t), *peyif* (-t) û *suf* (-t).

Di van cure lêkeran de, bi awayekî gelemper dengdara /f/yê li dengdara /v/yê û dengdêra /a/yê jî li dengdêra /ê/yê dadigere. Niha jî em rewşa wan a dawî derpêş bikin, her wiha bidin xuyakirin ku kîjan dengdêr û dengdar li dengên din dadigerin: *Axêv* (?), *xunif* (?), *qurêf* (?), *bişkêv*, *kev* (?), *qeşiv*, *perçiv* (?), *peyiv* û *suv*.

Em berêvkî pê de herin û bê çima me xalepîrs daniye ber hînekan, em bibêjin û rewşê rave bikin. Mînaka pêşîn “axêv”, ev lêkereke negerguhêz e, bi awayê “axaftin” û awayê wê yê gerguhêz jî “axaftandin” an jî “axivandin” e. Li aliyê din, hinde herêm ji bo rayeka dema niha wê ne wek “axêv”, lê belê mîna “axiv” bi lêv dikin. Her wiha tê dîtin ku dengdara /f/yê li dengdara /v/yê dageriyaye. Jixwe ev guherîna hanê, ji bo van cure lêkeran bi giştî guherîneke adetî ye.

Lêkera “xunafîtin” ku diviya radera wê li gorî rêzikê wek “xunêv” bûya, em dibînin ku mîna “xunif” jî tê bilêvkirin. Her du deng jî wek adetî li /ê/ û /v/yê danegeriyane. Herçî lêkera “qurafîtin” e, ku rayeka wê ya dema niha “qurêf” e, diviya ku “qurêv” bûya. Lê di vê lêkerê de jî îcar dengdara /f/yê danegeriyaye nebûye /v/. Di zimanê devkî de rewş ev e.

Lêkera “keftin”, ku di zimanê me yê devkî de bi piranî mînanî “ketin” dertê pêşberî me, di rastiya xwe de şeweya wê ya bera “keftin” e. Jixwe di zaravayê me yê din de, di kirmancîkî (zazakî) û kurmanciya nave-rast (sorani) de em rastî şeweyên wê yê wekî “kewtene” û “kewtin” tên. Her wiha em ji /v/ya ku di rayeka dema niha ya vê lêkerê de heye, tê derdixin ku divê rayeka wê “keftin” an jî “kewtin” be. Di kurmançî de, lêkerên mîna *derketin*, *daketin*, *raketin*, *hilketin*, *veketin*, *werketin*, *jê ketin*, *lê ketin*, *vê ketin* û *pê ketin* ji lêkera “keftin” ango “ketin”ê hatine zêdekirin û mîna ku di rayeka demên borî de li dawiyê dengê /f/yê tune be tên kişandin. Rewşa di kardariyê de îro ev e.

Em bèn ser lêkera “perçiftin”ê. Ev lêker, lêkereke negerguhêz e û bi awayê “perçivîn” an jî “perçifîn” jî tê zanîn. Li aliyê din, awayên wê yê gerguhêz, “perçivandin” e.

Em der barê van cure lêkeran de gotin û ramanên xwe aşkeratir bikin û bibêjin ku:

I) Ji van lêkeran bi avêtina radera /-in/ê, rayeka demên borî çêdibe. Di vê rayekê de guherîna denga rûnade û çênabe. Qertafên kêşanê yê deman li van rayekan zêde dibin.

II) Piştî avêtina dengdara /t/yê, ji rayeka demên borî, rayeka dema niha pêk tê. Di van lêkerên ku dawîya wan bi /-ftin/ê diqedin de, di rayeka dema niha de, dengdêr û dengdar tev de diguherin. Bi awayekî giştî /f/ li dengdara /v/yê û dengdêra /a/yê jî li dengdêra /ê/yê dadigere.

III) Ev cure lêker, hin jê gerguhêz û hin jê jî negerguhêz in.

IV) Di van lêkeran de jî, ji ber sedemên cuda, rewşên ku derî rêzika giştî ne, qewimîne.

#### 6) Lêkerên ku dawîya wan bi /-ptin/ê diqedin

Di zimanê me de, ez heta niha rastî lêkereke tenê hatime, ku li dawîya wê /-ptin/ heye. Ev lêker jî lêkera “qelaptin” e, ku qulaqtin û qelibandin, sînonîmên wê ne. Di vê lêkerê de /-in/ rader e û bi avêtina wê raderê demên borî çêdibe. Piştî ketina dengdara /t/yê û dagerîna dengdara /p/yê li dengdara /b/yê rayeka dema niha çêdibe.

Gihaneka pêşîn: *Qelap* (-in), *qulapt* (-in). *Qelapt* an jî *qulapt* rayeka dema borî ye. Guherîna denga di vê rayekê de pêk nayê.

Gihaneka duyemîn: *Qelap*(-t), *qulap*(-t): Bi ketina dengê /t/yê û dagerîna /p/yê li /b/yê jî rayeka dema niha bi dest dikeve û di vê rayekê de jî dengdêra /a/yê li dengdêra /ê/yê dadigere. Piştî ketin û dagerîna denga rayeka dema niha ev e: *Qelêb* an jî *qulêb*.

#### 7) Lêkerên ku dawîya wan bi /-xtin/ê diqedin

Di van lêkeran de, ku me di bin vî sernavî de dane, guherîna denga tenê di dengdêran de diqewime. Ew jî di rayeka dema niha de ye. Di van de jî piştî avêtina raderê ku /-in/ e, rayeka dema borî û bi ketina dengdara /t/yê û dagerîna dengdêra /a/ya di kîteya dawiyê de, bi dengdêra /ê/yê, rayeka dema niha bi dest dikeve. Em vê qewamê bi hev re bişopînin, hem jî bi dayîna nimûneyan: Lêkerên me yê ku wek mînak hatine hilbijartin ji ev in: *Kesaxtin*, *pelaxtin*, *mezaxtin* û *niwaxtin*.

Gihaneka destpêkê, em pêşî raderên wan ji wan bikin û di kevanê de jî vê rewşê diyar bikin: *Kesaxt* (-in), *pelaxt* (-in), *mezaxt* (-in) û *niwaxt* (-in). Em rewşa dawî, ango rayeka dema borî ya van lêkeran rapêş bikin: *Kesaxt*, *pelaxt*, *mezaxt* û *niwaxt*.

Piştî avêtina raderê, rayeka demên borî pêk tê. Niha jî em bala xwe bidinê ku dengdara dawî /t/ ji vê rayeka dema borî dikeve û tevî guherîna dengdêra /a/yê bi dengdêra /ê/yê hîna rayeka dema niha tê pê. Wek gihaneka diduyan em vê merhaleyê jî destnîşan bikin: *Kesax* (-t), *pelax* (-t), *mezax* (-t) û *niwax* (-t). Bi dû ketina dengdara /t/yê û guherîna dengê /a/yê bi /ê/yê,

ku dengê /x/yê bi dengdareke din naguhere, rayeka dema niha ya van cure lêkeran ev e: *Kesêx, pelêx, mezêx û niwêx*.

Em gotinên xwe yên der barê lêkerên di bin vî sernavî de ji bibêjin:

I) Bi avêtina radera /-in/ê, rayeka dema borî çêdibe. Di vê rayekê de guherîna dengan rû nade. Qertafên kêşanê yên demê li van rayekan zêde dibin.

II) Piştî avêtina dengdara /t/yê, ji rayeka demên borî, rayeka dema niha pêk tê. Di van lêkerên ku dawîya wan bi /-xtin/ê diqedin de, di rayeka dema niha de, dengdêr tenê diguhere.

III) Mînakên ku min ji bo van cure lêkeran bi dest xistine, gerguhêz in. Ez heta niha rastî yên negerguhêz nehatime.

### 8) Lêkerên ku dawîya wan bi /-atin/ê diqedin

Lêkerên me yên ku wiha ne, ango ku li dawîya wan /-atin/ heye, gelek kêma in. Heta hin jê jî, ji lêkera “*hatin*”ê zêde bûne. Mîna *dahatin, derhatin, hilhatin, rahatin, werhatin, jê hatin, lê hatin* û *pêk hatin*. Lewma min tenê xwest lêkerên ji vê komê yên sade (xwerû) wek mînak derpêş bikim. Lêker hev in: *Hatin, satin, rewatin, patin* û *hîzvatîn*.

Ji nav van, du lêker wek lêkerên nerêzikî (bêqayde) tînin pejirandin. Lêkerên “*hatin*” û “*patin*”. Lê bi ya min ev her du lêker jî lêkerên rêzikî ne. Em rayeka van lêkeran a dema borî nîşan bidin: *Hat* (-in), *sat* (-in), *rewat* (-in), *pat* (-in) û *hîzvat* (-in).

Eger em bi awayê rayeka demên borî wan nîşan bidin:

*Hat, sat, rewat, pat* û *hîzvat*. Wekî me li jorê jî got, lêkerên “*hatin*” û “*patin*” mîna lêkerên nerêzikî tînin pejirandin û wisan tînin zanîn. Lêkera “*hatin*”, lêkerê negerguhêz, lê belê “*patin*” gerguhêz e. Lêkera cêwîk û ya rêzikî ya “*patin*”ê, “*pijandin*” e. Heye ku awayê berê yê lêkera “*patin*”ê “*paştin*” be jî. Ji ber ku di dema niha de em wê mîna “*ez dipêjim*” dikêşin. Ji lew re li gorî rêzika ku dengê /ş/yê li /j/yê û dengê /a/yê jî li dengê /ê/yê dadigere, em dişên bibêjin ku /ş/ya di rayeka dema borî de jê ketiye.

Der barê lêkera “*hatin*”ê de jî ez dikarim ramanên xwe wiha diyar bikim: Çendî roja îro ji aliyê gelek zimanzanan ve ev lêker wek lêkerê nerêzikî bê qebûlkirin jî, bi ihtimaleke mezî ev lêkerê me ya teşeguhêrî (ango deforme bûyî) ye. Em bi hevokên nimûneyê dirêjî bi mijara xwe bidin. Ji bo dema niha û dema bê em vê lêkerê wiha bi kar tînin:

*Ez tîm, ez ê bêma.*

Lê ez dibêjim ku ev lêker jî ber ku bi doman û qonaxa demê re teşeguhêzî bûye, loma ketiye vî halî. Îcar ku em wê wek eslê wê bikêşin, ev rewşa teşeguhêziyê ji holê radibe. Em dişan bi hevokên nimûneyî balê bikişînin ser rewşê û bikin ku dabaşa me zelaltir bibe.

*Ez dihêma, ez ê bihêma.*

Ji bo ku “*dih*” jî ber sedemên denganiyê (fonetîkê) di zimanê devkî de bûye “*r*” û “*bih*” jî bûye “*b*”. Mîna lêkera “*inan*” ku çawan di dema kêşanê de wekî “*ez tînim*” û “*ez ê bînim*” tînin bikaranîn. Lê ev jî,

gerêk wek “*ez diînim*” û “*ez ê biînim*” bînin kişandin ku awayê wan ê rast wiha ye.

Herçî lêkera “*rewatin*” e, ev lêkerê teşeguhêrî ye, ango deforme bûye û awayê wê yê rast, “*rihoştin*” e. Ev lêker li hin deveran, bûye wekî “*rihotin*” û “*rewatin*”.

Di pey van ravekirinan de em niha rayeka dema niha ya van lêkerên hanê bidin xuyakirin. Ji van lêkeran, mîna cure lêkerên li jorê, herfa wan a dawî */t/*, dikeve û dengdêra dawî */a/* jî li */ê/yê* dadigere: *ha* (-t), *sa* (-t), û *hîzva* (-t).

Min bi taybetî lêkerên “*patin*” û “*rewatin*” wek mînak derpêş nekirin. Ji ber ku ew êdî di zimanê me yê devkî de bi qaydeyê nerêzikî tînin bikaranîn. Bi gotîneke din, ji ber ku dengê /ş/yê ji wan ketiye û teşeguhêrî bûne, mane derî adet. Rewşa dawî ya van lêkeran: *Hê, sê* û *hîzve* ne.

Der barê van lêkeran de kurtasiya gotinên me:

I) Bi avêtina radera /-in/ê, rayeka dema borî çêdibe. Di vê rayekê de guherîna dengan çênabe. Qertafên kêşanê yên demê li van rayekan zêde dibin.

II) Piştî avêtina dengdara /t/yê, ji rayeka dema borî, rayeka dema niha pêk tê. Di van lêkerên ku dawîya wan bi /-atin/ê diqedin de, di rayeka dema niha de, dengdêr tenê diguhere. Her wiha dengdêrên qertafên kesan ên lêkera bûnê (an jî qertafên pêvebestî) di wexta kêşanê û çivanê de cihê xwe didin dengdêra /ê/yê.

III) Lêkerên ku di nav vê senifandinê de cih digirin, hinek gerguhêz û hinek jî negerguhêz in.

### 9) Lêkerên ku dawîya wan bi /-êtin/ê diqedin

Ev lêkerên ku di bin vî sernavî de me wek mînak dane, he ma em bibêjin tev de, lêkerên teşeguhêrî ne. Ango lêkerên we-lê ne ku dengê /ş/yê ji wan ketiye. Ji ber ku di van lêkeran de, di dema kêşana dema niha û bê de, mirov rastî dengê /j/yê tê. Herçî lêkera “vêtin” e, (ku em wê wekî vên û vîn jî dinasin) ji min re wisan tê ku eleqeya wê bi lêkera me ya “xwestinê” heye. Jixwe di zaravayê kirmanckî (zazakî) de “xwestin”a kurmancî dibe “wastene” (an jî waştene). Di zaravayê kurmanciya naverast de (ango soranî) de jî “wîstin” e. Em bînin bîra xwe ku dengê /v/yê di vî zaravayê me de nîn e. Ji lew re li gorî kurmancî em dikarin wê mîna “vîstin” jî bi lêv bikin.

Belê, çendî gava ku em li teşeyê wan dinêrin, ji me re wek lêkerên neteşeguhêrî bîn jî, lê di çaxa kêşana wan ên demên niha û bê de, mirov pê dihese û di wan derdixê ku guherîneke denganiyê di wan de pêk hatiye û heta dengê /ş/yê ji wan ketiye. Em serî li mînakan bidin û lê bixebitin ku mijara xwe ronî bikin. Gava yekem, em rayeka wan a demên borî nîşan bidin: *Avêt (-in), mêt (-in), rêt (-in), vêt (-in), verêt (-in), dabêt (-in) û rawêrt (-in)*.

Ji van lêkeran, lêkera “vêtin”, di gava kêşanên demên borî de xwedî gelş û arîşe ye. Kêşanên wê yên demên borî ne li gorî rayeka “vêt”ê tîna kişandin, lê halê hazir li gorî şeweya “viyan”ê tê kişandin. Bi gotineke din, mîna ku ew lêkerê nerêzikî be, wekî ku ji bo dema niha tevî raderê lêker “vên” be

û ji bo demên borî jî lêker tevî raderê “viyan” be tê pejrandin.

Gava duyem, îcar em rayeka wan a dema niha derpêş bikin. Heke em dengdara /t/yê ji wan bigirin biavêjin, rayeka dema niha tê holê: *Avê (-t), mê (-t), rê (-t), vê (-t), verê (-t), dabê (-t) û rawêr (-t)*. Niha jî em rewşa wan a dawî pêşkêş bikin: *Avêj (?), mêj (?), rêj (?), vê (?), verêj (?), dabê û rawêr*.

Bala we kişandibe, di nav kevanekê de, li ber hin rayekan nîşana xalepîrsê heye. Em niha sedema vê yekê rave (îzah) bikin. Em jî bervêkî de dest pê bikin û dirêji bi ravekirina xwe bidin: Ev avêj, rayeka lêkera “avêtin” e ku, di hin devokan de wê forma xwe ya berê parastiye û ew “avêstin” e. Loma di rayeka dema niha de em rastî guherîna dengê /ş/yê bi /j/yê tîna, ku ew di hin devokan de maye û bi giştî di zimanê kurmancî de wekî “avêtin” tê zanîn.

Lêkera “mêtin”, dîsan di rastiya xwe de “mêştin” e, ku ev teşe jî di hin devokên kurmancî de hîna xwe dihêvişîne. Ji lew re di dema niha de em dibêjin “Ew dimije.” Heman tişt bi serê lêkera me ya din di “rêtin”ê de jî pêk hatiye. Ew jî “rêştin” e. Em eynî tiştî ji bo lêkera “verêtin”ê jî dibêjin ku jixwe bi qertafa lêkerçêker /ve-/yê çêbûye.

Ji bo lêkera “rawêrtin”ê jî em vî bibêjin, di kurmancî de gelek teşeyên wê hene. Mîna *bihartin, rabihartin, rawirandin, borandin, bihurandin...*

Li ser van cure lêkeran, em dikarin bi kurtasî van bibêjin:

I) Bi avêtina radera /-in/ê, rayeka dema borî çêdibe. Di vî

rayekê de guherîna dengê çê-nabe. Qertafên kêşanê yên demê li van rayekan zêde dibin.

II) Piştî avêtina dengdara /t/yê, ji rayeka demên borî, rayeka dema niha pêk tê. Di van lêkerên ku dawîya wan bi /-êtin/ê diqedin de, (em behsa yên ku dengê /ş/yê ji wan ketiye nakin) di rayeka dema niha de, dengdêr diguhere û /ê/ dibe /i/. Li aliyê din, di gava kêşanê de, dengdêrên qertafên kesan (an jî qertafên pêvebestî) cihê xwe didin dengdêra /ê/yê.

III) Lêkerên ku di nav vî senifandinê de cih digirin, gerguhêz in.

### 10) Lêkerên ku dawîya wan bi /-otin/ê diqedin

Lêkerên ku me di bin vî sernavî de senifandinê, hin jê di rastiya xwe de ne yên vî komê ne. Piştê re, di nav mijarê de dê gotin bê ser wan. Bi avêtina raderê /-in/ê, rayeka dema borî çêdibe. Wek gihaneka pêşîn em vî yekê nîşan bidin. Lêkerên me yên ji bo nimûne jî ev in: *Ajot (-in), firot (-in), sot (-in), dot (-in), got(-in), hêvot (-in), rihot (-in) û kot (-in)*.

Gava ku em dengdara /t/yê jî van rayekan biavêjin, îcar rayeka dema niha pêk tê. Di gihaneka diduyan de em vî rewşê diyar bikin: *Ajo (-t), firot (-t), so (-t), dot (-t), go (-t), hêvo (-t), riho (-t) û ko (-t)*.

Ji nav van lêkeran, lêkera “gotin”, lêkerê nerêzikî ye, çendî di nav lêkerên mînak de me nîşan daye jî, ew derî vî rêzikê ye. A rast ez wisan difikirin ku ew lêker jî lêkerê teşeguhêrî be û di rastiya xwe de lêkerê rêzikî be. Lê halê

hazir wek ku ne nêrizîkî be, ji aliyê zimanzanan ve tê pejirandin. Min dil kiriye ku ez di nivîsareke cihê de li ser lêkerên nêrizîkî û û yên teşeguhêrî bi taybetî rawestim û li wan bikolim. Niha, li vir tenê ev gotinên der barê van lêkeran de, bes in.

Li aliyê din, hin lêkerên ku me di nav vê komê de dane jî, di rastiya xwe de xwedî teşeyên din in. Ango ji wan dengdara /ş/yê ketiye. Em vê rewşa hanê, dîsan ji rayeka wan a dema niha, tê derdixin. Em piştî ketina dengê /t/yê ji rayeka wan a dema borî, rayeka wan a dema niha nîşan bidin: *Ajo, firoş (?), soj (?), doş (?), hêvoj (?), rihoj (ş) û koj (?)*.

Ez sedemên ku min di nav kevanekê de nîşan û hêmaya xalêpirsê daniye ber hin rayekan, rave û diyar bikim. Pêşî em ji “firoş”ê dest pê bikin. Rayeka dema borî ya vê lêkerê bi piranî “firo” e, lê em dizanin ku wek “firoştin” jî tê bikaranîn. Ev yek. A duyemîn, dîsan em ji /ş/ya di “firoş”ê tê derdixin ku ji rayeka dema borî ku wek “firo” tê bikaranîn, ev deng ketiye. Bi awayê rast diviya ku li gorî rêzikê ev /ş/ya di rayeka dema niha de /j/ bûya. Lê rewşeke derî asahiyê çêbûye.

Rayeka lêkera “sotin” jî di dema niha de wek “soj” derdikeve ber me. Lê em rast lê nayên ku ew mîna “soştin” tê bikaranîn. Em vê bibêjin ku jixwe ji aliyê şekil ve “sotin” û “şewitîn” heman tişt in, guherîna denganiyê di wan de qewimiye û her yek ji wan ketiye teşe û şeweyekî din. Bi awayekî din bibêjin. Berê eynî bûne, paşê ji ber guherîna denganiyê ketine du rewşên ku wekî ji hev cihê bin.

Bi gotina kin û kurt, lêkerên “dotin”, “hêvotin”, “rihotin” û “kotin” di rastiya xwe de “doştin”, “hêvoştin”, “rihoştin” û “koştin” in. Ji van lêkeran jî dengê /ş/yê ketiye. Lê em ji rayeka wan a dema niha dizanin ku ev deng ji rayeka wan a dema borî kêm bûye. Îcar di rayeka wan a dema niha de, li gorî rêzika ku divê dengê /ş/yê li dengê /j/yê dagere, rewşeke berevajî pêk hatiye. Deng neguheriye, mîna xwe maye. Halê hazir, di roja îro de welê ye. Li ser lêkerên ku di vê komê de cih digirin, em van daxuyaniyan bi awayekî kurtasî bidin:

I) Bi avêtina radera /-in/ê, rayeka demên borî çêdibe. Di vê rayekê de

guherîna dengan çênabe. Qertafên kêşanê yên demê li van rayekan zêde dibin.

II) Piştî avêtina dengdara /t/yê, ji rayeka demên borî, rayeka dema niha pêk tê. Di van lêkerên ku dawîya wan bi /-otin/ê diqedin de, (em behsa yên ku dengê /ş/yê ji wan ketiye nakin) di rayeka dema niha de jî em rastî guherîna dengan nayên. Lê dengdêrên qertafên kesan (an jî qertafên pêvebestî) cihê xwe didin dengdêra /o/yê.

III) Lêkerên ku di nav vê senifandinê de cih digirin gerguhêz in.

### 11) Lêkerên ku dawîya wan bi /-utin/ê diqedin

Ez heta niha rastî mînakeke tenê hatime ku dawîya wê bi /-utin/ê kuta û red dibe. Ew jî mîna hemû lêkerên ku kîteya wan a dawîna /-tin/ e, bi hilanîna radera /-in/ê jê, rayeka dema borî û piştî ketina dengdara

/t/yê jî, rayeka dema niha tê himatê. Lêkera ku dabaşa me li ser e, hewutin e. Heke em radera /-in/ê jê biavêjin “hewut” dimîne. Her wiha ji vê jî em dengdara /t/yê bigirin deynin aliyekî, îcar “hewu” dimîne li rastê.

Di dema kêşana vê rayekê ya dema niha de jî, ev dengê li dawîya rayekê ku /u/ ye, cihê xwe dide qertafên lêkera bûnê (ango qertafên lêkerên pêvebestî). Di vê lêkera nimûneyî de em rast lê nehatin ku guherîneke dengan tê de diqewime.

### 12) Lêkerên ku dawîya wan bi /-ûtin/ê diqedin

Lêkerên ku me di bin vê xalê de senifandine, wekî lêkerên bi şeweya ku li dawîya wan kîteya /-tin/ê heye, xwedî rêzîkekê ne. Radera wan jî /-in/ e. Bi hilanîna ve raderê rayeka demên borî çêdibin. Guherîneke dengan di vê rayekê de naqewime û rûnade. Dîsan bi ketina dengdara /t/yê ya li dawîyê, rayeka dema niha tê pê û guherîneke denganiyê pêk nayê, bi gotineke din ne dengdar û ne jî dengdêr di vê rayekê de bi dengekî din naguhere.

Em lêkerên xwe yên mînak derpêş bikin û bi hev re li vê guherîneke bişopînin: *Ajût (-in), bizût (-in), cût (-in), dût (-in), nimût (-in), rût (-in) û sût (-in)*. Em van rayekan careke din bi rewşa xwerû bidin nîşandan: *ajût, bizût, cût, dût, nimût, rût û sût*.

Niha jî em qonaxa duyemîn bidin xuyakirin. Di rayeka dema niha de, dengê /t/yê dikeve. Em bi mînakdayîne vê rewşê diyar bikin: *Ajû (-t), bizû (-t), cû (-t), dû (-t), nimû (-t), rû (-t) û sû (-t)*.

Piştî vê rewşê, eger em vê gihaneka duyemîn jî bi awayekî xwerû destnîşan bikin û rayekên xwe yê dema niha derpêş bikin, dê baş be: *Ajû, bizû, cû, dû, nimû, rû û sû*.

Bi gotinên kurt, der barê van lêkerên ji vê cureyê de em raveka xwe ya dawî bibêjin:

I) Bi avêtina radera */-in/ê*, rayeka dema borî çêdibe. Di vê rayekê de guherîna dengan çê-nabe. Qertafên kêşanê yê demê li van rayekan zêde dibin.

II) Piştî avêtina dengdara */t/yê*, ji rayeka demên borî, rayeka dema niha pêk tê. Di van lêkerên ku dawîya wan bi */-ûtin/ê* diqedin de, di rayeka dema niha de jî em rastî guherîna dengan nayên. Lê dengdêrên qertafên kesan (an jî qertafên pêvebestî) di dema kêşanê de cihê xwe didin vê dengdêra */û/yê*.

III) Lêkerên ku di nav vê senifandinê de cih digirin, hinek gerguhêz in û hinek jî negerguhêz in.

### 13) Lêkerên ku dawîya wan bi */-ûtin/ê* diqedin

Lêkerên ji vê senifanê, hema bibêje ji yê ku kîteya wan a dawî */-tin/ e*, ne cuda ne. Ji van jî, piştî hilanîna radera */-in/ê*, rayekên dema borî bi dest dikevin. Her wiha bi ketina dengdara tîpa dawî ku */t/ ye*, îcar rayeka dema niha tê holê.

Em wek gava destpêkê, lêkerên xwe yê nimûneyî pêşkêş bikin. Piştî jî di nav kevanê de rayeka wan bidin xuyakirin: *Birût (-in), dît (-in), dawût (-in), pût (-in), riwût (-in), rût (-in), vebirût (-in), vemirût (-in), verût (-in) û zût (-in)*.

Îcar em gihanekan diduyan jî bi heman rêbazî nîşan bidin. Pêşî em rewşa wan a ji bo rayeka dema borî hildinku deynin vir: *Birût, dît, dawût, pût, riwût, rût, vebirût, vemirût, verût û zût*. Niha jî em ketina dengdara */t/yê*, bi vî awayî diyar bikin: *Birî (-t), dî (-t), dawî (-t), pî (-t), riwî (-t), rî (-t), vebirî (-t), vemirî (-t), verî (-t) û zî (-t)*.

Di pey van gihanekan de, min divê ku ez rayekên dema niha yê van lêkeran bi awayê xwerû bidim xuyakirin: *Birî, dî (?), dawî, pî, riwî (?), rî, vebirî, vemirî, verî û zî*.

Dêhna we lê be, min xalepîrs li ber du rayekan daniye. Yek jê “dî” ye, ku ev lêker ne lèkerekê rêzikî ye. Loma min xwest ku ez balê bikêşim serê. Ya duyemîn jî “riwî” ye, ev lêker jî formeke din a lêkeran “rêtin” ang “rêştin” e.

Bi awayekî kurt em taybetiya van cure lêkeran vebêjin:

I) Bi avêtina radera */-in/ê*, rayeka dema borî çêdibe. Di vê rayekê de em leqayî guherîna dengan nayên. Qertafên kêşanê yê demê li van rayekan zêde dibin.

II) Piştî avêtina dengdara */t/yê*, ji rayeka dema borî, rayeka dema niha pêk tê. Di van cure lêkeran de, di rayeka dema niha de jî guherîna dengan pêk nayên. Lê dengdêrên qertafên kesan (an jî qertafên pêvebestî) di dema kêşanê de cihê xwe didin vê dengdêra */î/yê*.

III) Lêkerên ji vê senifandinê hinek gerguhêz in û hinek jî ne gerguhêz in.

### 14) Lêkerên ku dawîya wan bi */-rin/ê* diqedin

Lêkerên me yê sade yê ji vê grûbê gelek kêma in. Lê Lêkerên me yê ku ji van lêkeran hatine zêdekirin, gelek in. Ji lew re min digel ên xwerû hinek ên ne sade jî wek mînak dan. Lêker ev in: *Birin, kirin, xwarin, vexwarin, dakirin, rakirin, hilkirin û mirin*.

Radera van lêkeran jî */-in/ e* û piştî hilanîna vê raderê, rayeka demên borî çêdibe. Di pey vê merhaleyê de, îcar bi ketina dengdara */r/yê* jî rayeka dema niha pêk tê. Di her du rayekan de jî tu guherînên dengan naqewimin. Ango ne dengdar bi dengdareke din û ne jî dengdêr bi dengdêreke din diguhere.

Bi dayîna mînakan em roniyê bidin ser mijara xwe û aşkera bikin. Gihaneka pêşîn, em awayê bidestxistina rayeka demên borî bibînin bê ka bi çi awayî pêk tê. Dîsan wekî nimûneyên din, di nav kevanê de em raderên wan nîşan bikin: *bir (-in), kir (-in), xwar (-in), vexwar (-in), dakir (-in), rakir (-in), hilkir (-in) û mir (-in)*.

Gihaneka duyem jî ev e: Pêşî dengdara */r/yê* dikeve û bêtî ku tu guherîneke denganiyê di rayekê de pêk were, rayeka dema niha ya lêkerê bi dest dikeve. Em wê jî nîşan bidin: *bi (-r), ki (-r), xwa (-r), vexwa (-r), daki (-r), raki (-r), hilki (-r) û mir (?)*.

Di van cure lêkeran de, ji bo kêşena rayeka dema niha, ketina dengdêra */i/ û /a/yê* heye. Piştî ku di dema kêşanê de qertafên kesan (ên mîna *-im, -î, -e* û *-in*) tîn pêşiya wan, ew deng dikevin û cihê xwe didin wan

qertafên kesane, an jî qertafên lêkera bûnê. Ku hinek kes ji wan re qertafên pêvebestî jî dibêjin.

Li ber rayeka van mînanan, min tenê nîşana pirsê li ber rayeka "mir"ê danî. Sedema vê jî ev e. Ev lêker, lêkerêke şêweguherî ye. Di rastiya xwe de ev lêker bi awayê "mirtin" an jî "mirtîn" e. Lê halê hazir, di zaravayê kurmançî de wek "mirin" nasyar e û wisan tê bikaranîn. Lê belê şêweyên din jî (mirtin û mirtîn jî) di kurmançî de hene. Li aliyê din ev lêker di zaravayê kirmançî de "merden" e û di kurmançiya naverast de jî "mirdin" e.

Îcar, gava em li ser rayekên vê hûr dibin, em dibînin ku kêmasiyek di vê lêkerê de heye. Eger şêweya wê "mirin" be, divê piştî hilanîna raderê (ku 'in' e) ji bo rayeka demên borî "mir" bima û ji bo rayeka dema niha jî, piştî ku dengdara /r/yê jê biketa "mi" bima. Lê em dibînin ku rewşeke derî rêzîkê li rastê heye. Ji bo her du rayekan jî em şêweya wê ya "mir" bi kar tînin. Lê belê, heke em ji bo kurmançî eslê lêkerê wek "mirtin" bipejirînin, gelş çareser dibe. Em dêhna xwe bidinê bê çawan arîşe ji holê radibe: mirtin; heke em raderê (ku 'in' e) jê biavêjin "mirt" li holê dimîne û ev jî rayeka dema borî ye. Îcar em dengê /t/yê jê bigirin biavêjin, li rastê "mir" dimîne û ev jî rayeka dema borî ye. Bi kurtasî di vê lêkerê de rewşeke derî adet qewimiye.

Em taybetiyên van cure lêkeran di çend xalan de vebêjin:

I) Bi avêtina radera /-in/ê, rayeka demên borî çêdibe. Di vê rayekê de em leqayî guhe-

rîna dengan nayên. Qertafên kêşanê yên demê li van rayekan zêde dibin.

II) Piştî avêtina dengdara /r/yê, ji rayeka dema borî, rayeka dema niha pêk tê. Di van cure lêkeran de, di rayeka dema niha de jî guherîna dengan pêk nayê. Lê dengdêrên mîna /a/ û /i/yê, di dema kêşanê de cihê xwe didin qertafên kesan (an jî qertafên pêvebestî).

III) Lêkerên ji vê senifandinê, gerguhêz in.

### B) Lêkerên ku radera wan /-n/ e

Me gotibû ku di zimanê me de du rader hene; yek jê /-in/û yek jî /-n/ ye. Li ser lêkerên me yên ku radera wan /-in/ e, di bin çend sernavan de, em rawestîyan, niha jî em dixwazînin di bin çend xalan de em li ser lêkerên ku radera wan /-n/ in bisekinin. Bi ya min bi vê rêbazê dê mijar hîn bêhtir hêsan û zelaltir bibe. Ji lew re ez dê senifanê (ango kategorîkirinê) li gorî kîteya dawî ya lêkerê bikim û tenê bi awayê dengdêra dawî û radera lêkerê mijarê hildime dest. Çimkî hin lêkerên me hene ku tenê xwedî kîteyekê (heceyekê) ne.

#### 1) Lêkerên ku dawîya wan bi /-an/ê diqedin

Ev lêkerên hanê, ku me got li dawîya wan /-an/ heye, piştî avêtina radera /-n/yê ji wan, di destê me de rayeka dema borî dimîne û di dema kêşana van rayekan de tu guherîna dengan di wan de pêk nayê. Lê di dema kêşana rayeka dema niha de, rewşeke li dijî vê yekê derdikeve pêşberî me.

Ka em pêşî, ji gihaneka ewi-

li dest pê bikin û paşê em bîser gihaneka duyemîn bê ka çî guherînen denganiyê pêk tînin. Lêkerên me yên mînak ên ji bo vê xalê, ev in: *Dan, hêlan, înan, kêşan, kolan, pan, pêçan, razan û zan*. Heke em /-n/ya rader ji wan bikin, li ber destê me rayeka dema borî dimîne. Em vê yekê nîşan bidin: *Da (-n), hêla (-n), îna (-n), kêşa (-n), kola (-n), pa (-n), pêça (-n), raza (-n) û za (-n)*. Rayeka dema borî ya van lêkeran ev in: *Da), hêla, îna, kêşa, kola, pa, pêça, raza û za*.

Min li jorê jî nîşan da ku di heyna kêşana rayeka dema borî de, tu guherîneke dengan, an jî bi gotîneke din, tu bûyereke dengan di vê rayekê de pêk nayê. Tenê qertafên deman li vê rayekê zêde dibin.

Niha jî em bala xwe bidine rayeka dema niha. Ji bo ku ev rayek jî çêbe, eynî mîna lêkerên me yên ku rayeka wan /-in/ bû, ku piştî rayeka dema borî, denggek (çî dengdar û çî jî dengdêr) jî rayekê diket û ji bo hin lêkeran jî piştî guherîna dengan bi dengîna din, rayeka dema niha pêk dihat, eynî wisan, ji bo van cure lêkeran jî ji bo ku dema niha pêk were, divê denggek jî rayeka dema borî bikeve. Ev deng jî, dengê herî dawî ye. Em niha jî werin ser gihaneka diduyan û dêhna xwe bidinê bê ka rayeka dema niha a van cure lêkeran çawan bi dest dikevin û vê rewşê bişopînin.

Di dubarekirinê de feyde heye, me got ku piştî jî dawîya rayeka dema borî denggek dikeve hîna rayeka dema niha tê himatê. Em rayekên dema borî yên lêkerên nimûneyî dîsan esas bigirin û rûdanê li ser wan bişopînin. Em niha vê bidin nîşandan û xistina dengê dawî jî



di nav kevanekê de bidin xu-yakirin: *D* (-a), *hêl* (-a), *în* (-a), *kêş* (-a), *kol* (-a), *p* (-a), *pêç* (-a), *raz* (-a) û *z* (-a).

Em îcar jî bi rewşa wan a mayî wan pêşkêş bikin. *D*, *hêl*, *în*, *kêş*, *kol*, *p*, *pêç*, *raz* û *z*. Di dema kêşanê de qertafên dem û kesan li van rayekan zêde dibin. Lê guherînek di dengê rayekê de pêk nayê. Tenê ji van mînan, di çendan de (ku ew ev in; pan, zan û razan in), li derî rêzikê rewşek heye. Di şûna dengê */i-ya* lêkerên bûnê (lêkerên pêvebestî) de, dengê */ê/yê* derdikeve pêşberî me.

Ji bo ku mijar ronî bibe û baştir bê fehmkirin, em bi mînan li dabaşa xwe bidomînin. Di destê me de ji bo rayeka dema niha ya lêkera "pan"ê "p", ji bo ya "zan"ê "z" û ji bo ya "razan"ê jî */raz/* mabû. Li gorî rêzika giştî *divê* ev wiha bihatana kişandin:

Ez dipîm (ne dipê)m  
Ew dize (ne dizê)  
Ew dê razin (ne razên).

Em çend mînanan jî lêkerên me yên nimûneyî bidin, ku ji vî aliyî ve rêzikî ne. Ji lêkera "dan"ê "d", ji lêkera "hêlan"ê "hêl" û ji lêkera "kêşan"ê jî "kêş".

Ez didim  
Tu dihêlî  
Ew ê bikêşe.

Wekî tê dîtin ev lêkerên "pan", "zan" û "razan", di çaxa rayeka dema niha de derdikevin derî rêzika giştî û hema bibêje di zimanê nivîskî de jî bi piranî mîna ku ew ne rewşeke derasayî be, tînan bikaranîn.

Taybetiyên van cure lêkeran em di çend xalan de vebêjin:

I) Bi avêtina radera */-n/ê*, rayeka demên borî çêdibe. Di vê rayekê de guherîna dengê çenabe. Qertafên kêşanê yê demê li van rayekan zêde dibin.

II) Piştî avêtina dengdara */a/yê*, ji rayeka dema borî, rayeka dema niha pêk tê. Di van cure lêkeran de, di rayeka dema niha de jî guherîna dengê pêk nayê. Lê di çend lêkeran de (pan, zan û razan) */i/ya* qertafa lêkera bûnê li dengê */ê/yê* dadi-gere. Em vê yekê, wek awarteyekê bi nav dikin.

III) Lêkerên ji vî senifanê hinek gerguhêz û hinek jî negerguhêz in.

## 2) Lêkerên ku dawîya wan bi */-ên/ê* diqedin

Der heqê van lêkerên di bin vî sernavî de, em vê bibêjin. Niha li ber destê me du mînak he-ne. Jixwe lêkera "vên" me berê wek "vêtin" jî hilda dest ku mîna "vîn" jî tê zanîn. Tiştê heye ku gava em li gorî rêzika giştî van her du lêkeran bi vî şeweya wan hildin dest, em dê nikarî-bim ji nav mijarê derkevin. Çimkî em bi rewşeke din re rû bi rû dimînin.

Eger lêkerên hanê, ango "vên" û "şên" bi vî şeweyê bînin pejirandin û em jî bi rêzika giştî li wan bimêzin, dê rewş ev be. Em pêşî rayeka wan ku */-n/* ye ji wan bigirin biavêjin: *şê* (-n) û *vê* (-n) dimînin. Bi gotineke din, di destê me de halê wan ê "şê" û "vê" dimîne, *divê* ku ew jî rayeka wan a dema borî be. Lê em rast lê nayên ku wisan tînan kişandin. Li vir rewşeke derasayî diqawime.

Wek mînak, li Şemzînanê ev her du lêker bi awayekî zindî di

nav gel de hene û tînan bikaranîn. Ev lêkera "vên" an jî "vêtin" bi cînavkên tewandî (*min*, *te*, *wî/wê*, *me*, *we*, *wan*) tê kişandin û ew jî ji bo rewşa dema niha, dema bê û raweya fermanî tê bikaranîn. Lê ji bo demên borî lêkera "xwest"ê jî bi kar tînin. Nimûne: *min divê*, *min xwest* (ne ku bi awayê *min vê*). Îcar em lê rast tînan ku ew lêker di dema borî de wekî *min diviya*, *min dê biviyaya* û hwd. tê kişandin.

Lê lêker di dema borî de dikeve rewşeke din. Nexwe em nikarin angaş (îdia) bikin ku rewşa herî kevn a vî lêkerê, "vên" e. Dibe ku "vêtin" be. Çimkî ew awa jî di zimanê me de heye. Heke ew awa rast bê pejirandin, rayeka wê ya dema borî "vêt" û ya dema niha jî "vê" ye. Lê em dibînin ku di zimanê me yê devkî de em bi piranî rastî şeweyê "*min diviya*" nayên. Bêhtir em rastî "*min diviya*" tînan.

Lê eger ku awayê wê yê raderînan "viyan" be, îcar piştî avêtina raderê ango piştî hilanîna */-n/yê*, li ber destê me awayê wê yê "viya" dimîne û rayeka dema borî pê tê kişandin. Gava em rayeka wê ya dema niha bi dest bixin, îcar em bi rewşeke din re rû bi rû dimînin û ew rewş li rêzikê nayê. Em bi mînanan rave bikin. Rayeka dema borî "viya" be, piştî ku dengdara */-a/yê* jê bikeve, li rastê dimîne "viy", lê bi vî jî lêker nayê kişandin.

Nexwe em dikarin bi awayekî din bifikirin ku "vên" an jî "vêtin" awayê wê yê raderînan in. Ku em awayên wan ên "vîn" û "viyan" jî dizanin. Lê em wan deynin aliyekî. Ji ber ku, bi ya min awayê wan ê raderînan ne ew in. Ji van jî çendî ku ez bawer

dikim awayê wê yê berê “vêtin” e, lê niha bêhtir awayê wê yê “vên” tê naskirin. Em li ser wê dawestî û bisekinin. Em raderê jê biavêjin, li rastê dimîne “vê” û ev rayeka dema borî ye. Li dû ketina dengdêra /ê/yê jî, wek rayeka dema niha di destê me de /v/ dimîne. Em li gorî vê yekê lêkerê bikêşin: *Min dive, te dive, wan dive.*

Lê belê, mixabin di zimanê devkî de û heta di yê nivîskî de çavên me bi vê şeweyê nakevin. Ew dengdêra li dawiyê wekî /ê/yê tê kişandin: *Min divê, te divê, wan divê.* Di heyna kêşana rayeka dema borî de jî awayê “*min diviya*” (ne *min divêya*) derdikeve ber me. Jixwe di zimanê me de rewşeke awarte heye, ku ji aliyê rêziman ve çewtiyek e, lê ji aliyê wateyê ve guherînekê nake wateya kêşana lêkerê. Mîna:

*Ez firîm (ez firiyam)*

*Ez qedîm (ez qediyam).*

Li ser awayê rayeka dema borî ya lêkera “vên”ê ez dikarim vê bibêjim. Çendî rayeka dema borî ya lêkerê “vê” (ku bi ya me divê vêt be) ye, di dema kêşanê de ji ber ku dengê /y/yê tê pêşiya wê lewma guherîneke denganiyê di dengdêra /ê/yê de çêdike û dike ku ew li dengdêra /i/yê dagere.

Lêkera “şên”, ku ev lêker di zarawayê kirmanckî de bi awayê “şayene” an jî “şînayene” ye, di devoka Meletî û Semsûrê de wekî “şe kirin” derdikeve ber me, ew jî mîna lêkera “vên” qewamek bi ser de hatiye û ketiye halê heman lêkerê. Li dawiyê em dikarin bibêjin ku ev her du lêkerên me wekî ku lêkerên derî rêzikiyê bin, xwedî du raderan

in. Mîna “vên” û “viyan” û “şên” û “şiyân”. Awayê “vên” û “şên” ji bo rayeka dema niha, “viyan” û “şiyân” jî, ji bo rayeka dema borî tên bikaranîn. Helbet piştî avêtina radera /-n/yê jî paşiya wan.

Taybetiyên van cure lêkeran: Halê hazir ketine rewşeke cuda û bûne xwedî rêzikên xweserî xwe û ev lêkerên hanê jî gerguhêz in.

### 3) Lêkerên ku dawîya wan bi /-în/ê diqedin

Me divê em di serî de vê bibêjin ku, lêkerên me yên ku me di bin vî sernavî de tesnîf kirine, gelek in û hem gerguhêz û hem jî negerguhêz in. Ji van lêkeran jî piştî ku meriv radera wan a /-n/yê jî wan bike, di dest de rayeka wan a dema borî dimîne. Bi ketina dengê dawî jî rayeka dema borî jî, rayeka dema niha tê holê. Em rast lê nayên ku guherîneke dangan di rayekên wan de biqewime.

Em pêşî lêkerên xwe yên mînak derpêş bikin û paşê jî bi mijara xwe de herin, em radera wan jî di nav kevanekê de nîşan bidin Lêker ev in: *Anîn, axivîn, bihujîn, birîn, firîn, girîn, guherîn, jîn, karîn, kirîn, nalîn, nivîsîn, xemilîn, zivirîn û zanîn.*

Niha jî em lê bixebitin da ku rayeka wan a dema borî nîşan bidin: *Anî (-n), axivî (-n), bihujî (-n), birî (-n), firî (-n), girî (-n), guherî (-n), jî (-n), karî (-n), kirî (-n), nalî (-n), nivîsî (-n), xemilî (-n), zivirî (-n) û zanî (-n).*

Piştî vê yekê, em rayeka wan a dema borî pêşkêş bikin: *Anî, axivî, bihujî, birî, firî, girî, guherî, jî, karî, kirî, nalî, nivîsî, xemilî, zivirî û zanî.* Ev rayekên

dema borî ne û qertafên deman li wan zêde dibin, bêyî ku guherîneke denganiyê di wan de biqewime.

Wek gihaneka duyemîn, îcar em serî li vê riyê bidin. Ji bo pêkhatina rayeka dema niha, serê ewilî hewce ye ku dengê li dawîya rayeka dema borî bikeve, ku bi giştî ew jî /î/ ye. Di çaxa pêkhatina rayeka dema niha de, di rayekê de dengê li dengêkî din danagere. Ango em rastî tewanga ku di lêkeran de pêk tê, nayên. Bi dayîna rayekên dema borî em lê bixebitin dabaşa xwe ronî bikin: *Anî (?) axiv (-î), bihuj (-î), bir (-î), fir (-î), girî (?) guher (-î), jî (-?) kar (-î), kir (-î), nal (-î), nivîs (-î), xemil (-î), zivir (-î) û zan (-î).*

Ji van lêkeran min tenê li ber rayeka “anî”, “girî” û “jî”yê nîşana xalepîrsê danî, sedem jî ev e: Ev lêkera “anîn” lêkereke ne rêzîkî ye. Ango ev lêker tenê ji bo demên borî tê bikaranîn. Ji bo dema niha awayê wê yê din “înan” e û rayeka wê ya dema borî “îna” û ya niha jî, “în” e.

Herçî lêkeran “girîn” e, ji rêzîkê averê bûye. Ji bo rayeka dema niha diviya ku dengê dawî yê rayeka dema borî ku /-î/ ye jê biketa. Lê di kardariyê de em ji bo dema niha wekî ku dengê /î/yê hebe dikêşin. Heke em li gorî rêzîkê herin, wê gavê lêkera “girîn” û “girtin” di çaxê kêşana dema niha de tevî hev dibin. Mînak: Girîn, ku em wek “gir” rayeka wê ya dema niha qebûl bikin, gerek em bibêjin “ez digirim” lê em dibêjin “ez digirîm”, ji bo lêkera “girtin” jî heman tişt em dibêjin ku rayeka wê ya dema niha “gir” e. Mînak “Ez digirim, ez ê bigirim”.

Ji lew re ji min re wisan tê

ku awayê rast û bera yê lêkera "girîn"ê girîtin" e. Îcar ku em wisan bipejirînin rayeka wê ya dema niha "girî" û ya dema borî jî "girî" e. Lê di zimanê me yê devkî de ji bilî hin devokan herma bibêje em wek rader rastî awayê wê yê "girîn"ê tên.

Lêkera "jîn" jî ku divê rayeka wê ya dema niha tenê "j" be, lê wekî ku rayeka dema niha jî "ji" ye û wisan tê kişandin. Mesela em nabêjin "Ez najim" em dibêjin "Ez najîm". A ji vê rewşê jî diyar dibe ku ev lêker jî derketiye derî rêzika heyî û bûye xwedî rewşeke awarte.

Ev cure lêkerên me ji vî aliyê ve, ango ji hêla bidestxistina rayeka dema niha û rayeka dema borî ve, xwedî serûberiyekê ne. Di wan de guherîna denga çênabe.

Der barê taybetiyên van cure lêkeran de em dikarin van tiştan bibêjin:

I) Bi avêtina radera /-n/ê, rayeka demên borî çêdibe. Di vê rayekê de guherîna denga çênabe. Qertafên kêşanê yên demê li van rayekan zêde dibin.

II) Piştî avêtina dengdara /i/yê, ji rayeka dema borî, îcar rayeka dema niha pêk tê. Di van cure lêkeran de, di rayeka dema niha de jî guherîna denga pêk nayê.

III) Lêkerên ji vê senifanê, hinek gerguhêz û hinek jî negerguhêz in.

#### 4) Lêkerên ku dawîya wan bi /-ûn/ê diqedin

Lêkerên ku di bin vî sernavî de cih digirin, gelek kêr in. Rêbaza bidestxistina rayeka van cure lêkeran jî mîna yên din e. Bi xistina radera /-n/yê rayeka

dema borî û piştê jî, bi ketina dengdêra /û/yê jî rayeka dema niha tê pê. Di her du rayekan de jî dengê li dengê din danagere ango naguhere. Rayek her wekî xwe dimînin û qertafên kêşan û kesan bi ser wan ve dibin. Ji ber ku ev cure lêkerên me gelek kêr in, min tenê ev her sê lêker wek mînak hilbijartin: *Bûn, çûn û pûn*.

Di serî de ji bo ku em rayeka dema borî bi dest bixin, em radera wê ku /-n/ e ji lêkeran bixin û vê kirinê jî em di nav kevanekê de nîşan bidin: *bû* (-n), *çû* (-n) *û pûn* (?). Min bi taybetî nîşana pirsê danî ber lêkera "pûn"ê, ji ber ku ew xwedî rêzikeke derî qaydeyê ye û ev lêker gerguhêz e. Ew di dema borî de mîna ku rayeka wê "pûyî" be tê kişandin. Li gor ku dirûvê wê "pûn" be, ev yek nayê kişandin, lê wek ku lêker di rewşa "pûyîn" de bê tê pejirandin û demên borî li ser vê rewşê tê kişandin.

Piştî vê rewşa hanê, li rastê ev dimînin: *Bû û çû*. Di wextê kêşan û çivanê ya deman de, tu guherîna di rayeka dema borî de naqewime û çênabe. Qertaf û pirtikên kesane û deman li wan zêde dibin. Ji ber ku hin ji van lêkeran negerguhêz in, ji lew re min got qertafên kesane jî li wan zêde dibin.

Îcar em bî ser gihaneka di-duyan û em li gorî rêzika heyî ya ku di hemû cure lêkerên me de heye, em dengê dawî ji rayeka dema borî ya lêkerê bixin. Di pey vê yekê de, çî tiştê bimîne, êdî ew rayeka dema niha ya lêkerê ye. Jixwe di van lêkerên me de, yên ku dabaşa me li ser wan e, dengdêra dawî ya rayeka demên borî /û/ ye. Piştî ku ev

deng jî bikeve, di destê me de rayeka dema niha dimîne. Em vê yekê jî diyar bikin. Rayek ev in: *Bû û çû*.

Em dengdara /û/yê ya ku dê ji wan bikeve, di nav kevanekê de nîşan bidin: *b* (-û) *û ç* (-û). Bi dû van kirinan, li holê "b" û "ç" wek rayek dimînin. Nimûne:

*Ez dibim, ez ê biçim.*

Der barê taybetiyên lêkeran jî vê senifanê, em dikarin wek encam van gotinan bibêjin:

I) Bi avêtina radera /-n/ê, rayeka demên borî çêdibe. Di vê rayekê de guherîna denga çênabe. Qertafên kêşanê yên demê li van rayekan zêde dibin.

II) Piştî avêtina dengdara /û/yê, ji rayeka dema borî, îcar rayeka dema niha pêk tê. Di van cure lêkeran de, di rayeka dema niha de jî guherîna denga çênabe.

III) Lêkerên ji vê senifanê, hinek gerguhêz û hinek jî negerguhêz in.

#### C) Lêkerên ku ji rêzîkê der in

Çend lêkerên me hene ku bi şeweya xwe ya heyî, şewe û forma ku halê hazir di zimanê me yê devkî û nivîskî de hatiye pejirandin, çendî bişibin lêkerên me yên ku dawîya wan bi /-andin/ê diqedin jî, lê di rastiya xwe de ew xwedî rêzikeke din in. Heta em ji wan re dikarin bibêjin lêkerên teşeguhêrî. Bi gotîneke din teşe û şeweyê wan ê berê guheriye û ew ketine rewşeke din, loma di dema kêşanê de em rastî qalibekî din tên.

Lêkerêke me ya din jî heye ku ew jî teşeguhêrî ye û wek şewe halê hazir dawîya wê bi /-

an/ê diqede. Lê belê, çi heye ku ew jî di çaxa kişan û çivanê ya ji bo deman de, derdikeve derî rêzika giştî ya wan lêkerên ku dawîya wan bi /-an/ê diqedin. Ez ê di bin çend sernavan de li ser van cure lêkeran jî rawestim û nêrîn û ramanên xwe derbibim

### 1) Lêkerên çandin, şandin û xwendin

A rast, me li jorê di bin xala "Lêkerên ku dawîya wan bi /-andin/ê diqedin" de, ji van cure lêkeran behs kiribû, niha em dê hinek bi dorfirehî mijara wan hildine dest. Lêkerên me ev in: Çandin, şandin û xwendin. Lêkera "xwendin"ê wekî "xwandin" jî di zimanê me yê devkî de heye.

Em niha li ser van lêkeran li gorî rêzika ku me li jorê jê behs kiribû, rawestim. Lê em dê bînin ku ev derî vê rêzika wan lêkeran e ku dawîya wan bi /-andin/ê diqedin. Ka em bi hev re lê hûr bibin û baş di wan bifikirin. Em pêşî wek rêzika destpêkê radera wan ji wan biavêjin ku radera wan /-in/ e.

Wek gihaneka ewilî niha em wisan bikin û radera /-in/ê ji wan hildin û biavêjin: Çand (-in), şand (-in) û xwend (-in). Tiştê ku piştî avêtina raderê maye, rayeka dema borî ya lêkerê ye. Wek qayde, bi vê rayekê hemû demên borî tîndîrîşandin û tu rewşeke derasayî naqewime.

Em îcar bînin ser bi destxistina rayeka dema niha, ku divê ev rayeka dema niha ya gerguhêz be û her wiha ev yek, di heman demê de lêkera raderîna negerguhêz be. Ji bo ku em pêzanîng û agahiyên xwe teze û nû bikin, em lêkereke ku dawîya

wê bi /-andin/ê diqede wek nîmûne derpêş bikin. Bila ew jî "şewitandin" be.

Eger ez radera /-in/ê ji biavêjim li rastê "şewitandin" dimîne û ev jî rayeka dema borî ye. Wek gihaneka duyem, heke ez dengdara dawî ku /d/ ye, jê bixim û dengdêra /a/yê ku di kîteya dawî de ye bikime /î/, hingê rayeka dema niha ya gerguhêz pêk tê. Ev jî "şewitîn" e. Merheleya sêyem jî, îcar ev e. Ji bo ku em rayeka dema borî ya negerguhêz pêk bînin, divê ku em ji rayeka dema niha ya gerguhêz dengê dawî bigirin û biavêjin da ku rayeka dema borî ya negerguhêz (têneper) pêk were. Em jî "şewitîn"ê her dengê dawî ku /-n/ ye hildin deynin aliyekî, rayek wek "şewitî" dimîne. A ev rayeka dema borî ya negerguhêz e. Ji bo ku em rayeka dema niha ya negerguhêz jî çêkin, îcar hewce ye ku em dengdêra dawî ya vê rayekê biavêjin.

Em van her çar gihanekan dikarin wiha jî bişopînin: Pêşî em raderê ji lêkerê bikin ku ev rader /in/ e, bi vî awayî rayeka dema borî tê himatê. Paşê em /-and/ê ji rayeka dema borî bikin, îcar rayeka dema niha ya negerguhêz bi dest dikeve. Li dawiyê jî ku em /-în/ê li ser rayeka dema niha ya negerguhêz zêde bikin, îcar rayeka dema niha ya gerguhêz çêdibe û em /-n/yê jî jî vê rayekê bigirin biavêjin îcar rayeka dema borî ya negerguhêz tê holê. An jî gava em /andin/ê ji van cure lêkeran bikin rayeka wan a dema niha negerguhêz bi dest dikeve.

A ev her sê lêkerên me ku me ew wek mînak dane (çandin, şandin û xwendin) ne li gorî rêzik û rêbazên wan lêkeran in,

ku dawîya wan bi /-andin/ê diqede. Rayekên wan wisan bi dest nakevin. Niha jî em van lêkerên xwe bi rêzikên ku me li jorê jî wan behs kiribû hildin dest û lê bixebitin rayeka wan a dema niha bi dest bixin: Xw (-andin), ç (-andin) û ş (-andin). Li rastê /xw/, /ş/ û /ç/ dimîne:

*Ez dixwim, ez ê bixwim  
Ew dişe, ew dê bişe  
Em diçin, em dê biçin.*

Wekî ji van mînakên jî dixuye, rewşeke derî rêzikê derî holê û wateyêke din ji van lêkeran diçe. Li aliyê din, jixwe rayeka wan a dema niha ya negerguhêz çênabe. Lê belê rayeka wan a dema niha ya gerguhêz çêdibe. Eger em qertafa /-in/ê ji wan bigirin biavêjin rayeka wan a dema borî û heke em /-d/yê jî, ji rayeka dema borî bikin û dengdara /a/yê jî bikine /î/, rayeka dema niha ya gerguhêz pêk tê: Xwend (-in), şand (-in) û çand (-in). niha jî em dengê /d/yê ji wan bikin: Xwen (-d), şan (-d) û çan (-d). Di pey de em dengên /a/ û /e/yê bikin /î/: Xwîn, şîn û çîn.

*Ez dixwînim, ez ê bixwînim  
Ew dişîne, ew dê bişîne  
Em diçînin, em dê biçînin*

Ji bo van lêkerên navborî rewşeke awarte heye. Bi rastî ez gelek di wan fikirîm û min serê xwe li ser wan êşand. Der barê wan de ez wiha dihizirim. Gelo dibe ku şêwe û şêklê wan ê berê *xwantin*, *şantîn* û *çantîn* be. A rast ez li lêkerên ku dawîya wan bi /-ntin/ê diqedin, nemaze yê ku bi /-antin/ê diqedin, gerîm, lê min ew nedîtin. Tenê ez leqayî lêkerên ku bi awayê jentîn (jendin) û rêntîn (nihêrtin) jî tîndîrîşandin, hatim. Eger ku em

van lêkeran bi şeweyên *xwantin*, *şantin* û *çantin* bipejirînin, rewşeke wiha derdikeve rastê.

Serê pêşîn em raderên wan hildin biavêjin, lêker wek *xwant*, *şant* û *çant* di destê me de dimînin û ev jî dibin rayeka dema borî, eger em dengê dawî jî, ji wan bigirin deynin aliyekî û dengdêra /a/yê li dengdêra /i/yê dagerînin, îcar rayeka dema niha ya gerguhêz bi destê me dikeve. Mînak: Em dengdêra /t/yê ya li dawiya wan (*xwant*, *şant* û *çant*) hildin, di destê me de *xwan*, *şan* û *çan* dimîne. Dengdêra /a/yê jî ku bibe /i/, hingê rayeka dema niha ya gerguhêz tê himatê. Ev meseleya guherîna /a/ bi dengdêra /i/yê, rêzikeke tewanga lêkeran e: *xwîn*, *şîn* û *çîn*. Bi van rayekan em dema niha, dema bê û raweya fermanî dikişînin. Ji lew re awayê bidestxistina van her sê lêkerên navborî dişibe lêkerên ku dawiya wan bi /-tin/ê diqedin.

Ji van lêkeran, “xwendin” û “şandin”, di zimanê devkî de wekî “*ez dişeynim*” û “*ez ê bixweynim*” jî tên bilêvkirin. Em vê jî dixwazin wek agahiyekê bidin û balê bikişînin serê ku bê ev lêker çawan teşeguhêzî (deforme) bûne.

## 2) Lêkera “man”ê

Lêkera me ya din jî lêkera “man” e. Halê hazir di kurmançî de ew wekî lêkera raderî “man” e û mîna “mayîn” jî tê zanîn. Lê lêker wek rewşa raderî ne “mayîn” e. Ev “mayîn” di rewşa navdêra lêkerî de ye.

Gava em li gorî rêzika giştî radera vê lêkerê ku /n/ ye, hildin, wek rayeka dema borî di dest de “ma” dimîne û demên borî li ser vê rayekê tên kişandin.

Ji bo ku em rayeka dema niha bi dest bixin û dîsan li gorî rêzika giştî ku piştî ketina dengê dawî rayeka dema niha pêk tê, em tev bigerin em dê rastî rewşeke awarte bînin. Dîsan jî em li gorî rêzika giştî tev bigerin û em dengê dawiyê ji “ma”yê biavêjin, li rastê tenê “m” dimîne û bi vê jî dema niha nayê kişandin.

Di dema niha de em rayeka “mîn”ê bi kar tînin. Mînak: *Ez dimînin*, *ez dê bimînin* û hwd. bi vî halê heyî yê lêkerê ku “man” e, em nikarin rastî rêzika giştî ya ku di lêkerên me de heye, bînin. Ji lew re em bi rewşeke awarte re rû bi rû ne. Îcar ku em şeweya wê ya rast û ya dêrî “mantin” bipejirînin em di rayeka dema niha de bi hêsaniyê û rihetî, rastî rayeka “mîn”ê tînin. Çawan? Em bi hev re lê bişopînin.

Em di serî de rayeka /-in/ ji lêkerê hildin, ma “mant”, pişt re li gorî rêzika heyî ku divê dengê dawî bikeve ku ew /t/ ye, dimîne “man”. Di pey re jî dîsan li gorî rêzika eger dengê dengdêra /a/yê li dengdêra /i/yê dagere, li rastê rayeka dema niha dimîne ku ew jî “mîn” e. Lê çî heye ku ev lêkera me teşeguherî bûye û rayeka demla borî wekî “ma” (ku dengên “n” û “t” jê ketine) maye û ji bo rayeka dema niha jî “mîn” maye.

Tiştêkî din heye ku jixwe di kirmançî kirdkî, zazakî di şûna “ez mam” de dibêjin “ez mendo”. Bi gotineke din di vî zaravayî de awayê wê yê raderî “mendene” ye.

## D) Lêkerên ku li dawiya wan /-yan/ û /-yîn/ tînin

Min bi zanebûn got ku lêkerên li dawiya wan qertafên /-

yan/ û /-yîn/ datînin. Ji ber ku di zimanê me de, bi rastî awayên wiha yê lêkerên me nîn in. Ev navdêr in, ku ji lêkeran hatine çêkirin. Lê di hin berhem û nivîsaran de em rast lê tînin ku şeweyê lêkeran wiha jî didin. Mîna *jiyan*, *westiyan*, *heyîn*, *mayîn*, *çûyîn* û *bûyîn*. Digel vê rewşê hin kes awayê “bûyîn”, “çûyîn”, *mayîn* û “dayîn” napejirînin û diangêjin (îdia dikin) ku awayên wan ên rast “bûyîn”, “çûyîn”, *mayîn* û “dayîn” in. Bi gotineke din dengdêra /i/yê ya li dawiyê dikine /i/ û navdêrê wisan dinivîsin û dibêjin ku her wiha ev ne navdêra ku ji lêkerê çêbûye lê belê ew lêker bi xwe ye.

Eger em van awayan wek awayê lêkerê bipejirînin em dê di wexta bidestxistina rayeka lêkeran de rastî rewşeke din bînin ku heta niha me di bin hin navbernavan de ew hildabûn dest. Ev rêzika heyî çî bû em bînin bîra xwe. Piştî avêtina raderê, rayeka dema borî û bi ketina dengê dawî û guherîna deng an jî dangan bi dengên din jî rayeka dema niha bi dest diket. Niha em li gorî vê rêzika bi mijara xwe de herin. Em ji van navdêran re niha “lêker” bibêjin û wan wek mînak derpêş bikin: *Jiyan*, *westiyan*, *heyîn*, *mayîn*, *çûyîn* û *bûyîn*.

Pêşî em raderê ji wan bikin ku /-n/ ye û wekî çawan me li jorê awayê ketina wê nîşan dabû em wisan nîşan bidin: *Jiya* (-n), *westiya* (-n), *heyî* (-n), *mayî* (-n), *çûyî* (-n) û *bûyî* (-n). Ji van mînan em tenê dikarin “jiya” û “westiya” wek rayeka dema borî bipejirînin, ji ber ku bi van rayekan em dikarin hemû demên borî bikişînin, lê em nikarin bi mînakên din ên mîna “heyî”,

“mayî”, “çûyî” û “bûyî” bikêşin. Ew lêkerên rengdêrîn in, ango ew di halê rengdêrê de ne êdî.

Li aliyê din em nikarin ji rayeka her du cureyan îcar rayeka dema niha bi dest bixin. Qayde çî bû, qayde ev bû, dengê dawî diket û heke guherîna dengan hebûya ev yek di rayekê de pêk dihat û hîna rayeka dema niha dihate meydanê. Lê em çî jî bikin em nikanin ji wan rayeka dema niha bi dest bixin. Ji lew re, ji rêzik û qaydeyê giştî ev averêbûnek e û bi taybetê di lêkerên negerguhêz de pêk tê. Her wiha em tu car lêkerên mîna *westîn, bezîn, girîn, hebûn, man, çûn û bûn* nikarin wek lêkera raderîn bi awayê *westiyan, beziyan, giriyan, heyîn, mayîn, çûyîn û bûyîn* bidin.

Mîna li jorê jî dabû xuyakirin ku kêşanên dema borî yên lêkerên negerguhêz ên mîna *firîn, westîn, jîn, qedîn, bezîn* di hin devokên kurmancî de ji rêzika heyî ya grametîk cuda dikêşin. Mînak:

*Ez firiyam, firiyabûm, difiriyam...*

*Tu beziyay, tu beziyabûy, tu dibeziyay...*

*Ew westiya, ew westiyabû, ew diwestiya...*

*Em jiyân, em jiyabûn, em dijiyan...*

*Hûn qediyân, hûn qediyabûn, hûn diqediyân...*

*Ew beziyan, ew beziyabûn, ew dibeziyan...*

Lê belê awayê wan ên rêzimanî, ku em ji rêzika giştî derdixin û hin herêm jî jixwe rast bi kar tinîn, diviya ku wiha be.

*Ez firîm, tu bezî, ew westî, em jîn, hûn qedîn, ew bezîn.*

Eger ez gotina dawî li der barê vê mijara ku me di bin vê navbernavê de hildaye dest bibêjim. Ev ên hanê (*westiyan, beziyan, giriyan, heyîn, mayîn, çûyîn û bûyîn*) navdêrên lêkerî ne, ango awayê lêkera raderîn in.

Niha jî em hatin dawiya mijara xwe ya li ser bidestxistina rayekên lêkeran. Gotin û daxuyanîyên ku me di bin sernav û navbernavan de kirin, îcar ez dixwazim kurte û kurtasiya (xulaseya) wan bibêjim û rewşa vê beşê bi xalan rave û formûle bikim.

### Encam

1) Bi giştî tê pejirandin ku di zimanê me de du rayekên lêkeran hene. Yek rayeka dema borî û yek jî rayeka dema niha ye. Bi avêtina raderê ku ev */-in/* an jî tenê */-n/* ye, rayeka dema borî bi dest dikeve. Piştî ketina dengê dawî ji rayeka dema borî û pêkhatina tewanga dengan (an jî guherîna dengan) di vê rayekê de, îcar rayeka dema niha çêdibe. Lê lêkerên me yên ku bi */-andin/ê* (çendî hejmara wan pir hindik be jî yên ku bi */-isandin/* û */-ijandin/ê* jî) diqedin, xwedî rewşeke cuda ne. Rayeka wan a dema niha ya gerguhêz, lêkera raderîn a negerguhêz e, ku rayekên wan ên dema borî û ya niha jê çêdibin.

2) Di dema bidestxistina rayeka dema niha de, bi awayekî giştî dengê dawî ji rayeka dema borî dikeve. Ev deng te divê dengdar be û te divê jî dengdêr be, her ev yek diqewime. Ev rêzikeka zimanê me ye ku di dema çêbûna rayekan de derdikeve ber me.

3) Guherîna dengan an jî bi gotineke din, tewang ku di lêkeran de rûdide, ne di rayeka

dema borî de, lê belê di rayeke dema niha de pêk tê. Ev guherîn ango tewang, hem di dengdaran de û hem jî di dengdêran de pêk tê. Digel ku di hin cure lêkeran de her du deng ditewin jî, em dibînin ku di hinan de tenê dengdar an jî dengdêr bi dengekî din diguherin. Her wiha lêkerin hene ku guherîna dengan di wan de çenabîn. Mîna lêkerên *dan, çûn û bûn...*

4) Di lêkerên ku bi */-andin/*, */-isandin/* û */-ijandin/ê* diqedin de, dengdêra */a/yê* li dengdêra */i/yê* dadigere. Îcar di lêkerên ku dawiya wan bi */-tin/ê* diqede de, dengdêra */a/yê* li dengdêra */ê/yê* dadiger. Dengdêra */e/yê* jî carinan li */ê/yê* û hin caran jî li */i/yê* dadigere.

5) Ji bo lêkerên ku bi */-tin/ê* diqedin, em dikarin van taybetiyan bibêjin. Ez vî navî ji bo hemû lêkerên ku bi */-stin/*, */-ştin/*, */-ftin/* û */-ptin/ê* sergihayî dibin, bi kar tinim. Bi awayekî giştî (hin awarte ne tê de, ku carinan wekî xwe dimînin) dengdarên */s/*, */ş/*, */f/* û */p/* bi dengdarên */z/*, */j/*, */v/* û */b/yê* diguherin. Her wiha bi giştî dengdêra */a/yê* jî li dengdêra */ê/yê* dadigere. Herçî dengdêra */e/yê* ye, ew bêistiqrar e. Geh li */ê/yê* û geh jî li */i/yê* dadigere.

Li aliyê din, di lêkerên ku bi */-ştin/ê* diqedin de, carinan dengdêra */i/yê* di rayeka dema niha de dibe */ê/* an jî qet nabe.

6) Di lêkerên ku dawiya wan bi */-rtin/* û */-xtin/ê* diqedin de, dengdara */r/yê* li dengekî din danagere. Di van cure lêkeran de, di rayeka dema niha de tenê dengdêr diguherin. Ji bo lêkerên bi */-rtin/ê* diqedin em vê bibêjin ku, çendî kême be jî carinan dengdêra */a/yê* ditewe dibe */i/*.

7) Di lêkerên ku dawiya wan bi */-atin/ê* diqedin de, tenê di rayeka dema niha de, dengdêr diguhere. Her wiha dengdêrên qertafên kesan ên lêkera bûnê (an jî qertafên pêvebestî) di wexta kêşan û çivanê de, cihê xwe didin dengdêra */ê/yê*. Wekî “*ez dihêm*” an jî “*ez têm*”, ne ku mirov bibêje “*ez dihim/ez tim*”

8) Di lêkerên ku dawiya wan bi */-êtin/ê* diqedin de, di rayeka dema niha de, dengdêr diguhere û */ê/* dibe */i/*. Li aliyê din, di gava kêşanê de, dengdêrên qertafên kesan (an jî qertafên pêvebestî) cihê xwe didin dengdêra */ê/yê*.

9) Lêkerên ku dawiya wan bi */-otin/ê* diqedin, di rayeka dema niha de jî em rastî guherîna dangan nayên. Lê dengdêrên qertafên kesan cihê xwe didin dengdêra */o/yê*.

10) Lêkerên ku li dawiya wan */-utin/, /-ûtin/, /-îtin/* û */-rin/* hene, di wan de dengdar û dengdêr naguherin. Dengdêrên qertafên kesan di dema kêşanê de ji bo lêkerên ku dawiya wan bi */-ûtin/* û */-îtin/ê* diqedin, cihên xwe didin dengdêrên */i/* û */û/yê*.

Li aliyê din lêkerên ku dawiya wan bi */-rin/* û */-utin/ê* diqedin, dengdêrên li dawiya rayeka dema niha, di dema kêşanê de cihê xwe didin qertafên kesan. Mesela ji bo lêkerên ku dawiya wan bi awayê */-rin/ê* temam dibe, di kêşana dema niha de dengdêrên mîna */a/* û */i/yê*, cihên xwe didin qertafên kesan.

11) Ji bo lêkerên me yên ku dawiya wan bi */-an/, /-în/* û */-ûn/ê* temam dibin; di van cure lêkeran de, di rayeka dema niha de jî guherîna dangan pêk nayê.

Li hêla din, di dema kêşana lêkerên mîna “*pan*”, “*zan*” û

“*razan*” de em rast lê tên ku */i/ya* qertafa lêkera bûnê, li dengê */ê/yê* dadigere. Em vê yekê jî, wek awarteyekê dikarin bi nav bikin.

12) Di dema kêşana rayeka dema niha ya lêkeran de bi awayekî giştî dengdêrên */a/* û */i/* dikevin û cihên xwe didin qertafên lêkera bûnê, bi gotineke din qertafên kesan. Herçî dengdêrên */ê/, /î/ /o/* û */û/yê* di rayeka dema niha de cihê xwe dihêvişin ango diparêzin û qertafên lêkera bûnê cihê xwe didin wan.

13) Hin lêkerên me hene ku ji rêzika giştî averê bûne. Mîna hin lêkerên me yên ku dawiya wan bi */-stin/ê* diqedin. Ev li derî rêzîkê tên kişandin û bikaranîn wekî: *Westin, bestin, pestin* û *verestin*.

14) Hin lêkerên me hene ku ji wan jî ber sedemên cuda, ji rayeka wan a dema borî deng ketine. Em vê yekê jî ji rayeka wan a dema niha hîn dibin, ji ber ku di van rayekan de ev deng hîn xwe dihêvişîne (mihafîze dike). Mîna ketina dengê */ş/yê*. Heta hin lêker hene ku hîn jî di awayê wan ê raderê de ev deng heye, lê belê li hin herêm û di hin devokan de wekî ku tune be ew tê bikaranîn û bilêvkirin. Mînak:

*Avêtin/avêştin: Diavêjim, min avêt/avêşt*

*Ketin/keftin: Dikevim, ez ketin/ez keftim*

*Firotin/firoştin: Difiroşim, min firot/firoşt.*

*Rihotin/rihoştin: Dirihojim, min rihot/rihoşt*

*Kotin/koştin: Dikojim, min kot/koşt*

Wek gotina dawî ez van bibêjim: Digel ku hin guherîn bi ser lêkerên me de hatine û ji teşeyên xwe yên berê averêbûne jî, dîsan lêkeran me xwedî rêzîkekê ne û di bidestxistina rayeka dema borî de îstiqrareke tam heye. Piştî avêtina raderê, her rayeka dema borî li rastê dimîne û qertafên deman li wan zêde dibin.

Herçî bidestxistina rayeka dema niha ye, çendî ku bi awayekî giştî şeweyek, formek heye jî, ji ber sedemên jî hev cihê, em rastî hin guherîna dangan û şeweyên teşeguherî tên ku ev ji rêzîka giştî der in. Lê digel vê yekê, ji bo pêkhatina rayeka dema niha, her bi awayekî bi îstiqrar, dengê ji rayeka dema borî dikeve. Ev jî rêzîkeke giştî ye. Tişteki gelemper jî ev e ku guherîna dangan her di rayeka dema niha de çêdibe.

Di hin lêkerên me de ji aliyê teşeyê ve guherîn pêk hatiye. Lêkeran şeweyên xwe yên destpêkê neparastine. Ev yek jî bûye sedem ku lêker teşeyekî din bigirin. Ji lew re hin lêkerên me hene ku ew wekî lêkerên nerêzîkî (bêqayde) tên destnîşankirin, lê a rast ew lêkerên rêzîkî ne. Ji ber guherîn û ketina dangan a ji wan, mîna ku ew nerêzîkî bin hatine pejirandin û nîşankirin.

Çendî ku ji lêkerên me deng ketibin, hinde lêker ji rêzîkê averêbûbin jî, dîsan bi awayekî giştî û gelemperî di lêkerên me de serûberiyek, rêkûpêkiyek heye. Ji lew re em dikarin bibêjin ku, rewşên wiha awarte hemen hemen di her zimanî de hene. Ya girîng û hîmî ew e ku di zimanan de rêzîkeke giştî hebe. Zimanê me jî, jixwe ji aliyê rayeka lêkeran ve xwedî vê rêzîkê ye.

# Wêjeya devkî

Nezîr Silo

Gelê kurd di aliyê wêja devkî de, ew qas dewlemend e, mirov dikare bibêje ku gerdûna wêjeya devkî cih nehêlaye ji bo wêjeya nivîskî.

Weke ku Prof. Filacifisky dibêje: “Mirov dema lêkolîna wêjeya kurdî ya devkî dike, matmayî dimîne, ji ber ku gihîştîye radeyê gelek ji xwe zêdetir.” Têkoşîna gelê kurd, xwe di hundirê wêjeya devkî de daye diyarkirin û xwe bi awayê hezkirin ji xaka welat re, rihê parastina welat rave kiriye. Wêjeya devkî bûyerên dirokî dide xuyakirin. Stranên şivanan, beşê herî kevn di dirokê de di wêjeya devkî de cihekî pir mezin digirin, ew jî yê pêvajoya civaka beriya çandiniyê ye. Destanên pêvajoya feodalîtiyê ne, bi vê re jî stranên cotkaran derketiye.

Nivîskarê Rûs M. Gorkî dibêje: “Gel bi xwe feylesof e, bi xwezaya xwe şair û afirandêrê çanda gerdûnî ye. Ev hilberîn û berhem çavkaniya hemû şair û nivîskaran e. Eger em daboriyê xwe baş tenegehînin, afirandîna me wê pir balkêş nebe. Wê çaxê divê em girîngiya wêjeya gelêrî binasin.” (Binêre “Realîzîm di wêjeya Kurdî de” ya Dr. Îzedîn Mustefa Resûl rûpel 30)

Çavkaniya wêjeya devkî, kengê û ji aliyê kê ve hatine gotin nayê zanîn, ji ber vê jî, jê re tê gotin wêjeya hevpar. Di vê wêjeya hevpar de, bêhejmar çîrok, destan, serhatî, efsane û helbest hene. Hemû merc û rewşên jiyana xwezayî digirin nava xwe. Çavkaniya bingehîn a wêjeya devkî; evîn, şer, nêçîr, jiyana rojane, pevçûna di navbera eşîran de, şerên bêdawî yên di navbera gelê kurd û dagirkeran de, koçberî, lehengî, xwezayî û bîra wî ya tijî ji mîtolojiya Mezopotamyaya dewlemend e. Mijarên vê wêjeya dewlemend zarokên sêwî, lehengên bi rojan şer dikin; newêrekên ji roviyan fêlbaztir, lehengiya xortê kurd; keçên bedew ku xwe li lawan kun dikin, kalên xakê û esmanan digihînin hev, mîrên xêrxwaz û mereqdarên nêçîrê, serokên

neteweyî yên ku di dem û cihên cuda de li dijî dijminan şer kirin, livbaziya weke striyên di navbera du evîndaran de, xiyamet û bêbextî ne.

Dema mirov wêjeya kurdî, beşa devkî lêkolîn dike di hundirê wê de hestyarî, xemgînî, hestên mirovatiyê yên pir binirx dibîne. Ev dewlemendî û têrxaxiya wêjeya devkî ya kurd, B. Nikitin, di pirtûka xwe ya bi navê “Lêkolîna Li Ser Sosyolojî û Dîroka Kurd” di rûpelên 406-407’an de dibêje: “Çi lêkolîna li ser wêjeya kurdî bê kirin pêwîst e beriya her tiştî, li ser wêjeya devkî (gelêrî) bêt kirin. Ji ber ku di hundirê xwe de heta roja me ya îro jî, xwedî hêzeke zindî, afirîner û di nava nûbûneke herdemî de ye.”

Her wiha di wêjeya kurdî ya devkî de, mirov dikare rastiya civaka kurd û kesatiya mirovên kurd baş bibîne û binirxîne, ji realîteya civaka kurdî re, weke neynikê ye. Wêjeya devkî awayê xwe yê helbestî û lawik ne girêdayî tu qeydan e weke wêjeya gelên li hawirdora xwe. Ji lew re B. Nikitin di çavkaniya me li jorê de, di rûpela 443’yan de dibêje: “Di wêjeya xwe de çawan e, di konevaniya xwe de jî wisan e. Nikarin xwe ji pêvajoya qebîletî ya li ser bingehê ezezîtî rêk û pêk kiriye derbas bikin.”

Wêjeya devkî piranî ji aliyê dengbêj û çîrokbêjan ve tê gotin û di hundirê wan de hatiye parastin. Ev helbest û çîrok nayên naskirin ji aliyê kê ve hatine gotin, li hemû deverên

**Wêjeya devkî piranî ji aliyê dengbêj û çîrokbêjan ve tê gotin û di hundirê wan de hatiye parastin. Ev helbest û çîrok nayên naskirin ji aliyê kê ve hatine gotin, li hemû deverên Kurdistanê belav bûne û bi hemû zaravayên zimanê kurdî tînin gotin, di radeyek wisan de ye ku di her gundekî de çîrokbêj, dengbêj û lawikbêj tînin dîtî.**



Kurdistanê belav bûne û bi hemû zaravayên zimanê kurdî tîn gotin, di radeyek wisan de ye ku di her gundekî de çîrokbêj, dengbêj û lawikbêj tîn dîtin.

Di dawiya sedsala XIX û XX'î de gelek lêkolîner û nivîskaran berhemên wêjeya kurdî ya devkî komî ser hev kirine û derbasî nivîsandinê kirine. Ji van Sosîn, Birîm, Mox, di dawiya sedsala XIX'an û destpêka sedsala XX'î de, gelek çîrok, lawik kom kirine. Lêkolînerê alman Oskar Man tiştên ji wêjeya kurdî kom kirine, wergerandiyê almanî. Enstîtuya Kurdolojiyê ya li Sovyetê jî, gelek berhemên wêjeya kurdî ya devkî komî ser hev kirine û bi zimanê kurdî nivîsandine. Hacıyê Cindî, Eminê Evdal, Casimê Celîl û Kurakozyanê Ermenî di van xebatan de xwedî par in.

Çima wêjeya devkî di nava gelê kurd de bi pêş ket? Ev pirs tê pêş mirovan û pêdiviya bersivdayîna wê heye.

Mercên gelê kurd ku di nav de dijî, rûbirûmayîna li hemberî êrîşên dagirkeran; xaka wî ya ku bûyî qada cengan û van cengên ku her tim berdewam kirine, aliyekî vê rastiye ne. Ji ber ku kurdan li hemberî van êrîşên dagirkeran nikaribûn hebûneke xwe ya konevanî biafirînin. Gelê kurd li hember vê rewşê neçar maye ku xwe bi çiyar ve bi sînor bike. Xwe ji derve re girtî bihêle. Ev girtîbûn, bûye sedema bi awayekî seretayî û sade, bê sazî û xwendewarî bimînin. Lewra gelê kurd tiştê ku jiyaye, hiziriye û rabihîstiyê, ji xwezayê mijarên jiyane, kefxweşî û xemgînî, hezkirin û bêbextî, xiyaret û berxwedan bi şeweyekê wek efsane, çîrok, lawik û stran bi devkî gotine, gihandine hev û dane nişên pêş xwe. Bêguman cihê ku nivîsandin tê de bi pêş nekeve, bîra mirovan xurt dimîne. Ev jî dibe bingeha ku hunera wêjeya devkî bi pêş bikeve.

Cihê wêjeya devkî di parastina kelepora gelê kurd de gelek mezin e. Hebûna çanda gelekî bi kelepora wî diyar dibe. Pêwîst e ku em pirs bikin, çandeke ku bi qasî dîroka mirovatîyê kevn û dewlemend e, çawan bi ew qas êrîş, perçiqandin, talan û tunekirinê re rû bi rû heta îro li ser lingan maye û berdewam kiriye, bi dewlemendiyên xwe kevnêşop gihandine me? Ev ji taybetiyên jiyana

Cihê wêjeya devkî di parastina kelepora gelê kurd de gelek mezin e. Hebûna çanda gelekî bi kelepora wî diyar dibe. Pêwîst e ku em pirs bikin, çandeke ku bi qasî dîroka mirovatîyê kevn û dewlemend e, çawan bi ew qas êrîş, perçiqandin, talan û tunekirinê re rû bi rû heta îro li ser lingan maye û berdewam kiriye, bi dewlemendiyên xwe kevnêşop gihandine me? Ev ji taybetiyên jiyana civaka kurd û ji cografya Kurdistanê derdikeve holê.

civaka kurd û ji cografya Kurdistanê derdikeve holê. Bi vê cografyayê re, bi awayekî tund, bi girêdana axê re, bi hilberîn û kedê re ji nêzîk ve girêdayî ye. Di hunera wêjeya devkî de, bi taybetî di stran, çîrok û destanan de zimanekî kurdî yê zelal heye.

Wekî tê zanîn gelên pêşketî, dîroka xwe, berhemên xwe yên ramyarî û wêjeyî dinivîsin û diparêzin, ji bo ku bibe zaxa çandî, li ser bingehe wê pêşeroja xwe bi pêş de dibin û ava dikin. Gelê kurd nikariye dîroka xwe, berhemên xwe yên ramyarî û wêjeyî binivîse. Neçarî şewazê devkî bûye. Lewra wêjeya devkî bûye çavkaniya dîrokî, berhemên hunerî û wêjeyî ya gelê kurd. Wêjeya devkî bûye kela parastina dîrok, kelepor, çand û zimanê gelê kurd û bûye sembola heyîna gelê kurd. Wêjeya devkî rastiya hebûna gelê kurd e ku dîrokê ew jîbirîrî û cihanê ew nikolîrî, rave dike.

### *Hodariya ziman*

Pêdivî, dayika afirandinê ye. Ji sedema ku gelê kurd ne xwedî saziyeke perwerdeya neteweyî bû, pêdiviya hînbûna zimanê dayîkê neçar dihişt ku hinek riyên ji bo perwerdekirina zarokan û vebûna ziman bi şeweyekî rast û saxlem heta ku dengê tîpan derînin bide afirandin. Di nav xelkê kurd de, rêbazeke wiha bi pêş ket, pêwîst e zarok li ser hev bi deh caran hevokan bi wê armancê hatiye honandin dubare bike, bêyî ku şaş be, ji ber ku dema ew şaş bike, wê bi ber xwe bikeve. Lewre zarok bi hizir û balkêşî dibêje. Ev yek dibe sedema bihêzbûna pêwendîya di navbera mêjî û ziman de. Ziman bî

awayekî zelal û rast peyvan derdixê. Ev ên li jêrê  
jî hinek nimûneyên hînkirinê ne.

*Çil çûrên sorên, çaqrût, wê li vî aliyê avê.  
Van çil çûrên sorên çaqrût, gazî wan çil çûrên  
sorên çaqrût, got,  
hûn çend çil çûrên çaqrût in li wî aliyê avê*

*Ez çûm mala Mele Remezan,  
Min got, ho mamê Mele Remezan,  
Kanî mera mala Mela Remezan?  
Got; mera mala Mele Rezmezan, ne amade ye  
wa li balê rezan*

*Şero şeş seg hebûn, her şeş segên Şero şer kirin.  
Min çî şer, jî şerê her şeş segên Şero xweştir nedît.*

*Beran gêr bû, min beran xwar,  
Beraz gîz bû, min beran xwar.*

*Şahîne şivesorî,  
Ez hatim şûna şiva şahîne şivesorî.*

*Ez çûm zinca sofî Zinco,  
Segê sorê Sofî Zinco hat min.  
Min got, wirî segê sorê Sofî Zinco*

*Qîr ma kunê ve,  
Kunê me ma pîrê ve.*

*Heft qîrên qut çûn kunekê de.*

### **Mamik (xaçepirsa gelê nexwenda)**

Xwezaya mirovan tu caran li hemberî zor û  
cewisandinê bêçare namîne. Gelê kurd di dîroka  
xwe ya dirêj de rû bi rû li hember êrîşê dagirkeran  
bû, lê çanda gelê kurd, li ber xwe da û heyîna  
neteweyî parast. Lewre mirov di nav wêjeya devkî  
ya gelê kurd de dema digere, rastî gelek tiştên bal-  
kêş tê, yek ji van xaçepirsa kurdî Mamik e. Bi bê-  
jeyên kin û bi wêneyên balkêş, pirs dike û bersiva  
xwe dixwaze. Li jêrê çend nimûne ji mamikan.

*Sindirûk li ser sindirûkê,  
Kil û mifte li destê bûkê, çî ye?*

*Himhima dîwar sima, çî ye?*

*Hinenî li binê genî  
ez dibînim tu nabîni, çî ye?*

*Tiştêk nav mêzera siltanî, çî ye?*

*Pênc bira qesrekê ava dîkin, çî ye?  
Min derê govê vekir, tijî eskerê serreş e, çî ye?*

*Qesra spî ye, bêderî ye, çî ye?*

*Min berek ji dûr ve dît,  
nêzik bûm du ling, du dest û yek serî, çî ye?*

*Du tas in,  
du bintas in direqisin, çî ye?*

*Tenura himhimî tijî nanê genimî, çî ye?*

*Hilindir, milindir  
kur ji bavê bilintir, çî ye?*

*Tizbê xezalê, gêr bû newalê, çî ye?*

*Ez çûm şikeftê ve,  
tijî bizinên bi şaxekê, çî ye?*

*Li ber bide naşikê,  
Li avê bide, dişikê, çî ye?*

*Peyveke ji her tiştî re pêwîst e, çî ye?*

*Ker zirî bişkul firî, çî ye?*

*Mela bang dide, lê bêrih, çî ye?*

*Hindî ez diçim, ew jî ligel min tê, çî ye?*

*Tijî şikeftê sor kevirên spî ne, çî ye?*

*Mela, jina xwe û dotmama xwe,  
du sêva li hev belav dîkin her yekê yek, çî ye?*

*Hespê boz, meydan kir toz, çî ye?*

*Sengil gil e, bingil gil e, çavzîqê simbêl bil e,  
çî ye?*

*Malek heye, ne li erdê ye, ne li esmanan e  
Mifta wê di destê mirovan de ye, çî ye?*

### Gotinên pêşiyên

Civakên pêşketî gotinên pêşiyên xwe, komî ser hev kirine û parastine. Ji ber ku kevnetoneya wan a rewya ye. Kombûna şûnmahiya ramyarî ya civakê ye, roleke dîrokî di peywendiyên civakî de, di rîya zimanê rojane de dileyîze. Gotinên pêşiyên, di nav civaka kurd de gelek zêde ne, di asteke pir balkêş de ne. Der barê hemû aliyê jiyanê de ne. Lewre tê gotin ku "Mezinan, tiştêk ji biçûkan re nehiştiye." Ji ber ku gotinên pêşiyên di hevokeke tijî de tê gotin, bi xwe re bandoreke bîrewerî û hestiyarî li ser mirovan çêdikin. Di mirovan de xwesteka jiberkirina wan diafirîne.

Nexwendetî, roleke xwe ya girîng leyîstiyê di belavbûna van gotinan de di nav civaka kurd de. Bedirxan Sindî di pirtûka xwe ya bi navê Gotinên Pêşiyên yê Kurdî de di rûpel 8-9'an de dibêje: "Cara yekê Mela Mehmudê Beyazîdî, gotinên pêşiyên ên kurdan berhev kirine. Rojhilatnas Byoter Ltix, hinek ji wan wergerandine zimanê rûsî û almanî û di sala 1857'an de, çap kiriye. Îvî Azadofda li Tîblîsê, di sala 1891'ê de, pirtûkek ji gotinên pêşiyên ên kurdan çap kiriye. Komîsêrê Îngilîzî Nowêl, di salên 20'î yê nê sedsalê de, lêkolîneke bi navê Kesayeta Kurd Wekê ku di Gotinên Pêşiyên de Diyar Dibe, nivîsandiyê û daye weşandin. Daye diyarkirin ku gotinên pêşiyên ên kurdan li ser nîrxê civakî, azadî, dostayî, dirustî, aborî û peywendiyên civakî digire nava xwe.

Kamîran Bedirxan û nivîskara Frensî Losî Pol Margrêt, pirtûkek ji gotinên pêşiyên bi zimanê frensî di sala 1937'an de çap kiriye. Rojê Lîsko jî, gotinên pêşiyên kom kirine û daye diyarkirin ku, mijarên xwehezkirin, dîrok, xwestek, hestiyarî, ezezîfî ye. Nivîskarê Kurd Îsmail Heqî Çawîş, di sala 1933'yan de, pirtûkek bi navê Qisê Pêşiyên ku 613 gotinên pêşiyên tê de hebûn nivîsandiyê. Mamoste Merûf Ciyawak di sala 1938'an de, pirtûkek bi navê Hezar Bêje û Bend nivîsiye. Mamoste Hecî Cehfer pirtûkek bi navê Qisetên Mezinan ku tê de 2450 gotinên pêşiyên hene nivîsandiyê. Çapemeniya kurdî jî girîngiyê mezîna daye gotinên pêşiyên û lêkolînen li ser. Helbestvanê Kurd Pîremêrd, 6500 gotinên pêşiyên, bi awayê şîr rîstiyê û daye weşandin."

Wêjeya devkî pir dewlemend e, bi gotinên pêşiyên ên ku ji realîte û ezmûna di jiyanê de hatiye girtin. Di van de nêrîna piştî têkoşîneke bêhempa di jiyanê de hatiye deranîn. Nêrîna ji jiyanê re diyar dike, hinek ji wan nêrîn û taybetmendiya kesên cotkar û xîzan ji jiyanê û civakê re diyar dike, hin jî ji wan nêrîn û taybetmendiya kesên desthilatdar ji jiyanê û civakê re dide diyarkirin. Lewra mirov felsefe, bîr û bawerî, şeweya jiyanê ya gelê kurd di van gotinan de dibîne. Rastiya civak û mirovên kurd pir zelal tîne ber çavan. Gelek kesan gotinên pêşiyên ên di nav gelê kurd de tîne gotin berhev kirine, hin ji wan jî şîrove kirine û vequlibandine li ser zimanên biyanî jî. Lewra pêwistiyeke mezîna heye bi naskirin û tîgehîştina di gotinên pêşiyên de, yê ku cihekî xwe yê mezîna di wêjeya kurdî ya devkî de digire. Li jêrê çend nimûne ji gotinên pêşiyên.

*Şev çiqas tarî be, nikare ronîya mûmekê veşêre.*

*Yê ne li govendê be, xweşreqas e*

*Rindkirin ji pirkirinê ye.*

*Aqilê sivik, barê giran e.*

*Berxê nêr, ji bo kêrê ye.*

*Yê here girtina masiyan, wê şil bibe.*

*Tava xweş, ji sibehê de diyar bibe.*

*Destê bi tenê, li çepkan naxe.*

*Her hevraziyek, nişûviyek li pey e.*

*Deriyê xwe bigire, cîranan neke diz.*

*Xebera xwe bipêje, paşê bibêje.*

*Navekî giran, şehrekî wêran.*

*Eger ku tu nezani, berê xwe bide cîranî.*

*Her teyr, bi refê xwe re difire.*

*Kaniya te av jê vexwar, kevir neavêjê.*

*Mij li ser çiyayê bilind xelas nabe.*

*Mirov bi pirsan diçe 'amê.*

*Serê mezîna, ne nîşana aqil e.*

*Aqil taca zêrîn e, lê li serê her kesî nîn e.*

*Tasa te li erdê ket, çi şikest, çi neşikest, deng jê derket.*

### Helbestên devkî

Wêjeya devkî ya gelê kurd, bi helbestên xwe yên ku li ser hezkirin, pevçûnên di nav eşîran de, li ser şerê li dijî dagirkeran, li ser kesên leheng hatine gotin gelekî dewlemend e.

Taybetmendiye helbestên devkî ev e ku neqaratên wan tèn dubarekirin, ev yek jî dihêle ku hestên guhdaran bilivin. Dîmenên pir xweş û xweşik datîne holê û di wê de, hêzeke pir mezin a hunerî û wêjeyî heye. Asoya xeyalan tê de pir fireh e. Di hunerê wêjeyê de, hunandî û biqafiyeye, lê di pîvanê de, şikestî ye, vê kuştina pîvanê, hiştiye ku pir sivik bê gotin. Ne girêdayî tu destûrên gelemperî yên helbestan in. Xwedî taybetmendiyeke serbixwe ye. Helbestên devkî ji sê beytan heya bîst beytan hene. Helbestên kurt bi awayê pêlên deng dirêj bibe, lê bi vê pêlên deng dirêjiyê ahengeke xweş dertêxin holê.

Di wêjeya devkî ya gelê kurd de helbest cihêkî fireh digire. Helbestên devkî yên gelê kurd, bi gelek awayan hatine gotin. Ji ber ku ew qas kederên gelê kurd pir in, bi helbestekê wan tîne ziman. Her serpêhatî, yan jî hemû bûyerên li ser re derbasbûyî, bi awayê awazan lorandiyê. Helbestên devkî di nava xwe de dibin gelek beş.

#### a) Heyranok

Ev helbest, bi awayek stranan li ser evîndariya du kesan radiwestin û di heman demê de, di navbera du kesan de tê gotin: Yek dibêje, ya din jî bersiv dide. Bi taybetî yek xort e û yek jî keç e. Mînak:

Lalîxan

*Hesam axa te çi kul e, te çi derd e  
Te binserok bere cêrayî erd e  
Tê Hesam axa mîrat bikul û derd e*

Hesam

*Êvarî xweş êvarî.  
Zeryakên Hesamê axê meya ser robarî  
Ji min re hatibû kaxeza silhê kanê ne diyarî*

Lalîxan

*Êvarî roj tu nema  
Xelk û alem di rê mala me de bûne cema  
Tê Hesam axê mîrat bi kul û xema*

Hesam

*Êvarî ber rojê re*

*Keçyokê Lalîxana goveyê xezêma zêra li difnê  
Xweziya tu ya min bûya, ji xêr û miradê Xwedê re*

Lalîxan

*Xêlyekê Hesam Axê çûne deşta va Hevinda  
Xweşmêr siwar bû, qelsmêr mane rêza gunda  
Mala bavê min terefê Şamê bû, te çav li me neda.*

Hesam

*Êvarî ber vî wextî,  
Bejnika bilind bixemilîne, bîne dane ser vî textî,  
Kê dewrê heft zemana dîtiye maman li birazî  
kir bêbextî*

Lalîxan

*Bejnika te rihan e, rihana derb û dêra  
Awirê te kurê kurmalê, awirê piling û şera  
Piştî bejnika bilind, li min heram be mehra mêra*

Hesam

*Awirê vê kurê kurmalê, awrê milyaketa.  
Piştî bejna bilind, li min heram be balinkiyê  
hermeta.*

#### b) Serêlî

Ew cureyên helbestan ên bi stranî dema dilan direvîne, navê wê yê xwezayî jî (serê lê rê) tê girtin. Dema koçer ber bi zozanan ve diçin, evîndarek diçe zozanan, yek dima li deştê. Evîndarê diçû zozanên bilind, êdî ji deştê qut dibe, evîndara wî dihat bîra wî, dest bi stranê dike. Mînak:

*Binare binara binê vê beriyê,*

*Li min şîn dike gumçika kembaxa vê tehliyê,*

*Malxwê banî dike kevaniyê*

*Ka bîne şihîne vê weqiyê*

*Da bikêşîn donikê mirîtiyê*

*Kulavê giziriyê berê xwe bidin bajarê Cizîriyê.*

*Da em derbaz bikin şapikê sora bi kelek û bi  
gemiye*

*Ez ê bidim te banikê xanê bi pişo û gelêş ve*

*Ez ê bidim te qeyseriyê Cizîra Botan bi topikê  
qirêj ve*

*Ez ê bidim te seqlanên jorî bi kembaxê êş ve,*

**c) Helbestên narînî:**

Ew helbestên bi stranî yên di dema bûk tê veguhestin de berbûkî li ser bûkê dibêjin ji wan re tê gotin. Mînak:

*Narîné em hatin tewû  
Delalê em hatin tewû  
Tu bike wek karê xewû  
Bûkanê bûkanê, we lê lê bûkê  
Bûka hezû mezû, delalê bûkê  
Tiriyê kevnerezan, delalê bûkê  
Zavê da ber gezan, delalê bûkê*

*Bûka me we nakin, lê lê bûkê  
Çargê Xwedê nake, delalê bûkê  
Malbavê ji bîr nake, delalê bûkê  
Bûka me we dikitû  
Çargê Xwedê dikitû  
Malbatê ji bîr dikitû*

**d) Bilûte**

Ew helbestên bi stranî yên di dema zava dibin serşoyê, li ser tê gotin ji wan re dibêjin bilûte. Mînak:

*Da biçîn zozanan  
Da biçîn zozanan  
Kolekê çêkin ji gulan  
Eger tê nebû ker kin cîranan*

Mînak:

*Minara Sêrtê  
Minara Sêrtê  
Dotmam siwar tê  
Pismam peya tê  
Giriyê kafîran li halê pismêm tê  
Hoy qatê qatê Hesingo qatê  
Aliyek berf tê  
Yekê baran tê  
Hesing zavayê heyva sibatê  
Hoy wêlî wêlî Hesingo wêlî  
Hey wêlî wêlî pismamo wêlî  
Çar çeka rakin da biçîn xêlî  
Hesingo zava ye Xwedê tu bihêlî*

**e) Helbestên şînê**

Ew helbestên wiha ne ku bi stranî, yên dema mirovek hêja û berketî dimire, li ser tê gotin. Helbestên şînê bi sê awayan tên gotin. Mirina asayî, şehîdbûn, mirina bi birîndarî. Mirina asayî. Cihekî girîng û wekî beşek ji jiyana mirovan e. Ji ber vê bi gelek awayan helbest bi wan hatine gotin.

Du awayên helbestgotina şînê hene; awayek mîna stranana e û awayek mîna çîrokristinê ye.

Mînak:

*Serano ji dilê min re sosin bestî  
Kihêlên xirab ji dilê min re,  
nayê destî  
Heyf û mixabin ji dilê min re  
Serê xort û lawa bikeve ser  
darbestî*

Mînak:

*Casimo lawo dilê mino, diyarî  
xapanê vê felekê  
Li cotekî kevoka fir dabû, danî  
xopana devê te kulekê  
Sê kulê Xwedê bi kul bin, xwe  
berdîn mala gundîno lawê Gozê  
Na wilah baba sê barî Mehled  
Begê*

*De lawo, lawo, hey lo lawo  
Zavakê sê rojan û sê şevayo  
Dotmama reben, ne têr dîto, ne  
têr bînayo  
Li ber çavê dotmama reben,  
bûya xewna şevayo.*

*Lawo, lawo, hey lo lawo*

Mînak:

*Hey maro, marê belek  
Ez ê li bextê Xwedêwo, tu xwe  
li dora egîdê min nekî kulf û xelek  
Tu yê ji delalê min nexî, çavên  
reş û belek*

**f) Helbestên lorîk**

Ew helbestên bi stranî yên di dema dayîk zaroka xwe dixwaze bi xew ve bibe, dibêje, jê re dibêjin lorîk. Mînak:

*Delalê dayika, va delala  
Hewara Xwedê, xewika pîr û  
kala  
Bikeve çavikê van tifala*

**g) Helbestên lawîk**

Kurtehelbestên bi stranî yên evîndariyê ne, keçîk û kurîk diavêjin ser hev. Mînak:

**Lawîk**

*Serî bişo, bi ava gulan  
Tu çar biskan berde, ji her çar  
milan  
Ez û tu biçin, kêrî û miqabilan  
Em ê sozekê bidin, ji eşq û dilan  
Serî bişo, avê nerêj  
Tu çar biskan, berde serî dirêj  
Tu ya min, ji kesê re nebêj.  
Minê dîtî ser deravî  
Çarê girê nede, tu zirav î  
Tu heft mal û mêran bikî  
Tu ronîya, li ber vî çavî*

**Keçîk**

*Minê dîtî riya revê  
Te jî gule şekir, barî ji dev û lêvê  
Xwedê miradê min û te bike,  
ji îro û pê ve  
Minê dîtî, tê ji medresê  
Serî çêkir, pê meqesê  
Heger ne şerma bab, bira û  
gundiyan be  
Minê sê caran gotiban ax!  
Bejna bilind ez ê li kêrî, tu yê li  
kêrî  
Şal û şapikên bejna bilind, çûr  
melez e li piştê nêrî  
Xwezî heft salan tu bûban  
şivan, ez bûbam bêrî*

**Lawik**

*Keçê dînê, minê dîtî min nas nekir*

*Minê revandî, min xilas nekir  
Min bir li cem mela, li min mehr nekir*

*Keçê dînê, bejna te rihan e, rihana bi tenê*

*Xwezî babê te xizan ban, tu danaban ber kirîn û fîrotinê*

*Minê li te daban rihê şîrîn, malê delal*

*Bejna bilind minare ye*

*Destê rastê çixare ye*

*Dîtina min û te ev care ye*

**h) Helbestên payîzok**

Ew helbestên bi stranî di demên ku koçer payîzan ber bi deştê tîn de, keçik û kurik ji hev cuda bibin û her yek diçe warê koza xwe, ji stranên diavêjin ser hev re dibêjin payîzok Mînak:

*Payîz e, payîza li min dike gazî  
Hûr bayê lê da, li kêriyên bilindî  
Hûr bayê lê da, weşandin xizêm  
goyên darên mazi*

*Keçikê, bi sê denga li kurikî dike gazî*

*Kuriko mala babê te xira bû heta bihar bî*

*Te li warê warkuzê, te deyn nekir*

*Îro payîz e, mehelên mala nû cîbîna*

*Tê nûga desteyek rihanê û beybûna*

*Ji min dixwazî*

**Mînak**

*Xemê min ji xiyalê te pirtirû  
Kulê min ji mereqê te kûrtirû  
Hestirên çavê min rebena Xudê  
Bajarê Cizira Botan li ber xwe birû*

*Ez çûm çiyayê Cûdî mûrê çiyay  
Ez ê ji jor de berê xew bidim  
kul û keperê van deştiyan*

*Ez ê çembilê bejna zirav bigirim birevînim*

*Ez nabim mala çî mûr, axa û began*

*Ez ê bibim şikeftika "êx Eli ser geliya*

*Sal hiş û sal melez û tu derê mala*

*Babê min re dibûrî bi lez û bezû*

*Eger tu nêçîrvan î, xezal ezû*

*Min ne dît tu riy rêve*

*Wey la min xulamê, te çavreşê memiksêvê*

*Ez ê gurikim malên jêr û jorê bi jin û mêr ve*

**i) Helawik**

Ew helbestên bi stranî di maziçî, berûvanî û hwd bi dengê melûl keçik û kurik ji hev re dibêjin.

**Mînak:**

*Here maziçînê*

*Ez ê banî te bikim*

*Hege tu xwadan heval î*

*Cewabê li min nede*

*Hege tu bêheval î*

*Mesilade berde*

**î) Stranên palehiyê**

Ew helbestên bi stranî yên di dema palehiyê de, tîn gotin.

**Mînak:**

*Mendo Mendo, hoy Mendê min  
Çîçika sibê xwende, hey lawikê min*

*Zeriya kir govende, hey lawikê min*

*Kevirê reş mezin e, bin de te-rezîn e*

*Mendo anî jino, hey lawikê min  
Kevirê reş biçûk e, hoy Mendê min*

*Bin de belalok e, hoy Mendê min*

*Mendo anî bûk e  
Kevirê reşo vajî bin de toletajî  
Mendo ji germa najî, her Mendê min*

**j) Helbestên şeran**

Ew helbestên bi stranî, dema egîdek yê êlê tê kuştin, an jî dema di şer de serkeftin tê bidestxistin, tîn gotin. 1) Yek bi awayê dîlan tîn gotin 2) Yek jî bi awayê koçik û dîwanan tîn gotin

**k) Helbestên dîlanan**

Ew helbestên bi stranî yên di dawetan de tîn gotin. Mînak:

*Navê lawikê min Eli ye  
Tîfinga milî eynelî ye  
Dinya alemê gotibû reş e*

*Min evdala Xwedê*

*Tinê gotibû bila*

*Sal hêşino sal te nayê*

*Tu kiçik î jin te nayê*

*Welehî hin di tîn malê*

*Babê xwe bide nextikê*

*Min pê nayê*

*Navê gundê me Qando ye*

*Serê rû ye bin re çûye*

*Heçiyê lawikê min nas bike*

*Jixwe nas dike*

*Heçî nas neke didanzêr e nav rema ye*

*Tu wa çûyî min ji bîr neke*

*Navê min dane ser gustîlkê*

*Ji tilya xwe ke, heger tu çûyî*

*Welatê xeyan û xorbeta*

*Navê lawikê min Inis e*

*Tîfinga milî 44 nîfis e*

*Hegî sûka min qama de diçe*

*Ya jî dinya û alemê ve teyîse.*

### D) Sirûdên ayînî

Ew sirûdên sofî, mela û derwîş di civatên xwe de, yan jî demaş hazir bin, yan di bîranîn û cejnên ayînî de tîn gotin. Piraniya wan bi awayê helbestên sirûd hatine honandin, pir bi-bandor in û biaheng in, li ser eşqa Xwedê, Pêxember û şêxan tîn gotin. Mînak:

*Ez çûm Xydayê wa gelî gelî  
Jê derketin cotek welî  
Yek Şêx 'abedîn, yek Seyîd Elî  
Hewar şêxê min  
Ez çûm Xeydayê wa ye di kortê de*

*Daraxacî danîne di nav rê de  
Şêx Şabedîn, Seyîd Elî daliqandin pê de  
Şirît qetiya ji ba Xwe de*

#### Mînak

*Elî rabe wiha nabe  
Bi hîle û plan çênabe  
Umrê borî mirin habe  
Dek tê kengî peyda ke*

*Elî dinya gelek pîs e  
Keça 'eytan e Îblîs e  
Yeqîn axret diçe ji kîs e  
Heçî dil bigre ji dinyayê*

Di ola êzidî de gelek sirûdên ayînî hene, bi giştî qewl in, li ser bîr û baweriya ola êzidî ne. Ji aliyê şêx, pîr û qewalan ve jiberkirî ne. Bi zimanekî zelal û rewan hatine honandin. Li jêr çend parçe ji qewlên îmanê, ji kovara Lales, hejmara 8'an me girtine.

*Îman heye bi çi nîşan e  
Wekî ne erd hebû ne ezman e  
Ne çiya hebû ne sikan e  
Ne behr hebû ne biyan e*

*Ne mîr Birahîmê Adema  
Ne Xuresan e*

*Rê hebû terîqet e  
Erkan hebû merîfet e  
Kaniya spî hebû qubalet e  
Wê rojê Siltan Êzî kaniya spî  
Bo mêran kir qubalet e*

*Berî erd û ezman e  
Berî behr û binyan e  
Berî çiya û sikan e  
Ya Siltan Êzî çendî meder ji te didin nîşan e  
Ya Siltanê Êzî çendî meder ji te Dide me  
Berî loh û qelem e  
Berî Hawa û Adem e  
Berî wê hingê 90 hezar sal ezî li ba te me.*

Di helbestên devkî de, xalek diyar dibe ku bala mirov dikişîne, ew jî hebûna şeweyeke erotîk a pir pêşketî ye. Di asteke wisan de ye ku mirov rastî wê di wêjeyê gelên din yên herî pêşketî de nabinê. Ya din, civakeke bi nîrxên feodalî, eşîrtî ve girêdayî, di bin bandora ola îslamê de û di hundirê xwe de girtî, di nav civakeke wisan de erotîzmeke ew qasî aşkera bala mirovan dikişîne. Mînak:

*Lê lê keçikê  
Kuriko banî dike keçikê  
Min cotê zermemikî dîtine  
Keçik dibe; Ger te zermemikê  
Min dîtine bêje nîşanê wan çik e*

*Kurik dibe; Serê wan ar in  
Binê wan spî ne  
Nav narincî ne, kesk in, sor in, spî ne  
Xemirîn elwanî ne.  
Weke hêkên mêkewan e*

*Vê herama mêkewê li bin  
Belekên berfê li Zozanê Şeref-dîne*

*Ki ne wekî bibikûn baran e  
Biharî li avê ketine  
Minê leqek li nava wan dayî ne  
Aqil û sewda li serê min ne-mayîne*

*Heylo delal  
Bila ez bibûma livaya van  
berxikan  
Ez biketima teşte van qîzikan  
Ez bibama ser firat bişûştima  
û bidam ber şûnika.  
Ez biketama êlekeke sor û her  
danîma li ser wan memika*

Di encamê de, wêjeya devkî ya kurdî deryayeke bêbinî ye. Berhemên wê heta niha pir kêr hatine lêkolinkirin û nivîsandin, bi taybetî bi zaravayê kurmançî. Mîna xwest ku ez di vê xebata xwe de nêrîn û danasînek –her çendî pir kêr û qels be– bala wêjehezan û wêjekaran bikişînim ser vê gencîneyê. Ya din ev bibe sedema linavdanekê bo naskirin û xwedîderketineke li wêjeya devkî. Her xal, beş û şaxên wêjeya devkî pêdiviya xwe bi lêkolîn û berhevkirinê heye. Lêkolîna li ser wêjeya devkî pir kêr hatiye kirin, ku pêdiviyek mezin jê re heye, ji ber ku binyat û çavkaniya wêjeya kurdî ye. Ger em dixwazin rast di felsefe, giyan û derûniya kesayeta kurd de bigihin, pêwîst e em deryaya wêjeya devkî baş bikolin û bi zanistî binirxînin.

Ji bo zindîkirina wêjeya kurdî pêdivî bi nûjenkirina wêjeya devkî û nivîsandina wê heye, da ku hîmê ziman û wêjeya kurdî saxlem û asê were avakirin.

# Çend gotin li ser

## Destana Memê Alan

Yaşar Eroğlu

Ev nivîs ji xwendina min a pirtûkeke li ser Destana Memê Alan derket. Min pirtûkeke binirx xwend ku li ser wê destanê bû. Her çî qas pirtûk binirx û birûmet bû jî, şîroveya wê bi min şaş hat.

Min dîtînen xwe wek gotarekê amade kirin. Ev gotara ku ez der barê Destana Memê Alan de dinivîsim ne li ser dîtînen kesekî ne. Min xwest ku beriya rexnekirinê ez di vî warî de çî difikirim, destanê çawan dinirxînim diyar bikim û bi navgîna vê gotarê bi we re parve bikim.

Berî ku ez dest biavêjim mijarê û binivîsim, dixwazim ku bi destanê dest pê bikim. Pirsar yekem destan bi xwe ye; destan çî ye?

Malpera Wîkîpedîa ya li ser înternetê destanê wiha bi me dinasîne:

“Destan, berhemên ku kirînen awarte yên lehengan bi coş, şeweyekî dëlîndêz tîne zimên û bi pîranî ji gelek beşan pêk tên û helbestî ne. Wekî cureyekî herî kevin ê wêjeyî tê zanîn. Tê bawer kirin ku gotina “destan” ji gotina epos a yewnanî tê. Destan, hêmanên mîtolojî, gotegot (efsane), zanista gel (folklor) û dîrokî jî di nav xwe de dihewîne. Destan û çîrokên destanî, te-

şeyên wêjeyî ne ku ji çerxên herî kevn ve li her aliyê dinê bi awayekî kevneşopî ji nişên nû re bête hilanîn, bi hevkarî (kollektîf) hatine afirandin.”

Ên ku destanan diyar dikin, kê mîna mîna hev didin nasîn û wateyên pir nêzikî hev in. Wekî pênaseya Wîkîpedîa destan ew e ku, di dîroka gelekî an jî civatên gelêrî de bûyerên lehengî û awarte bi devkî an jî bi nivîskî, bi zimaneke coş û heyecan, gelek caran jî bi vegotîneke pirolekîrî (mubalexe) radixe ber guhê guhdar û çavên xwendekaran. Bi rastî destan bûyerên awarte ne. Pir tiştên ku di destanan de derbas dibin, dûrî mantiqê bin jî ew rastiyeke destanan e. Her wiha coş û heyecana wê jî awarte ye. Em dikarin bi dilrihetî bibêjin ku, koka destanan di mîtolojî û efsaneyan de veşarî ye. Ji ber ku aliyekî destanan jî, mîtolojî û efsaneyan di nav xwe de dihewîne.

Em vegebin ser mijara xwe ya esas. Pîrsek dîsan, gelo çîroka Memê Alan destan e yan na? Dema ku min careke din jî xwend û bi çavê nîrxandinê lê nihêrî, min ev pîrs ji xwe kir. Bi rastî dema ez li ser vê pîrsê hinekî fikirîm, bersiva wê ji nav destanê bi xwe derket û li ber

çavên min zelal bû.

Belê çîroka Memê Alan destan e. Wekî pênaseya destanê em dinêrin û bi destanê din re didin ber hev, ev rastî derdikeve holê. Di vê destanê de hêmanên evîne û bûyerên ku li dor evîne qewimîne, li pêş in. Mirov berê pêşîn li vê dinêre, dixape dibêje ku ev ne destan e. Belê rast e, tenê bi hêmanên evîne destanek pêk nayê. Lê gava mirov bi nîrxandinê kûr lê dinêre, rastî ne wisan e, lehengî û bûyerên awarte di destanê de neqîşandî ne. Şerê ku bi eceman re tê kirin, lehengiya Hesên, Çeko û Qeretacîdîn, erîşa mezin a Beglî ku ji Mixribê tê ser Cizîrê, ne lehengiyên ji rêzê û alelade ne. A din, jixwe destan ji serî heta dawiyê bi bûyerên awarte pêk tê. Ew yek jî, ji serî heta dawiyê coş û heyecanekê dide destanê.

Hin taybetiyên Destana Memê Alan dişibin destanê navdar ên cîhanê. Em dikarin bibêjin di serî de jî dişibe Îlyadaya Homeros. Îlyada jî destanek e ku li ser evîne pêk hatiye. Parîsê evîndar Heleneyê direvîne dibe Troyayê û şerekî ku neh salan didome diqewime. Evîn, şer û êrîşên wan, ji sedî sed nebe jî dişibin hev. Di destana me de evîn heye (lê bêtî re-



vandinê), ji bajarê Mixribê tê bajarekî pir dûr wek Cizîrê. Evîndar ji bo ku evîna xwe bibîne, meşeke dijwar dike. Erîş û dagirkirina bajarekî di her duyan de jî heye. Yek di destpêkê de ye, ya din di dawiyê de ye. Di her duyan de lehengên sereke dimirin û cinaze dîl dimînin. Di her du destana de erîşkar di heman demê de dagirker in. Lê di yekê de qehreman di bajarê xwe de ye, di ya din de qehreman li bajarekî biyanî ye. Li gorî destanan, her du bajar jî tîrên rûxandin û wêran dimînin. Hevpariyeke din jî xweda û xwedawend in. Zeûs, Hera, Athena, Apollon, Poseîdon û hwd. Û Heyvbano, Tavbano, Stêrbano, Xizir û hwd. Ew qasid in, di navberê de tîrên û diçin; bi kesên baş re dibin alîkar, rê nîşan didin, ji yêrî din re astengan derdixin.

Ji bo ku baş bê zanîn Memê Alan destan e, hêmanên destanan ên bingehîn, hevparî û şibandina wan bi destanên navdar ên ku tîrên zanîn re hene, me bi Îlyadaya Homeros re da ber hev.

Ez Destana Memê Alan a ku Roger Lescot ber hev kiriye û Weşanxaneyê Orfeus ew di sala 1996'an de li Stenbolê çap kiriye esas digirim û nixandînin xwe li ser wê dikim.

Ew destan, ji pir aliyan ve deforme bûye. Her destan li gorî dema ku tê re derbas dibe, hinek diguhere û rengê jî wê demê digire. Ev tiştêkî xwezayî ye. Bi ya min dengbêjên sedsala bîstan pir zêde xwe û nêrînen xwe tevî destana Memê Alan û her wiha destanên din jî kirine. Vê rastiye jî, destan hinekî ber bi deforme bûnê ve ajotiye. Di serî de tesîra zimanê tirkî pir li

destanê bûye. Destanên ku gel bi xwe ew rasterast parastine, bi pîranî jî aliyê dengbêjan ve hatine xwedîkirin, tesîra zimanên biyanî li ser wan nebûye, wek a Ehmedê Xanî, helbestên Melayê Cizîrî û serkêşên wêjeya klasîk a kurdî. Bi rastî ya Roger Lescot ber hev kiriye, ji vî aliyê ve di nav xwe de pir zêde peyvên biyanî hewandine. Pirên van peyvên jî, tirkî ne. Wek mînak ji van peyvên biyanî em çend nîmûneyan bidin:

*“her qapîke (rp. 73, rz. 4), emegê gane (rp. 97, rz. 593), îşê saetekî (rp. 131, rz. 1369), îznê bide (rp. 131, rz. 1381), mêrg û çayîrane (rp. 133, rz. 1419), deveciyane (rp. 142, rz. 1589), taxim lêkir (rp. 164, rz. 2070), boşê çû (rp. 167, rz. 2128), demirciyane (rp. 190, rz. 2617), qolordîya Kurdane (rp. 195, rz. 2734-39-48).”*

Tiştêkî din jî heye, ji ber ku destan ji devê pir kes û dengbêjan hatiye girtin, mirov dibîne ku zimanekî jî aliyê devokên herêman wek koalîsyon çêbûye. Bandora devoka Serhed û Botan pirtir tê de heye. Lê mirov herêmên din jî dikare tê de bibîne. Em bi çend mînakên bidin ku ji vê ramana me re bibin palîşt û delîl. Peyvên wek *“qutiya dilane (rp. 123, rz. 1197), balgihane (rp. 127, rz. 1271), bela bû, xelkê (rp. 127, rz. 1278), merikî pîr î çeleng e (rp. 127, rz. 1281), xulêm (rp. 130, rz. 1339), xwelî li serê te bel (rp. 130, rz. 1343), ciyane (rp. 130, rz. 1346), îşê saetekî (rp. 131, rz. 1369), paşê (rp. 131, rz. 1370), îznê bide (rp. 131, rz. 1381), mêrg û çayîrane (rp. 133, rz. 1419), gişkî (rp. 147, rz.*

*1691), gazî kin (rp. 147, rz. 1695), fîrnîk (rp. 159, rz. 1959), biqare (rp. 159, rz. 1963), nîga (rp. 161, rz. 11992), gî li boşê çû (rp. 167, rz. 2128).*

Mînak pir in lê ji bo palîştîyê bes in. Ev qalibên devoka Serhedê (ev qalib nêzikî Amed û Ruhayê ne jî) ne û wan mora xwe li destanê xistiye. Peyvên wek *“kokim (rp. 121, rz. 1136), wanî (rp. 121, rz. 1132), çitol, çeleng (rp. 126, rz. 1158), vemirîni (rp. 170, rz. 2177), tu nikanî (rp. 170, rz. 2179) jî, ji devokên cur bi cur ên deveran in. Peyvên wek ezbenî (rp. 213, rz. 3169), cih têt (rp. 213, rz. 3170), rûnît (rp. 213, rz. 3172), pev guhart (rp. 213, rz. 3173)”* jî qalibên devoka Botan in. Çend peyvên bi devoka Botan ên wek *“ko”* û *“hon”* di seranserê destanê de derbas dibin. Baweriyek bi min re çêbûye ku peyva *“ko”* û *“hon”* ne ji aliyê dengbêjan ve hatine bikaranîn û ne jî aîdî destanê bi xwe ne. Di dema ku destan hatiye deşîfrekirin û sererastkirin de, tevî destanê bûne. Her kê ev karê berhevkirinê kiribe, bi devoka xwe nivîsiye, ew jî devoka Botan e. Bi rastî jî ne pêkan e ku di hevokê bi devoka Serhedê de *“hon”* û *“ko”* derbas be. Dibe hin peyvên din jî hebin lê van peyvên bi taybetî bala min kişand.

Hest û pejnêk bi min re çêdibe ku, di destanê de peyva *“kurd û kurdan”* bi qasî ku tê de cih girtiye nebe. Lê ew kesên ku li ser vê destanê xebitîbîne, ên wekî Roger Lescot, Celadet Bedirxan û yêrî din, ji bo ku hest û ramanên neteweyî hişyar bibin li şûna peyvên *“kurmanc û kurmancan”* hatibin bikaranîn.

Erê rast e, peyva "kurd û kurdan" di destana resen de jî derbas dibe, lê belê pîrbûna van peyvên û nebikaranîna peyva "kurmanç û kurmançan" gumanekê dixê dilê mirovan. Ji ber ku kurmançî di nav gel de pirtir dihate bikaranîn, peyva kurd car carinan. Ger ev dîtina min rast be destan ji aliyê naverokê ve jî deforme bûye. Lê ez wek fikireke ku bi min re çêbûye, şik û gumanên xwe diyar dikim, ne wek tiştêkî konkret.

Hin peyv û gotinên ku di destana resen de tune bûne û piştê ketine destanê jî ez dê li vir nîşanî we bidim. "*Ezê sibe te dim, bi giraniya vî heywanî zer û mecîdiyan e, (rp. 120, rz. 1122)*", "*bi der xist tapiya Kaniya Qestelê, da Memî (rp. 164, rz. 2065)*", "*herhal, niha dûrbîn dane ber çawan e (rp. 173, rz. 2235)*", "*topê havan bar kirin li ser piştê bargiran, sendûqê cebelxanan e (rp. 234, rz. 3640)*."

Dûrbîn û topên hewan di destaneke kevnar a mîna Memê Alan de ku bi hezaran salan e heye, pîr serdemên nêzîk dinimîne. Tapî jî wisan e. Her wiha tapî jî hiqûqa milk a serdamên nêzîk dide xuyakirin. Mecîdî serdema herî nêzîktir e û pereyên bi navê Siltan Evdilmecîd dide xuyakirin, ew jî sedsala 19'an e. Tiştêkî diyar e ku her dengbêjekî jî xwe tiştêkî tevî destanê kiriyê. Bi rastî ev yek mora wan degbêjan e û di edebiyata devkî de jî tiştêkî xwezayî ye.

Destana Memê Alan jî wek destanên din, helbestkî ye. Heywên helbestê li gorî rewşa bûyerê diguhêre. Carinan şeweyeke lîrîk digire, carinan a mar-

şan, carinan dibe pastoral, lorik û zêmar. Ev tev jî dewlemen-diyekê tevî destanê dikin. Mi-rov carinan zîz dibe, carinan di-lovan, carinan hêrs dibe, carinan hestên şer û kuştinê derdixê pêş.

Ez dixwazim, xal bi xal li ser çend mijarên esas rawestim:

### 1) Di Destana Memê Alan de mîtolojî

Di her destanê de bingeheke mîtolojîk heye. Ev dide xuyakirin ku destpêka destanan heta dema mîtolojîk diçe dibe. Di destana Memê Alan de jî mirov rastî hêmanên mîtolojîk tê. Em di serî de dikarin Bozê Rewan wek mînakê vê bidin. Bozê Rewan hespekî bin behran e. Destan wek cinawirekî jê behs dike. Û ji bo Bozê Rewan wiha tê gotin:

*Beglî hat tevî hezar pênc sed xortê Kurdan, xwe dane benan e*

*Ben kişandin, bû hufehufa pêlan û çirkeçirke ben û şirîtan e*

*Bi derket binaniyê toran e*

*Dîtin ku di şebekê toran da, cenawerek dixewîne, di şeklê hespan e (rp.79 rz.117-118-119-120)*

Li gorî destanê, Bozê Rewan hespekî behran û tiştêkî awarte ye. Di mîtolojiya Rojhilata Navîn de hesp, cinawir û heywanên wek vê terîfê pîr in. Bingeha vê yekê heta mîtolojiya Sumeran kûr diçe.

Hêmaneke din jî hûrî û periyên bi navê Tavbano, Heyvbano û Stêrbano ne. Her wiha Xoce Xizir jî heye. Bi rastiya xwe ev perî xwedawend in, wek mînakên çîrok û destanên Rojhilat ên din li gorî ola îslamê

guherîne û bûne perî an jî hûrî. Her wiha Xoce Xizir jî mînakê xwedawendên mîtolojîk e ku li gorî ola îslamê guheriyê. Baş tê zanîn ku di mîtolojiya Rojhilat de pîr xweda û xwedawend hene. Li gorî zimanê destanê jî mirov dibîne ku ev pêş zanîn rast e. Destan wiha dibêje:

*Hebûn sê qîzên Padişahê Periyan e*

*Navê xwişka mezin Tavbano ye,*

*Navê xwişka navîn Heyvbano ye*

*Stêrbano navê biçûka xweyîngan e. (rp.81.rz. 170-171-172)*

Padişahê periyân çawan dişibe Mardûk an jî Zeûs ku xwedayên xwedawendan e! Li aliyê din jî perî jî naşibin xwedawendên di bin fermana wan de? Mirov hinekî bala xwe dide serê, dibîne ku rastiyeke wiha xuya dibe.

Girtin û avêtina Memê ya zîndanê jî bi rengêkî mîtolojîk e. Rewş bi vî awayî diqewime:

*Vêga Beko kete binaniya bircê, zencîrek anî*

*Memê Alan dîsa dey ne kir; dest û pê sist kirin, berdan.*

*Beko mêvanê xwe pihêt girê da, xelex û girêk li hev badan*

*Mem bêhnekî damayî ma, qey pêtek ji devê wî derket, pê pif kire zencîr:*

*Hesin sor bû, helî herikî, ket erdê. Bû marekî fêris.*

Dibe di guhartoyên bi hezaran sal berî îro de Mem wek xwedawendekî bê xuyakirin û ev şopa kerameta xwedawendîtiya wî, îro bi vî awayî hatibe guhar-

tin. Ev emareyên mîtolojîk in.

### 2) Di destanê de pirolekirin

Pirolekirin (mibaxele), xemla destanan e. Ew bi xwe tehm û çêjekê tevî destanê dike. Di Destana Memê Alan de pir caran em rastî pirolekirinê dibin. Destan, bi wan pêlan carinan radibe û carinan jî sivik dibe.

*Hûn bala xwe bidîne bajarê Mixribê çi bajar e:*

*Bajarê Mixribê bajarekî pir î giran e*

*Li ser heft çiyar e*

*Li ser sê sed û şêst û şeş qa-piyan e*

*Her qapîke li ser sê sed û şêst û şeş walîlixan e*

*Her walîlikê li ser sê sed û şêst û şeş midirlîxan e.” (rp. 73)*

Li gorî van piroleyan, bajarê Mixribê bi qasî bajarê Stenbola îro ye. Werin em li mezintiya Bozê Rewan temaşe bikin:

*Mem emir da Beglî serdarê xortan e*

*Got: “Vî heywanî berin, têxin paş wan diwazde odan e*

*Di ser ra kilît kin hemî derriyan e. (rp. 79)*

Bi vê nitirandinê em fehm dikin ku ecebêke giran e. Lê merîfetên Bozê Rewan naqedin. Binihêrin Bozê Rewan hespekî çawan e (di destanê de dema behsa Cizîra Botan dibe, kes wê nizane, neçûyê û cihêkî ew qas dûr e ku riya çûn û venegerînê ye)!

*Neditin kesê riya Cizîrê bizane*

*Bê wê ez, li ser piştta Bozê Rewan hatim panzde rojan e*

*Min pê birî riya şeş mehan e.*

Dengbêj li vir hatina Memê û lezbûn û cudabûna Bozê Rewan mibaxele dike û dinitirîne. Di destana devkî de, qabiliyeta dengbêjan derdikeve rastê. Ji ber ku nitirandin karê wan e. Dengbêj qonaxa ticêr dinitirîne û pirole dike:

*Kalo va meha şeşan e*

*Ez pir geriyam li der û bajarê ran e*

*Min tu qonax nedîn li tertîba vê qonaxê, bes yek e wanî heye, li bajarê Mixribiyan e*

*Ew jî qonaxa Padişahê Kurdan e.” (rp. 120-121)*

*Zînê got: Va şeş meh in ko min venexwariye ava kaniya Qestelê, ya gulana e.” (rp. 129).*

Li gorî honandina destanê dem ew qas zelal ne diyar e, lê hozan li vir bédengî, hesret û meraqa Zînê pirole dike, heycanekê derdixe holê. Ev çend mînak ji fêrbûna hebûna mibaxele yê tera me dikin.

Lê bêtir gotinekê em derbas nebin. Wekî me li jorê ji destanê girt, Memê Alan riya şeş mehan di navbera pazdeh rojan de diqedîne, lê heman rojê dema diçe ber qonaxê dibêje ku “*Ev şeş meh in ez digirim min bi vê tertîbê qonaxek nedît.*” Belê kîjan hevok rast e? Gava em wiha bifikirin ev nakokiyek e, lê ev ê ne rast be. Me behsa qabiliyeta dengbêjan kiribû. Bi rastî jî ev qabiliyet e. Dengbêj wexta bixwaze kîjan hêmanî derxe pêş, wê mibaxele dike, dinitirîne. Erê, dengbêj hostayên peyvan in. Bi peyvan dilîzin û li gorî xwe û nitirandina xwe, dirêsin.

Ev rastîyeke destanê ye. Ger li ser vê şîrove bîn kirin, divê

ku mirov vê rastîyê ji ber çawan dûr nexe. Her kes dikare navbera Mixribê û Cizîrê çî qas e texmîn bike. Lê bi van hevokên li jorê ne pêkan e ku tiştê zelal û aşkera bibe. Bi rastî ev metod dê ne rast be

### 3) Hin hêmanên berî zayînê û îslamê

Mînakên ku me li jorê, ji bo mîtolojiyê dan, hêmanên berî zayînê ne. Lê ez dixwazim ji aliyê jiyana civakî ve jî hin mînanan bidim. Di nav kurdan de çend tiştên ku dev jê nayê berdan hene, di serî de yek ji wan namûs e. Kurd gava behsa namûsê dikin dibêjin, bi her sê sonda bêtewa. Li ser her çî sond bixwe, namûsê jê didin aliyekî. Ji ber vê yekê jî, di nav kurdan de namûs hêmaneke awarte ye. Em bi rastîyê bi rê dîkevin û di avaniya destanê de digerin. Tiştên ku em dibînin ne li gorî rastiya îroyîn e.

Memê Alan rêwiyê ji Mixribê û evîndarê Zînê, mêvanê qonaxa celaliyên e ku yek ji wan dergistiyê Zînê ye. Gelo muama çawan çareser dibe? Pir tişt diqewimin lê di encamê de eşîret, malbat, birayên wî û ew bi xwe dev ji dergistiya xwe ango Zînê berdide ku ev feda-

**Me behsa qabiliyeta dengbêjan kiribû. Bi rastî jî ev qabiliyet e. Dengbêj wexta bixwaze kîjan hêmanî derxe pêş, wê mibaxele dike, dinitirîne. Erê, dengbêj hostayên peyvan in. Bi peyvan dilîzin û li gorî xwe û nitirandina xwe, dirêsin.**

karî jî, ji bo Memê xerîb û biyanî ye. Em ji devê serek û serleşkerê Eşîra Celaliyan guhdarî bikin:

*Carekê gotinekê bû, bi der ket ji devê me her sê biran e*

*Heya îro, ji me nehatiye bîna derewan e*

*Me tim qedandîye îşê mêvanan e*

*Em ê bidin Memî, rûyê xwe bi der bixin ji bin lingan e. (rp. 153)*

Dema Memê ji şer vedigerînin jî Hesên dibêje "Here mala me". Ew mala ku hemû mêrên ku di destanê de tînan çûne şêr, malbat bêmer e û yê mayî giştên wan jin in. Lê Hesên qet li wê nafikire û bêfîkar berê wî dide mala xwe.

Ev rewş bi bawerîya min, ne aîdî 1500 salên dawiyê ya kurdan e. Berî îslamîyetê şertên civakî yê kurdan cuda bûn. Namûs û mefhûmên mîna wê li gorî wê demê bûn. Ew dirûv şertên wan deman, di destanê de bi wî awayî mane.

Bi girêdayî wê xalê nuqteyek dîsan heye. Ev nuqteya ku ez dixwazim li ser bisekinim ev e ku, ew ji mêvantiya Memê heta mirina Memê bêrawestan û sekin didome. Ew jî dostanî, hevalbendî û dilsozî ye. Ew qas dilsozî û hevalbendî heye ku, cur bi cur fedakariyan bi wan dide kirin, neyarbûna mîr, mal şewitandin, şer û tiştên mîna wan ji bo wan ne xem in. Di dema feodalîtiyê de diyar e ku, dilsozî û dostanî pir giran e, lê ne di ser namûsê re ye, her tim li pêşîya dilsoziyê cih digire:

*Di qanûna xelkê Cizîra Botan e*

*Eger dewar û tarîş û yan ji însan here nav erdê meriyan e*

*Merî dikare wî dewarî an însanî ji xwe ra bîne û heqê kes tune ji meriyan e. (rp. 164)*

Di van rêzan de tiştê ku tê dîtîn ev e; milk û sînor pîroz in an jî sedemên destdanîna li ser in. Di serdama feodalîtiyê de milkê kesane pir binirx e, lê ne wek van rêzan. Bi piranî berî zayîne û îslamê koçberiyê giran hebû. Eşîrên ku bi ziraetê û yê ku bi ajaldariyê mijûl dibûn, êrîşî hev dikirin. Derbasbûna ji sînor, sedemê şer bû. Birçîbûn û xizanî xedar bû ji ber wê yekê ji sînorderbasbûn dibû destdayîna li ser.

Di van rêzên li jorê de emareyên bi vî rengî hene. Ne mimkûn e ku mirov bibêje ji sedî sed ev e, lê şopa wê tê dîtîn ku tiştêkî wiha heye.

#### 4) Nakokiyên destanê

Ji ber ku destan yekser çanda gel e û bi hezaran sal in ku gel di jiyana xwe ya rojane de, di şahiyên xwe de, di şîn û de-watên xwe de, di cotkarî û paretiyên xwe de, di şivanî, gavanî û bêrîtiyên xwe de, di zivistan û biharên xwe de, di şev û rojên xwe de parastîye û nîş bi nîş radestî hev kiriye û domandiye, lewma guhartin û nakokiyên di destanan de tiştêkî pir normal e. Nakokiyên ku min di Destana Memê Alan de dîtine ev in:

*Ban kire Qeretacîn biçûkê biran e (rp. 156)*

*Girt pîsîra Çeko, biçûkê herdu biran e (rp. 157)*

Kîjan rast e, Çeko an Qeretacîn biçûkê birayan e? Lê bi

giştî em di destanê de dibînin ku Qeretacîn biçûk e. Ev yek ne kêmasiya destanê ye, dema dengbêjan gotiye wê nakokiyê bala wan nekişandîye yan jî wan xwe daye ber bayê destanê û şaş gotiye.

Bi qasî ku xuya ye, di destanê de ji mîr mezintir kes nîn e. Lê dema Beko ji mîr re nameyekê tîne em nakokiyê ku heta wê demê em rast lê nehatabûn, dibînin. Ev name ku ji yekî di ser mîr re ye, tê û mîr ji şer averê dike û mîr mecbûr e ku wê fermanê bi cih bîne. Ew bi vî awayî dibe:

*Mîr Ezîn ferman vekir û xwend di nav wan siwaran e*

*Got: Gotina Beko rast e, şer sekinî û ji me ra hat rihetiya sê mehan e*

*Di bin fermanê da heye morra qolordiya Kurdan e. (rp. 195-96)*

Ev nakokî dibe ku ji dengbêj jî qewimî be, lê bi ya min dibe ku ev nakokiyê destanê bi xwe be jî.

Ya herî girîng nakokiya dawiyê ye ku ez dixwazim nîşanî we bidim. Piştî mirina Mem, Zîn û Beko, Çeko diçe bajarê Mixribê. Beglî bi ordiya xwe ve bi rê dikeve û ber bi Cizîrê ve tê. Gava digihîje bajarê Cizîrê, wê xera dike û li gorî destanê kevir namîne li ser kuçan e. Dijmin esas Mîr Ezîn e, diviya ku tolê ji wî bistînin. Lê di rastiye de wisan nabe. Beglî û artêşa wî Mîr Ezîn û giregiran didin aliyekî, dest pê dikin Cizîra bêsûc û bêguneh dirûxinin:

*Beglî emir da leşkeran e*

*Tev da bi derketin ji bajarê Cizîra Botan e*

*Hînga, Belî da îzna Mîr Ezîn, Mîr Şem û her sê Celaliyan e*

*Bajarê xan û xirabe teslîmê wan kir, hate ser tirba Memê Alan e. (rp.235)*

Ez bawer im ku ev nakokî ji avaniya destanê tê, ne ku nakokiya dengbêjan e. Dibe ku armanca destanê ev be; ew Memê Alan ê ku destan li ser wî hatiye avakirin dema dimire, divê ku tola wî jî wek giraniya wî navî be. Ew bi xwe, bedelî bajaran e, ne bi kesan e. Divê ku gava tol tê standin bajar bên hilweşandin ku armanca destanê pêk bê. Yek jî Mixrib ava û abad e. Divê ku miqabilê wî bajarî, piştî vê bûyerê li ser piyan nemîne; ew jî bajarekî tewanbar ê wek Cizîrê ye.

Cih cih di destanê de navê ebebozan cuda hatiye nivîsandin. wek "ebeboz" (rp. 123, rz. 1185), "bozbelî" (rp. 122, rz. 1174), "ebesor" (rp. 123, rz. 1188). Berê pêşîn em bibêjin peyva "bozbelî" di bin tesîra tirkî de ye. Lê tevî vê peyvê, bi giştî navê wan ji hev cuda hatiye diyarkirin. Mirov dikare vê yekê wek nakokiyekê bide xuyakirin. Ger wiha bê nirxandin dê çewt be. Çima? Sedem ev e ku, huner û hostatiya dengbêj ev rastî derxistiye holê. Dengbêj xwestiye ku bixemilîne, ji ber ku rola ebebozan li vir neyînî ye. Hozan bi vê rewşa neyînî listiye, xemilandiye, nitirandiye û rola xerab û ne baş bi awazekî xweş raxistiye ber çavên guhdaran, em jî bi saya Roger Lescot bi zimanê nivîskî pê agahdar bûne. Ji ber vê yekê, em nikarin vê cudahiye wek nakokiyekê binirxînin.

### **Destan, wêje û dengbêj**

Destana Memê Alan, ji çend destanên sereke yên kurdan yek e. Destan di parzûna sedsalan re derbas bûye, ji her serdemê bêhn, reng, awaz û wesfêk girtiye û di nav hêtûna sedsalan de kelijiyê û pijiyaye. Bi têne tiştê ku nehatiye guhartin, mora edebiyata devkî ye.

Bi qasî ku em ji çîrok û destanên din jî dizanin, li Destana Memê Alan jî mora edebiyata devkî ango zargotinê heye. Ew tê wê wateyê ku ev jî mora çîrokbêj û dengbêjan e.

**Em li edebiyata di Destana Memê Alan de heye dinihêrin, ev taybetiyên ku em bi lêv dikin tev tê de hene. Di destanê de rastî, xewn, xeyal, qencî, xerabî, êş, keser, evîn, hesret, hest, raman, dilsozî, îxanet, şer û lehengî pir bi zimanekîşîrîn, edebî û honandî hatine xemilandin. Belê bi tenê yek peyv nîn e ku di cihê xwe de rûneniştibe. Her yek di cihê xwe de ye û wate li hevokê û çîroka destanê bar dike.**

Êdî ne hewce ye em ku pesnê zargotina kurdî bidin ku pir dewlemend e. Ji ber ku cihan tevê yekê dipejirîne, vê rastiyê xwe daye qebûlîkirin. Zargotina kurdî nivî nivî xwe spartiye destan, çîrok û qewlikên kurdî. Divê em bizanibin ku heta pencî sal berê jî, ji zarokan bigirin heta kal û pîran gelê kurd di nav xwe de potansiyeleke baş a çîrok, qewlik û dengbêjiyê hewandiye. Her kurdek potansiye-

la van tiştan e. Ji ber vê çendê jî edebiyateke dewlemend, zindî û zelal heta îro jî me re hatiye.

Em li edebiyata di Destana Memê Alan de heye dinihêrin, ev taybetiyên ku em bi lêv dikin tev tê de hene. Di destanê de rastî, xewn, xeyal, qencî, xerabî, êş, keser, evîn, hesret, hest, raman, dilsozî, îxanet, şer û lehengî pir bi zimanekîşîrîn, edebî û honandî hatine xemilandin. Belê bi tenê yek peyv nîn e ku di cihê xwe de rûneniştibe. Her yek di cihê xwe de ye û wate li hevokê û çîroka destanê bar dike. Rêzên wê serbest in, lê ne beredayî ne. Ne arûz heye, ne jî kîte. Lê di nav xwe de lihevkiyaneke wisan heye ku mîna xaliyên nexşin ristî ye.

Ez destê xwe diavêjim û rûpelekê bêyî hemdê xwe vedikim. Ka werin em li van rêzan temaşê bikin:

*Di hinavê min da vêketiye arê daran e*

*Rivên û pêlî davêje taqê ezmanê heftan e*

*Dermanê min tune li bajarê Mixrebiyan e*

*Dermanê min pir î dûr e, li bajarê Cizîra Botan e.*

*Tasek ava Kaniya Qestelê, li ser destê Zîna Zêdan, wê ji min ra bibe hekîm û derman e.*

*Hon ê li min helal bikin şîrê bera û emegê ga ne.*

*Ez ê lingê xave têxim rikêba kuriyê behrê, çeleng Bozê Rewan e,*

*Li nabêna bajarê Mixribê û bajarê Cizîrê dûr e, qonaxa salekê û şeş mehan e.*

*Rebê Alemê mirin daye me, ebdê gunehkaran e,*

*Tirsa min e, ez serê xwe dey-  
nim diyarê rehmêtê, axê goran e.*

*Hesreta xewna şeva xerab e,  
wê bi min ra here diyarê reh-  
metê, axa goran e. (rp. 99)*

Hûn baş dibînin ku bê nitirandineke çawan heye. Ev rewş, ev hest, ev raman, ev xemilandin û nitirandin ji bo çi ne? Her kes bi hesteke dîlovanî fêr dibe ku ev ji bo evîna Mem e. Tu dibêjî ku ji devê dengbêjekî dibistan nedîtî derneketiye, lê tu dibêjî qey ji nivîsa hozanekî mezin derketine. Em dîsan bidomînin:

*Memî got: Lê lê Zîné, ez nizamim ku tu min ra rastî an derewîn î*

*Mîna kihêlên tewlan ên sor û zengû zêrîn î.*

*Arekî mezin ketiye hundirê min û dûman li devê min diçe, ma tu nabînî?*

*Tu nabê, ez carê berê xwe bidime Memî û bêjim: Tu dilbirîn î.*

*Tu niha bixwazî, dikarî vî arê di dil û hinavê min da vemirînî.*

*Vê hêzarê li ser çavên reş û belek eniya gewr hilînî;*

*Ma tu ku da herî, tu dergistiya min î, her hal, tu nikanî vê gustirê di tiliya xwe da bi derxînî.*

*Ko tu vê nekî, dikarî min li pêş hezar û du sed qîzê Cizîrê bigerînî.*

*Dinê û alemê bi mêvanê xwe yê şevan, Memê Alan û siwarê Bozê Rewan bikenînî.*

*Were guh bide min, carê gucê hêzarê bilivînî,*

*Çavên reş û belek, eniya*

*gewr di bin da ji bo xatirê min bi der xînî,*

*Werî ser kaniyê, tasa zîvîn di ber kemberê da bi der xînî,*

*Li ava gulan tijî bikî, bînî, li ber pîsîra Bozê Rewan bisekinînî,*

*Çavên xwe rakî, li çavên min binhêrî û tasê bi destê rastê hilînî.*

*Bi destê xwe avê bi ser min va kî û meraqa min xeribî bi cih bînî;*

*Pê yî vî arî di hundirê min da bi carekê vemirînî. (rp. 170)*

**Ji van hunerên gotinkî yên din jî şibandin (teşbîh), ristina peyv û hevokê ango bikaranîna gotinê û hwd. hene. Gotin bi devkî ye lê şeweyên nivîskî lê barkirî ne. Vê yekê li zargotinê re çand û civariya (daneheva) kurdî nemir kiriye. Ev hostatî, ji zanebûn, ji edebiyat û edebiyatnasiyê nayê. Rêbaz û qaydeyên ku bi salan e, bi gotina peyv û awazên stranê derketine holê, çêbûne.**

Li ser vê hevoksaziyê û hevokên xemilî û nitirandî ma mirov dikare çi şiroveyê bike? Ew bi xwe bersiv e. Ev jî nitirandina keçikên Cizîrê ne:

*Keçan li xwe kirine cilê eydî û dawetan e.*

*Di serî da heya binê lîngan, tev da keskesor xemiliyan e.*

*Çareçar û pencepênc bi destê hev girtin, rihet daketin devê sûk û çarşiyên e.*

*Tof bi tof hatin, bi der pen-*

*cera Memî ra derbas bûn, dimeşiyane. (rp. 149)*

Em hinek nitirandinên li ser şer jî bidin:

*Beglî bi derkete pêşiyê, anî çadiran e*

*Emir da eskerên xwe, got: 'Herin, bi xar kin qesr û qonaxan e'.*

*Sê roj sê şevan di nav bajarê Cizîrê da bû axir dewran e.*

*Ko kî di ber diketin dikuştin, di ber heyfa Memê Alan Padişahê Kurdan e. (rp.235.)*

Belê destan seranpê wiha bixeml, nitirandin û edebiyat e. Ev edebiyata ku em behsa wê dikin, afirînerên wê dengbêj in. Em dixwazin çend gotinan jî li ser wan bibêjin. Wek me berê jî behsa wan kiribû, dengbêj yek ji bingehen edebiyata devkî ne. Dengbêj destanê baş li ber çavan radixe. Dengbêj wisan baş peyv û gotinan bi kar tîne ku gava wan vedibêje, mirov xwe di nav de dibîne. Ev dibe ku li ser kaniyê be, xewn be, yan şer an jî evîn be ferq nake. Mirov hostatiya peyv û gotinê dibîne. Dîmenek li ber çavan û di nav mêjiyê mirov de çêdibe. Em dikarin ji vê re bibêjin vegotina hêmayî. Ango ev hêman in ku di edebiyata nivîskî de hene.

Ji van hunerên gotinkî yên din jî şibandin (teşbîh), ristina peyv û hevokê ango bikaranîna gotinê û hwd. hene. Gotin bi devkî ye lê şeweyên nivîskî lê barkirî ne. Vê yekê bi zargotinê re çand û civariya (daneheva) kurdî nemir kiriye. Ev hostatî, ji zanebûn, ji edebiyat û edebiyatnasiyê nayê. Rêbaz û qaydeyên ku bi salan e, bi gotina peyv û awazên stranê derketine holê, çêbûne.

A rast dibistaneke dengêjiyê ava nebûye ku di wê de perwerde bibin. Lê bi awayekî xwezayî dibistanek heye û her dengbêj di wê qonaxê re derbas bûye. Ku yên nehatibin wê radeye jixwe ji wan re bi awayekî teqez nabêjin dengbêj. Ji ber ku di dengbêjiyê de qayde û rêbazên deng hene. Ger dengbêj li gorî wan tev bigere, li gorî wan deng hilde, daxê û peyvê di cih de mor bike. Di nav dengbêjan de ji vê re dibêjin meqam. Pirs dikare lê zedê be, lê gava dengbêj stranekê dibêje mirov carinan xwe li ser avê û carinan jî di şer de dibîne. Carinan dengê hespekî di nav gotinê de tê, ango mirov wilo hest pê dike. Di destana Memê Alan de jî, ev yek bi vî awayî ye. Ka li van gotinan binêrin, dîtînen li jorê di cihê xwe de ne yan na:

*Law, Tacîno, Tacînê zoro,*

*Xwediyê şûrê nêriz ê devzirav ê pişt bi moro,*

*Şanî te hene, ko te bajar gişkî anî emanê bi zora şûro*

*Zûka were, van zilxan hilîne,*

*Li xwe ke, çapanan li ber pisîrê xwe girê de, li hev xîne.*

*Emrê ko didime te, bîne. Here xwe bi Çeko gihîne.*

*Şûrekî di ra veweşîne.*

*Serî jêke, temeriya mor bi xwînê bixemilîne.*

*Li ber min da bexîne.” (rp. 156)*

Belê destan û dengbêj ew qas bi hev tîn nasîn. Çêj, tehm û xweşikiya destanê bi navgîna dengbêjan tê digihîje me. Ew deng, reng, dîtîn û ramanê xwe jî li destanê bar dike. Dengbêj çî qas serketî be destan jî ew

qas baş tê ziman. Her wiha ku dengbêjê Destana Memê Alan jî çî qas serketî destan ragihandine me, wan ew qas serketina destanê pêk aniye.

### *Destan ne teqez e*

Hin şik min dibin ser fikarên neteqezbûna Destana Memê Alan a ku ez li nirxandinên xwe li ser dikim ango ya Weşanxaneyê Orfeusê ku li Stokholmê ye û destan jî li Stenbolê daye çapkirin. Ez fikara xwe li ser van emareyan ava dikim. Bi min hin mijarên girîng ku divê dengbêj binitirîne û bixemilîne, li ser bisekine pir zû yan jî bi hevokekê di ser re derbas bûye. Ez mînakeke girîng bidim; mirina Memê bi vî rengî ye. Lê rastiya destanê çî ye? Em berê jê bigirin, diyar bikin, piştî şiroveya xwe bikin:

*Çavên xwe girtin, bi carê daxwarin; axû gihêşt zik û roviyan e.*

*Çav xirab bûn, çû bû rehetmetan e. (rp. 226)*

Mem mir û çû êdî behsa şewe û çawabûna wê nabe. Lê belê destan li ser Mem û dorhêla Mem ava bûye, ev mijar ne hewce ye ku ew qas zû bê derbaskirin. Dîsan sehneya êrişê Beglî ya li ser Cizîrê jî van fikaran dide me. Êriş wek bayêbezê dibe û dibore. Bajar dirûxe, ew qas zû derbasbûn dibe? Hin mijarên bi vî rengî şikan zêde dike.

Ji aliyê din ve Nuredîn Zaza di pêşgotina xwe ya destanê de behs dike ku destan ji guhdarkirina bîst dengbêjên cur bi cur hatiye berhevkirin û ya Mîşo bingeh hatiye girtin, lê bi sermaye Sebriyê Mihacir û

Ji aliyê din ve Nuredîn Zaza di pêşgotina xwe ya destanê de behs dike ku destan ji guhdarkirina bîst dengbêjên cur bi cur hatiye berhevkirin û ya Mîşo bingeh hatiye girtin, lê bi sermaye Sebriyê Mihacir û alkariya yên din temam bûye. Belê diyar e ku destan jî devê dengbêjekî bi tenê derneketiye. Dema berhemek ji çavkaniyên cihê cihê pêk bê, jixwe kêmbûna wê jî rastiyeke berbiçav e.

alkariya yên din temam bûye. Belê diyar e ku destan jî devê dengbêjekî bi tenê derneketiye. Dema berhemek ji çavkaniyên cihê cihê pêk bê, jixwe kêmbûna wê jî rastiyeke berbiçav e.

Ez vê dîtina xwe dispêrim van argûmanan û palpiştîyê ji wan digirim. Ew jî, ji min re dibêjin dibe ku destan kêmbê.

### *Çend gotin li ser Selhedîn Eyubî û alanan*

Mirov hest pê dike ku destan di bin bandora dema Selhedînê Eyubî de maye. Lê meseleya Selhedîn Eyubî û ya alanan hewceyî pir nîqaşan e. Emareyên destanê bi xwe terê nakin ku em bikaribin bibêjin rastî ev e yan na. Hin îdiayên bi vî rengî hene. Ez ne dikarim bibêjim rast e, ne jî dikarim bibêjim ne rast e. Ez bi xwe wek nîqaşekê dipejirînim. A rast jî divê ev nîqaş bê berdewamkirin. Ew ê bi xwe re pêşveçûnekê jî bîne. Lê agahî û zanîna min têrê nake ku ez ji aliyekî re dîtineke erênî nîşan bidim. Lê ez dixwazim ku li ser metoda

nîqaşê çend tiştan bibêjim.

Wek me got, agahî û emareyên destanê bi xwe dest nadin ku mirov dîtineke qethî bibêje. Divê ku dîrok, arkeolojî, zargotin û çanda Rojhilata Navîn û hin emareyên din ji bo mijarê dest bidin. Ger alîkariya wan nebe mijar zelal nabe û mirov ji nav nîqaşan dernakeve.

Carinan zargotin û destan rê li dîroka windabûyî vedike. Bi vî awayî dîrok zelal dibe û ji nîqaşan derdikeve, konkret dibe. Mînakên bi vî rengî pir in. Lêkolîna ku di sedsala 19 û 20'an de Destana Gilgamêş deraniyê ronahiyê, bi xwe re dîroka Rojhilata Navîn û ya sumeran ronî kiriye. Tiştên ku em îro der barê vê dîrokê de dizanin pir ên wan ji tabletên destanê derketine. Yek ji van jî, efsaneya Nuh e.

Bila mînakeke me jî, ji dîroka girekan be, lê ew vajiyê vê mînaka me ya berê ye. Destana Homeros îlyada û Odesaus bi nivîskî di çanda nelenan de hebû, dihat zanîn. Zanyar û lêkolînerên alman, di sedsala 19'an de bişopa destanan, bi dû vê bûyerê ketin û rast li bajarê windabûyî yê bi navê Troyayê hatin. Bi heybet û rastiya xwe ve Troya derket ser rûyê zemîn. Îro di dîroka mirovahiyê de bûyer û bajarê Troyayê heye û dewlemendiyeke rojgerana (gerestêrka) me ye. Beriya dîtina wê, şerê Troyayê wek efsaneyekê dihat zanîn. Lê piştê efsane bû rastî.

Tiştên bi vî awayî mijarên zanistê ne. A rast jî divê zanist bersiva van nîqaşan û pirsan bide û zelal bike. Divê em beriya bersivan, şans nedine qetiyetên xwe ku rastiya wan îdiayên nî-

qaşê ne. Metoda wê jî, ji xwe ev e. Dîrok bi metodên zanistî derdikevin holê.

Ez bi bawer im; ger bingeha Destana Memê Alan hebe, dê rojekê dîroka kurdan qet nebe, bi qasî eleqeya xwe, wê derxe rûyê rastiye. Têne em bi bîr û bawerî li rastiye, zanistê bigerin, bi sebr û aram vê rastiye bişopînin.

Arîşeya ku bi Selhedînê Eyûbî û alanan ve girêdayî ya Destana Memê Alan pir girîng e. Divê her kesê ku wê dinirxîne û şîrove bike kûrtir bifikire û li pey argûmanên xurt bikeve. Di encama van argûmanan de ez dixwazim bi giştî vê bibêjim:

Destana Memê Alan di nav destanên kurdan ên gelêrî de yeke sereke ye. Bê şik û guman, nav û dengê wê ji sînorên kurdan derbas bûye. Ji aliyê edebiyatê ve, ji aliyê dewlemendiya ziman û çandê ve berhemeke heja ye û her wisan ji pir aliyên din ve jî berhemeke sereke ye. Ew taybetiyên vê destanê ne ku Ehmedê Xanî fikir û ramanên xwe li ser wê bingehe ava kiriye. Ev taybetiyên wê nikarin bîna nîqaşkirin.

Li ser destana Memê Alan cur bi cur nirxandin hatine kirin. Çi qas nirxandin bîna kirin jî ne bes e ku bê fêmkirin. Ez dixwazim çend gotinan li ser wê yekê bikim ku gava destan tê nirxandin ew nebin. Ji ber ku nirxandineke baş, rasteqîntir û bi zanistî derkeve rastê. Ji nav nirxandinan ên rasteqîn û bi zanistî herî nixdar in. Pir nirxandin dibe ku bibin, lê divê li ser hîmê zanistî û li gorî pîvanê ilmê edebiyatê çêbin.

Me li ser Destana Memê Alan hin nirxandin kirin. Dibe

ku ev nirxandin pir çewt bin, dibe ku kêma û şaş bin, lê heta ji me hat, me bi metoda zanistî pêk anî, spartek daneyên destanê bi xwe ne. Ev spartek û palpiştên hanê baş didin diyarkirin ku destan;

a- Kêma e, ne teqez e,

b- Destan ji pir dengbêjan hatiye girtin û destaneke berhevkerî ye. Ango ne şeweya resen e.

c- Di nav wê de pir nakokeyên wê hene.

d- Destan di nav demê de guheriye, hin tiştên wê demê tevî wê bûne.

e- Destanê reng, deng û dirûvê vegotina dengbêjan girtiye.

Erê, ev encam in ku me ji destanê derxistine. Ev xal bi serê xwe têra nirxandinên balkêş dikin. Madem ku rastiye destanê ev in, îcar divê nirxandin jî li ser van rastiyan bin. Ku kî nirxandinekê bike divê îdiayên xwe bispêre daneyên (doneyên) destanê. Destan û argûmanên destanê tiştêkî bibêjin lê em jî tiştêkî din bibêjin û berê xwe bidin hin argûmanên li derveyî destanê, wê gavê em ê destaneke li gorî xwe damezirînin. Texmîn, şik, di nêzikaya çarçoveya wê nirxandinê de an jî bi argûmanan misogerkin dibe û tiştêkî xwezayî ye. Lê tenê bi îdiayan misogerkin ji rastiya destanê dûr dixê. A din jî bi hest û pejnên nirxandin kêma e û razber e, anga subjektîf e. Hest û xeyal pir girîng in; ji bo çi? Ji bo derûniya mirovan bi xwe; bi coş û heyecan vegotin û şîroveyên bi devkî manewiyata mirovan a neteweyî xurt dike, belê dibe şîreya derûniya xerxa neteweyî. Lê belê nabe bingeha nirxandinên ku em destanê li ser ava bikin.



Hest her dem ji bo her awayî nixandinan, kê m in. Dibe ku hestên mirovan xurt û mezin bin, ew nayê wê wateyê ku hest rêberê rastiyê ne. Bi piranî hest mirovan ji rastiyan averê dikin. Ji ber vê yekê jî tu car hest û rastî nayên beramberkirin. Hest û hestewarî rê li ber zanistê û nixandina zanistî dibirin. Ilm û zanista edebiyatê li ser argûmanên wêjeyî ava dibin. Em wek mînak rewaniya Bozê Rewan bidin:

Bozê Rewan riya şeş mehan di pazdeh rojan de dikudîne. Lê carinan heman rê di şeş mehan didome û Bozê Rewan bi awayekî din derdikeve pêşberî me. Dîsan di çîroka Rustemê Zal de dêw pir pir mezin in, lê gurzê Rustem ew qas mezin e ku dêw jî nikarin ji erdê rakin. Xwendevan û nixandêr dê jî vê rewşê çî derxe û çawan şîrove bike? Yek, ev bi armanca destanê û armanca dengbêj ve girêdayî ye. Destan an jî dengbêj bixwaze ku çî derxe pêş wê nuqtayê dide bin mercekê. Jixwe gava çî kete bin mercekê mezin û jî xwe bêhtir tê xuyakirin. Ew jî mubalexeya destanê ye.

A duyem jî ev e; destan hin argûmanên dîroka mirovahiyê û civakî nîşanî me didin. Em bibêjin ku ziyayekî jî erdê heta esmanan dirêj dibe, ku di çîroka destanê de derbas bibe wê gavê em seh dikin ku mirovahî di dema arkaîk, nezanî, belengazî û xizaniye de ye. Ew jî berî zayînê ye. Tiştê ku nikare bi zanîna xwe ve pêk bîne, zelal û fêm bike, pir mezin dike. Ji ber ku mêjiyê destpêka mirovahiyê qels e, biçûk e; mêjî û zanîna biçûk tiştên li hemberî xwe mezin dike. Wê gavê jî em di destanê de şopa mîtolojîk û civakî dibînin.

Dîsan em vegehin ser mijareke din. Di destanên gelerî de tiştên ku bi telmîh, mecaz û nepenî nabin, hêz û qeweta gel têt nake ku mîna nivîsar û berhemên mîna Mem û Zîn, Leyla û Mecnûn, Romeo û Juliet û hwd. biafirînin, her wiha armancên ku nikarin bi devkî bibêjin bi sergirtî, mecaz û bi emarêyên din bar bikin û bi wî awayî binin ziman jî ne gengaz e. Ku bikaribiyay bi telmîh û mecazê armanc û daxwazên pêk bianîna çî karên dêw, ziya, hesp, gurz û hwd. ên dersirûştî di destanê de hebûn?!

Gel, hest û ramanên xwe, xeyal, hesret û daxwazên xwe bi riya destanê lê ne veşartî, aşkera tînin ser zimên. Sembolên ku di destanê de derdikevin, her çî qas dîrok û jiyana civakî jî dinimînin jî, lê ew qas daxwaz, hesret û xeyalên gel in. Sembol derûnî ango psikolojiya gel didin xuyakirin. Gel çî, çawan difikire, di serê xwe de çawan disêwirîne, ji sêwirandina xwe çî encaman derdixe rastê û çawan şîrove dike, em ji sembolan fêr dibin. Carinan dêwek xofeke mezin dide der, lê carinan jî daxwaz û xeyal e. Wê gavê li hember hêzên serdest gelên qels û bêhêz xeyalên xwe li wî dêwî bar dikin hêviyekê dide diyarkirin. Ji ber xwe nikare, lê dixwaze dêwekî dersirûştî wan daxwaza pêk bîne. Carinan jî dêw wek nûnerê xerabiyê ne. Dema lehengê destanê wî têt dibe, gel xwe serketî dibîne. Em dikarin bibêjin ku leheng liser navê xwe dide şerkin. Mînak dema Bozê Rewan riya şeş mehan di pazdeh rojan de dikudîne, guhdar an xwendevan gelo çî difikire? Bi rastî xweziya xwe bi Memê Alan

**Hest her dem ji bo her awayî nixandinan, kê m in. Dibe ku hestên mirovan xurt û mezin bin, ew nayê wê wateyê ku hest rêberê rastiyê ne. Bi piranî hest mirovan ji rastiyan averê dikin. Ji ber vê yekê jî tu car hest û rastî nayên beramberkiri n. Hest û hestewarî rê li ber zanistê û nixandina zanistî dibirin. Ilm û zanista edebiyatê li ser argûmanên wêjeyî ava dibin.**

tîne. Di stranên kurdî de nayê ziman ku dilketî dibêje, ez ê bibim teyrê qerekûşê lê ser te ba bim an jî, dema yek hesretekê tîne ziman dibêje, xwezî ez bibûma teyreki ku tu pişt Çiyayê Qaf bûya jî ez bi gihîştama te. Daxwaz û hesretên bi vî awayî pir in.

Di pir çîrok û destanan de dewlemendî û jiyana şah, padişah û qralan hûr û kûr tê nîrandin. Gelo çima? Yek, ev rastiyeke jiyana destanê ye. Ya duyemîn jî hesret û xeyalên gel in. Gel tu jiyaneke bi vî rengî najî. Lê bi vegotina wê xeyalê ve xwe tatmîn dike, deşarj dibe. A rast gel ku daxwaz, hêvî, hesret û xeyalên ku dixwaze bijî lê ancax bi xeyalên wan ve dimîne, dike sembol û bi vî awayî bi navgîna destanan realîze dike. Ev tişt bi zanayî nabin, ev daxwaz jî bi zanayî nakevin destanan. Her tişt xwezayî dibe, daxwaz di bin bîra mirovan de ne, dema wexta wan tê, derdikevin û mirovan tev digerînin.

Ango telmîh, mecaz û îma-yên destanên gel, sembolên wan in, ew jî pir aşkera ne.

# Li ser dem û jiyana Melayê Cizîrî

## Celalettin Yöyler

Der barê jiyana melayê Cizîrî û destpêka dîroka jidayîkbûna wî de, tu kesek ji dî-rokzanan û lêkolîneran, tu dîtineke nêzîkî rastiya destpêka jiyana Mela nedîtiye û nenivîsiye. Ew jî ji ber ku der barê bûyîna wî de ya ji dayîkê tu berhemek zelal û aşkera tune ye.

Kesinen ku ketine nav şîrovekirina jiyana wî û nasnameya wî bi gengeşiyên pir mezin re rûbirû mane û ramanên xwe diyar kirine. Wekî mamosteyê hêja Elaedîn Secadî, rojhilat-zanê Rûs Yaba û rojhilatnasê Elman Fon Hartman ê ku dîwana Mela li Berlînê çap kiriye û hinekên ku şîrove û lêkolîn li ser berhema Mela ya bi navê Dîwana Melayê Cizîrî kirine.

Bi rastî min yek bi yek lêkolîn û şîroveyên der barê dîroka jidayîkbûna Mela de, di ber çavan re derbas kirin û min bi hûrbînî li wan nêrî. Lê min tu dîtineke ku mirovan têr bike nedît. Yanî tu kesî vê dîroka veşartî bi zelalî nedîtiye û bi berhem û delîlên vebir diyar nekirîye. Mirov dikare bibêje, dîroknasan û lêkolînerên der barê mijarê de, dema jidayîkbûna Mela, bi dema kesatiyên ku Mela di helbesta xwe de navên wan derbas kirine ve girêdane. Ev reng dîtîna û ramanên bi vî awayî, nabine dîtîna û ramanên rastiya dîroka jidayîkbûna Mela. Lewra kesek gava di berhemek xwe de ji mirovekî beriya xwe bipeyîve, ew nabe rastiya dîroka wî nivîskarî.

Gava nivîskarek di nivîsa xwe de, ji hozan an zanayekî 500 an jî 1000 sal beriya xwe bipeyîve, ew nabe kêşan û pîvana dema dîroka nivîskar. Bi vê ramanê em dibêjin, rasthatin û dîtîna me ya der barê rastiya dîroka destpêk û jidayîkbûna Mela de, dîtineke rast e û nêzîkî lêkolîneke zanistî ye. Lewra lêkolîn û dîtineke wisan e, tu car



xwe naspêre qiyas û xeyalan. Ango bi serê xwe zanistek e ji zanîna hesabê ebcedê ye. Pir nivîskar û helbestvan ev rêbaza zanistî xebitandine. Pir caran Mele Seîdê Kurdî, ev rêbaz bi kar aniye. Ev reng xebitandina tîpên ebcedî, di hejmartina tiştînen nediyar de, ji Îmamê Elî

heta vê demê ji hêla kesên nivîskar û helbestvanên cur bi cur ve hatiye xebitandin.

### Dîroka jidayîkbûna Melê

Çend sal in ku min xebata xwe, li ser şîrovekirina dîwana Mela da meşandin, lê her tim armanc û mebesta min her ew bû ku di nav rêzehelbestên wî de, li rastî dîroka jidayîkbûna wî werim. Min derpêça (cildê) yekem qedand û xwe gihande dawiya derpêça duyem, lê rastî tu agahiyeke Mela ya der barê dîroka wî de nehatim. Gava min dest bi şîroveya derpêça duyem kir û çend beş jê qulipand, di pênçekê helbestê de rastî agahdariya Mela ya der barê dîroka jiyana wî de hatim. Gava min ew agahdarî dît, ez bûm ku bê per û bask bifirim.

### Rasthatina dîrokê bi hejmarên ebcedî

Em bi hev re xwe berdîna ser naveroka wan hejmarên ebcedî û dîroka jidayîkbûna Mela di nav wan de bibînin. Çend pênçek ji helbestên Melê:

*Naêtin guhtin bi qal, şerh û beyana husnê to*

*Dê bi hal û sir binasin, dil fesana husnê to*

*Xweş Mela amancê tîran kir, kemana husnê to*

*Qisseê eşqa celal û dasîtana husnê to*

*Tilke enbaun yeqûlunnasû minna bee'de hînin.*

Mela di vê rêzepênceka dawiya bi zimanê erebî de, dîroka destpêka nivîsandina helbesta xwe, bi hejmarên ebcedî diyar dike û dide zanîn ku temenê wî yê di nav tîpên ebcedî de veşartî ne, destpêka helbestvaniya wî ye. Temenê Mela di beriya helbestvaniya wî de 30 sal in. Gava em didine ser hejmarên ebcedî, dibe 1589 ku sala ji dayîkbûna Melê ye. Mela sî saliya xwe ya di beriya helbestnivîsandina xwe de, bi du helbestan tîne ziman û dibêje:

*Er nekî rehmê tu miro, dê cibit halê me îro*

*Qet nebê carek esîro, girtiyê Sî Sale ye*

Dîsa di helbesteke din de;

*Sih Sal e ji derd û ji belayê te hilakim*

*Heta bi felek her dirên ah û ehê min*

Helbestvan û hozanê mezin mamoste Hejar, di pêşeka şîroveya xwe ya li ser helbesta Melê ji Mamoste Elaedîn Secadî digire û dibêje, temenê Mela 32 salî bûye paşê dest bi helbestê kiriye. Lê Mela bi xwe di helbesta xwe de, dibêje, ez beriya helbestvaniya xwe, 30 salî bûme. Gotina Mela ya di helbestê de, rastiya sî saliya Mela ya beriya helbestê ji 32 saliya Hejar a bi gotina Elaedîn Secadî rastir e. Lewra Mela di helbesta xwe de tîne ziman û dibêje, girtiyê sî sala ye.

#### **Rêzehelbesta ebcedî:**

*Tilke enba un yeqûlunnasû minna bee'de hinin*

#### **Hejmara tîpên ebcedî:**

T = 400, L = 30, K = 20, E = 1, N = 50, B = 2, E = 1, Y = 10, Q = 100, W = 6, L = 30, E = 1, L = 30, N = 50, E = 1, S = 60, M = 40, N = 50, E = 1, B = 2, E = 70, D = 4, H = 8, Y = 10, N = 50. Encam: 1027.

Bi encama van hejmarên ebcedî sala destpêka Mela ya helbestê dertê meydanê. Hejmar bi hesabê koçî ne. Helbestgotina Feqiyê Teyran bi Mela re vê tezê destek dike. Lewra Feqî di helbesta xwe de dibêje, gava wî bi Mela re helbest gotiye, sal 1031 bûye. Di navbera gotina Feqî ya ku dibêje, sal 1031 û destpêka Mela ya helbestnivîsandinê de, 4 sal navber heye. Lewra helbesta Mela ya bi hejmarên ebcedî, çawa me li jorê daye nîşandan 1027 e. Ji ber ku Feqî 4 sal piştî destpêka helbestgotina Mela pê re helbest xwendiyê û navber bûye çar. Ev rastiya dîroka helbestgotina Mela û destpêka wî ya jidayîkbûnê ye. Gava em van hejmarên koçî û ebcedî diqulîbînin hejmarên mîladî û sî salê wî yê beriya helbestê jê dertînin, hatina Mela ya cîhanê dibe 1589+75 sal- jîn/1664 mirin.

#### **Raman û mebesta Mela ya di helbestê de felsefeya jiyane ye**

Mela di helbesta xwe de, di jiwariya rîya jiyana bievîn dinirxîne. Em ê beşek ji wan helbestan bidine destê xwe û watedariya naveroka wan bo xwendevanên hêja bi rengên wan ên felsefî û ramanî, bidine diyarkirin. Lê gava em dikevî nav şîrovekirinên van helbestên bi watedariyên pir giranbiha û bêhempa, em xwe pir bêhêz û

hejar dibînin. Lewra ew wekî deryayeke bêbinî, pir kûr û watedar in. Heger di bin wî barê giran de kêmahiyên me hebin jî bibexşînin û bibîne alîkar.

#### **Destpêka helbestan**

*Şah bi qesta kuştina min, rim hejandin bêsebeb*

*Dame çeşmê qehr xeşmê, rim li dil da ku edeb*

Mela di vê helbestê de, di jiwariya evînê û girîgiya wê tîne ziman û dibêje, şahyarê bi mebesta kuştina min, rîma xwe ya evînê hejand û xwest min bide ber lêdanên bi rîman û min biêşîne. Lê dema min ev hejandinê rimandîtin, min nezanî ka sedemên wê çi ne. An jî rast û çep rimên evîna xwe li ser min hejandin. Çawa ku di hinek nusxeyan de (rast û çep) hatiye nivîsandin. Hem jî çawa rimên xwe yên ji di jiwariya evînê bi ser min de hejandin û ez kirim armanca wan rîman, wisa jî bi çavên êşandinê û hêrsê awirên xwe yên tûj berdan ser min û dilê min da ber rîman û ji min re got, bo evînê bi edeb be.

Mela di vê helbestê de, bi ramaneke felsefî û armançî, felsefa evîna jiyana birûmet tîne ziman û helbestên xwe yên watedar dinirxîne û dibêje, şahê yanî dîlberê û yarê, ez dame ber rimên evînê bi qesta kuştina min rim hejandin. Ew yar û şah û dîlber jî, di ramana Mela ya helbestî de, navên mecazî ne, ji bo evîna wî ya ramanî, mirovahî û felsefî. Lewre kesek ger evîna mirovahî û jiyana birûmet, di kesayeta kesekî de, an tiştêkî de bibîne jî, mebest û armanç evîna rastî ye û ne ya mecazî ye.

Dema ku armanca kesekî evîna bo jiyana birûmet be, ew dikeve nav dijwariyên pir mezin û bi tîr û rimên wê evînê tê hingaftin û dibe xwediyê birînên wê evînê û bi wan birînan û hingaftinan tê perwerdekirin û edebkirin. Yanî kesên xwedî ramanên evîna birûmet, li hemberî evîna xweş, nikarin bikevîne nav bêrûmetî û bêedebiyên dij ramana evîndariyê. Ji bo wê yekê ye Mela dibêje “rim li dil de go edeb”.

*Kuştiyên dîdar û dîne, bêxeta her dehsed in*

*Her seher dîsa ji nû, wên tene kêrê sed celeb*

Kesên evîndarên ku bi çavpêketin û temaşekirina yarê bêxeta û guneh tîr kuştin, her bi qasî dehsedan e. Hem jî di her berbangên sibehan de yê ku ji nû ve tîr ber kêra evîna yaran û bo evîna wan tîr gorîkirin û serjêkirin, bi sed celeb û rengan in. An jî bi sed kerî û koman in.

Mela di vê malikê de, bi watedarî û ramanî girîngiya evîna mirovahî û jiyana birûmet tîr ziman û dide xuyakirin ku kesên bikevîne nav evîna ramanî û bo xwe bikene armanc û di wê rê de dest bi tekoşînê bikin, divê ku ew kuştin û gorîkirina xwe, bidine ber çavên xwe û xwe gorî wê riyê bikin. Her wisa Mela dide diyarkirin ku, kesên di wê riyê de, bi destpêka her rojên ku tîr ber kêra gorîkirina wê tekoşînê, tîr gorîkirin. Yanî kesên xwenas û rênas ên wê riyê, bêtirs, bêguman, rêwiyan wê riyê û xwe di wê dozê de didine gorîkirin. Bi rastî

gava em li tekoşînên bo serfirazî û serbilindiya gelan û kewan temaşê dikin, em dibînin ku bi hezaran di rîya evîna ramanî ya mirovahî de canê xwe yê pîroz gorî kirine. Bi vê ramanê Mela girîngiya evîna mirovahî û ramanî tîr ziman û dibêje, rîya evînê rîyeke dijwar û pîroz e. Hêja ye ku mirov canê xwe yê pîroz bo wê ramana birûmet gorî bike û bikeve nav wê tekoşînê. Gava em li rewşa ramana Melayê Cizîrî dinêrin û temaşê dikin, em dibînin ku ramana wî, her evîna mirovahî û jiyana bievîn û rûmet e. Lewre di lîteratûra heyînê de evîn bîngeha tekoşîna bo rûmeta mirovahiyê ye. Kesên bêevîn dîr ên ji zagona heyînê dîr in.

*Dê ji çerxê pencemîn bêtin tenezul ket Merîx*

*Mislê Şemsê ger kişînitin li wan tîxên xedeb*

Mela di vê malikê de, bo evîna yara xwe, dikeve nav pesndayînen pir watedar û dibêje, eger yara min li stêrka Merîxê were xezebê û bide ber tîrên awirên xwe yê newaze û şûrê xwe yê bedewî û çirîsandinê lê bikişîne, wê ji çerxa asîmanê pîncan wekî Rojê çawa berjêrî çerxa çaran bûye, berjêr be û were xwarê. Li vir Mela bi teşbîhên pir balkêş, teşbîha bedewiya yarê bi tûjî û bîriqandîna şûr dike û dibêje, ger yara min li stêrka Merîxê xwar be û rengê bedewiya xwe ya bêhempa ji cîhanê re diyar bike, wê stêrka Merîxê li ber bedewiya wê xwe negire û wekî Rojê berjêrî jêr bibe.

Dema em li teşbîh û mecaza

di helbestê de dinihêrin, em dibînin ku xebitandinên teşbîh û mecazê bi watedariyên pir mezin hatine xebitandin. Yanî tu gavan Merîx û Roj bi bedewî û rindiya tu yaran nayêne xwarê û berjêr nabin. Lê evîna ku evîndar di kesayeta yara xwe de dibîne û pê bawer e, ew serdestê hemû ronahî, Merîx û Rojan e. Lewre ev heyînên di gerdûnê de, hingî biwate û birûmet in bo mirovatîyê, heger di nav dil û hinavê wan de evîn hebe yanî evîn serdestê hemû heyînên di gerdûnê de ye. Bi vê wateyê; em dibêjin ku armanca Mela jiyana bievîn û rûmet e. Wê gavê evîn û jiyana yek tişt û yek heyîn in û ji hev naqetin.

*Her mecala ew di cengê bêt û rether carekî*

*Rast û çep dê bêxitin sed sed bi mizraq û qeseb*

Mela dîsa wekî caran dijwarî û tundiya evînê bi rewşeke ramanî û helbestî tîr ziman û dipesnîne û dibêje, her gava ku dîlber carekî di qada cenga evîna giran de here û were, li rast û çep bi mizraqên kurt û dirêj ên di destê xwe de, bi sedan dijberê xwe yê di qadê de, radixe ser zemîn û tune dike. Gava em li watedariya helbestê dinêrin, em dibînin ku tu dîlberek bi kesayeta xwe ya mirovtî, an jî bi wateya ramanî, ne rim ne jî mizraqan dixebitîne. Ne jî tu kesekî bi rîman û mizraqan radixe erdê û dikuje. Lê ew kesayeta di ramana evîndar de, temsîla evîna wî ye û li hemberî her dijwariyên rîya evînê tê dikoşe û ji holê radike. Dîlber di ramana evîndar (Mela) de,

hêza mirovahiya herî bilind û bala ye. Gava ku kesek ji kesan bibe xwediyê hêza şoreşgerî û nûjenî, bi hêza evîna xwe her tiştên dij û çewt ên evînê, bi wê hêzê dide rakirin û dikuje ango tune dike û digihîje armanca xwe ya mebestî. Ji bona vê yekê ye ku Mela di şirovekirina bûyera evînê de, peyva têkoşîn û cengê dixebitîne. Lewra, bi rastî evîn têkoşîn û cenga giran e bo kesên evîndar.

*Rustem û Cimşîd û Xalid,  
Hemze yan şêrê Elî*

*Aferîn ya şehsiwarê tirk û  
rimbazên ereb*

Mela vê malikê jî, di pesnê evîna yarê de, bi ya pêşîn ve girê dide û dibêje ku ew li hemberî livbaziya vê lehenga ku di meydana cenga de bi dijberê xwe re rast û çep rîman dihejîne û bi sedan kesên li hemberî xwe ji holê radike û dilezîne, mame di nav matmayîn û şaşiyê de. Gelo ew yar leheng û pehlewane kurd ê medî yê bi navê Rostemê kurê Zal e yan cengawer Cemşîdê Îranî ye? An jî serleşkerê Îslamê Xalidê kurê Welîd e? An jî Lehengê di nav hêza leşkeriya îslamê de apê Mihemed, Hemze ye? An jî xweşmêrê bi nav û deng Îmamê Elî yê kurmamê Mihemed e? Pir aferîn bo te hey dilbera çapik û çelenga wekî şarezayên siwarên tirk di meydana cengê de û wekî xweşrimbazên ji nijadên ereb.

Gava mirov li şewaza gotin û nivîsa helbestê dinêre, mirov di nav de, watedarî û ramanên pir bilind û bala dibîne. Yanî Mela bi ramanekî felsefî girîn-

giya hêza evîna mirovahî di kesayeta yara xwe ya bi navê Selma de şirove dike û dibêje ku li pêşberî evîndarê evîna mirovahî û têkoşîna wî ya bêhempa, tu hêzek dijber, asteng û nemirovahî nikare xwe bigire û wê mebesta bievîn rawestîne. Bi vê mebestê, wê ramana bievîn û mebesta bi armanca serkeftinê, dişibîne leheng û cengawerên bi nav û deng di cihanê de û navên wan lehengan di helbesta xwe de tîne ziman û dibêje:

Rostem, Cemşîd, Xalid, Hemze û Şêrê Elî; bi rastî gava mirov li têkoşîna evîndarên leheng dinêre, mirov heman di-menê lehengiya wan, bi hêsani dibîne. Yanî evîn heyîneke xwezayî û birûmet e ku di heyîna mirovan de hatiye bicihkirin. Gava kesek ji vê bûyera pîroz dût bikeve û lê nebe xwedî, ji sîfetên mirovatiyê dût dikeve û dibe kesayetekî rût. Em gava li rewşa derketina mirovatiyê dinêrin, em dibînin ku bi hezaran kesên berz, bilind û taybet, bi têkoşînên xwe yên ji bo rizgarkirina mirovatiyê ji cur bi cur stemkariyan û bêdadiyan, bi hêza evînê birine serî û bi encam kirine. Wekî Mihemed (Silava Xweda li ser be), Îsa, Mûsa û bi hezaran kesayetên ji cuda cuda nijad û neteweyan. Di nav dilê van lehengan de tim evîn hebûye.

*Lê li tûlê asîtanê çix biwan  
lee'lan kirin*

*Dergehê fethê vebû îro li  
mehcûran eceb*

*Bendeê sadiq seher amancê  
reştözên xwe kir*

*Min bi qewlê dijminan dît,  
ber xedengan bêsebeb*

Mela di vê helbestê de, bi hinek bêjeyan pir balkêş û newaze, rewşa girîngiya evînê tîne ziman û dibêje, yarê ji min ê hejarê ku her tim li ber derê seraya wê ya evînê wekî "tûle"yê li ber şemîka nobedar û parêzvanê wê re got, ger tu xwe li ber evîna min bi rengê leheng û pehlewana nagirî, ji ber derê min here. Dibêje gava bi wan lêvên xwe yên sor ên di rengê lee'lan de li min dengê derketina ji ber derê seraya xwe da, dergehê serkeftinê li me kesên evîndar ên belengaz, pir ecêb hate vekirin.

Mela, malika din jî bi ya pêşîn ve girê dide û dibêje, çawa bi lêvên xwe yên rengsor ên wekî sorahiya leel û mircanan banga derketina ji ber derê xwe li me kir, wisa jî min ê ku di fermana wê de wekî benedekê rast û durist, di dema berbanga sibehê de kire armanca tîrên ji reşahiya birûyên xwe yên pir bedew û ez hingaftim. Hem jî bi gotina dijminan û bêsedem ez dame ber tîran.

Gava em bizivirin ser watedariya felsefeya wî ya ramanî, em ê bibînin ku helbest bi aliyê xwe yê wêjeyî ve, bi wateyên pir giranbiha hatiye xemlandin. Lewra Mela di helbestê de ji bo girîngiya evîna xwe, bi hestên girêdana pê re, divê ku duristiya wî ya ji evînê re ji ya tûleyê kêmtir nebe. Lewra bi tesbîten zanistî, se (kûçik) ji bo xwedayê xwe ji candarên herî durist e. Hem jî dide diyarkirin ku hişyarkirina yarê bo evîndaran; şadî, serkeftin û dûtî, vebûna ji bo armanca wan e. Mela dide

zanîn, kî pir girêdayî bi evîna xwe be, ew bêhtir tê êşandin û hincirandin. Hem jî pir caran kesên mebest xerab û li dijî evî-nê, rexneyan tîne ser evîndaran û bi dijminahî wan didine ber tîrên bêwate û bêsedem. Çawa em di vê demê de ji dibînin ku bi hezaran kesên li dervayî ramana evîndariyê, bi sedan ewaniyên xwe yên ne di cih de û ne li rê, tînine ser xwedanê evîndariya mirovahî.

*Leşkerê qehr û xeman, wê çûn hisara dil bikin*

*Kee"be û beytulherame lê nebûritin Receb*

*Suftiyên pir lee'l û mircanan bi mujanan heta*

*Dîde rewşen bûn bi dîna dêmûra sîmîn xebeb*

Mela bi teşbîh û kinayatên pir watedar, rewşa dijawariya evîne di helbesta xwe de dertîne meydanê û bi şewazên pir newaze dinirxîne û dibêje ku derd û bêzariyên di nav bûyera evîne de, wekî leşkerên bi êrîşên pir hêz û dijwar dor li dilê wî yê wargeha evîna pîroz a wekî mala Xweda ya ku ji êrîşên hetikandinê re qedexe ye, girtine û dixwazin bixine nav çeper û dorgirtinên xwe yên pir giran û talan bikin. Hem jî ew dilê ku di pîroziya xwe de digihîje radeya pîrozî ya meha recebê ya ku di wê mehê de her cureyên cengan û êrîşan bi zagona olî hatiye parastinê û tê de ceng û êrîş nayê kirin.

Lê bi berxwedan û têkoşîna xwe ya bêdawî û pir dijwar, me hêstirên ji xwîna sor barandin û

**Mela bi teşbîh û kinayatên pir watedar, rewşa dijawariya evîne di helbesta xwe de dertîne meydanê û bi şewazên pir newaze dinirxîne û dibêje ku derd û bêzariyên di nav bûyera evîne de, wekî leşkerên bi êrîşên pir hêz û dijwar dor li dilê wî yê wargeha evîna pîroz a wekî mala Xweda ya ku ji êrîşên hetikandinê re qedexe ye, girtine û dixwazin bixine nav çeper û dorgirtinên xwe yên pir giran û talan bikin.**

pir dur û mircan bi girînên çavan, dane qulkirin û peydakirin. Bi van girînên xwe yên di riya evîna yarê de, me çavên xwe ronî kirine û em bi destûra yarê bûne xwediyê dîtina wê û gerdena wê ya spî ya di rengê zîvê spî de. Bi dijarî û çetînahiya pir giran dide diyarkirin û dibêje, ew çetînayên di wê riyê de wekî êrîşên leşkerî e û dilê evîndar dixine nav dorpêçanên giran û ji her hêlê ve êrîş dibine ser wî dilê ku di pîroziya xwe de dişibe pîroziya mala Xweda ya ku ji her cureyê êrîşên hetikandinê hatiye parastinê û qedexekirin. Hem jî ew dilê wekî çawa ku di zagonên olî de heta meha recebê nebore di nav de tu ceng êrîş nayê kirin. Yanî ew dilê ku warê evîna mirovahiyê jî, dîsa bêêrîşên dijber û êşandinên ne li rê nayê hiştinê û her tim bi evîna evîndar re çetînayî û dijarî dertîne holê.

Di dawiyê de dide zanîn ku xwe gihandina encama ramana mirovahiyê, bi têkoşinên dijwar

tê bidestxistin û di taliyê de evîndar dibe xwediyê dilşadî û bextewariya bêhempa.

*Ê bi Xidrê re divêt ava heyatê bit nesîb*

*Dê bi see'y û cehdê yeksan bin li bal wî roz û şeb*

*Xidmeta pîrê muxan dê kit kesê meqsûdê mey*

*Şîşe û cama zucacê ê divêt dê ret Heleb*

Mela di malika dehan de dibêje, kesê ku bixwaze bi Xizir re bigihîje ava jiyana bêmirin û jê re bibe nesîb, divê ku li bal wî kesî xebata bo wê riyê bi şevan, si rojan û bêkêmayî bête meşandin. Hem jî di malika yazdehan de tîne ziman û dibêje, kesên ku mebesta wan xwe gihandina bal vexwarina meya evîne û mebesta wan bidestxistina şûşeyên pir xweşik û qenc be, divê ew kes here bajarê Helebê. Lewra şûşeyên ku ew dixwaze, dikare li wir bibîne û bi destê xwe bixîne.

Gava em bi çavekî vekirî û bi dilekî zelal li naveroka helbestê dinêrin, em dibînin ku armanca van bêjeyên watedar, ramanêke pir birûmet û pîroz e. Mela teşbîha armanca ramanî ya di riya evîna mirovahiyê de, bi mebesta vexwarina ava jiyana bi Xizir re, ji kaniya ava jiyane dîke. Yanî kesê ku dixwaze bi Xizir re xwe bigihîne serkaniya ava jiyane û ji wê kaniyê avê vexwe û bikeve nav jiyaneke bêdawî û bêmirin, divê bi şev û roj li bal wî kesî, di xebata bo wê riyê de be.

Mela bi vê teşbîhê dide zanîn ku kesek bixwaze xwe bigi-

**Mela bi van herdû rêzên hanê, felsefeya xebata ji bo jiyana birûmet û têr aniye ziman û pir fireh û kûr xistiye nîşana xebata rizgarî û serkeftina mirovahiyê. Yanî çawa ku tu bixwazî xweşikî û bedewiya balindeyê Tawis bibînî, divê ku tu çetînahiya di wê riyê de bidî ber çavê xwe û paşê telba dîtîne bikî. Wisa jî bo serkeftina riya mirovahî û doza jiyana birûmet, pêwîst e ku tu xwe amade bikî û hemû çetînahiyên di wê riyê de deynî ber çavê xwe û paşê bikaribî xwe bigihînî wê doza pîroz a ku armanca heyîna mirovan her ji bo wê ye.**

hîne armanca xwe ya mebesta ramanî ya evîna mirovahiyê, divê ew her bi evîna xwe re heval be û şev û rojên xwe bike yek heta xwe bigihîne wê armanca pîroz û bi jiyana bêdawî be. Armanca jî jiyana bêdawî ew e ku kesên ji serkeftina doza xwe ya evîna mirovahî ya birûmet û bêhempa, her tim bi têkoşîn û xebat be, ew kes dikeve nav rêza kesên ku tu dem û gavan nayên jibîrkirin û di nav dilê milyonan de dijîn.

Dîsa bi vê mebestê, Mela di malika duyem de jî, girîngî û rûmeta jiyana bievîn dertîne holê û bi teşbihên pir newaze tîne ziman û dibêje ku kesên armanca wan vexawrina meyê be, divê ji bo pîrê meyxaneyê bi rêz û bi rûmet bin. Bi vê mînakê, têkoşîna bi evîna mirovahiyê dertîne holê û dinirxîne.

Yanî kesên ku mebesta wan xwegihandina armanca wan a pîroz be û bi rûmet be, divê ew her tim ji bo wê armancê bi rêz û rûmet bin û her tim di xizmeta wê de tê bikoşin. Hem jî dîsa Mela bi teşbiheke dinê, rengê têkoşînê bo xwendevanên helbesta xwe, diyar dike û dibêje, kesên ku armanca wan bi destxistina şûşeyên pir hêja û qenc bin, divê ew herine bajarê Heleba ku cih û warê wan şûşan e. Mela bi van teşbihên hanê ramana xwe ya evîna bêhempa dertîne holê û dibêje, ku mebesta wî ji van teşbihan ne ew e ku qala şûşan û pîrê meyxaneyê dike, armanca wî ew e kesên ku dixwazin xwe bi jiyaneke bêhempa û birûmet bikin, divê bo serkeftina armanca xwe ya mirovahî, Xwedayî, riya têkoşîna xwe ya evîndarî binasin û di wê riyê de bigihîjine taliyê.

*Çewrê hindî dê keşînit her kesê tawus divêt*

*Gewher û dura yetîm bê terkê ser têtin teleb?*

*Xefletê ew keşîfî şîr dest bi dest hatin ceger*

*Go: xebînet ya "Mela" mîskîn me lê ker kir kezeb*

Mela hinek mînakan ji diwariya riya evîne tîne û dibêje, kesên bixwazin balindeyê Tawis bibînin, divê xwe ji bo azarên kesên Hindistanê re amade bikin. Hem jî kesên ku bixwazin gewheran û duran bi dest bixin, ew bêtî serdayîna di wê riyê de nayêne bidestxistin. An jî ma qey ew bêserdayîna di wê riyê de û bo wê riyê, tîne bidestxistin?

Mela bi van herdû rêzên hanê, felsefeya xebata ji bo jiyana birûmet û têr aniye ziman û pir fireh û kûr xistiye nîşana xebata rizgarî û serkeftina mirovahiyê. Yanî çawa ku tu bixwazî xweşikî û bedewiya balindeyê Tawis bibînî, divê ku tu çetînahiya di wê riyê de bidî ber çavê xwe û paşê telba dîtîne bikî. Wisa jî bo serkeftina riya mirovahî û doza jiyana birûmet, pêwîst e ku tu xwe amade bikî û hemû çetînahiyên di wê riyê de deynî ber çavê xwe û paşê bikaribî xwe bigihînî wê doza pîroz a ku armanca heyîna mirovan her ji bo wê ye. Gava em li rewşa têkoşerên vê riyê dinêrin, em dibînin ku bi têkoşînên pir bêhempa û bi gorîkirinên pir bijan, paşê karîne xwe bigihînin encama serkeftinê.

Her wisa di rêza duyem a helbestê de, dîsa heman felsefe û ramanê diyar dike û dibêje, ger tu dixwazî xwe bigihînî armanca rûmeta têkoşînê, divê tu serê xwe û canê xwe bidî rê û gorî bikî. Çawa bi hezaran leheng û xweşxort û keçan bi wê rêbazê tev geriyane û bûne nemirê têkoşînê.

Bi kurtî me karî hinek ji ramana Mela ya felsefî, armancî bo xwendevanên birêz bidine diyarkirin. Lê gava ku ew bi hişyarî, kûrnêrin, berê xwe bidine felsefeya helbestên Melê, wê ji me bi hêztir bikevine nav mijarê û baş bêhempatiya wî ya felsefî bibînin û şîrove bikin.

# Melayê Cizîrî û Feqiyê Teyran\*

**D. N. MacKenzie** Wergera ji îngilîzî: **Samî Berbang**

Der barê helbestvanên kevn ên kurdan de kêmtir tîşt tene zanîn. Destnivîsên helbestên wan pir kêmtir in û bi piranî li ber destên hin kesan di quncên tarî veşartî de ne. Piçek agahiyên ku der barê jînenîgariya wan de tên dayîn jî, hev û din nagirin. Lewre der barê wan de her rastiya herî biçûk ku mirov dikare derxe holê jî gelekî hêja û giranbiha ye. Ev dilopên biçûk ên rastiye dibin xelatên biçûk ji bo bibîranîna yekî ku ji bo kurdan xwediyê evîneke mezin e û ji bo çand û dîroka kurdan xizmeteke mezin kiriye.


Yekemîn çavkaniya me ya agahiyên der barê helbestvanên pêşîn ên kurdan dide, bendek e ku Mehmûd Efendiyê Beyazîdî ji bo A. Jaba nivîsandiyê û berî sedsalê di xebata "Recueil de



notice et recits kurdes" de hatîye weşandin. Di vê xebatê de her du helbestvanên ku em ê li serê rawestînin ango Melayê Cizîrî û Feqiyê Teyran di rêza duyem û sêyem de hatine nasandin. Li gorî vê çavkaniyê, Mehmûdê Beyazîdî daye zanîn ku Melayê Cizîrî ji Cizîra Botan e, navê wî Şêx Ahmed e û ew di sala 540'î (1145-6) de li Cizîrê çêbûye. Şêx Ahmed di sala 556'an (1161) de koça dawî kiriye. Heçî Feqiyê Teyran e, navê wî Mihemed e, li bajarokê Miksê sala 702'yan (1302-3) ji dayik bûye. Di helbestan de nasnavê wî Mîm û Hê bûye, temenê wî gihîştîye 75 salan û di sala 777'an (1375) de jî koça dawî kiriye.

Di nav van agahiyên de şaşiya berbiçav agahiya der barê temenê Melayê Cizîrî de ye. Li gorî van agahiyên, ew bi tenê 16 salan jiyaye. Jaba jî di ser çewtîyê re qewastîye û gotîye di sala 540'î (hicrî) de li Cizîrê çêbûye. Dema ku di destpêka vê sedsalê de (sedsala 20'an), M. Hartman kopiyêke destnivîsî ya dîwana Cizîrî çap kir, wî jî di wergera xwe de gotina sala 540 esas girt û guh neda resîya terkîbenda Cizîrî ku qala xezelên Hafîz (791/1389) dike. Di pirtûka xwe ya Dîroka Wêjeya Kurdî de, Elaêdîn Secadî heta radeyekê ev mijar jî gotûbêjê re vekir. Cara yekem da zanîn ku Cizîrî li cihekî din jî qala Hafîz dike, dema ku dibêje:

*Ger lulu'ê menşûr ji nazmê tu dixwazi*



*Der şîrê Melê bîn, te bi Şîraz çî hacet*

Paşê di nav malîkeke Camî de (817-898/1413-1492) de rastî navê Cizîrî û Eliyê Herîrî ye ku Jaba wî wekî yekemîn helbestvan bi nav dike, tê.

*Pîremerdî be didem ez Cizîrî  
Nîm merdî be didem ez Herîr*

Li ser bingeheke zêde ne zelal û ronî wî angaştîye ku bi texmînî Cizîrî di navbera salên 811-886/1407-1481'ê de jiyaye. Helbestvanê me yê din ku wî di nav listeyêke bi navê Baxê Şairan de qal kiriye Feqiyê Teyran (!) ê Makû (!) ye ku li gorî wî di navbera salên 1307 û 1375'an de jiyaye. Lêhûrbûneke nêzîktir a li ser vê mijarê jî hêla Muftiyê Qamişloyê Ah-



med b. Mela Muhammed el-Buhtî el- Zivîngî ve hatiye kirin. Wî çapeke dîwana Cizîrî tevî wergera erebî, kir. Wî di xebata xwe de qala angaşten Secadî kir û diyar kir ku Cizîrî di hin malikeke terkî-benda xwe de bi nav qala Sa'dî û Camî kiriye. Belgeyên wî yên nû hîn zêdetir cihê baweriyê ne, ji ber ku mêjûyeke diyartir didin.

Hem di çapa Hartman de, hem jî di çapa Meleyê Zivîngî de, di dîwana Meleyê Cizîrî de helbestek cih digire; di vê helbestê de Melayê Cizîrî û Feqiyê Teyran diavêjin ber hev. Ne helbesteke pir xurt e, lê yekemîn beyta helbestê şewaza razî ya payebilind nîşanî mirov dide.

Feqî:

*Selama min heqîrê sedefek tivê têkin*

*Îro di Cezîrê heq e li Melê kin*

*Ku ji derba tîrê derman heyê lê kin*

Mela:

*Selamên milyaketan bêhed û bêhisêb bin*

*Şubhetî avên şetan ji Mela, li Mîm û Hê bin*

*Hilakên ji zehmetan derman ji lam û bê bin*

Feqî:

*Şerbeta lam û bêan nadim ez wê bi heyatê*

*Me'dena dal û rêan dibarînin nebatê*

*Izhar dikin me'neya ji husna but û latê*

Ji vê helbestê, Miftî encameke zelal (tiştê ku Hartman nekariye) derxistiye û gotiye ku her du helbestvan hemçerx in. Bi ser de jî xwe gihandiye helbesteke Feqiyê Teyran (ew jî di-

bêje ji Makûyê ye), ev beyt ji qesîdeya wî veguhastiye:

*Dilo rabe, dilo rabe, veke çehvan ku êvar e*

*Nezan û bes di xew da be, bi nawmê re mebe yar e*

Ev qesîde wiha didome:

*Li Muhammed heft felek çûne, ji hucret dewr gelek çûne*

*Hezar sal çil û yek çûne, ev xezel hate dîar e*

Ji rastiya ku ji vê helbestê derdikeve, diyar dibe ku Feqî di sala 1631'ê (1041 hicrî) de ji dayika xwe bûye. Ji vê yekê jî encama ku pêşrewê wî Melayê Cizîrî di navbera dawîya sedsala dehan a hîcrî û di sala 1050'î (1640 mîladî.) de jiyaye. Delîlên vê dîrokê ji helbesteke din a Feqî jî tên.

Celadet Bedirxan di gotara ya bi sernavê "Klasîkên Me" de ku bi nasnavê Herekol Azîzan, di hejmarê 7'emîn a Hawarê de weşandiye, li ser vê mijarê wiha gotiye: "Tê gotin ku Feqiyê Teyran şagirtê Melayê Cizîrî ye û li ber destê wî perwerde bûye. Li ser mirina Mele, Feqî zêmarek (mersiye) nivîsandiye û dema mirina wî bi hesabê ebcedê diyar kiriye. Ew mersiye demekê bi dest min ket, lê di vê dema ku ez van rêzan dinivîsim de ew li ber destên min nîn e. Bes, baş tê bîra min ku Feqî di vê zêmare de wiha dibêje:

*Heft 'eyn û lam ji hev bûn cida*

*Şîn û girî dîsa tê da*

Heke mirov van gotinên Feqî li gorî hesabê ebcedê dahûrîne, dê dîroka mirina Melayê Cizîrî derkeve holê."

Wî bi xwe ew dahûrandin nekariye, lê M. B. Rûdenko di tîbîniyên li ser pirtûka Feqiya

Teyran Şêx Senan de ev dahûrandin kiriye. Ew bi awayan van rêzikan şîrove dike.

**Şîroveya yekem:**

$(7 \times \text{eyn}) - (7 \times \text{lam}) = 490 - 210 = 280$

$\text{Şîn} + \text{gef} + \text{r} + \text{y} (\text{girî}) = 300 + 20 + 200 + 10 = 530$

$280 + 530 = 810$

Ev jî li gorî salnameya mîladî beramberî salên 1407-8 tê.

**Şîroveya duyem:**

$(7 + \text{eyn}) - \text{lam} = 7 - 70 - 30 = 47$

$47 + 530 = 577 \text{ h.}$

Ev jî beramberî 1181-2'yê mîladî tê.

Niha êdî aşkera ye ku divê ev tarîxa di vê zêmara ku bi awayekî rast hatiye bîra Celadet Bedirxan, wiha were şîrovekirin:

$(7 \times \text{eyn}) - \text{lam} = 490 - 30 = 460$

$\text{Şîn} + \text{y} + \text{n} + \text{gef} + \text{r} + \text{y} = 300 + 10 + 50 + 20 + 200 + 10 = 590$

$460 + 590 = 1050$

Em bi awayekî zelal xwe digihînin dîroka ku Miftî destnîşan kiriye. Bi zelalî xuya dike ku Melayê Cizîrî di navbera 980 û 1050'ê hîcrî ango 1570 û 1640'î de jiyaye. Her wiha Feqiyê Teyran jî bi texmînî, di navbera 1590 û 1660'î de jiyaye û tarîxên berê yên li ser jiyana wan armanca nepixandina qedîmbûna wan nîşan didin.

**Nîşe:** Ev nivîs ji pêşeka pirtûka Feqiya Teyran a bi navê "Şêxê Sen'an" a ku li Swêdê ji nav Weşanên Roja Nû, di sala 1986'an de derketiye, hatiye wergirtin. Nivîs bi îngilîzî bû, me li kurmancî wergerand.

# Teoriya muzîkê ya giştî

Veysî Varli Wergera ji tirkî: Yaşar Eroğlu

## Avaniya muzîka kurdî

Muzîka kurdî, bi awayê vokal û enstrumantal tê îcrakirin û avaniya wê muzîkeke dibistanî ye (sedema ku ji bo Safiyûdîn û mamoste Ebdil-qadirê Meragî re dibêjin dibistanên pergalexwaz, ev e). Pişt re bi nîfşên nû, bi devên dengbêjan, dayikan û feqiyên hatiye parastin, bi amûran jî bi bilûra şivanan, bi erbaneya hafizan, bi tembûra tembûrvanan, bi kemaneya (ribaba/kemençeya) kemanjenan, bi def û zirneya mitriban ve jiyaye û muzîkeke meqamî ye; ji usûla 2/4'an heta 28/8'an xwedî avaniyek e ku usûlên wê cuda ne. Xwedî muzîka dîwanê (muzîka edvar/muzîka hunerê jî dibêjin), muzîka olî (muzîka sufi), xwedî avaniya muzîka gel a bi navê stranên rîtmîk, lawik (serhawa) tê tebîrkirin û pergala deng, avaniya usûl, avaniya rîtmîka wê ya xweser û avaniya gera awazê ye; em ji van hemû pênase û îfadeyan re dibêjin muzîka kurdî. Tev gelê kurd bi awayekî pê eleqedar e, pir an hindik yekser bi kar tîne, ango bi awayekî her kes pê eleqedar e.

Der barê vê rewşê û muzîka kurdî de peywîrdarê hîndekariyê yê Zanîngeha Harvardê Mehrdad R. Îzadî dîtinên xwe wiha diyar dîke, "Ji bo muzîkîkaran kurd ku di çarçoveya zewq û ecibandina temaşekaran de bi riheî jixweberiyê dikin, elbet di nav sînorên meqaman an jî meqaman bi sînor kiriye de pir berfireh repertuara awazan heye. Her çî qas jixweberî taybetiya muzîkîkaran kurd ê herî balkêş be jî, muzîkîkaran bi îhtîmam rîyayetî meqam û awazên standard dîke. Belkî mirovên ji rêzê nizanibin dê çawa bê lîxistin, lê muzîsyenên bêtecrube derketin derveyî awazê ku di serî de ev yek tê ferqkirin." Di vê destnîşanê de diyar e ku her kurdek kêr zêde bi muzîkê re eleqedar e. Ji ber ku muzîkê di bûye zimanê hest îfadekirinê, di zimanê ku tê bikaranîn de, girîngiyê dide pêş. Ji ber ku ziman navgîna herî hêsantir a peyamdayîn û standina mirovan e ku ew heyînen çandî ne, hêmanek e ku barbûna derûnî ango hestewarbûna herî baştir li ser mirovan çêdike.

Ez dixwazim ku çavdêriyê xwe bi we re

pareve bikim. Sala 1981'ê... Xezûrê min û lawê apê min mêvanên min bûn. Di TRT 1'ê de bernameya Quranê hebû û wan jî lê temaşe dikir. Birayê min ê biçûk jî li odeya din, li qaseta qesîdeyan a ku ji aliyê Şêx Mîzbehê Farqînî ve ku bi piranî jî helbestên Cegerxwîn bûn, guhdarî dikir. Bala min kişand ku wan her duyan jî, ji bo ku qesîdan seh bikin guhên xwe ji Quranê hildan, dan ser qasê. Min ev yek ji xezûrê xwe pirsî. Bersiva wî ez birim ser hestên bêterîf. Kalê 75 salî wiha got: "Min fêmkir kû dema mirov bi zimanê xwe derdê xwe guhdarî bike dengê Qurana Kerîm jî di guhê mirov de naçe." Ev mînak min da, ji bo ne girîngiya Quranê bû, lê ji bo girîngiya hestên bi zimanê mirovan tîne îfadekirin, bawerîya pîroz jî didin aliyekî. Êdî ne hewce ye ku ez zêde şîrove bikim. Ziman ku sedemê heyîna çandan û gelan e, di warê muzîkê de jî roleke girîng dilîze. Ji ber ku muzîkê jî yek ji hêmanên girîng ê çandê ye.

Ziman, qarekterê muzîkê yê neteweyî temam dîke. Ango ji girîngiya peyvê zêdetir girîngiya zimên derdikeve pêş. Kirpdana zimên (ji ber ku dengsaziya fonetîk) her gelî jî hev cudatir e, ji bo muzîka wan ev yek hêmaneke sereke ye) di muzîka kurdî de skalayê xweser a deng di hemû enstrûmanên xwe de afirandiye. Amûra ku em jê re dibêjin zirne, li Rohhilata Navîn, li Anatolî û Balkanan pirî gelan bi kar tînin. Koka wê aîdî Qereçiya Pakîstanê ye û ji wir tê (Di nav kurdên bakur de, kesên di çadîrên koçeran de dijîn re dibêjin qereçî. Li vê herêmê di şahî, dawet û şenahiyan de kesên ku li dahol û zirneyê dixin bi piranî ev qereçî ne) û ji vê herêmê jê re dibêjin Zûr. Saza kesên ku ji wê cografyayê koç kirine bi xwe re anîne, li ba kurdan (ji ber dengê wê yê bilind, dest daye ku wek saza meydanî bê bikaranîn) skalayê xweser girtiye, di bejn û teşeya wê de guherîn çêbûne, ji zimneyên ku welatê jê hatiye cudatiyê berbiçav dide xuyakirin.

Ji vê jî tê fêmkirin ku di muzîkê de peyv girîng e, lê bîngê ziman bi xwe ye. Çimkî kirpdana zimên bi xwe re rîtmê çêdike. Ji sedemên ku

raboriya muzîka kurdî bingehîn e, di serhaweyên wê, di muzîka dansa wê de ku wek enstrûmatal (amûrî) xwe baş îfade dike, tev kirpandanên ku ji zimên derdikevin xwedî karakter û wesfekî ku di serê mirov de yek bi yek herî paqijtir û zelaltir dirûv lê dide, çêdike. Wek mînak; berhemên Qerê Lala (mêşîna reş) an jî Kotan ha Kotan (pevçûna gur û seyê şivan bi amûrê tîne zimên) a şivan bi bilûran îcra dikin, bi sedan salan e bi her awayî di nav gel de berbelavî bûye, ji şivanan re bûye îlham û hatiye guhdarîkirin. Ji bo ku em tev ji van fêhm bikin û tê bigihîjin, divê em taybetiyên ku muzîka kurdî li ser ava dibe yên ku bingehîn in, binêrin.

### a) Pergala deng

Pergala deng a muzîka kurdî, pergalek e ku bi dengên xwezayî yên di gerdûnê de hene û 17 oktavên newekhev ên ku selen /dengên zayok ku aîdî van in, pêk tê. Di heqê vê mijarê de jî belge yek ku li ber dest e, îro di Brîtîsh Museûma li Londonê ye û BZ (Berîya Zayîne) aîdî salên 280'an û amûra bilûrê ku bi navê na/nale tê zanîn e. Xuya ye ku di skalaya aîdî vê sazê de, deng, dengên îro ji bilûrê derdikevin ne cudatir in. Dîsa di lêkolîna arpa Sîr Leonard Wooley dîtîbû û aîdî xwedawenda ŞûbAd e ev rastî tê dîtin. Dema di pirtûka Musîkul Kîtabul Kebîr a Farabî nivîsiye de, di beşa duyem de Tembûra Xorasanî bê lêkolînkirin, tê dîtin ku perde û navberên vê sazê jî bi vê pergalê pêk hatine. Ev pergal bi hezaran salan e heye lê cara yekem ji aliyê Safiyûdîn Êrmiyewî ve bi awayê teorîk hatiye nivîsandin. Di pirtûka xwe ya Kîtabul Edvar de hildaye dest. Piştî wî, ev pergal ji aliyê alimên wek Xoce Ebdilqadirê Meragayî û Bedrî Dilşad ve hatiye şîrovekirin û bikaranîn.

Kurd û gelên Rojhilata Navîn jî bi hezaran salan e vê pergalê bi kar tînin. Ev pergal, ji aliyê Safiyûdîn Êrmiyewî ve bi cedwela tetbîqatê ku wek cedwela pîroz tê binavkirin, hatiye îfade kirin. Safiyudîn vê pergalê bi vî awayî diyar dike.

- Oktavek (navbera ku bi navê heştend jî tê binavkirin ku bi rêzekê hatiye rêzkirin û dûrahiya di navbera du nuqtayan de ye û heman nav li ser e) dabeşî 17 navberên newekhev kiriye û li gel perdeya yekem bi skalaya deng a xwedî 18 perdeyan e, îfade kiriye. Beşek ji van perdeyan tam e, beşek niv (navbera çar komayên li gor komaya bakiye=zarlîno), hinek jî irha/kerî (çarek navber (3/4) ne.

- Dema navên perdeyan danîne û teoriya wê îfade kiriye, dengên mirovan û amûrên aîdî wî

dengî li ber çav girtiye. Bala xwe daye ser hukm û sînorê dengên mirovan û oktavek esas girtiye. Pişt re ligel qada ku aîdî dengên oktav ên jêr û jor in, bi derecekirin û binavkirina du oktavî pêk aniye. Ev binavkirina berê li ser amûran, li gor îstiqamet û rawesta pêlîkirina tiliyan (pêlînga hejmaran) aniye pê û wiha bi nav kiriye: Yekgah (yegah), dugah, sêgah, çargah, pêncgah, şeşgah, heftgah, heştgah.

Ev perde an jî ev rawest li gorî rêza dengên meqamê *rast* (peyva *rêzê* wek rêza dengên hatiye bikaranîn, ne di wateya *rêza* tonalîteya muzîka rojava de ye) çêkirine. Ango rêza meqamê *rast* wek *rêza sereke* hatiye pejirandin. Rasta ku di wateya "rasteqîn, heqîqî, esas" de ye, bi zaneyî daniye navê vê rêzê. Afirandina rêzên din jî li ser vê rêzê hatiye pê. Bi alfabeya erebî nîmandiye û bi notayên ebcedê îfade kiriye. Bi giştî navên 17 oktavên û oktavên duyem wiha ne.

### Alfabeya Notaya Ebcedê ya Safiyûdînê Êrmiyewî

Yekgah	P. Beyatî	P. Hîsar	H. Aşîran	A. Aşîran
ا	ب	ج	د	ه
Iraqî	Rehawî	Rast	Şûrî	Zengîle
و	ز	ح	ط	ی
Dugah	Kurdî	Sêgah	Bûselîk	Çargah
یا	یب	یج	ید	یه
Saba	Hîcazî	Newa	Beyat	Hîsar
یو	یز	یح	یط	ک
Huseynî	Acem	Ewç	Mahrî	Gerdaniye
کا	کب	کج	کد	که
Zir (x)	Şehnaz	Muhayer	Sinbule	T. Sêgah
کو	کز	کح	کط	ل
T. Bûselîk	T. Çargah	Saba	T. Hîcaz	T. Newa
لا	لب	لج	لد	له
T. Beyat	T. Hîsar	T. Huseynî		
لو	لز	لح		

**Nîse;** Nivîsa li jorê, ji Muzeya Dîrokê ya Mîsirê ku xebateke bi navê Dinyaya Meqaman e hatiye girtin, ji aliyê min ve navên wan tirkî hatine nivîsandin.

<i>Xwendina bi tîpên ebcedê</i>	<i>Navê ku pê bi kar tê</i>	<i>Li gorî notaya îro</i>
1. Elîf	Yekgah	RE
2. Bê	Beyatî (a ku bemî ye)	MÎ Bemol (pênc koma)
3. Cîm	Hîsar (a ku bemî ye)	MÎ Bemol (du koma)
4. Dal	Huseynî aşîran	MÎ
5. Hê	Acem aşîran	FA
6. Waw	Iraqî	FA Diyez (sê koma)
7. Zê	Rehawî	FA Diyez (pênc koma)
8. Xê	Rast	SOL
9. Tê	Şûrî	SOL Diyez (çar koma)
10. Yê	Zengûle	LA Bemol (du koma)
11. Yê elif	Dugah	LA
12. Yê bê	Kurdî	Sî Bemol (çar koma)
13. Yê cim	Sêgah	Sî Bemol (du koma)
14. Yê dal	Ebûselîk (Bûselîk)	SÎ
15. Yê hê	Çargah	DO
16. Yê waw	Saba	DO diyez (sê koma)
17. Yê zê	Uzal (Hîcazî)	DO diyez (pênc koma)
18. Yê xê	Newa	RE (1 oktav)
19. Yê tê	Beyat	MÎ Bemol (pênc koma)
20. Kaf	Hîsar	MÎ Bemol (du koma)
21. Kaf elif	Huseynî	MÎ
22. Kaf bê	Acem	FA
23. Kaf cim	Ewc	FA Diyez (du koma)
24. Kaf dal	Mahûr	FA Diyez (pênc koma)
25. Kaf hê	Gerdaniye	SOL
26. Kaf waw	Zir (x)	SOL Diyez (4 koma)
27. Kaf zê	Şehnaz	LA Bemol (2 koma)
28. Kaf xê	Muhayer	LA
29. Kaf tê	Sinbule	SÎ Bemol (pênc koma)
30. Lam	Sêgah (zîl)	SÎ Bemol (du koma)
31. Lam elif	Ebûselîk (zîl)	SÎ
32. Lam bê	Çargah (zîl)	DO
33. Lam cim	Saba (zîl)	DO Diyez (3 koma)
34. Lam dal	Uzal (zîl)	DO diyez (5 koma)
35. Lam hê	Newa (zîl)	RE
36. Lam waw	Beyatî(zîl)	MÎ Bemol (5 koma)
37. Lam zê	Hîsar (zîl)	MÎ Bemol (2 koma)
38. Lam xê	Huseynî (zîl)	MÎ

Nîse: perdeya bi nîşana (x) hatiye nimandin di hin tetbîqetan de navê wê tune ye, heta di amûra tembûrê de ku bi vê skalayê hatiye perdekirin ev girêdan nîn e. Lê di hinekan de navê niv/nîm Şehnaz tê bikaranîn.

Ev nav, di terîfa meqaman de û aîdî kîjan dengê ye xuya dike. Ev pergala, di encama oktavekê de ku 17 heb navberên tam çarmend in û li ser hev hatine barkirin, derketiye holê. Yek çarmenda tam ji bemiyê ber bi zîlê (tîzê) ji navberên B.C.T.B.C.T.B'an pêk tê. Di oktavekê de, ji aliyê nirxa komayê ve navber bi vî awayî rêz dibin: 4-3-2-4-3-2-4 +4-3-2-4-3-2-4+4-3-2. Mirov bala xwe dide ser vê rêzê dibîne ku ji yek tam çarmend+yek tam çarmend+yek dengêkî tam pêk tê. Bi hezaran sal e, kurd vê pergala deng bi kar tînin û tev amûrên muzîka kurdî li gorî vê pergala deng skala girtine.

Wek berê jî me gotibû muzîka kurdî meqamî ye (kurdên li îranê dijîn ji meqam re dibêjin destgah). Em dixwazin pîrsa meqam çî ye û çawan diqewime, bibersivînin. Meqam: Ew qalibê muzîkê ye ku ji hin perde û navberan pêk tê, ji cih û cinsên ku kifşe ne dest pê kiriye, gera wê ya ku xweseriya wê heye ango ber bi qadekê û aliyekî ve dileqe, tevdiqere, di hin perdeyan de nîv radiweste, lê di encamê de li ser perdeyê bibiryar tam radiweste. A ku bîngeha meqamê tê dîtî ger e. Ligel wê motîf, qada deng, berê gerê, firehbûna deng, derbasbûnên xweser û dengên xemilandinê jî hêmanên girîng ên meqam in. Meqam ji cinsan pêk tên. Ji navbera ku di encama yek tam çarmenda ku di nav xwe de dabeşî sê navberên biçûk ên ne wekhev in dibe, derdikeve re dibêjin cins. Ev cins in ku hêmanên meqamê bi nav dikin. Rêz, tu car ne meqam e. Di muzîka Rojavahiyan de, mefhûmeke ku jê re dibêjin mod heye. Her çî qas dişibin meqam jî, lê tu car taybetiyên meqamê nakin. Tonalîte jî mefhûmeke din e. Hin peywiran li dengên bar dikin û li dorhêla tewerê rêz dikin, bi vî awayî tonalîte pêk tê. Ango heştgahek e ku ji yek rawest mod û hêzdar ve pêk tê. Di rêzê de deng bi her awayî heman taybetiyê nîşan dide, lê meqam ne wisa e. Li gor taybetiyên meqam deng peywira xwe tîne cih.

Di muzîka kurdî de mefhûma rêzê nîn e. Çimkî muzîk, li ser temamî meqam an jî awazê an jî li ser çarmend/pêncmend cins çêdibe. Di salên 1500/1600'an de, piştî derketina dengbêjan, li hin herêman tenê li ser cinsan awaz pêk hatiye. Cinsên ku ji bo meqam pêk bînin hatine bikaranîn (ji

Safiyûdînê Urmîyewî vir ve) deh heb in û ev in:

1) Rast (T.C.C), 2) Newroz; îro ûşaq dibêjin (C.T.T), 3) Uşaq; îro dibêjin çargah (T.T.B), 4) Newa; îro dibêjin bûselîk (T.B.T), 5) Buselîk; îro dibêjin kurdî (BTT), 6) Iraqî; xerîbî (CTC), 7) Îsfahan (CCCB), 8) Buzurg (CTCCB), 9) Koçek; zîrefkend jî dibêjin (CCB), 10) Rehawî (CCC).

**Nîşeya girîng:** T, tam an ji tanînê ye, C sêmbola munecebê ye, B sêmbola bakiyeyê, A sêmbola navbera zêde ye. Dema dengêkî tam tê aliyê zîlê cinsê Newrozî pêncmenda Huseynî pêk tê. A din sêmend ecem (trîcorhd), çargaha sêmend, sêgaha sêmend, sêmenda bernav, pêncmenda huseynî, pêncmenda nîkrîz hatiye bikaranîn û hin jî li Rojhilata Navîn tê bikaranîn. Lê li Tirkiyeyê, avaniya meqamên ku ji aliyê Arel-Ezgî-Uzdîlek ve hatine pêşxistin beşek jî van pêncmend û sêmend nanayên bikaranîn.

Ew pergala deng a ku di pirtûka Kîtabul Edvar a Safiyûdîn Urmîyewî de heye îro li Rojhilata Navîn û li Anatoliyê (em beyî tehrîfkirina bi meqamê arel, ezgî, uzdîlek bihesibînin) bi 12 meqam, 7 awaze, bi cinsan pêk tê, xwedî çar perdeyên biryar û destpêkê ye ku berê dema îcrayê jê re digotin şu'be.

Meqam ev in: Rast, huseynî, newa, ûşaq, bûselîk, iraqî, îsfahan, buzurg, zîrefkend, rehawî, zengûle, hîcazî/hîcaz, bi giştî 12 heb in.

Awaze jî ev in: Newroz, gewêşt, selmek, gerdaniye, maye, şehnaz û hîsar.

Destpêk an jî perdeya qerare jî yekgah (RE, paşê bûye qerara rast-sol), dugah (LA), Sêgah (SÎ, perdeya bemol a du komayî) û çargah (ku perdeya Doyê ye)

Meqamên hevedudanî di serî de 24 heb hatine bikaranîn, paşê derketine 48'an û pişt re derketine ser 500'î. Lê hemûyên van, îro tune ne. A din jî der barê senifandina meqaman de ev derdikeve rastê: Meqamên ku di nav malbata 12 meqaman de tên hesibandin, em wek meqamên şed (transportekirî) dizanin. Diyarkirin û vekirina taybetiyên van hemû meqaman bi serê xwe mijarek e. Em zêde nakevin vê kûrahîyê lê em dê bi diyarkirina hin meqamên ku di muzîka kurdî de hatine

bikaranîn, mijara pergala dengan bi dawî bikin.

Safiyûdînê Êrmîyewî di pirtûka Kîtabul Edvar de navê 12 meqaman dide, qala rêzkirina ku dengan dinimîne û meqaman pêk tîne nake (ji ber ku wê heyamê meqam baş tên zanîn qala wê nekiriye, paşê Xoce Ebdilqadir aniye ziman û di Şerhul Edvara xwe de perdeyên dengê meqaman diyar kirine. Xoce Ebdilqadirê Meragî di Camîul Elhana xwe de dibêje ku, moxol û tirkan tenê ji van meqaman du heban dizanin.)

Ez dê pişt re, der barê mijara ku ez li jêrê didim xuyakirin ez dê nivîsarekê binivîsim. Meqamên digel hin cudahiya ku îro (wek zengûle) di kurdî de tên bikaranîn û di Kîtabul Edvarê de tên hejmartin, ev in.

**Ecem:** Çargah, şewkefza.

**Sêgah:** Bestenîgar, huzam, mustear, rahatul erwah.

**Beyatî (beyatî kurdî):** Beyatî şûrî (karcîgar), huseynî, newrozî (ûşaq), tahir, mûhayer (îbrahîmî).

**Nîhawend:** Ferahfeza.

**Hîcaz:** Hîcazkar, şedereban, şehnaz, sûzî dil, zengule, iraqî (xerîb).

**Saba:** Saba zemzeme.

**Kurdî:** Ecem kurdî, newa kurdî, kurdî hîcazkar.

**Newa:** nîkrîz, pesndîde.

**Rast:** Sûzîdilara, sûzînak, mahûr, dilneşhîn.

Digel li hin deveran bikaranîna hin meqamên sed û yekgirtî (terkîb) ku hin malbatên diyar in, bi taybetî awazên aîdî muzîka gel a kurdî bi piranî li ser cins û awazeyên van meqaman tên çêkirin.

Hîn ku em ji vê mijarê derbas nebûne, em destnîşana Safiyûdîn û Xoce Meragayî ya ku der barê vê pergala deng de ye, li vir bînine ziman (Îshaq Misûlî û Zêryab jî ji vê mijarê behs kirine). Dibêjin ku, “18 perde hejdeh hezar aleman, 12 meqam dozdeh mehan (bircan), 7 awaze heft gerstêrkan (seyareyan), 4 şube çar werzan (dem-salan), 24 meqamên yekgirtî jî 24 saetan îfade dikin.” Ji ber vê yekê, yên zanista muzîkê bi astronomiyê ve li hev tînin, loma tê fehmkirin ku çima ji muzîkê re gotine ilmî nucûm/necm.

### Avaniya şeweyê

Kurdan, bi hezar salan e ku carinan bi xema hunerê, carinan jî bêyî xem û fikara hunerê hest û ramanên xwe, şîn, şadî, coş û êşa xwe, hevî û hesreta xwe, baweriya olî û hawara xwe; bi hestên xwe yên ji dil tên ve, yên ku di nav jiyana rojane de derdikevin, li awazeyan bar kirine û ev awaze wek muzîka olî, muzîka gel û wek muzîka hunerê ya kevneşopî derdikevin pêşberî me. Divê ev şeweyên ku di bingeha xwe de xwedî heman deng, hest û uslûbê ne, yek bi yek bînin lêkolînkirin. Lê ji ber ku ev xebateke dûvedirêj e, em dê tenê bi vê gotinê diyar bikin û derbas bin.

Muzîka kurdî çavkaniya xwe ya rîtmîk ji kar, reqs û zêmarê digire. Rîtma leşkerî di muzîka kurdî de nîn e. Ji ber ku muzîka leşkerî di neteweyên ku xwedî dewlet in de heye. Bela ku dewleta kurdan nehebûye, ev muzîk jî çênebûye. Lê kengê nêzikê vê derfetê bûne muzîkeke bi vî rengî jî çêkirine (wek mînak; di dema Komara Mehabadê de sirûda *Ey Reqîb*, di dema tevgera Barzanî de *Em Pêşmergeyê Qehreman in*, di dema tevgera azadiyê ya bakur de *Ey Şoreşger; Herne Pêş* marşên leşkerî ne.) Lê belê, aliyekî vê muzîkê seqet e. Ew jî taybetiya rîtmîk e. Ji ber ku qalibê wê ne xweser e, ji der ve hatiye. Ji derveyî muzîka leşkerî, hemû şeweyên muzîkê yên vokal û enstrûmantal hene. Em li ser muzîka hunerê (muzîka dîwanê) û muzîka olî zêde nasekinin. Lê em dê li ser avaniya muzîka gel a ku bi dorfirehî bûye malê gel, bisekinin.

Muzîka kurdî ya gel bi sê awayan xwe dide der: 1) Bipîvane (Tempo Quîsto), 2) Bêpîvan (Parlendo Rubarto-Reçîtatîve-Serhewa), 3) Birîtma Zêmarêye (Birîtma sist).

Di nivîsa pênasiya muzîkê de ku lêkolînerê muzîkê Chirîstîan Porche, ji bo dîska Kurdish Music di çarçoveya music and musicians of the world UNESCO'yê de amade kiriye, dorhêl û dema ku muzîka kurdî lê îcra dibe esas digire û wek du beşan ji hev diqetîne. Ji ya yekem re dibeje “muzîka şahiyê, muzîka roj a ku xwedî taybetiyên kirpandanê tund ên rîtmîk û awazî” ne, ji ya duyemîn re jî dibêje “muzîka şev a ku ji bo di demên ji xwe re veqetandine de yên ku înzîwa

û bêdengiyan bidine der îcra dikin.” Mebesta vî lêkolînerî ev e ku avaniya awazê ya ku me wek bipîvane û bêpîvane diyar kiribû, bîne zimên.

Di muzîka kurdî de ku li ser taybetiyên van her du esasan ava bûye, îfadeyeke her du şêweyan a ku di heman demê de di nav hev de ne, heye. Em dikarin ji vê re bibêjin têkel (tevlîhev). Dîsan hin awazên ku tîpeke rîtma serbest nîşan didin û di nav xwe de rîtmekê biserûber nîşan didin hene (bi taybetî ji zêmaran pêk tên). Divê em van jî di bin sererêzekê de vekolin. Ev awazeyan devkî (vokal), bêpeyvî (amûrî-enstrûmantal) tên îcrakirin. Awazeyên devkî, hin caran wek serhewa, tenê enstrûmantal derdikevin pêşberî me. An jî awazeya ku em enstrûmantal guhdarî dikin, dibe ku em devkî jî bibihîzin. Temayên awazeyên devkî lorîk, zêmar, hesret, jihevqetîn, xerîbî, evîn, mirin, mêrxasî, niçlêdan, koçberî, hine, bereket, berhem hilanîn û hwd. ne. Carinan wek payîzokekê yan jî serhêliyekê, carinan wek berbûk, serhine, lorîk, lawik derdikevin pêşiya me. Mînakeke ku li dinyayê tune yan jî hebe nayê zanîn, di muzîka kurdî de heye. Awazeyên bipîvane sedî nod û neh bi devên mêran pêk hatine (afirandêrê wê mêr be jin be), di nav de xîtaba mêran heye. Çimkî di civakê de derfetên mêran hebûn ku xwe zêdetir îfade bikin. Di govendê de mêr li çavên hezkiriya xwe dinêre û dibêje, ew min dike. An jî gava di zeviyê de dixebite, bi stranên evînê peyaman jî hezkiriya xwe ya ku tevî bav û diya xwe dixebite re dişîne.

Awazeyên bêpîvan (rîtma serbest-serhewa) jî sedî nod û pêncan bi devên jinan in. Lê sed mixabin, ên ku vê di nav civakê de tîne zimên dîsan mêr in. Jin, jî aliyê civakî ve tune tîne hesibandin. Evîna jî bo hezkiriyê xwe, zêmara jî bo lawê xwe yê mirî, rikê jî bo kesê ku jê hez nake û nas nake lê bavê wê dide wî û hemû êş, elem û şadiyên xwe ku di nav civakê de nikare bîne zimên, wexta sergîna berhev dike, wek jin bi hev re dixebitin an jî dema dergûşa xwe dihejîne, bi serê xwe li zeviyê dixebite bi derûniya lîrîk, reben û hestewar aniye zimên. Vê rewşê awazeyên bêpîvan afirandine (Di awazeya Cembelî de jin dibêje ku, “Ez Cembelîyê biçûk bihejînim/ li dora serê Cembelîyê mezin

bigerînim, lorî lorî! Li vê hesretê binêrin! Xuya ye ku di strana xwe de dergûşa xwe qurbana hezkiriyê xwe yê salên berê dike). Hin awazeyên bêpîvane bi xîtaba wan tê fêmkirin ku mêran ew afirandine lê di vir de jî rebeniya jinê, bêçaretîya wê heye (20-25 salên vê dawiyê ne tê de. Vê demê zêmar jî bipîvane tên gotin û wekî tên gotin mirov pê re govendê digirin. Wek newayên Bêrîvanê, Lê Amedê Amedê, Heval Egît). Mêr an dil e, an di dijwariyê de ye, yan jî li ser gora evîndara xwe ye û neçariya xwe, esareta xwe diqîre. Mînak; di strana Xalo de, dilîtiya mêran û hawarên alîkariyê hene. Were Bêmal, li ser gora evîndarê mêr hesret û neçarî tê hawarkirin).

Divê mirov vê jî bizanibe ku li ba kurdan çêkîrin û bi tevahî gotina muzîkê heye, lê di îcrakirina muzîkê ya netewe û gelên kurd bi tev dijîn (ereb, tirk û faris) de, kevneşopiya tevahî gotinê nîn e. Kesek dibêje yên din jî guhdarî dikin. Der barê vê mijarê de dîtînen du muzîknasan wiha ne: “şêwaza teganiya hevpar, li deverên Anatoliyê yên din tune. Bala mirova dikişîne ku belkî ji ber hikariya ol an jî ya şerîetê gundiyan Anatoliyê zewqa ji pev re tegehanîkirinê nestendiye. Adeta bi yek dengî ku çend kes bi hev re bêjin jî nîn e” (Adnan Saygun; Rize, Artvin ve Kars Havalisi türkû, saz ve oyunlari hakkında bazi malumat; İst. Nümune Matbaası 1937 s.21).

“Ez tu car fêr nebûm ku du an çend kes bi hev re stranên dibêjin an nabêjin û di çi rewşê de diqewime. Rastî ev e ku tu car min bi gelê gundekî jî nikaribû bi tevahî stran bidana gotin. Di goşeyê vê dinyayê de hewce hebe ku insan bifikirin bi tevahî stran gotin nediyar e, divê ku mirov bi ihtiyatekî li vê hukmê binêre. Tişteki eceb e ku tirk tu car bi tevahî strana nabêjin, bi yek dengî be jî, qet koro ava nekirine (Türkiyede Halk Türküleri Derlemeleri. Wergêr S.BİRGİ Flarmoni 13 -16.12.1949- sayfa 10).

Lê em dikarin bi tesbîten pir lêkolînerên hêja yên muzîkê îcra kirina bi tevahîstran gotina kurdan heta bi awayê polifonîk û antîfonya îfade bikin: “Kevneşopiya bi tevahî strangotîne ku bi usûlekê ve girêdayî ye, di Anatoliyê de, li bajarê me yê Sêrtê heye. Li navenda bajêr û 7 gundên derûdor tirkî, erebî, û kurdî tê axaftin tirk; ereb,

kurd di nav hev de dijîn. Li vî bajarê me navê leyîstinê govend e. Go, wateya strangotinê, vend jî wateya bitevahî, bihevve ye. (Halil Bedii Yönetken “ Siirt Folkloru” Müzik görüşleri, Aralık, 1952.).

Halil Bedii Yönetken û Muzafer Sarisozen jî bo berhevkirin û lêgerînên qadî diçin Dêrsimê. Li navçeya Pertekê rastî îcrakirina pêncmenda peralel tên. Çavdêriyên xwe wiha diyar dikin: “Gotina van stranên a bi du dengî ne adetî bû, jixweberî digotin. Wan li ser hev, bi yek dengî lê dixist û digotin. Di dawiyê de hatine coşê û ji xwe çûn. Ancax bi dû wê re dest bi dudengiyê kirin û pê de çûn (Ülkü Yeni serî, Sayi:77, birinci kanuna 1964).

Peywirdarê Zanîngeha Hunera Estetik û Muzîkê ya Tokyoyê Ayako Tatsûmûra, di sala 1975'an de, di lêkolîna xweya qadî de ya ligel koma “Lekolîna Zanistî ya Duyemîn Etnomuzîkolojî li İnan û Tirkîyeyê” kiriyê, dibêje, “Heta dawîya lêkolînê pê de, em li gundên ezerî, ermenî, asûrî û kurdan ên li derdorê bajarê Rizaiyê geriyên. Ji bilî gundê kurdan li hemû gundan cureyê muzîka reqsê ya ku dişibe hev heye ku bi dahol û zirneyê tê lêxistin. Lê tenê kurd xwedî cureyê muzîkê bûn ku şeweya antîfonal pêk dihat û taybetiyên wê cudatir bûn.”

Dieter Christensen jî, di analîza lêkolîna xwe ya qadî de, mînakên stranên antîfonal ên aîdî çar herêmên cihê yê muzîka kurdî tesbît kirine. Ya din jî di strana reqskî de, tespît kiriyê ku komeke mêran a biçûk û komeke jin heman hevoka muzîkê bi perdeyên (dereceyên) cihê distrên (Kürt Müziği, Weşanên Avesta, 1996, rûpel 37). Em bi van tesbîtan û lêkolînên dîrokî dikarin bi rihefî bibêjin digel çewsandin û talanê, muzîka kurdî li herêma xwe muzîka herî pêşketî û dibistanî ye. Ev rastiyek e ku gava yek tenê serê xwe awazeyekî bibêje, yê der û dora wî tev li wî dibin. Ev yek ne ji bêrûmetiyê tê lê bûye adet. Mînak; gava dengbêj kilamekê distrên û bêhna xwe distîne, cîvata dorê dest pê dike û tew dike û bi vî yekê strana dengbêj rewan dibe.

**1) Newayên bipîvane:** Ev newayên bipîvane (tempo qûsto) ango ev newa (melodî) xwedî

avaniya hin rîtm û usûlan in. Hemû newayên kar û reqsê di vir de ne. Ev newayên devokê mêran in. Ji pîvaneyên du çarmendan heta bîst û heşt heştmandan pîvaneyên cuda ne. Qalibên usûlê pir diyar in. Ji dîsgotin (nakarat) û navberên biçûk hatine honandin. Di muzîka olî de newayên zikir û semah jî di vî kategoriyê de ne.

**2) Newayên bîpîvane:** Newayên bîpîvane (rîtm serbest-serhewa) di muzîka kurdî de cihekî girîng digirin. Ji pênc -şeş sedsalên dawiyê bi vir ve jî devê dengbêjan neketiye û dema behsa muzîka kurdî dibe ew tîna mirov. Her çend bi devê jinan tê gotin jî, yê îcra dikin bi piranî mîr in (her wekî Bavê Fexro, Lawikê Metînî, Siwaro, Mala Min, Teyar û Derwêş, Derwêşê Evdî û em dikarin bi sedan bijimêrin. Naveroka kilamê bi devê jinan e, lê bi piranî mîr dibêjin. Di nav de pêlawazeke veşarî heye.

Muzîkeke wisan e ku ger (seyir), biryar (qerar) û navberên wê hene. Îcrakarê wê dikare hest û derûniya xwe tê de bihone. Mirov nikare van newayan notayî bike. Wekî bê notakirin hestên wê dimirin. Li Rojava nêzî van Parlando Rûbarto yan jî Parlando Reçîtatîfe hene, lê tam li wan jî nayê. Lê wek terz ew bi Syllabîc-Melîsmatik-Hîbrîd li hev tîna. Di îcraya wan de trîyole pir in. Trîllerên wê yê xweser hene. Kirpdanên senkop ên newekhev in (di rîtmên serbest de dengê mîna dengê loqîniya simên hespan) pir caran derdikevin. Xwedî terzekî bi vî awayî ne.

**3) Newayên xwedî rîtm zêmari:** Jê re ku xwedî rîtm sist jî tê gotin digel rîtm bipergal û giraniya wan, mîna tempo qûstoya ku newaya bipîvane em nikarin şrove bikin. Her çî qas avaniya newayên wê mîna newayên bîpîvane ne jî, bela ku kirpdanên pêlewaz ên bipergal di nav de hene, em nikarin wek bîpîvaneyan jî binirxînin. Rîtmê vî newayê zêmari û lorîk in. Dema dayik dergûş an jî hêlekanê dihejîne lorîkan dibêje. Di vî demê de pêlawaz û rîtmê xwezayî di îcraya peyvên de xuya dibe û rê li ber newayê dixê. Mînak, li herêma Qerecdaxê newaya Xelo Lorî, dîsa li Amedê, dema Delîlo bi dahol û zirneyê lê dixê, gava zirne serhewayekê împrovîze lê dide, dahol bipergal li gor kirpdana reqsê lê dide (di sala 1980'î de min jî van



newayan yek bi tembûrê îcra kir û pêşkêşî girseyê kir. Ji bo gel ne biyanî bû, baş cihê xwe girt. Piştî min, muzîsyenên herêmê bi kar anîn û qasetên wê yê enstrûmantal bi hezaran hatin firotin.) Heman tişt di "Giranî"ya Rihayê de û ew di "Şêrwanî"ya li herêma Xerzan heye.

### *Avaniya ger û newayê*

Her çi qas avaniya van newayan li dijî hev nebe jî, ne mîna hev in. Wek ku şalê li Rihayê û yê li Hekariyê yek navî ye, lê taybetiyên wan ji hev cuda ne. Dema newa jî çêdibin û pêk tînin, hîkariya mercên erdnîgarî, avhewa, avaniya civakî, têkiliyên aborî lê dibin, dibin sedemên çêbûna kirpandan, rîtm û gerên cuda. Di pêkhatina newayan de, em dikarin mînakên herî hêsan jî û yê herî giran ku hostatiyê bixwaze jî di avaniya newaya muzîka kurdî de bibînin. Yê herî diyar ev in:

a) Newa, bi piranî xwe dispêrin taybetiyên rîtmîk ên ku ji dengên binavber pêk hatine ku li nik hev û biçûk in. Ji ku dest pê dikin bila bikin, di finalê de ji dumendên jêr û jor nerm dedikevin û li wir biryarê digirin. Di nav pîvaneyê de rawest (es) yan li serî an jî di dawiyê pîvaneyê de cih digirin. Di navenda pîvaneyê de rawest bi stekato tînin pê.

b) Newa ji dengê dest pê dike lê bi giştî newa bi dengê qerarê diqedin. Hin awaze hene di dereceya yekem a cins a jêr de diqedin (mînak, Memir Memir, Leylo Leylo Ziravê).

c) Awaze (newa) di dereceya pêncemîn, şeşemîn, heftemîn de, di pêncmenda beşa yekem yan jî di dengê biryarê de diqede. Heta vedigere dengê biryarê ya beşa duyem, heman motîf, her car ji dereceyê jêr dest bi dubarekirinê dike, ber bi finalê bi nermayî jî dengê ku di dereceya duyemîn de ye digihîje dengê biryarê. Ji van awazayan re dibêjin newayên nêrdewanî jî. Mînak; Ey Dilberê, Lo Şivano.

d) Ji dereceya duyem a dengê biryarê dest pê dike, di nav dengê pêncmend de digere, li ser dengê dereceya sêyemîn kirpandanê pêk tîne û derbasî dereceya duyem dibe û di biryarê de dawî lê dibe. Mînak; Baranê Gujeguje.

e) Ji oktava dengê biryarê dest pê dike, di dereceya yazdeh an dozdehan de digere, taybetiyên meqamê yekgirtî tetbîq dike, bi gera daketîni digihîje dengê biryarê. Mînak; Xanima min bermaliya min. Meqamê wê newa kurdî ye.

f) Bi çarmenda dengê bingeh dest pê dike, li ser dereceya pêncmend hinekî radiweste û digere, piştê ber bi dengê bingeh wek daketîni dadikeve û li wir biryarê digere. Mînak; Ey wax li min ev çi dinya ye.

g) Bi dengê bingeh dest pê dike, li ser dengên nikhev bi derketîni dişopîne, piştê re li ser awazeya çarmend an pêncmend beşa yekem diqedîne. Piştê re bi daketîni tî ser biryara xwe. Mînak; Şukrayê.

h) Ji dereceya şeşemîn a deng dest pê dike û dadikeve dereceya heştamîn, ji nişkê ve dadikeve dengê deh an yazdemîn, bi dorê tî dereceya dengê pencemîn û piştî beşa yekem diqedîne, bi gereke daketîni tî ser dengê biryarê û diqede. Mînak; Ez kevok im.

j) Ji dereceya heftemîn a dengê biryarê an jî ya pencmendê deng digere, ji dereceya nehemîn dadikeve ya dehemîn, ji wir tî heştamendê beşa xwe ya yekem tamam dike û beşa duyem ji heştamendê dest pê dike, di ya pencemîn de biryareke demî nişan dide, ji wir newaya nêrdewanî ve tî ser dengê biryarê. Mînak; Şewitîm ez.

k) Ji dengê biryarê yê dereceya heftemîn dest pê dikê, bi nermayî piştî ku di dengê biryarê de hevoka yekem diqede, beşa duyem ji pencmendê dest pê dike, motîfên awazeya nêrdewanî nişan dide û li ser biryarê xwe disekine. Mînak; Desmala min.

l) Hin awaze li jora dengê biryarê ya şeşmend an jî heftmendê dest pê dike lê wexta vê dike hesteke wek sêmend an dumendeke jêr e dide, tî ser dengê biryarê û ji wir ji nişkê ve derbasî sêmend, çarmend an jî pêncmenda jor dibe û gera xwe diqedîne, tî ser dengê biryarê. Mînak; Şerîna min, Zozan zozan.

m) Hin awaze jî gera li ser motîfên çarmend an jî sêmend pêk hatiye, dikin û li biryarê radiwestin. Mînak; Bingol şewitî.

### c) *Avaniya Rîtmê*

Wekî me berê jî diyar kiribû, avaniya rîtmîk a muzîka kurdî li ser nîzama kar- reqs û leşkerî saz dibe. Her wiha ya hemû gelên cihanê jî wisan e. Mercên aborî, civakî, erdnîgarî yekser hikariyê li ser çêbûna avaniya rîtmê ya gelan dike.

Ayako Tatsûmûra li ser vê mijarê wiha dibêje: “Di serî de, di her çandê de rîtmên xwezayî ku di bin tesîra guherînên demsalî de dimînin, hene. Aşkera ye ku rîtma beriyê û rîtma herêma tropîkal a bibaran an jî herêma Japonyayê ya ku xwedî îqlîma nerm a ku çar demsal lê çêdibin, pir jî hev cudatir in. A duyemîn, di her çandê de rîtma civakî heye. A sêyemîn jî, hesta ji dengên rêzê nîzama muzîkê, ji hêmanên dîtarî afirandina berhemên hunerî ye. Ev hest jî bi esasa rîtmên xwezayî û civakî bi pêş ve çûye û bi hesta rîtma hunerî bin av dibe. Lê carekê gihîştibe hesta rîtma hunerî, ku rîtma xwezayî û civakî biguhere jî êdî ev hest bi hêsanî naguhere. Dema behsa karakterê muzîkê yê gel dibe, tiştê ku tê ferzkirin bi piranî aliyê muzîkê yê ku nayê guhartin e. Bi rastî jî hin gelên ku zimanê xwe yê xwerû winda kirine (li Afganistanê gelê Hazar) hene ku gengaz e ku mirov bi rihetî bibêje karakterê muzîka xwe hîn jî diparêzin.”

Heman muzîkologê ku li ser tîkiliya mirovan û muzîkê disekine dibêje: “Rîtm jî, ji merasimên ku li hember xwezayê coşa sembola qazancên mirovên ku xwe pêşxistî, daxwaza xweefûkirina ku li hember hêzên pîroz aşkera dike, derketiye. Eleqeya li hawirdora nêçîreke bi dijwarî bi dest xistine merasimên pîrozkirinê bi reqsê re zehf aşkera ye. Hesta rîtmê ya li ser mirovan, em dikarin bi vî awayî terîf bikin; hazek e ku ji dubarekirin an jî sîmetriya lîxistinekê, xirecîrekê, qîrînekê ve derdikeve. Bêguman rîtm, peyama ku em ji xwezayê digrin a herî qetî ye. Sîmetrî, dubare, dubareya nîzamî, dengvedan... digel belawelayîbûna berçavan, her tişt bi pîvane ye. Şev û roj, demsal, jihevzêdebûn, ajdayîn, kulîlkevîkirin, çilmîsîn, jiyan û mirin... tev jî li hember disiplîneke qetî stûxwar in. Mirov, tê gihîştine ku xweza û mekanîzma wan bi hawirdor bi rîtman dorpêçkirî ye.

Mahiye Morgül, di meqaleya xwe de (Cumhuriyet Bilim Teknik 17 Rêbendan 2004, hej. 878) de wiha dibêje: “Di gerdûnê de her tişt di nav liv û lebatê de ye. Cihê ku rîtm lê radiweste û xera dibe, jiyan bi dawî dibe. Di latînî de rîtm wateya herikê ye. Rawestina lebatê, dawîbûna herikê rawestina rîtmê ye. Berdewamiya gerdûnê, girêdayî dubarebûna lebata rîtmîk e. Rîtim, vegotina lebatê ya bi hejmaran e, zimanekî hejmarî ye. Bi awayekî din, lebata di gerdûnê de bi hejmaran diyar dibe. Wek lebata Rojê, dubarebûna demsalan, şev û roj. Lebata Rojê ya rîtmîk daîrewî rîtma bingehîn e û em di nav rêzeke giloka rîtman de ku girêdayî vê rîtmê derketine holê dijîn. Em bi girêdayîna vê rîtma gilokan hatine dinyayê. Berdewama van rîtmên gerdûnê em di bedena xwe û avaniya îdraqa xwe de dibînin.”

Dema em bi awayê dîrokî lê dikolin, rîtma ku hêmaneke bingeha muzîkê ye; gilokeke deng e, di encama kirpdana kurt, dirêj, qels û xurt de derdikeve holê. Di gerdûna deng de bihîstina kirpdanên rîmên xwezayî gengaz e. Gilokeke deng a ku ava ji rex şîpekî dişirike dengêkî derdixe rîtmek e. Dengê ku mirov di rehma diye xwe de seh dike, dengê lêdana dilê dayîkê ye. Diyardeya ku bi qasî dîroka mirovahiyê dûvedirêj e, bi hezaran salan e mirov pê dizanin. Di serî de mirovan bêpergal û beredayî dikir, lê di nav demê de mirovan bipergal û bi dîsîplîn kiriye û bûye karekî estetîk ku reqs pê rîtmeke cuda tîne pê. Di dema kar de dengên ji qirika mirov derdikevin wek ih, iha, hiha bi kirpdanên kurt û dirêj û lêbarkirinên qels û xurt bûne bingeha awazeyan. Ev bûne qalib û figurên reqsan ên cuda çêbûne û bi cureyên kar, tesîra îqlîm û erdnîgariyê cudatîyên xweser derxistine rastê.

Rîtm di muzîka kurdî de jî, di tabîeta xwe de bi pêş ve çûye. Dema serê sibehê jina kurd di meşkê de dew dikile qelsbûn an jî xurtbûna lêdanê hestên rîtmên cuda pêk tîne. Bi vê jî, şideta tempoyê pêk hatiye. Her wiha dema paleyan das bi kar aniye li gor hêza xwe rîtma xwe girtiye. Hikariyên civakî pirtirîn li ser muzîk û rîtmê bandora xwe çêdike. Ji ber vê yekê mirov dikare rîtma dînamîk di nav qalib û pîvanyên

cuda de bibîne. Ev yek di muzîka kurdî de jî heye. Hin qalib û pîvanyên di muzîka kurdî de hene, bi salan ligel navê terîqatên olî hatine senifandin. Dema dewrêş ji bo zikir li elbaneyê dixin bi qalibê ebaneyê re dibêjin qadirî (usûlên wê 2/4, 4/4), rûfaî (10/8 û 6/4) û bi vî navî pêk tînin. Qabiliyeta peyamê jî bi rîtmê re heye. Mînak sê terzê lêxistina daholê hene.

1) Defa şahiyê (dîlanê): Ji bo kêf û zewqê ye û di dawet û dîlanan de ji bo govend û reqsê tê lêxistin.

2) Defa berbangê: Berê dengbêjên êl û eşîretan hebûn, yek jî qereçî hebûn ku ji wan re digotin çîngene, mitrib, gewende, wan di çadirên xwe de li dahol û zirneyê dixistin lê rîtmên wan tu car mîna yên şahiya nedibûn. Mebesta wê lêdanê ev bû ku kesên herin kar şiyar bikin.

3) Defa hawarê: Di dema şer û hewarê de lê didan û peyama rîtma wê jî xweser bû. Em di destanên kurdî de rastî şopa vê defê dibin.

Li rojhilata navîn, Asya, Qafqasya û li pir deverên din qalibên rîtmên aidî usûlên 6/8'an tînin bikaranîn. Ev usûl di muzîka kurdan de jî pir tê bikaranîn. Lê hem li gor usûlê gelên din û di nav xwe de jî cudabûn hene.

1) Xwedî qalibê muzîka dansê ye ku li Amed û der û dora Amedê heye û xwedî qalibên rîtmêke bi pênc lêdanên ku ji nixê cuda pêk tînin. Lêdanên qaliba jî dum-te-tek-dum-teek pêk tînin.

2) Xwedî qalibekî yekgirtî ye ku hem di dema reqsê hem dema guhdariyê de bi kar tînin û ji sê demiyên pêk tînin. Lêdanên wê dum-te-ke-te-ke ne.

3) Bi piranî di awazeyên hesretê û jihevqetî de heye, (Porê xerîba min sor e, Oy li min xerîbê, Tebarek ha tebarek). Qalibên wê wiha ne: Dum-teek-duum-tek. Di vî qalibî de dema pêşîn qels e, ya duyemîn xurt e, dema sêyemîn xurt e, ya çaremîn qels e. Her wekî me berê jî got pîvane û usûl ne yek in. Ji ber vê yekê ku hin usûl bi nixê cuda bin jî, dibe ku di nav qalibên ku qedemeyên ji bin xwe pêk bûne de bîr sehkirin. Mînak; Gulgulî ha gulgulî 18/8 pîvane e. Lê ji aliyê usûlê ve tenê qalibê 6/8 dide xuyakirin. Di dawiyê de naxwazim bêyî vê bi dawî bikim:

Dem ku mirov welweleyên qalibê rîtmê di avaniya muzîka dîrokî ya kurdên ku li çar parçeyan dijîn de bi kar tîne, dibîne ku tev jî bi heman qaliban û li ser heman kokê gihîştine. Ji ber vê yekê jî em mafdar in bibêjin ku "Her gul li axa xwe û li ser koka xwe bedew e." Çawa ku lale û qerenfil tu car nabin gul, wisan jî slovrock jî nikarin bibin qalibê 6/8'an ê muzîka kurdî. An jî rîtmên cografyayeke din ji bo muzîka kurdî zêde ne girîng û watedar in.

### Çavkanî:

- 1- Safiyuddin Urmiyevi-Kitabul Edvar, İstanbul Nuri Osmaniyye 3653
- 2- Abdulbaki dede ef. Berhema bi navê Tetkik u tahkik İstanbul Süleymaniye Kütüphanesi
- 3- Zeynul Elhan Süleymaniye Kütüphanesi.
- 4- Müzik Tarihi, Ahmet SAY.
- 5- Yalçın Tura, Makam Hususiyetleri.
- 6- Ali UÇAN, Müzik ve İnsan.
- 7- Hızır İbn Abdullah -Edvar- Topkapı Sarayı
- 8- Farabi -Kitabul Musikül Kebir- behsên 1-2-3' wergêr Farmer.
- 9- Abdul kadir Meragi -Şerhul EDVAR-
- 10- Küçük Asya Sazları-1780- Dela Bourde Muzeya Etnografya, Frensa
- 11- Safiyuddin Urmiyevi'nin Ses Sistemi Mubarek Cedveli, British Muze, Londra
- 12- Tahkikul Edvar ul Kurdi-Muhamed Sdr. Kahire
- 13- Maqamat ul Arabi- Maqam world- Mısır
- 14- Kısa Müzik Tarihi - Kurt sachs
- 15- Ziryap le marle- Le musicien amateur. Cordoba
- 16- İhsan Nuri, Nijadî Kurd
- 17- Ansiklopediya Meydan Laurousse
- 18- Seyahatname, Evliya Çelebi
- 19- Edssa, The Blessed city.By.J.B.Segal Oxford. 1970
- 20- Kovara Dar'ul elhan, Evkaf 1927.
- 21-Musique folka, C.Bretny.1978

**Nişê:** Bi zanebûn min hin çavkanî di nav nivîsarê de diyar kirin.

# Komara Mehabadê

Rûpelên dîrokê ji bûyerên balkêş û serpêhatiyên sosret tîjî dibe. Mîna ketin û rabûnê, serkeftin û têkçûnê, mayîn û windabûna netewe û dugelan. Dîsa mîna tekoşîna çînên serdest û bindest û rizgarîxwaz û dagirkeran. Gelê kurd neteweyeke kevnar, bastan û dîrokî ye. Dîsa xwedî mêjûyêke şanaz û pênu-seke zêrîn e. Kurd di Rojhilata Navîn û Mezopotamyayê de, xwedan pîşe, wêje, çand, huner û şarîstaniyêke dewlemend, mînakdêr û bastan in. Li gor dîroknasên bêalî, gelê kurd pênc hezar sal berî zayînê (BZ) li Zagros û Mezopotamyayê nişteciyên herî bingehîn bûne. Şeş sed sal BZ. dugela Medan li Ektebanayê hatiye damezirandin.

Rûpelên dîroka kurdan jî bi têkoşîn û serhildanan dixemile û bi komkujî û xwinê jî, dime-wile. Di van 150 salên dawî de, gelek raperînên mezin û berxwedanên bêhempa pêk hatine. Dîsa gelek serhildêrên çalak û lehengên hêja jî, peywira xwe ya dîrokî bi cih anîne. Wek mînak Komara Mehabadê û rêberê wê. Komar di sala 1946'an de hatiya damezirandin. Ev komar, encama berheviya hêrs û hestên kurdan ên di navbera sed salan de ye. Loma Bedirxan Begê di

sala 1846'an de serhildan pêk anîbû. Komara Mehabadê, hem yekemîn û hem jî yekane ye. Lê mixabin ev komara ezîz bes çend mehan karî bijî û xwe li piyan bigire.

## *Bajarê Mehabadê*

Mehabad bajarekî dîrokî ye li rojhilatê Kurdistanê. Ji serdema Medan ta roja îro ew cihekî kurdnişîn e. Navê Mehabadê yê pîşîn Sablax bûye. Paşê, di dema Şah Riza Xan de, bû Mehabad. Çawan ku navê Urmîyeyê jî bû Rizaiye. Mehabad bi hola Çarçira û bi gumbeta Deryazê navdar e. Peykerên çar şêran di nava holê de çikandî ne. Mehabad bajarekî asêgeh, zivistanî û serma ye. Nivîskar James Bayil Kayniz, dinivîse û dibêje ku Di serdema sefewiyan

de, perestgeha bi navê “Der-yaz” hatiye hilweşandin...

## *Rewşa cîhanê*

Destpêka damezirandina Komarê di dema şerê cîhanê duymîn de bû. Gelek welat ji hêla dagirkeran ve hatin dagirkirin û gelek xalên girîng jî hatin vegirtin. Bêjimar mirov bi çekên kîmyewî bi awayekî komkujî hatin kuştin. Bes sed hezar kesî di bûyera Hîroşîmayê de, jiyana xwe ji dest da. Yek ji welatên dagirkirî jî, dugela Îranê bû. Nivîskar Willîam Agleton dibêje, ku Sovyet û îngilîzan di Gelawêja (tebaxa) 1941'ê de, beşek ji axa Îranê dagir kir û vegirt. Kirmanşan bû navenda bandora îngilîzan û Azerbeycan jî, ket bin destên Sovyetê.



Ji îlankirina Komara Kurdî ya Mehabadê, Rêbendan 22, 1946

Bi vî awayî rewşa Îranê çî qas çû jar û qelstir dibû. Hêz û desthilatdariya Şah heman heman nemabû. Di vê navberê de rewşa kurdan jî, biriqî û geş bûbû. Ta hinek ji kurdên ku ji ber Şahê xwînrej koçber bûbûn ji vê fersendê sûdwer bûn û vege-riyan welatê xwe. Têkiliyên kurdan û Sovyetê jî çî qas diçû xurtir û gerimtir dibû. Ta ku di dawiya sala 1941'ê de rûsan bi fermî şandeke kurd vexwendin bajarê Bakoyê, paytextê Azerbeycana Sovyetê. Ev delegasyon ji 30 kurdên navdar pêk dihat, Qazî Muhemed jî, di nav wê şandeyê de bû. Ev şande (heyet) bi gelek soz û hêvîdariyan vege-riyan. Mîna serbestiya ziman, çand, huner û hwd yên kurdî. Di sala 1939'an


de li Silêmaniyê komela Hêvî, di sala 1942 de Komela Jiyaneweyî Kurd û di sala 1945'an de Partî Demokratê Kurdistan hatin avakirin. Di rezbera sala 1945'an de Mele Mistefa Barzanî tevî hemû hevriyên xwe û gelek kesên navdar mîna Faîq Bêkes û Îbrahîm Ehmed, ji bo piştewaniya şoreşê derbasî Mehabadê bûn. Merc û rewş êdî dest dida ku amadekirina Komarê bête kirin.

### *Qazî Mihemed*

Qazî Muhemed ji malbateke dadmend, kurê Qazî Elî û neviyê Qazî Qasim e. Xwendina xwe ya bingehîn di dibistana olî (medresê) de pêk anîbû. Lê xwendina dadî li nik bavê xwe fêr bûbû. Di pişya qazîtiyê de jî, ew gerîndeyê saziy ewqafa Mehabadê bû. Qazî ne tenê zan-yarekî oldar bû, lê belê ew rewşenbî-rekî pêşkeftî û ronakbîrekî pêşerû bû. Dîsa ew di warê ramiyari, aborî û civakî de, xwedî raman û dîtineke bilind û berfireh bû. Di nav gel de ew xwedî rûmet û xwedî rêz bû. Qazî bi piraniyeke bilind dihat hezkirin û teq-dîrkin. Wî digel kurdî, farisî, erebî,

azerîkî, rûsî û îngîlîzî jî gelek baş dizanibû.

Qazî di sala 1944'an de bû endamê komela Jiyaneweyî Kurd. Bi vî awayî xebata komelê geştir û berfirehtir bû. Komelê di sala 1944'an de alaya neteweyî bi rengê îro amade kir. Têkiliyên Sovyetê hîn çêtir bû û peywendiyên bi komelê re hîn gerimtir bûn. Di Rezbera sala 1945'an de, serokwezîrê komara Azerbeycana Sovyetê Cafer Baqirof xwest ku navê komelê biguherîne. Da ku bibe saziyeke diyar û zagonî. Di kewçêra 1945'an de, li ser banga Qazî, komelê civînek li darxist. Di vê civînde, biryar hat wergirtin û Partiya demokrat a Kurdistanê hat damezirandin. Komîteya navendî ya partiyê, ji 15 kesên navdar pêk dihat. Di 17 Berfanbara heman salê de PDK'ê li Mehabadê civîneke dîrokî li darxist. Endamên partiyê tevî girseyeke giran, çûn ser koşka dadî ya Îranê li Mehabadê. Alaya Dugela Îranê hat daxistin û alaya Kurdistanê li ser koşkê hat bilindkirin û çikandin. Pişt re Qazî Mihemed, du nûnerên partiyê şand Tewrêzê, ji bo danîna peywendiyên bi Qonsiloxaneyê Îngîlîz re. Lê bersiva îngîlîzan ne zelal bû. Paşê qazî Mihemed jî bi xwe çû Tewrêzê ji bo axaftinê, digel berpirsiyarê Sovyetê der barê rewşa şoreşê de. Êdî tu dijberî û astengî ji amadekirina danîna komarê re xuya nedikir. Li ser



Qazî Muhemed

van bingehan xebat û hewldan hatin lezandin.

Di 22'ê rêbendana sala 1946'an de, di rojêke tav, sir û serma de, li Mehabadê li qada Çarçirayê bi beşdariya cema-wereke giran ji gelê kurd, piştî tijîbûna qada navdar, Qazî Mihemed komara kurd bi şêweyekî fermî bang kir û got: "Kurd îro neteweyeke serbixweye, êdî li ser axa xwe dijîn û a niha Komara Kurd hat damezrandin." Ev teqîna volqanîkî û ev bûyera dîrokî, bi dengê 300 tifingan û bi dehol û zirneyan hat pêşwazîkirin û pîrozkirin. Êdî ew roj kurd bûn xwedî komar di dîroka mirovahiyê de.

Piştî ku şahî û pîrozbahî qediyar, di heman rojê de partiyê civîna komîteya navendî pêk anî û biryara hîlbijartina wezîran da. Li gor biryarê 13 wezîr hatin hîlbijartin. Serokwezîr Hacî Baba Şêx bû. Di 11'ê Reşemîya sala 1946'an de Qazî Mihemed bû serokê Komara

Kurd. Desteya wezîran tevî Serrokkomar di heman rojê de, bi hev re ji bo hemû maf û berjewendiyên gelê kurd sond xwarin. Gotin ku em dê bi hemû hêz û derfetên xwe ta dawîya dilopa xwîna xwe, ji gelê kurd bi dilovanî û dilsojî bixebitin. Ev rê û resm di Sermaweza 1946'an de tevî navên wezîran di rojnemeya Kurdistanê de ku weşana Partî Demokrat bû, hat weşandin. Komarê rewşa xwe ya aborî û asayîşî bi hêsanî, bes çend mehan karî ku bidomîne.

#### *Destpêka pelîşandîna komarê*

Di Tebaxa sala 1946'an de li ser daxwaza Sovyetê Qazî Mihemed çû serdana Îranê. Ev serdan ji bo hinek daxwazên mîna otonomî û yê din bûn. Îranê ji Qazî re got: "Bila yek serleşkerî di nav me de hebit. Ji Senendêjê pêk ve bila nav bibe Awîstan". Qazî bêhêvî vegehiya Kurdistanê. Di 27'ê sermaweza sala 1946'an de balyozê ame-

rikî li Tehranê daxuyaniyek da ku leşkerê Îranê li hemû axa welat belav bibe, êdî karekî rast e. Di 13'ê berfanbara 1946'an de, leşkerê Îranê Tewrêza paytextê Azerbeycana Îranê dagir kir û Azerbeycan ruxand. Di 17 berfanbarê de hêzên Îranê di bin serokatiya General Himayonî de Mehabad dagir kir û vegirt. Piştî şerekî dijwar Barzanî tevî 500 şervanan ji Mehabadê derket û berê xwe da Sovyetê

#### *Girtîna Qazî Mihemed*

Qazî Mihemed di mala xwe de, mîna girtiyar hat rawestandin. Di 21'ê berfanbara 1946'an de, Qazî Mihemed, Mihemed, Hiseyn Seyfî Qazî û Ebdulqasim Sedrî Qazî, tevî 40 karmendên komarê hatin zîndankirin. Di 9'ê rêbendana sala 1947'an de Îranê Qazî Mihemed ji bo darizandinê derxist pêşberî dadgeheke leşkerî. Qazî ev reş şermezar kir û dibêjin ku bi tabûreyekê li serê dadgerê leşkerî daye. Di rêbendana 1947'an de, Îranê 25 siyasetsedar û karmendên Komara Kurdistanê li Mehabadê xeniqandin. Dadgeha rejîma Îranê ya leşkerî biryara kuştina Qazî Mihemed, Mihemed Hisyn Seyfî Qazî û Ebdulqasim Sedrî Qazî da. Di adara 1947'an de, ev her sê leheng li Mehabadê, li Meydana Çarçirayê hatin bidardekirin û bi vî awayî sed mixabin komar jî pelîşt.



Seyfî Qazî



Muhemed Qazî



Sedrî Qazî

# Helbesteke windabûyî ya Feqiyê Teyran; “Sînem”

**Miraz Ronî**

Hewar Sînem!...

Hewareke pensesdale ye Sînem,

Ew hewara dilê Feqiyê Teyran îro jî her berdewam e û ew hewar îro hewara dilê me ye.

Ew hewar nalînek e, ku ji ber jana birîna me ya kevnare ye. Ew hewar serhildanek e, li hember bîndestîya me ya bêyom. Ev hewar şermezariyek e, li hember bextreşîya me ya dilkovane. Ev hewar axînek e, li ser bêtalî û bêmiraziya me ya dildêrane...

Welatekî ku paymalkirî be, keleporeke ku talankirî be, ma dê li wir nexşe bi çi rengî be?

Ma hewce ye ku ez bi nav û nîşan kim pismamno!

Ezîzên min, ev welatê ku ez qala wî dikim Kurdistan e.

Dîrok karê dîrokzanan e. Lê em hemû şahidê parçeyek ji dîroka talan û tar û markirinên li ser erda kurdan in. Heta roja îro gelek nîrx û rûmetên me yê madî û manewî li ber talanan çûne. Lê ya heyf ev e ku îro roj jî hê me wekî kurd nekariye pêşî li windabûn û talankirina nîrxên xwe bigirin.

Heta îro her Xwedê dizane ka çend berhem û belgeyên çand û dîroka me hatine windakirin û paymalkirin. Ên ku mane jî ka bi çendî celeb ecêban gihîştine roja me ya îro, ew jî çîrokeke cihê ye.

Ez ê niha kurteçîroka şîra –ku di heman demê de stran e jî- Feqiyê Teyran “Sînem” bibêjim.

Wekî ku tê zanîn Feqiyê Teyran yek ji çend şairên sereke yê edebiyata kurdî ya klasîk e. Feqî ev nêzikî 500 salan e ku koça xwe ji vî dinê bar kiriye. Ev şîra wî geh bi destên hin xwen-

dayan nivîskî geh jî li ser zimanê hin dengbêjan devkî, dest ji dest û dev ji dev girtiye da ku heta gihîştîye destê me.

Ji aliyê gelek kesan ve li ser berhemên nivîskî yê edebiyata kurdî û her wisan jî li ser berhemên Feqiyê Teyran lêkolîn û lêgerîn hatine kirin. Lê di gel vî yekê jî bi qasî ku ez dizanim hê heta roja îro ev berhema Feqî nehatiye tesbîtkirin û li tu deverê nehatiye çapkirin.

Ev berhem ango ev strana ku ji aliyê hin dengbêjên herêmî yê der û dorên Bedlîs û Hîzanê ve heta panzdeh, bîst sal berê niha jî dihate strîn, îro hema bigir bi temamî hatiye jîbîrkirin. Û jî ber ku bi qasî ku ez jê agahdar im heta niha nehatiye çapkirin û tomarkirin jî pir kêmkî kes pê dizanin.

Min ev berhem ji keşkûla (defterok) Cemal Efendiyê Pînkanişî girt. Pînkanişî gundekî li ser Tetwana Bedlîsê ye. Rojekê ez li Stenbolê, bûm mêvanê Feqî Mehemed (Mehemed Avcî) ku kurê Cemal Efendî ye. Di nav sohbetê de, me qala berhemên klasîk yê edebiyata kurdî kirin. Feqî Mehemed rabû ji pişt dolaban defterokek derxist. Ji rewşa defterokê diyar dibû ku çendî ecêb hatibûn serê wê defterokê. Feqî Mehemed ji min re qal kir ku ev keşkûla bavê wî ye û 50-60 sal berê niha jî aliyê bavê wî ve hatiye nivîsîn. Di keşkûlê de ev şîra Feqî û gelek şîr û nivîsarên din ên cur be cur hebûn. Ji nav wan ên ku bala min kişandin Sînema Feqiyê Teyran û şîreke Mîr Mehemedê Hekarî bû. Ji ber ku ev her du berhem heta îro li tu deverê nehatibûn çapkirin.

Li gorî gotinên Feqî Mehemed gelek kitêb û destxet li ba bavê wî hebûne lê ji ber cerd û talanên dewletê anca ev di destan de maye.

Diyar bû ku wê keşkûlê gelek cerd û talan dîtibûn û xwendina wê jî gelek dijwar bû. Keşkûl bi herfên erebî hatibû nivîsîn û destxet bû. Ji ber ku hem destxet ne bi rêk û pêk bû û hem jî gelek kevn bûbû xwendina wê pir zehmet bû. Min nîşanî çend melayan da nekarîn baş bipîşkêvin. Dû re Seydayê Mele Îsmet ji heq derket.

Me ev berhema Feqiyê Teyran ji destxeta Cemal Efendî ya ku bi herfên erebî hatibû nivîsîn, piştî çend zehmetiyan paşê bi alîkariya Mele Îsmet Kiliçarslan bo herfên latîni tîpguhêziya wê kir.

Niha ez vê berhema hêja bi nivîskî pêşkêşê gelê kurd dikim. Wisan dizanim ku dê ev berhem di nav klasîkên me yên sereke de cihê xwe bigire. Hêvîdar im ku di demeke kurt de dê bi awayekî kilamkî jî pêşkêşê gelê me bibe.

## SÎNEM

*Hewar Sînem*

*Ew qesrika serê xanî*

*Derî ji zêr î mifte ji mircan î*

*Ez ê terka çav û biriyên belek nadim*

*Heta Esrafîl nefxa sûrê ket,*

*Li min rabit roja heşr û mîzanê*

*Lewra tu şêx î, ez mirîdê te me*

*Hewar Sînem*

*Ez çiqas dînya hebû geriyabûm*

*Kesî negot Sînem nexweş e*

*Ez ê çûme hicra feqiyên dinivîsîn kêl û fers e*

*Ez ê tembeh li mişk û maran bikem,*

*Bila xunavê tenikî carî biken, li ser ebleqê reş e*

*Hewar Sînem*

*Tu rabe ev çi dem e?*

*Te bejn ji kelha Tîkrîtê*

*Te sing ji qumaşê Ecem e*

*Li min hatî mehka Remezanê*

*Ez ê fitra serê te me*

*Hewar Sînem*

*Ez ê Hîzanê dihebînim*

*Zêde taxa qenterê*

*Van katiban hezar pînsed dane defterê*

*Miraz hatibû hasilbûnê*

*Mîr em şandine seferê*

*Hewar Sînem*

*Ez ê Hîzanê dihebînim*

*Salê du car bihar e*

*Te rû eyne ye, şems û qemer tê de diyar e*

*Ez ê herim Sînem bibînim*

*Dîtina min û Sînem ev car e*

*Hewar Sînem*

*Ez ê Hîzanê dihebînim*

*Zêde taxa Seraşan*

*Gul di baxan de kemilîn,*

*Pala xwe dan xaşxaşan*

*Miraz hatibû hasilbûnê*

*Kul kete nav oldaşan*

*Hewar Sînem*

*Min Sînem dibû şeva erefatê*

*Te gulî şuştine ji ava heyatê*

*Dê biçim Sînem bibînim*

*Sînem nexweş e ber wefatê*

*Sînem hîva nûrîn e*

*Şewqê daye umetê*

*Gerden şûşa hişîn e,*

*Nuqte nuqte xal ketê*

*Kesê Sînem bibînim,*

*Bêşik diçe cenetê*

*Min Sînem dibû li eywana mîr ve*

*Te çavek roj e yek jî hîv e*

*Te ez kuştim*

*Xûna min maye bi zendê spî ve*

*Hewar Sînem*

*Xweş govend e li eywanê*

*Dînya li min xewxa ye*

*Ku vî best î hewranê*

*Çavreş li min wînda ye*

*Xwedê bide îmanê*

*Hewar Sînem*

*Dar û devî li min bûne gurî*

*Ji kulan û derdan*

*Hêstirên çavên min evdalê Xwedê digilgilî*

*Me tu xizmet ji padîşahê mezin re nekir*

*Çawa şah û xunkar mift digirî*

*Hewar Sînem*

*Şah û padîşah û xunkar siwar in*

*Her sê siwarê cengê ne*

*Pehlîvan li meydanê diçin tene*

*Şer çû sewta Xwedê<sup>(\*)</sup>*

*Çavên reş li ber sulhê ne*

<sup>(\*)</sup> Şer çû sota Xwedê



# Bernameya Beşa Ziman

Beşa Zimên, yek ji beşên destpêkê ya Enstîtuyê ye û piştî kongreya pêşîn a Enstîtuyê ligel beşên dirok û wêjeyê hatiye avakirin. Serokê wê yê pêşîn jî nêmir Feqî Huseyn Sagnîç e. Enstîtuyê, di kongreya xwe 7'an de hem di rêzîknameya xwe de û hem jî di şêklê rêveberiya xwe de guhartin pêk anîn. Li gor vê rewşa nû, beşa zimên biryar girt ku xwe careke din rêxistî bike, bernameya xwe çêke û azîna xebatê ji bo xwe diyar bike.

## *Mebest û Armancên Beşa Zimên*

Di rêzîknameya Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê de mebest û armancên Beşa Zimên wiha hatine diyarkirin:

“Ev beş, ku pêşvebirin, standardkirin û hêvişandina zimanê kurdî ji xwe re dike armanc, ji bo amadekirina meteryalên pêwîst ên mîna rêzîman, rêbera rastnivîsê û kerese-yên hînkirina zimên, kesên zimanzan, yên ku der barê zimên de xebatan dikin, di vî warî de bi pêş dikevin û hêvî didin mirov ku dê sibê roj bibine pispor, di binyata xwe de li hev dicivîne. Beş, di nav xwe de ji kesên pispor, xwedî civarî û akademîsyenan Kargêriya Beşê pêk tîne û xebatên xwe jî di bin kontrola vê kargêriyê de berdewam dike. Kargêriya Beşê, ji bo ku di warê ferhengnasyê de xebatên pêwîst bike û ji bo amadekirina ferhengên têvel ku Enstîtu hewcedarî bi wan dibîne, li gor pêdiviyê dikare komîsyonan ava bike.”

Beşa Zimên, li gor arman-

cên ku di rêzîknameya Enstîtuyê de hatine diyarkirin, armancên xwe di dozdeh xalan de destnîşankirin. Ev Armanc;

1. Beşa Zimên dixwaze bi xebatên xwe bibe navnîşana xebatên li ser zimanê kurdî û li xebatên ku der barê zimanê kurdî de tên kirin xwedî derkeve, wan berhev bike, di bin banê beşê de kom bike û pêwîstiyên wan xebatan bîne cih,

2. Beş dixwaze alîkarî û piştgiriya ji zimanzan, pispor û lêkolîneran bistîne, lê bixebite ku wan beşdarî xebatên zimên bike, xebatên heyî û yên tên kirin bi pêş ve bike û xebatên nû bide kirin,

3. Pêwîst dibîne rê li kesên ku li ser zimanê kurdî dixebitin veke, bi wan re têkilî deyne, xebatên wan ên heyî binirxîne û ji bo berhemên wan ên hêjayî çapkirinê jî, li çêkirina derfetan bixebite,

4. Beşa Zimên dixwaze bi kesên ku li ser zimanê kurdî dixebitin, lêkolîn û lêgerînan dikin û xwe di vî warî de bi pêş ve dibin, bibe alîkar, wan bigihîne û derfet û zemînan ji wan re amade bike,

5. Beş dê li ser gelş û arîşeyên zimanê kurdî raweste, wan biçespîne, xebatên lêkolînî û lêgerînî bike û ji bo çareserkirina wan gelşan bikeve nav hewldanan,

6. Beşa Zimên, dê xebat û berhemên xwe jî ji çapê re amade bike û lê bixebite ku wan bide çapkirin,

7. Beşa Zimên dixwaze ku

der barê xebat û pirsgerêkên zimanê kurdî de çalakiyên mîna panel, sempozyûm û konferansan pêk bîne,

8. Çi li welêt û çî jî li derveyî welêt bin, beş dixwaze bi saziyên ku xebatan li ser zimanê kurdî dikin têkilî deyne û bi wan re bikeve nav danûstandinê.

9. Beşa Zimên, dixwaze li ser zaravayên kurdî xebatan bike, ji bo berbihevanîna wan xebatan bide kirin û xebatên ku di vî warî de tên kirin ji nêzik ve biçûkîne,

10. Li gor derfetan Beşa Zimên pêwîstî pê dibîne ku literatûra li ser zimên, wergerîna zimanê kurdî û çavkaniyên bi zimanê kurdî zêde bike,

11. Beş, ji bo gihandin û perwerdekirina kadroyan, dê hemû derfetên xwe seferber bike.

12. Beşa zimên xwedî armanceke wisan e ku di demeke pêş de xwe wek saziyeke zimanê kurdî bi rê bixe.

## *Azînen Xebatê*

Ji bo pêkhatina van armancan, pirsê herî girîng a li ber me ew e ku “em dê karibin çawan bixebitin û çawan li riya xwe bikudînin” da ku em karibin armancên xwe bibin serî. Wek tê zanîn her xebatên ku armancên wan hatine xuyakirin û destnîşankirin, ancax bi metodeke zanistî û baş dikarin pêk bên. Azîne çî qas rast û di cih de bin, xebatên ku dê bên kirin jî ew çend bêkêmasî û di wext de tên pê.

Beş dê li gorî rê û rêzanên li jêrê hatine daxuyandin, tevgerê

û xebatên xwe bide meşandin.

1. Beş dê xebatên xwe ligel kesên profesyonel bi kesên nîv profesyonel û amator jî bike.

2. Beş, dê xebatên ku di warê zimanê kurdî de bide kirin, bi awayê kolektîf û ferdî bin. Ji bo ku berhem û xebatên ji aliyê beşê ve tên kirin, ji aliyê raya giştî ve, bi awayekî gelemper bê pejirandin, pêwîstî pê dibîne ku serî li raman û nêrînan kesên zane û pispor jî bide. Li aliyê din beş dixwaze hemû sazî û kesên li ser zimên dixebitin beşdarî xebatên xwe bike, bi wan re têkilî deyne û piştgiriya hev bike.

3. Beşa Zimên, ji bo ku li ser zimên xebatên baş bîn kirin û encamên baş bi dest bîn xistin, girîngî bi xebatên lêkolînî, lêgerînî û xebatên meydanî dide. Lewma dixwaze li gora pêdivî û derfetan, avakirina koman pêk bîne û wan bişîne cihên xebatan.

4. Beş, berhevkerin û arşivkirina berhem û xebatên li ser zimanê kurdî, yên ku li derveyî saziyê ji hêla kes û saziyan ve hatine kirin, dide ber xwe û yên ku hêjayî weşandinê dibîne jî dê çap bike.

5. Ji bo pêkanîna armanca û serketina xebatan, beş girîngî bi metod, dîsiplîn û bi cidîyetê dide.

#### *Amûr û Alavên Xebatê*

Beşa Zimên, ji bo ku bigihîje armancên xwe û xebatên xwe bi awayekî serketî temam bike, dê ji van amûr û navgînan ku li jêrê hatine xuyakirin sîd wergire:

1. Navgînên aborî; ji bo peydekirina hewcedariyên madî û teknîkî û pêkanîna xebatan pêdivî bi aboriyê dibîne.

2. Navgînên teknîkî; ji bo

kirin û meşandina xebatan pêdivî bi amûrên teknîkî yên mîna kompîtur, cîhazên qeydkirina deng û kamerayan heye.

3. Çapemenî û weşan, ji bo ragihandin û danasîna berhemên ku hatine amadekirin, çapkirin û weşandin, dê ji amûrên ragihandinê yên girseyî sîd wergire.

4. Cihê xebatê; ji bo xebateke baş, xebateke kûr û dorfireh, hewcedarî bi cihekî guncan ê xebatê heye.

5. Komîsyon; hemû xebat dê bi navgîna komîsyonan bi rê ve bîn birin û îdarekirin.

#### *Armancên Dema Nêzik*

Ji bo dema nêzik armancên beşê ev in:

1. Beşa Zimên, ji bo ku karibe armancên xwe bîne pê, serê pêşîn dê xwe bi rê bixe û kêmasiyên xwe temam bike.

2. Li gor armancên Beşa Zimên ji bo warên cuda dê komên xebatê bîn damezirandin.

3. Li ser rêziman û rastnivîsa zimanê kurdî dê perwerdehiya navxweyî ji bo xebatkar û endamên Enstîtuyê bê kirin.

4. Beşa Zimên dê li ser zimanê kurdî (zarava û gelşên zimên) panel, semîner û konferansan pêk bîne.

#### *Bernameya Beşa Ziman a Salane*

Beşa me, ji bo ku xebat bi awayekî serûber û birêkûpêk bîn kirin, xweavakirinê girîng dibîne û lewma dê serê pêşî lê bixebite xwe di vî warî de bi rê bixe. Tê zanîn heta sazî xwe bi rê nexin, pir zor e ku karibin xebatên serketî û encamgir bidin kirin.

Beşa Zimên, dixwaze armancên ku li jêrê hatine rêzkirin, di nav salekê de pêk bîne.

1. Ji bo kirin û meşandina xebatan, dê komên xebatê û komîsyon bîn çêkerin û ji bo damezirandina komîçkên zaravayên kurmançî û kirmançî (zazakî), gramer, rastnivîs û devokan jî, dê xebat bîn kirin.

2. Beş, ji bo ku kesên pispor û profesyonel bide xebitandin û kadroyên xwe temam bike dê li riya bidestxistina derfet û îmkanan bigere.

3. Dê li ser gramer, rastnivîs, zarava û devokên zimanê kurdî xebatên lêkolînî, lêgerînî bîn kirin û xebatên heyî dê bîn berhevkerin.

4. Beşa Zimên dê li ser zimanê kurdî û gelşên wê panel û semîneran li dar bixe.

5. Beş ji bo xebatkar û endamên Enstîtuyê dê li ser rêziman û rastnivîsa zimanê kurdî perwerdehiya navxweyî li dar bixe.

6. Ji bo pêkanîna mebest û armancên beşê dê bi sazî û kesan re têkilî bîn danîn, danûstandin bîn kirin û lê bixebite ku hevkarî û piştgiriya saz û xurt bike.

7. Der barê zimanê kurdî de dê proje bîn amadekirin û ji bo piştgiriya van jî, dê bi sazî û rêxistinên li nav welêt û derveyî welêt re têkilî bîn danîn.

8. Xebat û berhemên heyî yên der barê zimanê kurdî de dê bîn berhev û arşivkerin, li gor derfetan jî, xebatên ku ji hêla beşê ve guncan hatine dîtin, dê bîn çapkirin.

9. Beş, ji bo ku xebatên xwe bigihîne raya giştî û kesên têkilidar dê ji navgînên ragihandinê sîd û kelkê wergire.

# Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê



## Rêzeya Ferhengسازیê

**Büyük Türkçe-Kürtçe Sözlük**

Zana Farqînî

**Ferhenga Mezin a Kurdî-Tirkî**

Zana Farqînî

**Ferhenga Biwêjan**

Mustafa Borak

**Deyimler Sözlüğü-Ferhenga Biwêjan**

Dilawer Zeraq



## Rêzeya Hîndekariyê

**Binêre, Bixwîne, Birengîne**

Enstîtuya Kurdî

**Xwendin Ronahî ye**

Enstîtuya Kurdî

**Pirtûka bi Wêneyan ABC**

Enstîtuya Kurdî


**Kurdiya Nûjen Destpêk**

Çeto Özel

**Kurdiya Hêsa**


Sadık Varlı, İkrâm İşler, Taha Ceylan,

Ramazan Turan, Cihan Çelik




## Rêzeya Zargotinê

Çîrokên Kurdî-Zargotin / Remezanê Botî  
 Çîrokên Kurdî-Şemikê Bêdiran / Îkram Îşler  
 Çîrokên Kurdî-Fabl / F. Huseyn Sağniç  
 Dermanên Bijîşkiya Gelêrî / C. Hekîm-M.M. Qûtup  
 Çîrokên Kurdî -Senem Xanim / H. Akyol  
 Çîrokên Kurdî-Mîrze Meheme û Çapik Ehmed / H. Akyol  
 Çîrokên Kurdî - Tembûrzêrîn û Tembûrzîvîn / H. Akyol  
 Pênenokên Kurdî - Ax Piştî Min / Mahmut Barîk  
 Taw Dilo / Mehmet Kômür




## Rêzeya Wêjeya Klasîk

Yûsiv û Zuleyxa / Selîm  
 Çend Xezel û Helbest / Siyahpûş  
 Ey Avê Av / Feqiyê Teyran  
 Şêxê Senanî / Feqiyê Teyran  
 Dîwana Kerbelayî / Şêx Mihemed Kerbelayî  
 Dîwana Ruhî / Şêx Evdîrehmanê Axtepî  
 Nehcul Enam / Mele Xelîlê Sêrtê  
 Sirul Mehşer / Feqe Reşîdê Koçer



## Rêzeya Lêkolînê

Kurdistan / Felat Dilgeş  
 Xanî'den Platon'a İki Demet Çiçek / H. Mem  
 Xanî'den Mem'e Bir Buket Çiçek / H. Mem  
 Portreler / F. Huseyn Sağniç  
 Kürt Sultan Salahaddin ve Eyyubi Hanedanı / Torî  
 Kürtlerin Arî Boylarından Urartular / Torî  
 Em Zimanê Kurdî Binasin / Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê  
 Üçüncü Öğretmen Xanî / H. Mem  
 Mamosteyê Sêyemîn Xanî / H. Mem  
 Dîroka Wêjeya Kurdî / Feqî Huseyn Sağniç  
 Kevneşopiyên Kurdan / Mahmut Barîk  
 Tesewira Xaniyê Fîlozof / H. Mem  
 Dîroka Nijada Şêrwan / Salihê Kurê Xan Budaq  
 Mem û Zîn İdeal Memê Alan Destan Masal / H. Mem  
 Rastiyên Destana Memê Alan / H. Mem  
 Kaniyek ji Mezopotamya NISÊBÎN / Eslîxan Tanhan Yıldırım



## Rêzeya Ziman

Rêziman û Rastnivîsa Zaravayê Kurmancî / Samî Tan